

JI DO HETA ÎRO LI TIRKIYEYÊ SAZÎBÛNEKA NÎVLEŞKERÎ

# PERGALA CERDEVANIYÊ

Şemsa ÖZAR
Nesrin UÇARLAR
Osman AYTAR

Edîtorê Wergerê: Mirad Gundikî

DİSA
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

# JI DO HETA ÎRO LI TIRKIYEYÊ SAZÎBÛNEKA NÎVLEŞKERÎ: PERGALA CERDEVANIYA GUNDAN

**ŞEMSA ÖZAR NESRİN UÇARLAR OSMAN AYTAR**

Edîtorê Wergerê: Mirad Gundikî

**WEŞANÊN DÎSAyê**

Enstîtûya Diyarbekirê Bo Lêkolînên Siyasî û Civakî
(DÎSA)

**JI DO HETA ÎRO LI TIRKIYEYÊ SAZÎBÛNEKA NÎVLEŞKERÎ: PERGALA CERDEVANIYA GUNDAN**

**ISBN:** 978-605-5458-20-1
**Nivîskar:** Şemsa Özar, Nesrin Uçarlar, Osman Aytar
**Birêvebirên Projeyê:** Dilan Bozgan, Murad Akıncılar
**Edîtorê Wergerê:** Mirad Gundikî
**Wergêr:** Mirad Gundikî, Kenanê Nado, Sevîm Qoserî, Omer Faruk Kaya, Omer Faruk Baran, Bawer Ronahî, Nûhat Deştî.
**Dîzayna Dîtina Weşanan:** O. Özgür Güven
**Berg-Çêker:** Eylül Sozak, Medyakom *Kreatif Ajans*
**Dîtbarîya Rûpelan:** Buse Temel, Medyakom *Kreatif Ajans*
**Wêneyê Bergî:** Arşîva Ajanda Nûçeyan ya Dîcleyê (DİHA)
**Amadekar:** Atalay Göçer, DİSA
**Çapxane:** Berdan Matbaacılık Davutpaşa Cad. Güven San. Sit. C Blok No: 215/216 Topkapı/İSTANBUL Tel: 0212 613 12 11
**Çapa Yekê:** Stenbul, Berfanbar 2013

DİSA
DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ
DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL AND SOCIAL RESEARCH

Mimar Sinan Cad. Aslan Apt. B Blok No: 12
21100 Yenişehir/DİYARBAKIR
Tel: 0412 228 1442
Faks: 0412 224 1442
www.disa.org.tr
disa@disa.org.tr

**Copyright © Tebax 2013**
Hemî mafên li ser vê berhemê yên Enstîtûya Diyarbekirê Bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DİSA) ne, ti beşên berhemê bêyî destûra wê nikare li ber bê zêdekirin.

Ev rapora bi navê **Ji Do Heta Îro Li Tirkiyeyê Sazîbûneka Nîvleşkerî: Pergala Cerdevaniya Gundan** parçeyeka Projeya Cerdevanên Gundan e ko ev lêkolîn Enstîtûya Diyarbekirê Bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DİSA) bi piştgiriya Weqfa CHRESTê û Komeleya Heinrich Böll Stiftungê daye amadekirin. Fikrên di raporê de çêdibe ko rasterast ne wek fikrên DİSA, Weqfa CHRESTê û Komeleya Heinrich Böll Stiftungê bin.

Ji bo ko hûn raporê ji înternetê bibînin vê dûvelankê bitikînin; **http://www.disa.org.tr/cerdevaniyagundan.pdf** an jî bi agahîyên peywendiyê xwe bigihînin me.

Bi piştgiriya

CHREST VAKFI

HEINRICH BÖLL STIFTUNG
DERNEĞİ TÜRKİYE TEMSİLCİLİĞİ

**Osman Aytar**î li sala 2007ê li Zanîngeha Stokholmê li beşa civaknasiyê li ser rêxistîbûna parêzvanên komên ji gelek kesan pêk tê, doktoraya xwe temam kir. Ew niha li Swêdê li Zanîngeha Malardalenê, li pişka xizmetên civakî wek doçent, dixebite. Gelek nivîsarên wî yên bi zimanê kurdî û bi zimanê tirkî hene û digel wan li ser van mijaran xebitiye; koçberbûn, nijadîbûn (etnîsîte), entegrasyon, pirhejmarîbûn, mişextîbûn, kom û neteweyên bêdewlet, globalî, rêxistin û serokatî.

**Şemsa Özar**ê li sala 1990ê, li Zanîngeha Wirtschaftuniversitaetê ya li Awisturyayê, li ser ekonomîyê doktora kir. Ew ji sala 1990ê heta niho li Zanîngeha Bağaziçiyê li beşa ekonomîyê, dersên li ser bipêşketina aborîyê û cihê zayendên cida yên di civakê de dersan dide. Xebatên wê yên li ser van mijaran hene: Koçkirina bi zordariyê, ked û cihê zayendên cuda yên di civakê de, polîtîkaya civakî, birêvebiriya dezgehên biçûk. Kitêbeka wê ya, wê bi Handan Çağlayan ve Ayşe Tepe-Doğanê re nivîsî heye û navê wê "Ne Değişti? Kürt Kadınların Zorunlu Göç Deneyimi" (Çi Hat Guhertin? Serpêhatiya Koçkirina bi Zordariyê ya Jinên Kurd) e.

**Nesrin Uçarlar**ê li sala 2009ê li Zanîngeha Lundê li ser siyasetzaniyê doktora kiriye. Ew li beşa Têkiliyên Navneteweyî ya Zanîngeha İstanbul Bilgiyê dersan dide. Ew li Enstîtûya Diyarbekirê ya Lêkolînên Siyasî û Civakî projeyeka li ser edaleta bi bingehê civakê ya serastkar bi rê ve dibe. Ew bi çavê felsefeya nûjen heyina serdestan, berxwedan, sîyasîbûn û têgeha edaletê, lêkolînan li ser kêşeya kurdan a li Tirkiyeyê dike. Ji bilî ko kitêbên wê yên şexsî hene, kitêbeka wê ya wê bi Büşra Ersanlı û Günay Göksu Özdoğanê re çêkirî ya bi navê "Türkiye Siyasetinde Kürtler - Direniş, Hak Arayışı, Katılım" (Di Siyaseta Tirkan de Heyina Kurdan - Berxwedan, li Gerîna Mafên Xwe, Tevlêbûn) heye.

## SIPASÎ

Di beşa 4an a vê kitêbê de nêrînên li ser lêkolînên di nava civakê de cih digire, ev nêrînên bi alîkariya raporên ko Alk. Doç. Dr. Abdürrahim Özmenî koordînatoriya wan kirine, hatine nivîsîn. Em ji cenabê wî û ji hevkarên wî Ahmet Dolu û Zübeyde Osalê re gelek spas dikin ko ew bi xîret û berhemdariyê ji bo lêkolînên di nava civakê de xebitîne. Em ji amadekarên arşîvandina lêkolîn re, ji Didem Aydemirê, Müge Yaman Yılmazê û Nezih Bamyacıyî re jî spas dikin ko ew xemxwarên karê xwe bûn.

Em ji Dilan Bozganê re spas dikin ko wê li demê lê kolandinê de keda xwe daye, em ji Atalay Göçerî û Şemsa İlbaş re jî spas dikin ko wî ev kitêb ji bo weşanê û çapê amade kiriye, em ji Meral Danış Beştaşê, Nurcan Baysalê, Semahat Sevimê û Ulrike Dufnerê re jî spas dikin ko li dema, me li ser reşbeleka pêşiyê giftûgo dikir beşdarî giftûgoyê bûn, em ji seroka Weqfa CHRESTê, ji Lou Anne Jensen-CHRESTê re jî ji bo ko piştgiriya me kir spas dikin, em ji Emre Senanî re jî spas dikin ko wî karê dîzaynê da ser milên xwe.

## NAVEROK

**I. PÊŞKÊŞÎ** 9

**II. ALAYÊN HEMÎDIYEYÊ - DI ÎMPERETORIYA OSMANÎ DE NÊRÎNEKE DÎROKÎ YA LI RÊXISTINEKE NÎVLEŞKERÎ / Osman AYTAR** 15

1. Destpêk 15
2. Armanca alayan û pêvajoya damezirandin û belavbûna wan 16
3. Kiryarên alayan û bandorên civakî 20
4. Pêvajoya hilweşîna alayan û dawiya wan 25
5. Niqaş û encam 28

**III. JI BELGEYÊN MECLÎSÊ Û ÇAPEMENIYÊ DAMEZRANDIN Û DOMANDINA PERGALA CERDEVANIYÊ / Nesrin UÇARLAR** 35

1. Di Parlamena Mezin a Tirkiyeyê de nîqaşên li ser cerdevaniyê: Kewçêr 1984-Sibat 2011 35
   - a. Piştî şêst salan ji nû ve cerdevanî: Despêkirina pergalê, pêşniyar û îtiraz (1984-1988) 36
   - b. Berfirehkirina pergala cerdevaniyê: Arîşe û pêşniyarên “çareseriyê” (1988-1991) 39
   - c. Bicihbûyina pergala cerdevaniyê: Hikûmetên Nû, Rêbazên Kevn (1991-1996) 47
   - d. Di pergala cerdevaniyê de tedbîreke nû: “Islah/Selihandin” (1996-2002) 53
   - e. Şîroveya nû ya “Islah”ê: “Sozdarî” (2002-2009) 60
   - f. Di pergala cerdevaniyê de qonaxa dawî: “Komkujiya gundê Zanqirtê” û “Tîma Xençer” (2009-2012) 66
   - g. Nirxandin 71
   - Pêvek 1: Sererastkirinên ku li ser hevdîtinên pêşnûmeya zagonan di danişîna 27ê Gulana 2007an de hatin pejirandin û bûn zagon 73
2. Di çapemeniyê de cihê cerdevaniyê: 1987-2013 87
   - a. “Bijartineka ji bo welatiyan”: Salên pêşiyê yên destpêka cerdevaniyê 78
   - b. “Destûrname” û “karkerê kargeha pere peydakirinê ya bêhilberîn”: Belavkirina Cerdevaniyê 81
   - c. Mayindebûna “di nêva du agiran de” ya “çerxa cerdevaniyê“: Mayindebûna demdemî, mecbûrîtiya dildarî 83

d. "Zirarê cerdevanan, ji karê cerdevanan bêhtir e" 87
e. Rûyê cerdevaniyê yê li dewletê:
Bi rêya parlamenteriyê û memûriyetê hewldana
"islahkirina" cerdevanan 91
f. Hewldana hikûmkirina li ser cerdevanan 92
g. "Gundên qedexe" yên bêcerdevan;
ji bo cerdevanên "gundên stratejik" û taybet 95
h. Çavgerandin û alozî: "Hereqola cerdevanan",
"yekîneyên nêçîrvan", "daristanparêz", "cerdevanên taybet"
û "çeteya Geverê" 97
i. "Licê desteser e" 101
j. "Qey cerdevanî tê tasfîyekirin?" 103
k. "Saziyên civakî yên sîvîl yên Piştgiriya dewletê distînin":
Komeleyên Cerdevanan 108
l. Astengên vegera li gundan: Cerdevan 111
m. "Qetliyama li gundê Bîlgeyê" 114
n. "Dîroka" Cerdevaniyê:
Failên meçhûl, destdirêjî, sûc; tirs, wijdan, aştî 117
o.Nirxandin 121

**IV. NÊRÎNEK JI HÛNDIR: SERPÊHATÎ Û DAXWAZÊN CERDEVANAN, HEVSERÊN WAN Û ZAROKÊN WAN / Şemsa Özar** **125**
1. Cerdevaniyê çawa dest pê kir? 127
a. Hilgirtina pêşîn ya çekan 127
b. Zordariya cendirmeyan û derneketina ji gund 129
c. Agahdariya xelet - bekçîtî 131
d. Xizanî û pêwendiyên malbatî 132
e. Çekhilanîna li hemberî PKKê 133
f. Şer û dijminahiya di navbera malbatan de 136
g. Berjewendî - cerdevanî wek karekî malbatî tê dîtin 137
2. Cerdevan û malbatên wan behsa cerdevaniyê
dikin û wê dinirxînin 138
a. Esker me dixapînin 140
b. Derketina operasyonê 140
c. Tabûrên cerdevanan 143
d. Piştgiriya cerdevanan, saziyên wan 143
e. Cerdevan têkiliyên xwe û eskeran çawa dibînin 144
3. Guherîna têkiliyên civakî û gundan 148
a. Nêrîna li cerdevanan 148
b. Tirs 153
c. Fikr û raman û hest û daxwazên jinên cerdevanan 154
d. Zarokên Cerdevanan 155
4. Ekonomiya cerdevaniyê 157
a. Qezenca cedevaniyê, tezmînat, teqawîtbûn û sîgorte 158
b. Dûrketina ji rêncberiyê; wek karekî her-demî, cerdevanî 158
c. Mafên xebatê 161
5. Karên der-qanûnî ko cerdevan tevlî bûne 163
6. Fikr û ramanên li ser rakirina cerdevaniyê 166
a. Mafên xwe dixwazin 168
b. Karekî, rêya debarekê dixwazin 168
c. Tirsa ji PKKê 169

**V. EZMÛNÊN WELATAN YÊN BI BI RÊXISTINÊN NÎVLEŞKERÎ RE TÊKILDAR / Osman AYTAR** **175**
1. Destpêk 175
2. Perspektîvên teorîk 176
3. Ezmûnên welatên cihêreng 178
a. Fîlîpîn: Yekîneyên Erdnîgarî ya Hêzên Welatiyên Çekdarî 179
b. Guatemala: Komîteyên Parastinê yên Sivîl yen Dilxwaz 182
c. Afrîkaya Başûr: Yekîneyên Welatiyan 186
d. Iraq: Siwariyên Selahadîn 190
e. Guftûgo û çend encamp 194

**VI. NIRXANDIN** **201**

## I. PÊŞKÊŞÎ

Li Tirkiyeyê dewlet ji bo ewlehî û parastina raya giştî ji berê de bi rêya biçekkirina hemwelatiyên sîvîl rêxistinên nîvleşkerî ava dike û vê veavabûnê heta îro jî berdewam kiriye. Di dema Împaratoriya Osmanî de ev rêxistinên hanê wekî Alayên Hemîdiyê dihatine binavkirin û piraniya wan jî ji eşîrên kurdan pêk dihatin. Di serî de ji bo ermeniyan û ji bo hêzên ku dijminê dewleta Osmanî ne hatibûn biçekkirin. Di dema Cûmhûriyetê de jî îcar bi navê cerdevaniyê (Geçici Köy Koruculuğu), li hemberî serhildana PKKyê ji gundiyên Kurd rêxistineke nîvleşkerî hate damezirandin.

Di navbera dewletê û hin êşîrên Kurdan de yekem hevalbendiya fermî di sala 1891ê de bi damezrandina Alayên Hemîdiyê[1] pêk hatiye û ev hevalbendî ji bo jihevcihêbûna eşîrên Kurdan jî bûye dîrokeke girîng. Ji bidawîbûna van alayan heta sala 1985an damezrandina cerdevaniyê, di vê heyamê de, bi taybetî jî di navbera salên 1920 û 1938an de[2] wekî Alayên Hemîdiyê û cerdevaniyê fireh û bi rêk û pêk nebe jî, li Kurdistanê eşîrên Kurdan wekî rêxistinên nîvleşkerî hatine bikaranîn û ev rewş berdewam kiriye.

Pergala cerdevaniyê bi fermî bingeha xwe ji Destûra Gundan ya 442 nimroyî distîne ku ew di sala 1924an de hatiye derxistin. Di 26ê adara 1985an de bi guherandina di benda 74emîn a destûrê de[3] bi teklîfa walî û bi erêkirina Wezîrê Karên Navxweyî an jî bi teklîfa muxtar û bi biryara qeymeqam saziyeke ku tê de bi dil wezîfe tê girtin, hate damezirandin. Cerdevanên ku di heyamên cihê de hejmara wan digihişt 90 hezarî, ji aliyê îdarî ve girêdayî muxtar, ji aliyê karî ve jî di bin emrê Serfermandarê Cendermeyan de ne. Di 1ê tîrmeha 2000an de Rêznameya Cerdevaniyê di Rojnameya Fermî de hatiye weşandin. Di vê rêznameyê de girtina cerdevanan a wezîfeyê, kar û berpirsiyarî û perwerdeya cerdevanan, derxistina wan a ji kar û wezîfeyê, maf û heqên wan ên şexsî û hemû esas û ûsûlên cerdevaniyê hatiye diyarkirin.[4] Piştî vî ji bo cerdevaniyê guherandineke din a dawî jî di 27ê Gulana 2007an de bi destûra 5673ê nimroyî "Di destûra gund û di hin destûran de guherandin" de hatiye kirin. Miaşên cerdevanan û rewşa wan a teqawîdbûnê û guherandinên dawî yên ji bo girtina cerdevanên nû jî bingeha xwe ji vê destûrê distîne.

Cerdevanî ji Cerdevaniya Demkî û ji Cerdevaniya bi dildariyê pêk tê. Cerdevanên demkî çekên birûhsat digirin û mehane jî miaş distînin, ji ber vî miaşî jî nobetan digirin û tevlî operasyonan dibin. Cerdevanên dildar jî miaş nastînin û tenê ji bo ku "gundê xwe ji eşqiyayan biparêzin" cenderme çekên

birûhsat dide wan û mecbûriyeta wan a nobet û tevlîbûna operasyonan jî tuneye.

Li gorî agahiyên fermî, di dîroka 1ê sibata 2013an de, di nav sînorê 22 bajarî[5] de 46.195 cerdevanên demkî hene.[6] Ji xeynî cerdevanên demkî ku bimiaş di xebitin, bi texmînî nêzî 20-25 hezar cerdevanên dildar hene ku hejmara wan di belgeyên fermî de derbas nabe heye.[7] Tê zanîn ku dewlet di van mehên dawî de cerdevanên nû digire.[8] Di vê heyama ku çek radiwestin û pêvajoya çareseriyê dest pê kirî de, di ciyê ku wê cerdevanî çawa bê teswiyekirin nîqaş bikin, girtina cerdevanên nû û zêdekirina hejmara cerdevan nîşan dide ku ev veavabûna nîvleşkerî ji bo dewletê ne tenê hêzeke ewlehiyê ye, ji vê pirtir tiştekî îfade dike. Ji ber vê sedemê jî xuya ye ku wê pêvajoya bidawîanîna pergala cerdevaniyê hêsan nebe. Ji bo ku ev pêvajoya teswiyeyê zû bimeşe û bê qeza û bê bela bigihîje encamekê, em wisa difikirin ku gava ewilîn ew e ku bê zanîn ev pergal ji bo aktorên wê tê çi maneyê, ji bo çi ava bûye û tê berdewam kirin û hwd. bê deşîfre kirin. Armanca vê xebatê ew e ku der heqê vê pergala ku li Kurdistanê birînên bêderman vekiriye de feydeyek bide.

Ev xebat ji sê qonaxan hatiye sêwirandin. Di serî de lêkolîn ji aliyê dîrokî ve lê hatiye kirin. Aliyê dîrokî ji ber du sedeman girîng e. A yekem pergala cerdevaniyê ku di sala 1985an de dest pê kiriye, bi gelek aliyên xwe dişibe Alayên Hemîdiyê ku di dema Osmaniyan de hatiye damezirandin. Ji ber vê sedemê vê veavabûna berê, ji bo ku em hikûmeta navendî û polîtîkayên wê yên li herêmê û afirandina pêvajoyên dost û dijmin baş fêhm bikin û pergala cerdevaniyê baş deşîfre bikin doneyên girîng dide me. A duyem jî van sih salên dawîn dihewîne. Vê pergala ku 30 sal in didome, her çiqas ji aliyê destûrî ve "demkî" xuya bike jî, wekî saziyeke nîvleşkerî ku sê çar nifş di bin bandora wê de dimîne disekine. Li ser vê veavabûnê gerek li Meclîsê û gerek jî li raya giştî nîqaşên ku hatine kirin, raporên ku hatine hazirkirin, vê pêvajoya dîrokî bi awayên cuda cuda radixe li ber me. Ji bo ku ev heyam baş bê fêhmkirin belgeyên Meclîsê û nîqaşên ku hatine kirin, fikr û ramanên hikûmet û muhalefetê hatiye lêkolîn. Ji xeynî vê bûyerên vê pergalê ku di çapemeniyê de derketine, ji arşîvan hatine îstîfadekirin. Sûcên ku cerdevanan kirine, şahidiya mexdûran, daxuyaniyên berpirsiyarên dewletê bi rêya veguheztina vê arşîvê, hemû neheqiyên vê pergalê radixe ber çavan.

Ji xeynî veguheztina arşîvê, xebata li nav civakê jî hatiye meşandin. Bi cerdevanan re û bi jin û zarokên wan re ku li deverên cuda yên Kurdistanê dijîn re hevpeyvînên rû bi rû hatine kirin. Li ser mijarên wekî çawa dest bi cerdevaniyê kirine, çi jiyane, pergalê çawa dinirxînin, der heqê sûcên ku hatine





kirin de çi difikirin, ji vî mafê xwe daxwazên wan çi ne, der barê bidawîbûna pergalê de fikrên wan çi ne de dîtinên wan hatine sitendin.

Helbet tiştên ku mexdûr jiyane, him ji bo fêhmkirina pergalê û him jî ji bo pêvajoya çareseriyê ku di navbera terefan de edalet pêk were gelek girîng e. Tiştên ku mexdûr jiyane divê bi rêya komîsyonan derkevin holê û eşkere bibin. Sûcdar divê cezayê xwe bibînin û zirara mexdûran jî were dayîn. Lê armanca vê xebatê ne ew e ku neheqiyên ku ji aliyê cerdevanan ve hatiye kirin, derxe holê. Tiştên ku mexdûr berê û îro jiyane, di serî lêdanên saziyên wekî İHD (İnsan Hakları Derneği- Komeleya Mafên Mirovan)[9], GÖÇ-DER (Göç Edenler Sosyal Yardımlaşma ve Kültür Derneği- Komeleya Çandî û xêrxwaziyê ya Kesên Koç Kirîn)[10], MAZLUM-DER (İnsan Hakları ve Mazlumlar İçin Dayanışma Derneği - Komeleya Mafên Mirovan û Xêrxwaziya Mezlûman)[11] de û di raporan de pêşkêşî raya giştî bûye.

Van çavkaniyên hanê ji bo dîtina zêdebûna neheqiyên pergala cerdevaniyê, ji bo dîtina zilm û tehdayî, tacîz û tecawiz û qetlîaman girîng in.[12] Wekî din ji baro û hin komîsyonên fermî agahiyên ku hatine berhevkirin hene.

Bi xebata qadê, bi axaftina bi cerdevan û malbatên cerdevanan re, kêmasiya der barê pergala cerdevaniyê de hate temamkirin. Ji xeynî îfadeyên cerdevanan û çend tez û maqale[13] û çend kitêbên ku bi nêrîneke cuda behsa pergala cerdevaniyê dikin û çend kitêbên ku cerdevan nivîsandine wekî din çavkanî û agahî tune ne. Ji bo ku pergala cerdevaniyê ji kokê rabe û were teswiyekirin, divê di damezirandina vê pergalê de bêhiqûqiyên ku derketine neyên piştguhkirin û divê bi mutabaqateke civakî aktor û mexdûrên vê pergalê bêne zanîn û diyarkirin.

Di vê xebatê de ji bo pêvajoya bidawîanîna pergala cerdevaniyê, ji bo ku rê nîşan bide, mînaka Guetamala hatiye lêkolîn û nirxandin. Di vê dewletê de wekî yên me derketina veavabûnên nîvleşkerî, pevajoyên belavbûna wan û pirsgirêkên ku pergalê derxistiye û encamên wê yên civakî hatine nîşandan. Mînaka Guetamalayê wê li Tirkiyeyê ji bo teswiyekirina pergala cerdevaniyê rê nîşanî me bide. Çimkî li Guetamalayê piştî ku di nav dewlet û gerîlayan de Mutabaqata Aştiyê hate îmzekirin û komên nîvleşkerî hatin teswiyekirin jî, dîsa di nav demê de van komên hanê li ser gundiyan zor û zordariyê berdewam kir. Ev xebat, di dawiya kitêbê de, bi beşa nirxandinên gelemperî bi dawî dibe.

**Şemsa Özar**

**Têbînî**

[1]Ji bo dîrok û damezrandina Alayên Hemîdyê bnr.: Osman Aytar (1991), Hamidiye Alaylarından Köy Koruculuğuna, İstanbul, Medya Güneşi Yayınları.
[2]Di salên 1930î de, li Mêrdînê, ji bo mînakek bnr.: Ali Enver Toksoy (1939),Milli Mücadelede Mardin, C.H.P. Mardin Halkevi Neşriyatından No: 6, İstanbul, Resimli Ay Matbaası T.L. Şirketi, r.18.
[3]Bnr.: Köy Kanunu, 1924.
http://www.nvi.gov.tr/Files/File/Mevzuat/Nufus_Mevzuati/Kanun/pdf/KoYKANUNU.pdf
Bi pêveka ku di benda 74emîn a Destûra Cerdevaniyê de bûye, hatiye sazkirin:
(Pêvek: 26.3.1985 - 3175/1 bend; Guherîn: 27.5.2007 - 5673/1 bend) Li bajêrên ku wê Lijneya Wezîran diyar bike, piştî ku sedemên îlankirina rewşa awarte bête dîtin û nîşanên tevgerên tundiyê li gund an jî li derûdor biqewime yan jî bi kîjan sedemî dibe bila bibe, piştî ku can û malê gundiyan bikeve xetereyê yan jî bête tecawizkirin, bi teklîfa walî û bi biryar û erêkirina Wezîrê Karê Hundir, li gorî pêwistiyê wê biryara girtina cerdevanan bête dayîn. Gere hejmara cerdevanên ku wê bi vî awayî bêne berpirsiyarkirin, ji 40. 000 kesî derbas nebe. Lijneya Wezîran xwedî destûr e ku vê hejmarê derxîne ji sedî pêncî jî. Piştî ku ev sedem ji holê rabûn an jî ji ber sedemên îdarî, ger hewce bike, bi heman awayî wê cerdevanî ji holê bête rakirin.
[4]Bnr.: Köy Koruculuğu Yönetmeliği, 01.07.2000 tarihli ve 24096 sayılı Resmi Gazete:
http://www.seo.mavi1.org/mevzuat/20524.html
[5]Ev bajêr, Diyarbakır (Amed), Hakkari (Colemêrg), Şırnak (Şirnex), Tunceli (Dersim), Batman (Êlih), Bingöl (Çewlik), Bitlis (Betlîs), Mardin (Mêrdîn), Muş (Gimgim), Siirt (Sêrt), Van (Wan), Adıyaman (Semsûr), Ağrı (Agirî), Ardahan (Erdexan), Elazığ (Elezîz), Gaziantep (Dîlok), Iğdır (Îdir), Kahramanmaraş (Mereş), Kars (Qers), Kilis (Kilîs), Malatya (Meletî) û Şanlıurfa (Ruha) ne.
[6]Di pêşkeşkirina Serokatiya TBMM yê pirsa pêşniyaznameya nivîsî ya 17/16241 de bersiva serokatiya wezîrtîya navxweyî ya gerînendeya bajaran yê gelemperî
[7]Ertan Beşe (2006), "Geçici Köy Korucuları" (Cerdevanên Gundan Ên Demkî), Almanak Türkiye 2005: Güvenlik Sektörü ve Demokratik Gözetim (Sektora Ewlekariyê û Çavdêriya Demokratik), Weşanxaneya TESEV'ê, ss. 134-143. http://www.tesev.org.tr/Upload/Publication/c2e4e702-300a-4b46-b48e-ba55e802087b/Almanak-2005-Turkce-Tam%20Metin.pdf
[8]Li ser pirseke pêşniyaziyê serokatiya wezîrtîi ya navxweyî yê gerînendeyê bajaran yê gelemperî yê ji bo TBMM yê dayî de ji bo Baykana navçeya Sêrtê di 2012 de dest bi girtina kadroya 100 cerdewanên demkî kiriye û din av berfanbara 2012 û çileya 2013 de 100 cerdewan hatiye girtin. Li hin ciyên Kurdistanê ên di de ji nûçeyên mamendî hene. Minak, bnr.http://www.ozgurgundem.com/?haberID=80875&haberBaslik=Osmanl%C4%B1%E2%80%99dan%20yeni%20bir%20oyun&action=haber_detay&module=nuce , Özgür Gündem, 15.08.2013.
[9]Çile 1990-Adar 2009 Rapora taybet ya zerardayina mafên mirovan ên mafên mirovan. Gulan 2009. http://www.ihd.org.tr/images/pdf/ocak_1990_mart_2009_koy_korucülari_ozel_raporu.pdf
[10]Türkiye'de Koruculuk Sistemi (Li Tirkiyê pergala cerdavaniyê): Zorunlu Göç ve Geri Dönüşler (Koçberiya Mecbûrî û Veger), 2013 http://panel.stgm.org.tr/vera/app/var/files/t/u/turkiye%E2%80%99de-koruculuk-sistemi-zorunlu-goc-ve-geri-donusler.pdf
[11]Mazlum-Der Raporu (Rapora Komeleya Mafên Mirovan û Xêrxwaziya Mezlûman): Katliamın kökeninde koruculuk var(Di bingeha komkujiyê de cerdevanî heye) http://www.bianet.org/bianet/bianet/114427-mazlumder-raporu-katliamin-kokeninde-koruculuk-var
[12]Ji bo agahiyên berfirehtir li dîrok û pratîka cerdewaniyê bnr.: Berivan Tapan (2007), Terörün Bekçileri, Hamidiye Alaylarından Günümüze Koruculuk" (Notirvanên Terorê,Ji Alayên Hamidiyê Heta Îroyîn). İstanbul: Güncel Yayıncılık; Nihat Ekinci (2011), Pimi Çekilmiş Bomba: Köy Koruculuğu Sistemi (Bombeya Li Ber Teqînê: Pergala Cerdevaniya Gundan). İstanbul: Do Yayınları.
[13]Nur Tüysüz (2011), Yerel Güvenlik ve Etnik Kimlik: Güneydoğu Anadolu'da Bir Köy Üzerinden Köy Koruculuğu Sistemi, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Yıldız Teknik Üniversitesi, İstanbul; Ali Rıza Özdemir (2012), PKK ve Korucular, Balıkesir: Altınpost Yayınları; Evren Balta Paker ve İsmet Akça (2013), "Askerler, köylüler ve paramiliter güçler: Türkiye'de köy koruculuğu sistemi", Toplum ve Bilim, Sayı. 126, ss. 7-34.

## II. ALAYÊN HEMÎDIYEYÊ - DI ÎMPERETORIYA OSMANÎ DE NÊRÎNEKE DÎROKÎ YA LI RÊXISTINEKE NÎVLEŞKERÎ / Osman AYTAR

### 1. Destpêk

Damezrandina Alayên Hemîdiyê û pêvajoya piştî damezrandinê ji bo Împaratoriya Osmanî gelek girîng bû. Wekî ku tê zanîn, di sedsala 19an de Kurdan li hemberî dewleta Osmanî gelek serhildan û şer kirine, lê mixabin hemû serhildan jî hatin tepisandin. Dewleta Osmanî di tepisandina tevgerên Kurdan de, ji nakokiya di navbera Kurdan de gelek îstifade kiriye. Mesela li herêma Silêmaniyê, di tepisandina serhildana ku di sala 1806an de bi serkêşiya Evdirrehman Paşa destpê dike de, ji birayê Evdirrehman Paşa, ji Xalid Paşa hatiye îstifade kirin; paşê jî li herêma Cizîrê, di salên 1840î de Bedirxan Beg dibe desthilatdar, li hemberî Bedirxan Beg jî birayê wî Yezdanşêr tê bikaranîn. Di tepisandina tevgera ku di sala 1880an de bi serkêşiya Şêx Ubeydûllah destpê dike de, dewleta Osmanî bi Îranê re hevkarî kiriye (Arfa, 1966; Zeki, 1977; Nikitin, 1986; Gasaratyan v.d., 1987).

Ji xeynî Kurdan, neteweyên din ên ku di bin desthilatdariya Împaratoriya Osmanî de bûn, ew jî ji bo ku bigihîjin mafên xwe, di nav hewldan û tevgerên cihê cihê de bûn. Êdî gotina Osmanîtiyê wekî berê ne xwediyê tu giraniyek bû. Ermenî jî ji wan gelan bû ku ji bo bigihîjin mafê xwe di nav hewldan û tevgerê de bûn. Hin dewletên Rojavayî, ji ber dubendiyên di navbera xwe û dewleta Osmanî de, maf û daxwazên Ermeniyên ku li ser erdnîgariya Kurdistanê dijîn, ji bo berjewendiyên xwe zêdetir bikaranîne. Dewleta Osmanî êdî axên ku bi sedsalan pê ve girêdayî bûn yek bi yek winda dikir, ji bo axên ku Kurd û Ermenî li ser dijîn di destê xwe de bihêle her rêyê bikar dianî û diceriband. Polîtîkaya Abdulhamît a Panîslamîst ku giraniyê dabûyê, yek ji van rê û rêbazan bû (Aytar, 1992).

Alayên Hemîdiyê wekî perçeyekî vê pêvajoyê, di sala 1890an de hat rojevê û bi vê rêyê dixwestin ku rizgariya neteweyî ya Kurd û Ermeniyan bidin sekinandin. Nakokiyên di navbera Kurd û Ermeniyan de jî ji bo bicîanîna vê armancê bû sedem. Piştgiriya ku dewletên mezin dida Ermeniyan, propagandaya ku dewleta Osmanî dikir, “wê Kurdistan bibe Ermenistan”- bû sedem ku hin eşîrên Kurdan çekan bigirin û ji bo armanca dewleta Osmanî xizmetê bikin (Aytar, 1992).

Her çiqas 120 sal berê hatibe damezrandin jî, sedema damezrandin û armanc û kirin û encamên Alayên Hemîdiyê îro jî di rojevê de ne.

A yekem, Alayên Hemîdiyê perçeyek ji polîtîkaya dewleta desthilatdar bû ku pê hin perçeyên civaka Kurd di bin kontrolê de digirt, îdare dikir û bi vê rêyê armanc ew bû ku pêşî li ber xurtbûna muxalefeta Kurd digirt, nedixwest mezin bibe. A duyem, bi bikaranîna propagandaya ku "Kurdistan dibe Ermenistan" û bi motîfên dînî, hin eşîrên Kurd li hemberî Ermenî û muxalefeta Kurd hatiye rêxistinîkirin. A sêyem, Alayên Hemîdiyê tevî hin cudahiyên dema xwe, ji bo fêhmkirina pergala cerdevaniyê, daneyên girîng dihewîne. A çaremîn, Alayên Hemîdiyê ji bo heyama ku hatiye damezrandin û ji bo xebatên dîrokî jî tiştên girîng di xwe de dihewîne.

Armanca vê nivîsê ew e ku ji çend hêlan ve nirxandin û lêkolînkirina Alayên Hemîdiyê ye ku ji teref Împaratoriya Osmanî ve li Kurdistanê hatiye damezrandin û wekî din jî dixwaze perspektîfek dîrokî li ser paşeroj û pêşeroja pergala cerdevaniyê pêşkêş bike ku pergala cerdevaniyê di sala 1985an de ji hêla Tirkiyeyê ve li Kurdistanê hatiye avakirin. Di lêkolînkirina Alayên Hemîdiyê de, li bersiva sê pirsan tê gerandin: Armanca Alayan û pêvajoya damezirandin û belavbûna wan çi ne? Bandora Alayên Hemîdiyê û tesîra wan a civakî çi ye? Alayên Hemîdiyê di dawiyê de çi bûn?

Ev nivîs ji hêla daneyên bingehîn ve ji vê berhemê digire: *Hamidiye Alaylarından Köy Koruculuğuna* (Aytar, 1992), lê ji xeynî viya piştî vê tarîxê hin lêkolîn û nivîsên ku derketine jî di vê nivîsê de cî digire. Wekî din pêşniyar û daxwazên Enstîtuya Lêkolînên Siyasî û Civakî ya Diyarbekirê jî ji bo hilbijartina çavkaniyan bû krîterek. Ji ber vê sedemê em dikarin berhevkirina daneyan û nirxandina metodolojiya nivîsê, wekî berhevkirina sîstematîk (Polit & Beck, 2010) û di dawiyê de jî analîz bi nav bikin.

### 2. Armanca alayan û pêvajoya damezirandin û belavbûna wan

Damezirandina Alayên Hemîdiyê di sala 1890an de fiîlî destpê dike û derheqê wan de guherandina ewilîn a destûrî jî di sala 1891an de bi destûra "Hatt-ı Hümayun" hatiye kirin. Di benda yekemîn a vê destûrê de armanca damezirandina Alayên Hemîdiyê wiha hatiye diyar kirin:

> Ji bo ku welat ji êrîşên hêzên derveyî were parastin û ji bo avakirina hêzên leşkerî hemû gel ji bo viya xwedî berpirsiyar in. Dûr hiştina qismek gel ji vê berpirsiyariyê wê di hêzên gelemperî de bibe sedema qelsî û kêmasiyek, ji bo ku ev li tevahiya dewleta Osmanî derbas bibe û ji bo zêdekirina hêzên gelemperî, heta niha ji ber sedemên xwe yên taybet ên ku xizmeta leşkeriyê nekirine û bi comertiya xwe tên nasîn, divê mensûbên van êşîrên koçer bi navê pîroz ê "Leşkerên Hemîdiyê" bê damezirandin, ev emrê xîlafetê ye (Kodaman, 1987, s. 34).[1]

Sutan Abdulhamît di daxuyaniyek xwe ya derbarê Alayên Hemîdiyê de wiha digot, "Divê li Rûmeliyê, taybetî jî li Anadoliyê Tirk bihêz bibin û beriya her tiştî divê em Kurdên nav xwe bihelînin û ji xwe re bikin mal" (Abdulhamit, 1984, s. 73). Abdulhamit di hin rojnameyên Ewrûpayê de ji bo rexneyên ku li Alayên Hemîdiyê dihate kirin, vê bersivê daye:

> Ji bo ku min alayên Kurda ava kiriye, rojnameyên Ewrûpayê min rexne dikin. Îdîa dikin ku piştî damezirandina vê teşkîlatê Kurd, li welatên Şerqê êrîşî Ermeniyan dikin û dibêjin ku van Kurdên ku ji aliyê me ve hatine rêxistinî kirin, wê ji bo azadiya xwe li himberî me rabin û serhildanê bikin. Wisa xuya ye ku rojname li xeberan digere, ji ber vê sedemê jî tiştên şaş û xelet dinivîsin. Rojnamevan rewşa li Kurdistanê, li Beyoğluyê, li quncikên xwe yê rehet û li gorî fikr û dîtinên Ermeniyan temaşe dikin û dinirxînin(Abdulhamit, 1984, s. 74-75).

Derbarê Alayên Hemîdiyê de îtirazên hin padîşahên dewleta Osmanî jî bûye. Abdülhamit sedema van îtirazan bi hesûdiya M.Zeki Paşa ve girê dide û ji bo feydeyên Alayên Hemîdiyê wiha dibêje:

> Di şerê me û Rûsyayê de, van Kurdên ku bi disîplîn hatine perwerde kirin, wê ji me re xizmetên mezin bikin. Wekî din fikra 'îtîatê' ku li leşkeriyê hîn dikin, wê feydeyek mezin bide wan jî. Axayên Kurd ên ku me sernava zabît daye wan wê bi vê wezîfeya xwe bextewar bibin û wê hewl bidin ku bikevin binê hîmaya me. Wê heyama xwe yê şagirtiyê bi vî awayî temam bikin û wê bibin artêşek muhîm. Ez dizanim, ji ber ku min, zarokên hin axayên Kurd aniye Stenbolê û wan kirî memûr, têm rexne kirin. Bi salan e, Ermeniyên Xristiyan, mewkiya naziriyê dagir kirine. Ji niha û pê de Kurdên ku dînê me yek e, em wan nêzî xwe bikin, çi zirara viya heye? Eynî wisa ji ber ku ez Bedirxaniyan hîmaye dikim û li navendê diparêzim, dîsa têm rexne kirin, dibêjin ew ê ev hizûra welat xirav bikin. Tabî her kes di fikra xwe de azad e û serbest e! Lê di wê qenaetê de me ku ez di polîtîkaya xwe Kurdan de di rêyek rast de me. Zeki Paşa vê rewşê li ciyê wî tekîk kirî û fikra wî ya ji gundiyên Kurd damezrandina alayan gelek di cî de ye. Ji ber ku di her mijarî de em tên rexne kirin, êdî em hînî rexneyê bûne (Abdulhamit, 1984, s. 75-76).

Di nivîseke bi navê ”Alayên Siwarî yên Hemîdiyê” de ku di 14ê Îlona 1901ê de di hejmara 28an a rojnmaye Kurdistanê de derketiye de wiha dibêje, ji bo ku li himberî zilm û tedayîya ku li her her derê Împaratoriya Osmanî belav bûye têkoşîn bê kirin, hikûmet ditirse ku wê Ermenî Kurdan jî bikşînin ser fikrên xwe yên derbarê rizgariya netewî, di vê rewşê de wê ev hevkarî xetereyên mezin derxe. Ji bo ku di navbera Kurd û Ermeniyan de dijminî û dubedî hasil bibe Alayên Hemîdiyê hatine damezirandin. Ji bo ku civakek ji holê rakin îmtiyaz didin civakek din (Bozarslan, 1991b). Di maqaleyek di hejmara 56-57a Roja Nû de jî wiha tê ragihandin, Alayên Hemîdiyê ji bo ku navbera Kurd û cîranên wan ên Xristiyan xirav bikin hatiye damezirandin. Van alayên hanê pêşveçûyîna Kurdan dereng dike û di navbera Kurdan û Xrisitiyanan de dijminityê derdixe (Jîna Nû, 1986).

M. Emin Zeki (1977) dibêje ku Alayên Hemîdiyê ji bo ku tevgerên li dijî rejîmê neqewimin, Kurdan bi dewletê ve girê bidin û ji wan îstifade bikin hatine damezirandin. Li gorî Mikhail Semenovich Lazarev (1999) jî armanca hebûna Alayên Hemîdiyê ew e ku Kurdan li himberî Rûsan wekî sîperek, li himberî Îranê jî di rewşa êrîşê de bihêlin hatine damezirandin. Sedemek girîng jî ew e ku pêşiya Kurdan bigirin, Kurda di bin kontrola dewletê de bihêlin û bêguman rewşa serbixwe ya eşîrên Kurd ji holê rakin. Ji bilî viya Alayên Hemîdiyê li dijî doza netewî ya Ermeniyan jî hatiye emlandin. Celîlê Celîl (1985) jî wiha dibêje, Alayên Hemîdiyê li himberî Rûsan wezîfeya sîperî dîtiye û li hmberî serhildanên Ermeniyan jî hatine bikaranîn. Alayên Hemîdiyê di bikaranîna dijî tevgera Kurd jî rolek mezin leyîstiye.

Li gorî Hasan Arfa (1966) Abdülhamit bi rêya Alayên Hemîdiyê xwestiye ku eşîrên Kurd ên şerkir bigre binê kontrolê, feeliyetên wan ên şerker li gorî destûran li hev bîne û di navbera xwe û Kurdan de têkiliyek taybet ava bike. Abdul Rahman Ghassemlou (1965) diyar dike ku dewleta Osmanî her çiqas di li dijî Rûsyayê pêwstî bi Alayên Hemîdyê dîtibe jî, di şer de rolek girîng negrrtine. Martin van Bruinessen (1978) jî wiha diyar dike, Alayên Hemîdiyê ji bo ku Kurdan bi padîşah ve girê bidin û li Rojhlatê dengeyan ji bo dewletê biguherîn hatine damezirandin, wekî din li dijî Îngiliz û Rûsan jî wekî pêşşigrek hatiye ava kirin.

Yılmaz Öztuna (1983) jî wiha îdia dike ku bi rêya Alayên Hemîdiyê Kurd li djî Ermeniyan hatine emilandin, bi vê rêyê jî leşkerê Tirk di şerê gerîlayê de nehatiye emilandin. Bayram Kodaman (1987) sedemên avakirina Alayên Hemîdiyê wiha rêz dike, tesîskirina otorîteya navendî, li Rojhilatê avakirina





bandora dewletê ya civakî û aborî, ji hêla leşkerî ve ji eşîran îstifadekirin, bertekkirina feeliyetên Ermeniyan, di navbera Ermeniyan û gelê Misilman de avakirina dengeyê, li dijî êrîşên Rûsan û ji polîtikayên Îngilizan parastina Rojhilatê û meşandina polîtîkaya panîslamîst.

Hin çavkanî jî (Ghassemlou, 1965; Erdost, 1987) dibêjin ku Alayên Hemîdiyê li dijî Kurdên Dêrsimê û Kurdistana Başûr û li dijî netewperweriya Ereban hatiye emilandin û diyar dikin ku van alayên hanê di 1915an de li dijî Nastûriyan bi leşkerên Osmanî re tevgeriyane.

Alayên Hemîdiyê perçeyek polîtîkaya perçe bike û îdare bike ye, damezirandina wan li du herêman destpê kir. Herêma yekem, navbera Erzirom û Wanê, ciyên ku sînorên Rûsyayê heye, herêma duyem jî navbera Mêrdîn û Rihayê. Bi emrê Abdülhamit Fermandarê Artêşa 4emîn Müşir Mehmet Zeki Paşa Erzîncanê ji xwe re dike navend û ewil Mîrliva (Tuğgeneral) Mahmud Paşa dişîne Van, Malazgirt ve Hınıs û damezirandina Alayên Hemîdyê da destpê kirin. (Altay, 1970; Bruinessen, 1992; Aytar, 1992).

Derbarê hejmara Alayên Hemîdiyê de digel daneyên nêzî hev daneyên cihê jî hene. Li gorî Bruinessen (1978) hejmara Alayên Hemîdiyê di 1892an de 40, di 1893an de 56 û di 1899an de 63 e; li gorî ku Kodaman (1987) ji daneyên ku ji “Sâlname-i Askeri“ radighîne di destpêka sala 1895an de hejmara alayan 56 e. Di vê lîsteyê de alay ji 1ê heta 56an fermandarên alayan û nav û rutbeyên wan hatine diyar kirin. Alayên 51., 52., 53., 54. û 55. Ji ber ku nêzin girêdayî Artêşa 5emîn a li Sûriyê ne. 51 alayên din jî girêdayî Artêşa 4emîn in ku navenda wê li Erzincanê ye. 20 alayên ku bi Artêşa 4emîn ve grêdayîne ji hêla sûbayan ve yên dinê jî ji hêla qeymeqaman ve dihatin îdare kirin.

Li gorî Şevket Beysanoğluyî (1956, 1990) jî di destpêkê de 36, di 1895an de hejmar 56 bû, di 1908an de derket 65a. Li gorî Beysanoğlu radigihîne li herêma Diyarbakirê ciyê 9 Alayên Siwarî yên Hemîdiyê û mensûbê kîjan eşîrê ne wiha ye: Alaya 41., li Viranşehirê di bin îdareya ji eşîra Milli Miralay İbrahim Beg[2]; Alaya 42., di bin îdareya kurê İbrahim Beg Kaymakam Abdülhamid (Humûd);Alaya 43. Di bin îdareya kurê İbrahim Beg Kaymakam Mahmud; Alaya 44., ji eşîra Karakeçi di bin îdareya Kaymakam Halil Bey; Alaya45., di navbera Serê Kaniyê û Mêrdînê de ji eşîra Kiki/Kikan di bin îdareya Kaymakam Reşit Bey; Alaya46., ji eşîra Bucak di bin îdareya Binbaşı Yusuf Axa de;Alaya 48. Li Cizreyê ji eşîra Miran di bin îdareya Kaymakam Mustafa Paşa[3] de bû. Dîsa li gorî ku Beysanoğlu radigihîne gorî Salnâme-i Askeriye ya dema Abdülhamit eşîra Millî ji xeynî alayên 41., 42. û

43. ku li jorê hatiye behs kirin, alayên 63. vû 64. Jî ava kirine û zarokên Îbrahîm Paşa, Halîl û Temûr bi rutbeya qeymeqam hatine berpirsiyarkirin. Li gorî sûbayê Rus Avyarov (1995) jî di sala 1899an de hejmara gştî 65 alay e.

Li ser hejmara siwarî û piyadeyên di Alayên Hemîdiyê de, li gorî mezinbûna eşîrê, demê û herêmê hejmar diguhere (Avyarov, 1995; Lazarev, 1999; Süphandağ, 2006) û vana bi gelemperî di navbera hejmarên 300-800 de diguhere. Lê heger em hejmara alayan 65 qebûl bkn û di her alayê de texmînî 500 leşker hebe, ev hejmar bi tevahî diçe 32 500 leşkerî û ev hejmar li gorî wê demê hejmarek kêm nîn e.

Mektebên Eşîran jî ku di 1892an de tê damezirandin rastî pevajoya damezirandina Alayên Hemîidiyê tê û ew jî digel vê mijarê veavabûnek girîng e. Çimkî kesên ku ji van mekteban mezûn bûn di serî de di Alayên Hemîdiyê de û di xizmeta dewletê de xebitîn. Mekteb cara ewil li Stenbolê, li Akaretlerê vebû, di 1894an de li Kabataşê çû avahiya xwe ya nû. Em dikairn bibêjn ku ev mekteb ji bo siyasetên Abdülhamt ên panîslamîzm, Osmanîtî bi rêya perwerdeyê bi eşîran bidin qebûl kirin navgînek bû. Mekteb ji bilî viya, zarokên serokên eşîran li Stenbolê wekî dîlan digirt û navgînek ji bo îhtimala pêşî lê girtina serhildanan (derbarê mektebê ji bo agahiyên fireh binêrin: Celîl, 1985; Aytar, 1992; Akpınar, 1997).

### 3. Kiryarên alayan û bandorên civakî

Serhildana Sasonê ji bo kiryarên Alayên hemîdiyê wekî mînaka yeken tê qebûlkirin û pêvajoya piştî vê serhildanê girîng e. Ermeniyan ji ber polîtîkayên di dema Abdülhamit de di 1892an de fiîlî dest bi berxwedanê kirin, Piştî ku Ermeniyan di sala 1894an de li Sasonê serhildan çêkir, ev serhildan ji bo qetlîama wan jî bû sedem. Ji bo tepisandina vê serhidanê dewleta Osmanî hin Alayên Hemîdiyê emiland. Sason û derûdora Sasonê hate wêran û kavil kirin. Bi hezaran însan mirin. 102 gund hatin talankrin û ji vana 89 gund hatin xirav kirin. Dora salê li Bitlis, Elazığ, Diyarbakır, Erzurum, Trabzon ve Urfaê qetlîma Ermeniyan pêk hat. Di sala 1896an de ji ber ku grûbek terefterê Taşnakê li Stenbolê êrîşî Banqeya Osmanî kir, ji ber vê sedemê li Stenbolê qetlîama Ermeniyan pêk hat. Di salên 1894-1896an de li tevahiya delweta Osmanî de, di qetlîama Ermeniyan de ji 300 hezar zêdetir însan hatni kuştin. Bi hezaran însan reviyan derveyî welêt (Lazarev, 1999; Aydemir, 1972; Bruinessen, 1978; Yerasimos, 1980; Ahmad, 1986).





Rêveberiya Osmanîyan ji bo ku Komîsyona Lêkolînê (ji nûnerên konsolosên biyanî pêk dihat) bixapîne zor dida hin Ermeniyan ku li ber komisyonê bibêjin ”Tirkan bi me re tim mûameleyên xweş kiriye” û ev hewldan jî feyde neda û komisyon di van qetlîaman de dewleta Osmanî sûcdar dikir (Larsson, 1897).

Qetlîama Sasonê him li hundirê welêt û him jî li derve bûbe sedema bertekên mezin, lê dîsa di îlona 1895an de ev qetlîam dîsa destpê kirin. Di Kewçêra 1895an de li Akhisar, Trabzon, Bayburt, Bitlis, Erzincan, Palu, Diyarbakır û li Erzurumê; di 1895an de li Elazığ, Sıvas, Urfa, Malatya, Maraş, Antep, Arapkir, Siverek, Muş, Tokat, Amasya, Merzifon, Kayseri û li gelek ciyên din li dijî Ermeniyan qetlîam pêk hatin. Qetlîam û tedayî di Hezîrana 1896an de li Wanê, di Tebaxa 1896an de li Stenbolê û di bihara 1897an de li Tokatê berdewam kir. Derbarê van qetlîaman de mîsyonerê İsveçî (1897, 1919) li gorî reqamên fermî yên dewleta Osmanî wiha radigihîne, di heyama 1894-1897an de 2.500-3.300 gund hatine şewitandin, 29 hezar 544 kes bi çekan hatine kuştin, 1 383 kes hatine şewtandin, 5 hezar 563 kes ji serma û ji birçîbûnê mirine, 92 hezar 650 kes bêmal maye. Wê demê mîsyonerê Îsweç Larsson ku ji bo Tirkyeyê seferek xaçperestan pêwist didît, di nirxandinên xwe de –her çiqas di bandora olê de be jî- hejmarên ku dide ji bo ferhmkirn û têghiştina qetlîama Ermeniyan grîng e.

Wekî ku tê dîtin, qetlîma ku li Ermeniyan dihat kirin, tenê bi Kurdistanê sînorkirî nebû. Li gor agahiyên hin kesên ku şahidî van bûyen bûye, dibêjin hikûmetê bi zanatî Kurd li dijî Ermeniyan bikardianîn û bi rêya fanatîzma Îslamî Kurdan êrîşî ser Ermeniyan dikir. Hikûmeta Osmanî ji bo ku têkliiyên Kurd û Ermeniyan xirab bike, Kurd tim derdixist pêş. Leşkerên Osmanî pirî caran cil û bergên Kurdan li xwe dikirin û qetlîam û tedayî dikirin. Ji bo ku nakokiyên di navbera eşîrên Kurdan de van qetlîama nede rawestandin, dewleta Osmanî eşîrên dijmin li hev dianî û mensûb û serokên eşîran ên ku di girtîgehan de bûn dihatin berdan. Tabî ev ji bo kesên ku bi dewletê re di nav hevkariyê de derbas dibû (Lazarev, 1999).

Piştî qetlîama Sasonê û bûyerên piştî wê, di nav gelê Kurd û Ermenî de bêbawerî çêbû. Begên Kurd dest didan ser erd û mal û milkê Ermeniyên ku derketin derveyî welêt. Gorî ku Lazarev (1999) dinivîse, Balyozê Rûs İ. A. Zinoviyev dibêje ku bi destûra berbirsiyarên himûmetê Kurdan dest didan ser hin erdên Ermeniyan ku vala mabûn, gundiyên ku mabûn jî Kurdan mûameleya koleyan li wan dikir. Berpirsiyarên dewleta Osmanî çend sal bû ku ji Ermeniyan bac nedistend, baca ku çend sal e nehatibû sitendin derbasî hesabên begên Kurd

dikirin û wan dikirin xwedî ax û milk. Destdayîna ser axên vala jî rêbazek ku dihate bikaranîn bû.

Hikûmeta Osmanî cezakirina Kurdên ku mensûbê Alayên Hemîdiyê bûn li dera hanê, ew teşwîq dikirin. Li gorî ku Lazarev (1999) radighîne, gilîkirina Kurdên ku di alayan de ne sucek bû, çimkî vê rêxistana ku navê sûltan lê bû, mensûbên wê sûc nedikirin, kî wan sûcdar bike Sûltan sûcdar dike û ev jî sûcek mezin bû. Li gorî ku Beysanoğlu (1956) radigihîne ku heta Fermandariya Artêşê ya 4emîn ku li Erzîncanê ye destûr nede, di derheqê Alayên Hemîdiyê de tu lêpirsînek destûrî destpê nedikir û mensûbên van alayan nedihatin darizandin. Di rewşên wiha de qerar rasterast li Stenbolê dihate dayîn. Sait Paşa (1977) –ku wê demê sedrazamtî kiriye– di bîranînên xwe dibêje ku heta destûra padîşah nebûya tu mehkeme nikarbû mensûbên Alayên Hemîdiyê bidarizîne. Tenê dîwana herbê dikare wan mehkeme bike.

Ne tenê Ermenî, Kurdên ku tevlî van alayan nebûbûn jî ji êrîşên Alayên Hemîdiyê zirar didîtin. Li gorî Lazarev (1964) Kurdên ku li qezaya Hoşapê rûdinin, di daxwaznameya ku ji hikûmetê re şandine de wiha dibêjn, di nava 8 sala de Alayên Hemîdiyê ku ji eşîra Şemsikî pêk tên, di êrîşên ku kirine de 12 kes kuştine û derdora 40î de jî birîndar hiştine û dest dane ser 800 heb dewar 10 hezar mêşinên wan. Lê hîkûmetê pêşiya van tiştan negirtiye. Di vir de armanc ew e ku Alayên Hemîdiyeyê nexeyîdînin, çimkî li himberî Ermeniyan xwediyê rolek bûn û him jî di serî de M.Zekî Paşa û mezinên dewleta Osmsanî, ji van talan û êrîşan para xwe digirtin.

Lazarev (1999) –ji rapora komîsyona ku ji hêla Almanan ve ji bo çêkirina Rêya Trênê ya Bexdatê lêkolîn bikin hatiye avakirin– radigihîne, Alayên Hemîdiyê ya Diyarbekirê ku grêdayî Îbrahîm Paşa ye, li Serê Kaniyê bi sedan gund talan kirine. Li ser rêya Nusaybinê ji nîvê gunda gundiyan axa xwe terk kiriye. Sancaqa Nusaybînê ku qesrên Mustafa Paşa –di dema xwe de yek ji fermandarên Alayên Hemîdiyê bû– hebûn, rewş xirabtir bû. Li ser rêya Mûsûlê ji bîst gundên wêran tenê gundek mabû. Li bajarê Diyarbekrê rewşa aborî bi tevahî xirab bûbû. L gorî rapora ku hate qal kirin, heger ev talan wiha dom bikira wê bajêr ji binî xirab bibûya. Di dawiya raporê de tê ragihandin ku li Mûsulê rewş tevlihevtir û xirabtir e.

Alayên Hemîdiyê li Helebê û li derûdora Helebê jî êrşî qebîleyên Ereban dikir. Di rapor û daxuyaniyên Rûs û Fransiz ên Helebê de ku Lazarev (1999) radighîne de ev rewş tê qal kirin. Di dubendî û nakokiya ku di navbera hin eşîrên Ereb û êşîrên Kurd ku mensûbê Alayê Hemîdiyê ne de derket, dewleta Osmanî piştgirî dida Alayên Hemîdiyê. İbrahim Paşa ji bo ku wî gilîkirin, gundekî ku girîdayî eşîra Abû Asaf e, talan kir. Li başûrê Herranê bi sedan gund, ji ber van kiryaran talan bûn wêran bûn. Li gorî ku tê gotin, gelê wir Îbrahîm Paşa wekî padişah didît.

Li gorî ku Lazarev (1999) radigihîne, piştî qetlîamên Ermeniyan, Abdülhamît derbarê Alayên Hemîdiyê de biguman bûbû. Ji ber vê sedemê nedixwesst ku Alayên Hemîdiyê çekên modern bigirin. Çekên modern di depoyan de dima û kêm diket destê alayan. Ji van çekan, yek didan sed kesan. Di berdewiya de li gorî Lazarev (1999) radigihîne, Lijneya Wezîran di Sibata 1899an de raporek dide Abdülhamit, tê gotin ku di Alayên Hemîdiyê de disîplîn nemaye. Abdülhamt komîsyonek ava dike û ev komîsyon rapora M.Zekî Paşa dinirxîne û derbarê alayan de digihîje encamên neyînî. Biryar tê dayîn û sûbayên ji hêla perwerdeya leşkerî ve gihîştî ne dişînin alayan. ji bo alayan talîmatnameyên ku li Rûsyayê ji bo Alyaên Kazakan hatine bikaranîn dixwazin bikarbînin. Hikûmet ji ber ku wê eşîrên Kurd berdek nîşan nedin, dev ji van pêşniyar û projeyan berdan.

Nakokiyên di navbera berpirsiyarên sîvîl û leşkerîi û eşîrên Kurdan de her ku diçû zedê dibû. Li gorî ku Lazarev (1999) radigihîne, di destpêka 1898an de, waliyê Wanê, ji Babialiyê re nameyek dişîne û dibêje ku bi Kurdan re rêya lihevkirinê nemaye, bacê nadin û ji desthilatdariyê re serî danaynin. Di bersivê de wiha tê gotin, bi zorê bacan bistînin. Ji ber vê sedemê sê fermandarên Alayên Hemîdiyê hatin girtin, lê dîsa hatin berdan.

Di wê demê de tiştekî balkêş jî ew e ku her ku diçû Kurd tevlî hewldanaên qetlîamên Ermeniyan nedibûn. Di nav Kurdên Bedlîs û Wanê de êdî hewldanên ji bo qetlîamên Ermeniyan bêwate bû û dihate gotin ku têkiliyên di navbera Kurdan û dewleta Osmanî de nêzî neyartiyê ye. Wê demê agahiyên ku hin Kurdên ku mensûbê Alayên Hemîdiyê ne bi Ermeniyan re têkildarin û tevdigerin, digihîşt rêvebirin dewleta Osmanî. Di havîna 1903an de çend fermandarê Alayên Hemîdiyê ji ber ku bi Ermeniyan re tevgeriyane hatin derdest kirin. Di salên 1903-1904an de di bûyerên ku li Sasonê qewmî de Kurdan vekirî yan veşartî be jî piştgirî da Ermeniyan. Bi xêra vê piştgiriyê dewleta Osmanî wekî deh salên berê nekarî Ermeniyan qetil bikin (Lazarev, 1999; Gasaratyan vd., 1991; Celîl, 1985).

Li gorî konsolosê Erziromê ê Rus Maksimov ku radigihîne (Lazarev, 1999), eşîrek Kurd bi Ermeniyan re li dijî leşkerên Osmanî şer kiriye. Rojnameya

Ararat qala hin begên Kurd dike ku Ermeniyan ji qetlîamê parastine. Mesela Mahmutzade Beytullah Beg li dijî Alayên Hemîdiyê derdikeve û herêma Miksê ji talanê û wêrankirnê xils dike.

Li hin deverên din jî Kurdan Ermeniyan parast. Serokê eşîra Rişvan Besnili Yakup Ragıp Paşa di salên 1890an de li Malatya, Besni, Adıyaman Ermeni parastin, heta ji bo Ermeniyan ji eşîra Huveydî 16 kesan kuşt. Ermeniyên ku şahidiya viya kirine heye (Dersimi, 1986).

Hevkariya Kurd û Ermeniyan xwe di rojnameyên wan de jî nîşan dide. Di rojnameya Kurdistanê de bi taybetî qala biratiya Kurd û Ermeniyan dihate kirin. Mîqdad Mîthed Bedirxan û Abdurrahman Bedixhan ku him xwedî û him jî nivîskarên vê rojnameyê bûn, pirî cara ji bo biratî û hevkariya Kurd û Ermeniyan bang dikirin. Rojnameya Kurdistanê bang li Kurdên ku ji aliyê Abdülhmît ve dihatin xapandin dikir û dixwestin ku ji demên berê dersan werbigrin (Bozarslan, 1991a, 1991b).

Maqaleya Abdurrahman Bedirxan Beg ku bi Tirkî û Kurdî hatiye nivîsîn ji bo Kurdan wekî bangek e, ev nivîs di Hezîrana 1901an de di hejmara 4emîn a rojnameya Troşak de hatiye weşandin. Li gorî ku Garo Sasûnî (1986) radigihîne, Abdurrahman Bedirxan di vê maqaleya ku îmze û mora wî ya taybet li serê ye de Abdülhamit rexne dike û bi mînakan nîşan dide û dixwaze ku Kurd nekevin xizmeta wî.

Beriya 1908an li Kurdistanê bi armancên cihê serhildanên herêmî qewimîn. Li gorî lêkolînek li ser vê mijarê sedemên bingehîn ên van serhildanan ev bûn, giranî û pirbûna bacan, bacên nû, bêedaletiya rêvebiran û zor û zordariya ku Alayên Hemîdiyê li ser gel dikir (Kars, 1984). Li gorî lêkolînek din jî sedemên serhildanên ku di salên 1906-1908an de ku li Kurdistanê derketine, piştî qetlîamên Ermeniyan ku 1894-1895an de derketin bûrjûvaziya tîcarî, ticareta herêmê dike destê xwe, li himberî viya jî derketina kapîtalîsên biyanî ku ji kapîtulasyonan îstifade dikirin, ji gundiyan berhevkrina bacên nû jî yek ji van sedeman e (Petrosyan, 1974).

Piştî ku İttihat vû Terakkiyê desthilatdariyê bi dest xist, dewletê ji nakokî û ji dubendiya di navbera Kurdan de îstifade kir û emiland. Ji bo ku pirsgirêka netewî bi rêya muzakereyê were çareserkirin, hin serokên Kurd (Emin Ali Bedirhan, Seyit Abdülkadir, Şerif Paşa vb.) piştgirî dan Meşrûtiyeta Duyem. Di serî de pêwistiya İttihat û Terakkiyê bi vê piştgirîyê hebû.

Wekî ku tê zanîn piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem hin komeleyên





Kurdan vebûn û hin rojname derketin. Di Nîsana 1909an de bi bahaneya ku di navbera Kurdan de û navbera ên ku serî rakirin û demekê rêveberiyê kirin destê xwe têkilî heye, demekê navbera rêvebirên İttihat ve Terakki û Kurdan xirav bû. Lê sedema esas ew bû ku Îtîhat û Teakki di ciyê ku ji bo mafên netewî gav bavêje tedayiya girantir kir. Wekî din di vê navberê de di nav Kurd û Ermeniyan de têkilî çêdibûn. Hikûmet ji bo ku dubendî bikeve nav Kurd û Ermeniyan, ajanan dişand Kurdistanê. Di nava hin serokên Kurdan de jî nakokî hebû. Bi taybetî di navbera Seyît Abdulkadîr û Emîn Alî Bedirxan de dubendî zêde dibû. Rêveberiya Osmanî ji van firsendan îstifade kir û 1911an de saziyên Kurd ên siyasî û yên perwerdeyê girt û rêvebirên wan hatin girtin. Di nav wan de rojnameye Kurd Teavun û Terakkî û dibistana Kurd hebû. Hin serokên ku ji bo ku nekevin destê hikûmetê reviyan derveyî welat û yên man jî xebatên xwe veşartî domandin. Ji xwe berê bi bahaneya bûyera 31ê Adarê hin Kurd hatibûn ceza kirin (Gasaratyan vd., 1991). Piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem li Stenbolê di salên 1908-1913an de rojname û kovarên wekî “Şark û Kürdistan“, “Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi“, “Kürdistan“, “Rojî Kurd“, “Yekbûn“ ve “Hetawî Kurd“ weşiyan ( Malmîsanij & Lewendi, 1989).

Hin derûdorê Kurd ku di dema Abdülhamit de xwediyê îmtiyazan bû bi nêrînek neyînî li rêveberiya İttihat û Terakki dinihêrîn. Van derûdorên hanê, li hin deverên Kurdistanê serkêşiya propagandayên li dijî rêveberiyê meşandin. Kurdên Dêrsimê jî ku di dema Abdülhamtt de ne xwedyê tu îmtiyazek bûn û ji dewleta Osmanî re pirsgirêk derdixistin, rejîma nû wekî ”li ser Kurdan zêdekiriina desthilatdari Trkan” dinirxandin û serî rakirin. Paşê her çqas di navbera Kurdên Dêrsmê û hikûmetê de lihevhatinek pêk hat jî ev zêde dom nekir. Li Kurdistana Başûr jî di sala 1908an de eşîra Hemavendan serhildan çêkir.Eşîrên Zibarî vû Barzanî jî piştgirî dan wan (Gasaratyan vd., 1991).

#### 4. Pêvajoya hilweşîna alayan û dawiya wan

Di Alayên Hemîdiyan de yek ji ’şikestin’ên ewilîn piştî bûyerên Sasonê derdikeve holê. Li gorî ku Lazarev radigihîne (1999), di salên 1905-1908an de di Alayên Hemîdiyê de hilweşîn zêde dibe û serhêldanên li himberî dewletê destpê dike. Di salên dawî yên rêveberiya Abdülhamit de him ji bo hikûmetê û hm jî ji bo Alayên Hemîdiyê encamên muhîn diqewime. Piraniya Kurdên ku di Alayên Hemîdiyê de ne, peywirên ku dewletê dida wan nedikirin û jê direviyan. Di wê

heyamê de ji 64 Alayên Hemîdiyê de ji her yekî wan, hejmara mewcûda wan daket 459 kesî. Di payîza 1907an de ev hejmar daket 373 kesî. Di rastiyê de di alayan de hejmara er û sûbayan, derdora nîvê vê hejmarê bû. Hikûmeta Osmanî ji ber ku li Yemenê ji hêla leşkerî ve qeybên mezin dida, ji bo ku serhildanên ku li wir derdiketin bide sekinandin, Alayên Hemîdiyê dişande wir, ev jî hilweşîn û belavbûna alayan lezîntir dike. Mesela Alaya Hemîdiyê ya 40emîn li Yemenê bi temamî hilweşiya. Kurdên ku di nav Alayên Hemîdiyê de bûn, êdî nedixwestin ji bo sûbayên dewleta Osmanî û ji dozek ku ne ya wan e, xwîna wan birije.

Piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyemîn, statuya Alayên Hemîdiyê zêdetir bû mijara nîqaşê. Li derdora Îttîhat û Terakkî û di çapemeniyê de li dijî Alayên Hemîdiyê hewldan destpê kirin. Li gorî ku Lazarev (1999) radigihîne, raya giştî li dijî M.Zeki Paşa ku di avakirina alayan de û di qetla Ermeniyan de rolek mezin dilîze, rastî bertekên mezîn tê. Hikûmet jî ji ber ku M.Zeki Paşa li Dêrsimê li himberê Kurda têk diçû, jê memnûn nebû. Her çiqas gazî M.Zeki Paşa kirin û dan mehkemeyê, li doza wî nenhêrîn. Hikûmeta Osmanî di Îlona 1908an de fermanek dide ku Alayên Hemîdiyê bêne bêçekkirin, him ji ber ku rêvebirên herêmî nedixwestin bi begên Kurd re bikevin şer û him jî ji ber ku daxwazek wan ê wiha tunebû, ev ferman bicî nehat. Di heman demê de ji bo Kurdên ku emrên hikûmetê bicî nedianîn, bi genelgeyek ku dişandin bajêran, ji bo ku li himberê wan bi hişyarî tevbierin, berpirsiyar dihatin temîn kirin. Di dawiya sala 1908an de di rûniştinek meclîsa Osmanî de, her çiqas li gorî daxwaza hin derûda nebe jî, qerara belavkirina Alayên Hemîdiyê nehate dayîn. Begên Kurd ên ku di Alayên Hemîdiyê de cî girtibûn, kampanyaya ku li dijî alayan hatibû vekirin, wekî ku li dijî hemû mafên wan e dinirxandin. Ji ber vê sedemê di payîza 1908an de têkiliyên di navbera Alayên Hemîdiyê û artêşê de qete nav aloziyê. Hin mensûbên eşîrên Kurda li dijî qerara ku hin Alayên Hemîdiyê tevlî artêşê bibin derketin. Sêrkêşiya hewldanên ku Alayên Hemîdiyê cardin çalak bibin serokê eşîra Heyderan Huseyîn Paşa dikişand[4] (Lazarev, 1999).

Di bihara 1909an de qismî be jî bêçekkirina Alayên Hemîdiyê destpê kir. Ji beg û axayan hate xwestin ku bicîanîna rêzika peydakirina hesp, mirov û techîzat pêk were. Hin eşîrên Kurd hatin bêçekkirin û Huseyîn Paşa û hin serokên Kurd hatin derdestkirin. Ji ber ku Îtîhat û Terakkî ji serhildanek gelemperî ya Kurda ditirsiya û ji ber ku ji îhtîmala şerek bi Rûsyayê re biqewime pêwistiya wan bi van alayan hebû, hewldanên belavkirina Alayên Hemîdiyê bêencam dima (Lazarev, 1999).





Piştî nîqaşên ji holê rakirina alayan, hikûmetê biryara ji nû de rêxistinî kirina alayan da û j bo viya du komîsyon hate ava kirin. Komîsyona yekem bi serokatiya Bînbaşi HacıHamdi Beyê Trabzonî ji bo komên li bakur ên li sînoran hate wezîfedar kirin. Komîsyona duyem jî bi serokatiya Fahrettin Altay ji bo ji nû de avakirina alayên çolê hate wezîfedar kirin. Komîsyona di serokatiya Altay de di zivistana 1911an de êşîrên li herêmên Cizîrê, Nusaybîn, Mêrdîn, Vîranşehîr, Herran û Surûcê dîsa di alayan de wezîfedar kir û vegeriya navenda artêşê ya Erzîncanê. Altay, sancak, ferman û belgeyên sûbayan dîsa li ser navê padîşah da Alayên Siwarî yên Eşîrata ku cardin hatibûn wezîfedar kirin. Ji bo viya F.Altay ji Trabzonê çû Erziromê û li herêmên wekî Hınıs, Varto, Eleşkirt, Karaköse, Tutak, Erciş, Cizre, Nusaybin, Mardin, Viranşehir gerdîşan çêdikir, di vê navberê şerê Balkanê qewimî (Altay, 1970). Her çiqas hin çavkanî bibêjin Alayên Eşîran tevlî şerê Balkanê nebû ne jî (mînak Fırat, 1983) digel bêdiliya gelê Kurd, çend alayên eşîra tevlî şer bûye (Schwerin, 1913; Altay, 1970; Bruinessen, 1978; Avcıoğlu, 1983; Yaşin, 1983; Dersimi, 1986; Kodaman, 1987)

Em dikarin viya bibêjin ku piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyem Alayên Hemîdiyê girîngiya xwe winda kirine. Bi taybetî jî ji serokên alayan Huseyîn Paşa derbeyek mezin li alaya xistiye. Piştî ku ji girtîgehê derket, tevî hin mensûbên eşîra Heyderan koçî Îranê dike. Hikûmeta Osmanî dest di ser axa Heyderiyan û difiroşe şexsan. Piştî viya wekî lêkolînerek Rûs jî dibêje, siwariyên Kurd bi xwe ji holê radibin (Lazarev, 1999).

Piştî ku Şerê Cîhanê destpê kir, hikûmeta Osmanî ji bo ku ji eşîrên Kurdan û ji Alayên Hemîdiyê bikaribe baş îstifade bike, li rê û rêbazan digere. Çimkî ji bo ku li Kafkasyayê li himberî Rûsan, li başûr jî li himberî Îngiliz û Fransayê bihêz bibe, rêyek jî piştgirî û hêza Kurdan bû. Ji ber vê sedemê jî têkiliyên Kurd û Tirkan û di salên dawî de xirav bûbû, diviya bihata xurt kirin. Di vê heyamê de propagandaya ku Ermenî bi Rûsan re hevkarî dikin û wê Kurdan qetil bikin, bi zanatî dihat belavkirin (Arfa, 1966).

Lê di pêvajoyên dawî de baş xuya bû ku berpirsiyarên Osmanî bi qismî karîn Kurdan kişandin sefên xwe. Di navbera Kurdan de hişmendiya ku dewleta Osmanî netewan berî hev dide her ku diçû belav dibû û di nav Kurdan de hişyariya netewî belav dibû. Piştî di 1915an de qetlîama Ermeniyan bû û îcar li ser Kurdan polîtîkayên tunekirinê hate meşandin, ev bû bertek ku Kurd bi dewleta Osmanî re tevbierin. Lê dîsa jî hejmara Kurdên ku bi dewleta Osmanî re tevgeriyan ne kêm bû. Li gorî ragihandina Alfa (1966) 30 alayên ku ji Kurdan pêk dihat, tevlî şer bû.

Ji alîkî din ve hin hêzên Kurd ku tevlî artêşa dewleta Osmanî bûbûn, di destpêka şer de tevlî hêzên Rûsan dibûn. Li gorî ku Lazarev (1999) dibêje, di hefteyên ewilîn ên şer de, çend serokên eşîrên Kurd û serokên Alayên Hemîdiyê û tevî 4 hezar siwariyên ku di emrê wan de ye tevlî Rûsan bûne. Li herêma Bazîdê hêzên Kurd qet şer nedikirin û teslîmî Rûsan dibûn. Pênc fermandarê Alayên Hemîdiyê, piştî hêzên Rûsan gihîştin texma Gola Wanê, daxuyanî didin ku wê alîkariya Rûsan bikin. Huseyîn Paşa ji ber ku daxuyaniyek wiha dide, tê derdestkirin û bi sûcê xayintiyê li dîwana herbê tê darizandin. Apê Abdürrezak Bedirhan, Yusuf Kami Bedirxan jî bang li leşkerên Kurd dike ku li dijî dewleta Osmanî şer bikin û tevlî hêzên Rûsan bibin. Ji bilî viya çavkaniyên ku behsa şerê di navbera Rûsan û leşkerên eşîrên Kurdan de diqewime dike jî kêm nîn in. Li gorî daxuyaniyan di sala 1915an de, li nêzî Xinûsê, li çemê Zorû, serokê eşîra Cibran, Albay Xalid Beg[5] di nav dorpêça Kazakan de dimîne û bi serkeftî ji nav vê dorpêçê xilas dibe. Ev di vê bûyerê de nîvê alayê û ji Kazakan jî du qatê viya leşker telef dibe. Xalid Beg bi destê xwe fermandarê Rûsan dikuje (Arfa, 1966; Silopi, 1969; Bruinessen, 1978; Avcıoğlu, 1983; Gasaratyan vd., 1991).

Her çiqas Alayên Hemîdiyê hate rakirin jî, hêzên ku ji mensûbên eşîrên Kurd pêk dihat, tevlî "Şerê Rizgariya Tirkan" bûn. Kazım Karabekir hêzên eşîrên Kurd him armanca ji bo dijî gelên Kafkasyayê û him jî ji bo teskîn kirina Kurdan bikar dianî (Bruinessen, 1978; Avcıoğlu, 1983; Gasaratyan vd., 1991; Beysanoğlu, 1990). Hêzên eşîrên Kurd di salên ewil ên komara Tirkiyeyê de jî hatin bikar anîn. Li gorî Mete Tuncay (1981) radigihîne di sala 1928an de di Türk Yılı de bi navê "Di Komara Tirkiyeyê de TeşkîlataMüdafaa-i Milliye" nivîsek diweşe, di vê nivîsê de wiha tê gotin "her firqeya siwariya nîzamiyê ji 3-4 alayên siwarî û yek tabûra siwarîya topçû pêk tê, her firqeya eşîrê ji 4 alayên siwarî pêk tê. Tê zanîn ku di tepisandina serhildanên Kurd ên vê paşiyê de jî mîlîsên eşîrên ku bi dewletê re hevkarî kirine hatine bikaranîn (Bulut, 1991).

### 5. Nîqaş û hin encam

Armanca vê nivîsê ji hin hêlan ve lêkolînkirina Alayên Hemîdiyê ye ku li Kurdistanê bi destê Împaratoriya Osmanî hatiye damezirandin û wekî din jî dixwaze perspektîfek dîrokî li ser paşeroj û pêşeroja pergala cerdevaniyê pêşkêş bike ku pergala cerdevaniyê di sala 1985an de ji hêla Tirkiyeyê ve li Kurdistanê hatiye avakirin.





Daneyên ku li jorê tên vehuhêztin derbarê armanc û avakirina alayan de, derbarê pêvajoyên belavbûna alayan de nîşan dide ku Alayên Hemîdiyê him ji hêla hijmendiya dîrokî ve û him jî taybetî îro ji bo pergala cerdevaniyê ku hebûna xwe didomîne dersên girîng dihewîne. Bêguman di navbera van herdu rêxistinan de hin cudatiyên heyamî heye. Lê digel van cudatiyên hanê, herdu rêxistin jî perçeyek polîtîkaya dewletê ya perçe bike û îdare bike ye ku pê desthilatdariya xwe berdewam dike.

Heger em şert û mercên damezirandina Alayên Hemîdiyê binhêrin, em dikarin bibêjin ku armanca damezirandina wan ew e ku him netewa Kurd di nav xwe de perçe bibe û bi van alayan xwîna Kurd û Ermeniyan bi hev bidin rijandin. Wekî din jî bi vê rêyê Kurd di şerê bi dewletên din re tim wek amûrek hatiye emilandin. Ev encam nîşan dide ku herger em bi cerdevaniyê re bidin ber hev û binirxînin, armanca sereke ku Kurdan berî hev bidin.

Em dikarin bibêjin ku di destpêka salên 1800î de serhildanên Kurdan bi xwînê hatin tepisandin, piştî van serhildanan li Kurdistanê valahiya otorîteyê çêbû, ji bo ji holê rakirina vê valahiyê Alayên Hemîdiyê wekî amûr hatine bikaranîn. Em dikarin wiha şirove bikin ku pergala cerdevaniyê jî, piştî ku PKKê di 1984an de dest bi şerê gerîllayê kir, ji ber îhtimala valahiya otorîteyê, wekî amûr hate emilandin.

Yek ji encamên daneyên ku li jorê bi kurtasî hate ragihandin jî ev e, di heyama 1894-1896an de qetlîamên Ermeniyan e. Ev qetlîamên hanê bi beşdarbûna hin Alayên Hemîdiyê ku ji hêla serok eşîran ve dihat îdarekirin, lê di bin kontrola leşkerên dewleta Osmanî de pêk hatine. Piraniya eşîrên ku li derveyî Alayên Hemîdiyê man, ji qetlîaman dûr man, tevlî nebûn û hinekên wan ji bo dewleta Osmanî li Kurdistanê bihêz nebe, piştgirî dan Ermeniyan. Wekî li Dêrsimê, li hin deverên Kurdistanê Kurd û Ermenî li dijî dewleta Osmanî şer kirin. Mesela li herêma Dêrsimê Kurda 5 hezar Ermeniya ji bo ku nekevin destê Osmaniyan, parastin (Lazarev, 1999; Ahmad, 1986). Pergala cerdevaniyê û Alayên Hemîdiyê her çiqas ji hêla dîrokî ve ji hev cihê be jî, ji gelek aliyan ve dişibin hev.

Di heyama ku Alayên Hemîdiyê xurt dibû de, netewperweriya Kurdan jî xebatên girîng dikir û ketibû merhaleyeke baş. Di vê de rola malbata Bedirxaniyan gelek mezin e. Hin mensûbên vê malbatê, di nava salên 1890î de tevlî xebatên li dijî hikûmetê bûn. Hin ferdên Bedirxaniyan di îlona 1898an de bi îdîaya ku amadehiya serhildaneek giştî dikin, hatin derdestkirin û wan şandin

sirgûnê. Di wê demê de rojnameya Kurdistanê ku li Qahîreyê derdiket, cî dida propagandayên li dijî Abdulhamît. Rewşenbîrên Kurd mecbûr dibûn û direviyan derveyî welêt. Rewşenbîrên Kurd bi Ermenî û Tirkên Jon re têkiliyên xwe xurt kirin. Serkêşiya van hewldanan jî Abdurrhman Bedixhan dikişand û di Kongreya 1emîn a Jon Tirkan de jî wekî delegeyê Kurd beşdar bûye (Celîl, 1985; Malmîsanij, 1986; Gasaratyan vd., 1991; Kutlay, 1990; Bozarslan, 1991a, 1991b).

Der barê Alayên Hemîdiyê de encameke girîng jî ew e ku piştî ku pêwistiya dewletê bi wan nedima yan jî ku birêveberî diguherî helwesta ku li himberî wan nîşan dida ye. Fermandarên ku di dema xwe de dihatin pesinandin an jî ji hêla aborî ve dihatin xurtkirin, eger em li dawiya jiyana wan- mînak Îbrahîm Paşayê Milî (Milli İbrahim Paşa), Kor Hueyîn (Hüseyin Paşa) Xalid Begê Cibrî (Cıbranlı Halit Paşa) binihêrin, em ê bibînin ku ev îmtîyazên hanê berdewam nakin piştî ku pêwistî bi wan namîne. Ji ber vê sedemê jî Alayên Hemîdiyê ji bo îro û siberoja Pergala Cerdevaniyê derseke girîng e. Heta niha helwesta dewletê ya li dijî kesên ku çek danîne û an jî dixwazin deynin li ser vê mijarê tije mînak in.





**Têbînî**

[1]Di xala yekemîn a orjînala "Hatt'ı Hümayun"ê ji bo sedemên Alayên Hamidiyê wiha tê gotin: "Memleketin, teaddiyât ve tecavüzat-ı ecânibten muhafazası zımnında tertibi muktezi olan heyet-i askeriyenin terkibi ol memleket ahâlisinin nüfus-i umumiyesine ait mükellefiyet cümlesinden olup, bu mükellefiyetten ahâliden bir kısmının istisnâsı kuvve-i umumiyenin noksanını icap edeceği derkâr bulunduğuna ve bu kaide-i meşrianın Memâlik-i Mahruse-i Şâhâne'de bihakkın mer'i tutulmasıyla Kuvve-i Umumiye-i Osmaniyenin tezyid ve teksir olunması maksad-ı meşriasına binâen hususiyet-i halleri hasebiyle şimdiye kadar tamamiyle intizâm-ı askeri altında olarak hizmet-i askeriyede bulunamayan ve cudilik ile meşhur ve me'luf oldukları halde haymenişin olan efrâd-aşâirden müceddeten 'Asakir-i Hamidiye' namı celiliyle Süvâri Aşâir Alayları teşkili muktezâyı irâde-i seniyye-i hilâfet-penâhidir" (Kodaman, 1987, r. 34).

[2]Ji Fermandarên navdar yê wê demê yê Alayên Hemîdiyê Îbrahîm Paşayê Milî, piştî îlankirina meşrûtiyeta duyemîn bi rejîmeke nû re rû bi rû ma û herêmekê ku îro li Sûriyê ye xiste bin destê xwe. Bi egera ku yekîneyên şer yên Osmaniyan û Eşîra Ereban Şemmer hicûmê wî kirin ew jî mecbûr ma vekişiya çiyayê Şingalê yê ku îro di nav sînorê Kurdistana başûr de ye û li wir hat kuştin. Çavkaniyên ku dibêjin Îbrahîm Paşa hatiye darvekirin jî hene. Ji bo agahiyên berfireh mirov dikare li Aytar (1992) û Kiran (2003) binêre.

[3]Ji Fermandarên navdar yê wê demê yê Alayên Hemîdiyê der barê Misto Paşayê Mîran de heke hûn dixwazin agahiyên berfireh bixwînin hûn dikarin li Yaşın (1983) û Aytar (1992) binêrin.

[4]Ji Fermandarên navdar yê wê demê yê Alayên Hemîdiyê Kor Husên Paşa, piştî îlankirina meşrûtiyeta duyemîn kete girtîgehan û mecbûrê sirgûnê bû û herî dawî piştî serhildana kurdan ya piştî 1925an ji Aydinê reviya Sûriyê û bi Xoybûna ku Serhildana Agiriyê da destpêkirin re kete têkiliyê. Piştre ji bo ku beşdarî serhildana Agiriyê bibe derkete rê û ji hêla Medeniyê kurê Hacî Mûsa Beg ve bi hevkariya desthilatdariya wê çaxê ya Tirkiyê ve di sala 1929an de hat kuştin. Ji bo agahiyên berfireh yên dema Kor Husên Paşa mirov dikare li Aytar (1992) û Suphandag (2006) binêre.

[5]Xalid Begê Cibirî ji Mektebên Eşîra mezûn bûbû û wê demê yek ji fermandarê Alayên Hemîdiyê bû. Bûrayê Şêx Seîd bû ku serokê sserhildana Kurd a 1925an bû. Xalid Beg jî yekem serokê Cemiyeta Azadî bû ku vê serhildanê organîze dikir. Di 1924an de li Erzirômê hate derdest kirin û di 1925an de tevî Yûsûf Ziya Beg û hin Kurdên din hatin îdam kirin. Ji bo çavkaniyên derbarê Xalid Begê Cibirî û Serhildana Kurd a 1925an binhêrin, mînak Hasretyan, Ahmad ve Ciwan (1985), Arda (1988a, 1988b).

**Çavkanî**

Abdülhamit, S. (1984). *Siyasî Hatıratım*. İstanbul: Dergah Yayınları.

Ahmed, K. M. (1986). *Birinci Dünya Savaşı Yıllarında Kürdistan ve Ermeni Soykırımı*. Stockholm: Kürdistan Yayınevi.

Akpınar, A. (1997). *Osmanlı Devletinde Aşiret Mek*tebi. İstanbul: Göçebe Yayınları.

Altay, F. (1970). *10 Yıl Savaşı ve Sonrası (1912-1922). Görüp Geçirdiklerim*. İstanbul: İnsel Yayınevi.

Arda, B. (1988a). Şeyh Sait ayaklanması 'dinsel irtica' mı?, *Toplumsal Kurtuluş*, sayı:8, 50-54.

Arda, B. (1988b). Şeyh Sait Ayaklanması'nın Ulusal ve Sosyal Karakteri. *Medya Güneşi*, sayı: 4, 13-26.

Arfa, H. (1966). *The Kurds*. Oxford: Oxford University Press.

Avcıoğlu, D. (1983). *Milli Kurtuluş Tarihi*. Cilt 3. İstanbul: Tekin Yayınları.

Avyarov (1995). *Osmanlı-Rus ve İran Savaşlarında Kürtler. 1801-1900*. Ankara: Sipan.

Aydemir, Ş. S. (1972). *Makedonya'dan Ortaasya'ya Enver Paşa*. Cilt 1, 1860-1908. İstanbul: Remzi Kitabevi.

Aytar, O. (1992). *Hamidiye Alarından Köy Koruculuğuna*. İstambul: Medya Güneşi Yayınları.

Beysanoğlu, Ş. (1956). *Ziya Gökalp'ın İlk Yazı Hayatı (1894-1909)*. İstanbul: D. Bakır Tanıtma Derneği.

Beysanoğlu, Ş. (1990). *Anıtları ve Kitâbeleri ile Diyarbakır Tarihi. Cilt 2*. Diyarbakır: Diyarbakır Belediyesi.

Bozarslan, M. E. (1991a). *Kürdistan*. Cilt I. Uppsala: Deng Yayınları.

Bozarslan, M. E. (1991b). *Kürdistan*. Cilt II. Uppsala: Deng Yayınları.

Bruinessen, M. M. van (1978). *Agha, Shaikh and State: on the social and political organization of Kurdistan*. Utrecht: Utrecht University, Ph.D. thesis.

Bulut, F. (1991). *Devlet Gözüyle Türkiye'de Kürt İsyanları*. İstanbul: Yön Yayınları.

Celîl, C. (1985). *Jiyana Rewşenbiri û Siyasi Ya Kurdan*. Uppsala: Weşanên Jîna Nû.

Dersimi, M. N. (1986). *Hatıratım*. Stockholm: Roja Nû Yayınları.

Erdost, M. İ. (1987). *Şemdinli Röportajı*. İstanbul: Onur Yayınları.

Fırat, M. Ş. (1983). *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*. Ankara: Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü (TKAE).

Gasaratyan, M. A., C. Celîl, C., Jegalina, O. İ., Lazarev, M. S., Mgoyan, Ş. H. (1991). *Yeni ve Yakın Çağda Kürt Hareketi*. Balinge/ Sweden: Jîna Nû Yayınları.

Ghassemlou, A. R. (1965). *Kurdistan and The Kurds*. Prague: Publishing House of The Czechoslovak Academy of Sciences.

Hasretyan, M. A., Ahmad, K. M., & Ciwan, M. (1985). *1925 Kürt Ayaklanması (Şeyh Sait Hareketi)*. Uppsala: Jîna Nû Yayınları.





Jîna Nû. (1986). *Roja Nû (1943-1946)*. Uppsala: Weşanên Jîna Nû.

Kars, H. Z. (1984). *Belgelerle 1908 Devrimi Öncesinde Anadolu*. İstanbul: Kaynak Yayınları.

Kıran, E. (2003). *Kürt Mılan Aşiret Konfederasyonu. Ekolojik, Toplumsal ve Siyasal İnceleme*. İstanbul: Eşma Yayınları.

Kodaman, B. (1987). *Sultan II. Abdulhamid Devri Doğu Anadolu Politikası*. Ankara: Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü (TKAE).

Kutlay, N. (1990). *İttihat-Terakki ve Kürtler*. Stockholm: Vejîn Yayınları.

Larsson, E. J. (1897). *Förföljelserna och Blodbaden i Armenien*. Helsingborg: Missionsbokhandel.

Lazarev, M. S. (1999). *Pirsa Kurdan (1891-1917)*. Bromma/ Sweden: Weşanên Roja Nû.

Malmîsanij (1986). *Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*. Uppsala: Jîna Nû Yayınları.

Malmîsanij & Lewendi, M. (1989). *Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981)*. Uppsala: Jîna Nû Yayınları.

Olson, R. (1989). *The emergence of Kurdish Nationalism and the Sheikh Said rebellion. 1880-1925*. Austin, Texas: University of Texas Press.

Öztuna, Y. (1983). *Büyük Türkiye Tarihi*. Cilt 7. İstanbul: Ötüken Yayınları.

Paşa, S. S. (1977). *Anılar*. İstanbul: Hürriyet Yayınları.

Petrosyan, Y. A. (1974). *Sovyet Gözüyle Jöntürkler*. Ankara: Bilgi Yayınları.

Polit, D. F., & Beck, C. T. (2010). *Essentials of nursing research. Appraising evidence for nursing practice*. Philadelphia: Lippincott Williams & Wilkins.

Sasuni, G. (1986). *Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni-Kürt İlişkileri (15. yy'dan Günümüze)*. Stockholm: Orfeus Yayınları.

Schwerin, P. von (1913). *I Falt med Turkarne, Minnen fran Balkan-kriget*. Stockholm: Hugo Gebers Förlag.

Süphandağ, K. (2006). *Büyük Osman Entrikası Hamidiye Alayları. Araştırma – İnceleme*. İstanbul: Komal Yayınları.

Tuncay, M. (1981). *Türkiye Cumhuriyeti'nde Tek-Parti Yöneti-minin Kurulması (1923-1931)*. Ankara: Yurt Yayınları.

Yaşın, A. (1983). *Bütün Yönleriyle Cizre*. Yücel Matbaası

Yerasimos, S. (1980). *Azgelişmişlik Sürecinde Türkiye (Bizanstan 1971'e)*. İstanbul: Gözlem Yayınları.

Zeki, M.E. (1977). *Kürdistan Tarihi*. İstanbul: Komal Yayınları.

## III. JI BELGEYÊN MECLÎSÊ Û ÇAPEMENIYÊ DAMEZRANDIN Û DOMANDINA PERGALA CERDEVANIYÊ / Nesrin UÇARLAR

### 1. Di Parlamena Mezin a Tirkiyeyê de nîqaşên li ser cerdevaniyê: Kewçêr 1984-Sibat 2011

Di vê beşê de zabitnameyên ku ji dema sazandina cerdevaniyê yên ku yekemîn car li TBMMê (Türkiye Büyük Millet Meclisi- Parlamena Mezin a Tirkiyeyê) ketiye rojevê hatine girtin. Li dema me ya nêzîk ku cara dawîyê bûye rojev çav bi wan zabitnameyan hatine xistin û hin beşên zabitnameyên ku têkildarî mijarê ne ku li gor çarçoweya giştî ya xebatê guncav hatibe dîtin cih jê re hatine veqetandin. Ev beşa ku cergeke nêzî bîst û pênc salan dihundurîne, serdema destpêkê ya pergala cerdevaniyê (1984-1988), bi çarçoweya pêşniyar û itirazên ku hatine rojevê; serdema duyemîn a berfirehkirina wê (1988-1991), arişeyên ku pergala cerdevaniyê derxistine holê û bi pêywendiya pêşniyarên “çareseriyê”; serdema sêyemîn ku êdî pergala cerdevaniyê dêmanî ye (1991-1996), digel hikûmetên ku nuh hatine damezrandin bi bingeha rêbaz û nêzîkatiyên nehatine guhertin lê hûr dibe. Li ser serdema çaremîn (1996 - 2002) ji hêla sekinandina li ser têgiha “islah”ê û nîqaşên li ser tedbirên ku piştî pergala cerdevaniyê vediguhere arişeyeke xeternak têne girtin ve, serdema pêncemîn (2002 - 2009) ku “islah” weke “wefadariya bo ehdê an sozdarî” tê şîrovekirin, serdema şeşemîn ya k udi pergala cerdevaniyê de qonaxa dawî ye bi kirûyên wekî “Komkujiya Gundê Zanqirtê” û “Tîma Xençerê” û bi çarçoweya nîqaşên li ser van kirûyan tê sekinandin. Di beşa nirxandinê de jî, li ser helwestên partiyên siyasî yên van serdeman têne sekinandin, her weha li ser nêzîkatiyên demokrasî û pirsgirêka kurdî ku berdewamiya wan helwestan e, nîqaş têne kirin.

**a. Piştî şêst salan ji nû ve cerdevanî:**
**Despêkirina pergalê, pêşniyar û îtiraz (1984-1988)**

> *"Heke hin kes û eşîr di dawiya vê pergalê de xwe bi çek bikin, di demên pêş de dê mirovên me hev û du qir bikin bi birînên civakî dê rewşa aramî ewlekariyê bi temamî ji holê rabe û di vê herêmê de dê rejîmên zordar tim hebin."*
> Fuat Atalay, Parlamanterê SHPê

Di 17ê cotmehê sala 1984an de serokwezîr Turgut Özal'î di axaftina xwe ya li meclîsê de di derheqê operasyonên leşkerî yên li herêmê ku ji ber êrîşên PKKê yên yekemîn ku li Sêrt û Colemêrgê de pêk hatibûn, de agahî dabûn û wî got ku wan li ser damezrandina cerdevaniya gundan û çekdayina wan fikirîne. Li ser vê yekê di danişîna 12ê adara sala 1985an de, li xala 74emîn a "Zagona Gund" (paragrafa yekemîn) fiqreyek (paragrafa duyemîn) hate zêdekirin û bi vê yekê re li ser destpêkirina pergala cerdevaniyê nîqaş hatiye kirin:

> Ku li gund eşqiya an jî talanker peyda bibin muxtarê gund û heyeta rûspiyan ji bo ku gundîyan ji talanê biparêzin ji kesên ku bikaribin çek bikarbînin qasî hejmara kupêwîst bin wan weke cerdevanê dilsoz hildibijêrin, navên wan li kaxezeke dinivisînin û didine qeymeqam. Heke destûra qeymeqam hebe ev cerdevanên dilsoz bi cerdevanên esil re gund û gundîyan ji talanker û eşqiyayan diparêzin.
> Li bajarên ku dê ji aliyê Lijneya Wezîran ve bê tespîtkirin; ku li gund an li derdora gund nîşaneyên tevgerên tundûtujîyê û sedemên ku pêwistiya Îlankirina Rewşa Awarte derdixîne holê peyda bibe û her ji çi be bila bibe bûyerên ku dê bibin sedema tecawîza can û malê gundiyan zêde bibin, bi pêşniyara Parêzgar û bi erêkirina Wezareta Karên Navxweyî bi qasî hejmara ku pêwîstî pê bê dîtin "Cerdevanên Demdemî yên Gundan" dikarin bêne peywirdarkirin. Meaşê ku bi dema peywira cerdevanên demdemî yên ku bi vî rêbazî têne peywirdarkirin û mêjera tezmînata ku di dawiya peywirê de bê dayin, li ser pêşniyara Wezareta Karên Navxweyîji aliye Lijneya Wezîran ve têne tespitkirin û ev buha ji aliye Wezareta Karên Navxweyî ve bi pêdaniya ku neqilkirina bo Wezareta Karên Navxweyî yaji yekeya veguhestina xerçkirinê ya budçeya Wezareta Darayî û Gumrikê ve tê dabînkirin. Hemû tezmînat û destmizên ku wê li cerdevanan bê dayîn ji her cûre bac û rismê bexşandî ye.

Di dema hevdîtinan de M. Seyfi Oktayê ku li ser navê Partiya Gelparêz/Halkçı Parti (HP)[1] axifî û ji bo vê fiqreyêgot:"Ev dixwaze ji bo gundiyên Tirk sazûmaneke nû ya rewşa awarte bi hiqûqa me ve monte bike" û weha dirêje pê da:





> "...dewleta me xwediya rêxistinên ewlekarî yên bingehîn e... Digel ku dema pêwistî pê hebe bi dewletê re rayeya bikaranîna van rêxistinan hebe, em bi pêdivî bi avakirina sazûmaneke weke cerdevaniya demdemî ku bi rayeyên awarte hatibe dirûstkirin, nabînin".

Endamekî din ê Partiya Gelparêz Ömer Kuşhan jî gotiye ku wan ev pêdivî qebul kiriye lê li ser wê fikarên wan çêbûne û weha gotiye:

> "Gelo mafên van kesan ên ewlehî yên civakî dê çi bin ku ev kes bi niyetên nebaş bêne tayinkirin... li gor ku di deste me de rêvebirnameyek jî tune ye venerîna van kesan dê çawa pêk bê?"

Parlamenterekî din ê Partiya Gelparêz ê ku balê kişand ser vê nelirêtiyêCüneyt Canver e:

> "Ku mirov li ser bûyerên Mereşê bifikire, ferz bikin ku, ew rêvebir ji bo ku qismek ji gel bikuje çekan li qismekî din ê gel belav dik...Ji bo pêşîlêgirtina liv an bikaranînên xêrnexwaz ka tedbîrên çawatêne pêşniyarkirin?"

Parlamenterê Partiya Demokrasiya Neteweperwer/Milliyetçi Demokrasi Partisi Mustafa Çorapçıoğlu di hevdîtinên ku di 26ê adara 1985an de didomî mafê axaftinê xwest û bi bîr anî ku; Komîyona Plan û Budçeyê, fiqreya "Bi babetên wekî ku her dem ne guncav e ku ji nav şêniyên wê deverê kesên xwediyê taybetmendiyên cerdevaniyên gundan bin peyda bibin û ya herî girîng jî ji ber sedemên dozên xwîne, arişeyên mezrika û sedemên her wekî din dibe ku ew karên xwe bi niyetên xêrnexwazî bikarbînin" dixwest lê zêdekirin nepejirandiye. Hikûmetê, beyî ku rexneyên li ser pergala cerdevaniyê hatine girtin li xwe bigire, bi pejirandina awayekî sergirtî ya netêrbûna hêzên asayişe di heman danişînê de kir ku ev hevok li xala 74. bê zêdekirin pergalê xistiye meriyetê:

> "Di dema peywirê de birîndarbûn, seqetbûna an jî mirinaCerdevanên Gundan Cerdevanên Demdemî yên Gundan de hukmên Zagona Tezmînata Neqdî û Girêdana Meaşê Mehaneya bi jimara 2330î tê tetbîqkirin..."

Di îtırazên ewil ên li ser pergala Cerdevaniyê de li ser bûyerên Mereşê dihate sekinandin û dihate gotin ku dewlet li hemberî qismekî gel çekan li qismekî din ê gel belav bike û ev gava ku rayeyên awarte li van kesên çekdar

bên dayîn ev rewşa ku ji bo xêrnexwaziyê ye guncav e dibe ku arişe ji ber wê peyda bibin. Çawa ku şeş meh ji ser pêkanîna pergala cerdevaniyê derbas bû mînakên bi vî rengî ên sûîîstimaliyê ketine rojevê.Parlementerê SHPê M. Seyfi Okay di 2êîlona 1986an de,li ser hevdîtinên di derheqê tevgera leşkerî ya ku Hêzên Çekdar ên Tirk di meha tebaxê de di nava axa Iraqê de pêkanîbû de, di mafê xwe yê axaftinê de behsa lêkolînên ku partiya wî li herêmê çêkiribû dikir û digot, " gel ji aliyekî di bin zextê eşqiyayan de ji aliye din jî li hemberî tevgerên peywirdarên dewletê ên vederker ketiye nava pençikê" û lê zede dikir digot cerdevanên gundan jî li herêmê bûne sedema bêaramiyê:

> "Cerdevanên ku xwe danîne pêşiya hêza dewletê, vê hezê di nakokiyên xwe yên taybet ku di navbera eşîrên wan û bi eşîrên din re peyda bûne, bikartînin. Bi ser de jî partîzanî jî bûye çavkaniyeke bêaramiyê."

Di danîşîna 4êîlona 198an de, ji bo parastina pergala cerdevaniyê Wezîrê Karên Navxweyî Yıldırım Akbulut mafê axaftinê xwest û got wan li 13 bajaran ev sistem sazkiriye û heta niha bi giştî 7993 heb cerdevanên gundan tespit kirine û wan 3679 heb çekên lûledirêj li van cerdevananbelav kirine. Akbulut weha lê zede kir: "Li gundên ku cerdevanên demdemî li wan hatine peywirdarkirin, çalakiyên êrîşbar ên terorîstên cûdaxwaz û çalakiyên propogandayî nispetek bir girîng kêm bûne."

Wezîrê Parastina Neteweyî Zeki Yavuztürk di danişîna 4ê Adara 1987an mafê axaftinê xwest û bûyerên ku di 22ê sibata 1987an de qewimîbûn ji bo tevgera dersînor a ku ji nû ve dest pê kiri weke hincet nişan dabû:

> "... hûn pê dizanin, komeke cûdaxwaz a eşqiyayan ku ji 25-30 kesan pêk dihatin û cilûbergên leşkerî li ser wan bû, hatine bajarê Colemêrgê, navçeya Qilabanê gundê Nîrweyê, li wir xwestine ku cerdevanên gund li hev kom bin. Gava ku ev xwesta wan pêk nehatiye ew bi çeken otomatik û bombeyan êrîş birine li ser xaniyên cerdevanan bi vê êrişê jî ji şêniyên gun, gellek ji wan zarok û jin 14 kesan kuştine 9 kesan jî birîndar kirine."

Piştî ku di demên nêz de bûyerên bi vî rengî qewimîbûn, di danişîna 11ê adara 1987an de parlementerê DYPê Murat Sökmenoğlu mafê axaftinê xwest û got: "Belavkirina çekan bo cerdevanan çareserî nayîne. Beravajî wê ev yeke kiriye ku"cinayet" zede bibin."; Parlementerê SHPê Erdal İnönü jî got ku: "Di rêveberiya awarte ya ku ev şeş salin didome de û bi êrîşên berdewam ên digel ku sê heb





tevgerên leşkeri yên dersînor li dar ketine jî, cerdevanên gundan nikarine di şerê gerillayî de xwe biparêzin. Her weha hinek cerdevan di nakokiyên taybêt ên navbera eşîran di meşandina dozên xwînî de cihekî neyînî girtine."Înonu di danişîna 28êkanûna 1987an de mafê axaftinê xwest û vê carê jî got ku: "Biçekkirina ya bi zagona Rahiştina Çekên Bidestûrname ya ku di Herêma Rewşa Awarte[2] de pêk tê, teşebuseke bixetereyek e ku em nizanin bê dê çi derkeve pêşiya me, cerdevaniya gund ji dilsoziyê derketiye û kesên ku naxwazin bibin cerdevan rastî zexta dewletê tên û li ser wan kesan koçberî tê ferzkirin.

Parlementerê SHPê Fuat Atalay jî di axaftina xwe ya danişîna 14yê çileya 1988an de bale dikişine ser pergala "cerdevaniyê bizorê" û behsa çavdêriyên xwe yên li herêma xwe ya hilbijartinê weha kiriye:

> "... Ez hîn bûm ku li gundan hin kesên ji hêzên ewlekariyê bi kêfa sere xwe lêgerînan pêk tînin mafên mirovan bin pê dikin, derbavê vê mijarê de min ji welatiyan îfadeyên niviskî wergirtin. Daxiyaniyên bi vî rengî yên peywirdarên tekildir roj bi roj berfirehtir dibe ku ku gundî cerdevaniyê qebul nekin dê kiryarên bi vî rengî berdewam bin... Piştî zordariya cerdevanbûnê niha jî bi işkenceyeke fiiî ji hemwelatiyan tê xwestin ku ew bibin sîxur....Tiştê dawî jî... Ez dixwazim bibêjim ku gava kesên li herêma rewşa awarte serî ji bo destûrnameya çekan didin û beyî ku li jêderka wan bê nihêrtin dike ku xetereyên girîng derxîne hole...Bi xêra vê pêkanînê bazirganên çekan û qaçaxçî bihêz bûne û cihê xwe girîngtir kirine....Heke hin kes û eşîr di dawiya vê pergalê de xwe bi çek bikin, di demên pêş de dê mirovên me hev û du qir bikin bi birînên civakî dê rewşa aramî ewlekariyê bi temamî ji holê rabe û di vê herêmê de dê rejîmên zordar tim hebin."

### b. Berfirehkirina pergala cerdevaniyê:
### Arîşe û pêşniyarên "çareseriyê" (1988-1991)

> *"Beramberî kirûya ku welatiyên me ji bo serîlêdana peywirgirtina Cerdevaniya Demdemî dikevine dorê, ew angaşta ku dibêjin hin kes bi zorê dibine Cerdevan him li dijî mantiq ê û him jî li dijî rastiyê ye."*
>
> Abdülkadir Aksu, Wezîrê Karên Navxweyî

Çawa ku tê dîtin jî hemû piştî ku pergala cerdevaniyê tê destpêkirin bi du sal şûn de, bi berdewamiya 30 salên cerdevaniyê hemû pirsgirêkên ku derketine

holê di danişînên meclîsê de hatine tomarkirin. Ev yek hatiye tespitkirin ku; gava ku li taybetmendiyênkesên ku dibine cerdevan neye kontrolkirin û çek li wan kesan bê belavkirin ji aliye şerê gerillayê bê fêde ye, ji bo civaka ku tê de dijîn xetere ye û him ji hela dewletê him jî rêxistinê hatiye dîtin ku zext û zordariya li hember wan kesên ku li gundên xwe bûne cerdevan pirrtir bûne. Cerdevan li ser gelê herêmê dibine alavake zext û zordariyê bi ser de jî ji aliye dewletê ve li hember gel tene bikaranîn.

Parlementerê SHPê Hasan Fehmi Güneş di danişîna 9êadara 1988an de mafê axaftinê xwest û behs kir ku arişeyên ku ji pergala cerdevaniyê derdikevin ji ber ku hikûmet pirsigirêkê xelet tarif dike, derdikeve holê:

> "Niha gava ku dibêjin "eşqiyatî", helbet pergala pêşîlêgirtina eşqiyatiyê tê berçavê me. Di destpêka avakirinê ya komarê de zagonek bi navê "Men'i Şekavet" heye; li wir cerdevanên gundan hene. Helbet wê deme hêza dewletê ew çend ne gellek e derfetên wê ewqas tune ye ku her gundî biparêze... Heke bibejin em ê vê pirsgirêka îro bi çarçoweya Zagona "Men'i Şekavet"ê çareser bikin, mixabin ev xelet e. Îro hejmara cerdevanên gundan li gorî hejmarên fermî li dora 12 hezarî ye... Hejmara rêxistina ku hemberî wê têdikoşe çi qas e? Li gor hejmarên fermî ku vê taliyê hatiye eşkerekirin di binê vê hejmarê de ye... Cerdevanî ji ber taybetmendiyên îdeolojîk û siyasî yên wê herêmê ji bo ewlekariyê tu fêde nade... Dev ji çareserkirinê berde cerdevaniyê ji aliye ewlekariyê çareserî neaniye bi ser de bûye çavkaniya pirsgirêkan. Çima? Hûn pê zanin awayeke feodali ya wê derê heye; pergala eşîrtîyê dengeyên eşîrtiyê hene... Heke hûn rabin çekan bidin aliyekî û wê dengeyê xera bikin hûn ê rastî pirsgirêkên din werin; weha pêk hatiye bûye, divê weha nebe.... Ev jî dikare bê gotin: 'Ezbenî saziya cerdevaniya ya wê herêmê di heman deme de meseleya istihdamê ye... Ku bi rastî jî armanca me ev be armanca me pêşxistina aboriyê be em vê bi rastî bi rêbazên aboriyê pêk bînin; wisa ne bi çek an bi gulleyan, an bi mekanizameyên xelet weke dana rayeyê ya bo bikaranîna çekan. Çi dikare bê kirin? Li wir bi vî pereyi veberhênan karine bêne kirin. Kargeh dikarin vebin. Qadên kar dikarin çêbibin. Divê ev bêne kirin, pêdivî bi van tiştan hene... Peywira cerdevan divê ji aliye hêza dewletê ve bê meşandin; nikare hêzeka din a gelê Tirk bi wekaletî berpirsiyariya ku divê dewlet bike bixe ser milê xwe, divê weha nebe."

Aliyekî din a pirsgirêka kurd ew e ku xwe bi awayê şerê çekdarî nişan daye ku hikûmet vê weke pirsgirêka eşqiyatiyê bi nav kiriye û weke dermanê vê pirsgirêkê jî saziyeke weke cerdevaniyê daniye ev jî ji aliye hikûmetê ve





helwesteke lihevkirî ye. Heke em bifikirin ku pergala cerdevaniyê ya salên 1980an îro jî berdewan dike, ku tu ji bo pirsgirêkê salên 2010an çaresetiyên 1920an pêşniyar bikî an jî 60 an 90 sal aliyê wê yê siyasî li hêlekê ku ji aliyê civakî û aborî ya pêşneketina herêmê qebûl bikî an partiyên li parlementoyê û dewlet bi çavekî klientalîst ji pergala eşirtiyê istifade bike û wê di têkoşîna çekdarî jî bikarbîne ev siyaseteke bi zanebûn hatiye pejirandin ku tu cudahiyên di civata kurdan de heye dixwazî hê berfirehtir û kurtir bikî. Hejmara endamên rêxistinê ji hejmara cerdevanan kêmtir e û pereyên ku ji bo cerdevanan tene veqetandin nêzî qasî vebêrhenanên aboriyê ye, yanî nebûna taybtmendiyeke rasyonel ya pergala cerdevaniyê jî her du ihtimalan tîne bîra me.Li hêleke din jî, rasyonelbûna pergala cerdevaniyê ya ji aliyê dewletê ve ew e ku, dewlet raye û berpirsiyariya bikaranîna şiddetê ku di vê rayeyê de tekedestî ye ji berdêla ku hêza xwe ya leşkeri bikarbîne û ew biperitîne dike ku ew raye û berpirsiyariyê bi ew kesên ji heman civak û demografiye ne ku li hemberî wan şer dikin ve par ve dike.Digel ku hêz û awaya leşkerî ya dewletê ku ji aliyê teknikî ve bihêztir e li hemberî rêbazên gerillayî yên rêxistinê û desthilatdariya wê ya li herêmê qels maye, rê li pêşiya pergala cerdevaniyê vekiriye.

Parlementerê DYPê Zeki Çeliker di axaftina xwe ya li ser guherîna xercan kudi 24ê adara 1988an de:

> "... demeke berê li rojhilat û başûrê rojhilat li herêma rewşa awarte ji aliyê dewletê ve hemwelatiyên ku nebûne "cerdevan" ji bo biçekkirina wan ji bo her welatî derfeta rahiştin û li cem xwe hiştina 1 an jî ku karibe peyde bike 2 çekan hatiye dayîn"

aniye bîra me. Her weha ji bo meşaên 90 hezar lîrayî ya cerdevanan jî:

> "...Kesên ku li ber xwe didin an xwe diparêzin û diçin erdê xwe an zêrên jinên xwe difroşin û bi zorê ji xwe re çekekê peyde dikin û namus û şerefa dewletê diparêzin xwe ji bo vî karî weke welatiyekî dildar wezîfedar dibînin, nabe ku em wî bixine kemîneke em rabin wî bixin bin barê bacê."

gotiye û bi ser de jî tu aliekî vê ya adilane jî ne dîtiye û rica kiriye ku ji xercên ku ji bo destûrnameyan têne standin hinekî din dikarine bêne sivikirin. Xema Çeliker ya ku newekheviya aborî ya di navbera cerdevanên fermî û yên kesên çekan "bi derfetên xwe" peyde dikin ne gihiştiye rastiya ku dewleta ku destûr

dide hemwelatî bi derfetên xwe çekên xwe peyde bike û dewlet jê bedêla xercê teshîl dike – ihtimala herî baş - çavên xwe ji bazirganiya çekan re girtiye. Çawa ku parlementerê SHPê Mehmet Adnan Ekmen di axafitna xwe ya danişîna 13ê nîsana 1988an de, gotiye ku arişeyên pergala cerdevaniyê gihiştiye asteke gellek mezin û dewlet bi sûcdarên qaçax re hevkariyê kiriye, û weha domandiye:

> "Kesên ku 10 salan an 20 salan hukmê cezayê li wan hatiye birin, li milên wan çek bi meqamên dewletê ve têkilî datînin û bi firokeyên dewletê beşdarî operasyonan dibin."

Li ser van angaştan jî parlementerê ANAPê Mehmet Kahraman jî mafê axaftinê xwestiye û weha gotiye: "Ev îfadeyeke bedbext û neheq e ku li dijî vê pergala ku hikûmeta me li ba welatiyên xwe bi aqilane daniye... kesên ku canê xwe û welatê xwe ji bo ku biparêzin canê xwe didin nabe ku mirov ji bo van kesan sileheke zêde bibinin. Mantiqa vê nayê fêmkirin"dîsa gotiye ku: "Sûcên ku bi çeken cerdevanên hatine kirin negihiştine merheleyeke ku mirov pê bawerî bîne. Bi vî awayî tê dîtin ku qedîmbûyîna helwesta "Heke mijar welat be tiştên mayî hurgulî ne" hatiye dîtin.

Bi rastî jî parlementerê ANAP Hasan Çakır jî di axaftina xwe ya ku di13êhezîrana 1989an dedigot ku pergala cerdevaniya gundan ne ya rewşa awarte ye û di damezrandina komarê de jî hebû hetta li Împaratoriya Osmanî jî ev pergal hebûye. Hasan Çakır vê bi vê parastinê qayil nebûye û bale kişandiye ser gotinên kesên ku pergalê rexne dikin û terorîstan çiqasî dişibin hev:

> Li herêmên me yên ku lê Rewşa Awarte tê sepandin, bi qasî hejmara ku wê têr be cerdevan li wir hatine peywirdarkin û dewletê çek dane destê wan: û bi vê pergalê jî bi ser ketiye. Ew qas bi ser ketiye ku di belgeyên ku bi destê van xayinan têne belavkirin de ev mijar tim û daîm tê istismarkirin û li ser vê mijarê bi gazinc in... Hetta ji bo ku behsa girîngiya vê bikim dixwazim çend mînakan pêşkêşî we bikim ku parlementerên herêmê ji bo hilbijartinên deverî li ser cerdevaniya gund weha axifîne: Ji axaftineke parlementerekî ku di 22ê adara 1989an de li navçeya Nisêbînê hatiye axaftin: "Çek li me belav kirin, dibêjin ha ji we re hev û du bikujim. Saziyeke bi navê cerdevaniyê anîn, ev sazî dixwaze me bi destê xwe bide qirkirin; ev sazî ku ji bo cerdevanan, ji bo mirovên me, mirovên me yên ku birçî hatine hiştin, xefika aborî danîn ber wan mirovên me" ...Ji axaftineke din: "Ez bangî cerdevanan dikim: Ev çek ji bo ku hûn hev û du bikujin di destên we de ne. Biçin, çekên ku di destên we de ne teslîm bikin..."





Parlementerê SHPê Fuat Atalay di danişîna 4ê cotmeha 1989an de axifî û got ku, gellek cerdevanên ku tevlî bûyerên kuştinan bûne ew bûyer hê jî zelal nebûne, Atalay li ser vê jî gellek mînakan dide û lê zêde dike ke pergala cerdevaniyê gel kiriye du beş ango du alî, kesên ku cerdevanî qebûl kiriye weke alîgirên dewletê û kesên ku cerdevanî qebûl nekiriye weke dijberên dewletê têne şîrovekirin. Li ser van gotinan ji bo bersivanê Çakır mafê axaftinê xwest û vê carê jî bi endamên rêxistinê destnîşan kir û weha got:

> "Ev xayin ev cudaxwaz li Ewropayê bi tundûtujî li dijî pergala cerdevaniyê derdikevin û li her derê belavokan belav dikin; mixabin hin parlementerên ku hatine Meclîsa Mezin a Neteweyî ya Tirkiyeyê weke wan difikirin"

Axaftina Çakır piştî çend salan ji bo parlementeran bû bingeh ku li gor wê di navbera parlementeran û PKK têkiliyek heye ku ev têkilî dike ku ev parlementer derveyî meclîs û siyasetê bimînin. Ev bilêvkirina ku nikare li ser şert û mercên aborî û civakî ya herêmê, arişeyên binyadî yên pergala eşîrtîyê û bîr û boçûnên li ser pirsgirêka kurdî ku ji aliyê hin parlementer û PKKê vê têne eşkerekirin qebûl dike ku dewlet ji aliyê aborî û civakî nikare hebûna xwe nîşan bide lê bi veşartî qebûl dike dewlet bi hêza xwe ya leşkerî û siyasî dibe mudaxîlê herêmê. Bi rastî jî ji bo ku bersivê bide Atalay mafê axaftinê Wezîrê Karên Navxweyî Abdulkadir Aksu mafê axaftinê dixwaze û dibêje ku; li ser bûyerên ku tê angaştkirin ku cerdevanên demdemî yên gund tevlê bûne, yekser lêpirsîn hatiye vekirin û gava ku wan rastî piştguhkirinê jî werin ew dawî li peywira wan tînin her weha mêjera sûcên ku pêk hatine gellekî kêm e û gava ku ev kes dibine cerdevan ku hejmara wan gihiştiye 15 hezarî ji bo herêmê bûye derfeta karpêkirinê. Xuya ye dewlet bi serkeftina bo nehiştina çavvekirina ji bo piştguhkirin û sûîstimalên ku di derheqê pergala cerdevaniyê ku ji bo sazkirina ewlekariyê û pêşxistina aboriyê li herêmê dabû destpêkirin xwe serfiraz dibîne.

Parlementerê SHPê Cumhur Keskin di axaftina xwe ya danîşana 19ê cotmeha 1989an got ku: Li bajaroka Hilal ya Qilabanê ku bi ser bajarê Colemêrgê ye 45 cerdevan bi zorê bûne cerdevan, û dema ku ew ji her du aliyan ve rastî zext û zorê tê ji derdevaniyê istifa kirine û ji ber vê yekê ew 9 rojan li bin çavan hatine girtin û bi şertê ku di demeke kurt de ji gund bar bikin û biçin serbest hatine berdan.[3] Dîsa li navçeya Qilabanê ya Colemêrgê parêzgarê Colemêrgê, fermendarê lîwayê, muftî, midûrê emniyetê, fermandarê alayê û hin kesên

din ên peywirdarên herêmî ên dewletê bi navê “Civîna Aramiyê” civînek li dar xistine, û ji bo vê civînê jî gazî li muxtar û serekeşîran hatiye kirin û yek ji van rayedarên dewletê gotiye ku: “Ez hefteyekê wext didime we, heke hûn cerdevaniyê qebûl nekin em ê we weke alîgirê PKKê bin av bikin” û bi vî awayî şîret li gundiya kiriye. Keskin li ser gotina Wezîrê Karên Navxweyî ku gotibû cerdevanî dildarî ye ango kes bi zorê nabine cerdevan, pêşniyar kiriye ku ew bi hev re biçine herêmê. Wezîrê Dewletê Recep Ercüment Konukman jî weke bersiv got ku: Kesên ku ji Gever û Qilabanê koç kirine ji ber tirsa milîtana hatine navenda bajêr û kes tune ye ku bi zorê bûye cerdevan, berevajî wê hemwelatî pargala cerdevaniyê “bi lez û bez hilbijartine”. Parlementerê SHPê Kamer Genç di danişîna 14ê mijdara 1989an de mafê axaftinê xwest û li ser vê “hilbijartina ya bi lez û bez” a hemwelatiyan vê yekê bi bîr xist:

> “Baş e, heke siberoj ev cerdevan hev û du bikujin dê kî bibe berpirsiyarê vê yekê? Ez vê ji we dipirsim dê kî bibe? Wê demê ev cerdevan dê bidin weke “Alayên Hamîdiye.”

Genç, hewcedarî bi ravekirina vê şibandinê jî nedîtiye. Ev tawanbariya ku ji bo dewletê dihate kirin ku gel hev û du dikujin, berê ji ber bûyerên Meraşê ku derbasî zabitnameyên meclîsê bûbû vê carê jî ji ber Alayên Hamidiyê ve cardin derbasî zabitnameyan bûbû. Ev têkiliya ku di navbera pergala cerdevaniyê û Alayên Hamidiyê ve hatibû afirandin; nîşan dide ku dewlet di hin derdorên ku di nav pevçûnên civakî de mane an jî xwe weke alî dîtine, wan weke çavkaniya pevçûnan dibîne û pirsgirêka ewlehiyê îhaleyî beşekî din ê civatê dike û bi vî awayî jî pevçûnan gurtir dike û hewl dide ku “wan ji holê radike.”

Gellek caran li meclîsê ku ji ber mijarên din jî hatiye gotin ku, şer û pevçûn bi rêbazên heyî ve nikarin bêne tunekirin, berevajî wê bi vî awayî wê pevçûn berdewam bike. Parlementerê DYPê İrfan Demiralp di danişîna 11ê çileya 1990an de mafê axaftinê xwest û got ku pergala cerdevaniyê û teror ketiye nav hev û van şîreta kiriye:

> “Gellek kesên ku îro ji ber cerdevaniyê pere qezenç dikin û debara xwe pê tînin û ji vê yekê jî kêfxweş in, difikirin ku li herêmê koka terorê bê qelandin dê ew kes ji wê debarê mehrûm bimînin. Tu dibêje qey yek ê din teşwîq dike; yanî, hindik maye bibe ku teror cerdevaniyê, cerdevanî jî terorê teşwîq bikin, heta bûye jî... Ku hûn rojek koka terorê paqij bikin jî hin cerdevan ji bo ku pergal hilneweşe, ji bo ku çekên destên wan de ji wan neyên standin, belkî ew bi xwe wê serî li rêbazên terorê bikin.”





Her çiqas li herêmê sektora şerê ku hatiye afirandin ne tenê ji cerevaniyê pêk bê û ya herî girîng ne ew be jî, ev tespît di cih de ye ku, cerdevanî ne tenê ji bo ku ji him ji aliyê derûnî him jî ji aliyê qadî ve alaveke tê bikaranîn, di heman demê de jî ji bo ku têkiliyên eşîrtî xurt dike bazar û bikaranîna çekan berfirehtir dike.

Hikumet xuya ye li ser van tespîtan weke tedbîr fikiriye ku, şiklê cil û bergên cerdevanan û çekên wan divê bê zelal kirin û ji bo vê jî di 31ê çileya sala 1990an di fiqreya duyemîn a xala 74emîn a Zagona Gund de ev lêzêdekirinên ku bi tîpên stûr hatine nivîsandin kiriye û bi bî şiklî guherandiye:

> Li bajarên ku dê ji aliyê Lijneya Wezîran ve bê tespîtkirin; ku li gund an li derdora gund nîşaneyên tevgerên tundûtujîyê û sedemên ku pêwistiya Îlankirina Rewşa Awarte derdixîne holê peyda bibe û her ji çi be bila bibe bûyerên ku dê bibin sedema tecawîza can û malê gundiyan zêde bibin, bi pêşniyara Parêzgar û bi erêkirina Wezareta Karên Navxweyî bi qasî hejmara ku pêwîstî pê bê dîtin “Cerdevanên Demdemî yên Gundan” dikarin bêne peywirdarkirin. Meaşê ku bi dema peywira cerdevanên demdemî yên ku bi vî rêbazî têne peywirdarkirin û mêjera tezmînata ku di dawiya peywirê de bê dayin **û buhayên cil û bergan bi hevkariya Wezareta Karên Navxweyî û Wezareta Darayî û Gumrikê ve têne tespitkirin** û ev buha ji aliye Wezareta Karên Navxweyî ve bi pêdaniya ku neqilkirina bo Wezareta Karên Navxweyî ya ji yekeya veguhestina xerçkirinê ya budçeya Wezareta Darayî û Gumrikê ve tê dabînkirin. Fiqreya yekemîn a xala 78. Jî bi vî şiklî hatiye guherandin: Diyarkirina cil û berg û çekên cerdevanan ji aliyê Wezareta Karên Navxweyî ve têne diyarkirin. (kirpandin ên nivîskar in)

Parlementerê SHPê Fuat Atalay di axaftina xwe ya danişîna 6ê sibata 1990an de bal kişand ser bûyerên koçberiyên herêmê, û sedema vê yekê jî weha destnîşan kir ku hemwelatî di navbera xelîl û celîl de mane:

> “... ku tu cerdevan bî û tu ji ber tirsa rêxistina deryasayî dev ji çekan berdî, ev hincetek e di cî de ye ku ev dîsa dikare bike ku tu li hemberî xwe terora dewletê bibînî.”[4]

Wezîrê Karên Navxweyî Abdulkadir Aksu pergalê bi van gotinan parastiye:

> "Ne pêkan e ku ji tu kesî re zext bê kirin ku di Cerdevaniya Demdemî peywirê bigirin. Beramberî wê, gellek hemwelatiyên me ji bo ku bibine cerdevanên demdemî yên gunda serî lê dane û li hêviya dora xwe ne. Di destpêkê de hejmara cerdevanên demdemî yên gundan 5.744 bû îro jî ev hejmar gihiştiye 17.734an... Beramberî kirûya ku welatiyên me ji bo serîlêdana peywirgirtina Cerdevaniya Demdemî dikevine dorê, ew angaşta ku dibêjin hin kes bi zorê dibine Cerdevan him li dijî mantiq ê û him jî li dijî rastiyê ye."[5]

Dema ku angaşta cerdevankirina bi zorê tê rojevê ku ev yek weke terorîzma dewletê tê binavkirin û ji bo bersiva vê angaştê ev angaşt jî tê dayin ku ji bo hem welatî bibine cerdevan dikevine dorê, nabe ku di vê angaştê de rola serekcerdevan neyê dîtin ku ew rêvebirên eslî yên vê pergalê ne. Di 7ê sibata 1990an de di dema berdewamiya hevdîtina de parlementerê CHPê Kamer Genç mafê axatinê dixwaze û dibêje ku, gava ku ev yek bê gotin ku dewlet pere dide serekeşîr û serekcerdevanan, mirov nikare pêşiya bûyerên herêmê bigire ku tu kes dê nexwaze ji vê hatiniyê xwe merhûm bike berevajî wê ev yek wê bûyeran tehrîk bike.

Di axaftina xwe ya di 19ê tîrmeha 1990an de parlementerê SHPê Cumhur Keskin weha got: Li rojhilat belavokeke bi şaneşava Cerdevanên Nemir ên Başûrêrojhilat/Güneydoğunun Ölümsüz Korucuları bi awayekî nehenî li mal û kargehan hatiye belavkirin." Keskin dipirse bê ev kesên ku bi kurtasî navê "GÖK" bikartîne û gel ditirsînin wan tehdît dikin kî ne û têkiliyên van kesan bi dewletê re çawa ne? Wezîrê Karên Navxweyî Abdulkadir Aksu got ku belavokeke weha nehatiye belavkirin, rêxistineke bi navî tune ye û ew rê nade ku hikûmeta wan qet destûrê bide kiryarên derhiqûqî. Aksu 25ê îlona 1990an de got ku hejmara cerdevanên demdemî gihiştiye 25600î di 6ê mijdara 1990an de jî gotiye ku pergala cerdevaniya demdemî "pêşketineke mezin" nîşan daye ji ber wê jî hejmara qadroyan bûye 31000 û hejmara heyî jî bûye 27.250 kes. Di danişîna 7ê adara 1991an de parlementerê SHPê Orhan Veli Yıldırım mafê axaftinê xwest û got ku dewletê li herêmê parastina heremê parastina mal û canê herêmê ihaleyî "Şîrketa Anonîm ya Cerdevanan Gund" kiriye û bi vê yekê mantiqa dîtina pergala cerdevaniyê weke karpêkirinê rexne kiriye û ev dîsa kiriye rojev.





### c. Bicihbûyina pergala cerdevaniyê: Hikûmetên Nû, Rêbazên Kevn (1991-1996)

> *"... Ez dibêjim qey dîsa xeletgotineke ser cerdevanên demdemî weke "ew qaçaxçîtiyê dikin an nizanim kî çi dike"çêbû... Kesên ku di nav wan de xeletî bikin hebin hûn ê wan bineqînin lêbelê...kesên ku xeletî dikindi nav wan de hebin tu nikarî cerdevaniya gundan ji holê rakî"*
>
> Ünal Erkan, Parlementerê DYPê

Di dema desthilatdariya ANAPê de ku pergala cerdevaniyê xiste meriyetê û ev cerg dikeve navbera 1987 û 1991an, parlementerên muxalîf gellek caran axifîn ku pergala cerdevaniyê zeafiyeta siyasî, civakî, aborî û leşkerî ya dewletê destnîşan dike. Endamên hikûmetê jî digotin ku vê pergalê wan nedaye destpêkirin, ew tenê li ser sencandina cerdevanan vesazkirinan çêdikin her weha cerdevan dikin ku êrişên rêxistinê bêencam bimînin û cerdevanî li herêmê firsendeke bo karpêkirinê ye. Destnîşankirina kevinbûyina pergala cerdevantiyê him dike ku berpirsiyarî ji ser wan rab ehim jî acziyetekê destnîşan dike. "Başkirina" şert û mercên karê cerdevantiyê û dîtina cerdevaniyê weke beşek ji karpêkirinan, him acziyetekê îtiraf dike him jî dike ku ew weke sazûmaneke rûdinê. Dîtina çekdarkirina hemwelatiyên sivîl ku weke pêximker tê dîtin ku em vê sedemê jî deynin aliyekî û em bihesibînin ku qesteke din jî tune ye, ev yek bi serê xwe acziyetekê nîşan dide.

Suleyman Demirelê serokwezîrê hikûmeta koalisyona DYP-SHPê piştî hilibjartinê 6ê mijdara 1991an de saz bûbû, di danişîna 25ê mijdara 1991an de wehd kir ku ew ê pergalên Parêzgariya Rewşa Awarte ya Herêmê/OHAL û cerdevaniyê ji ber çavan derbas bikin. Parlementerê Partiya Refahê (RP) Necmettin Erbakan di danişîna 28ê mijdara 1991an de mafê axaftinê xwest û ev rexne anîn; partiyên ku niha di hikumetê ava kirine berê soz digotin ku ew ê "cerdevaniyê ji holê rakin" niha jî dest bi gotina "em ê ji ber çavan derbas bikin" kirine... A rast em dikarin bibêjin ku mebesta Erbakan ne DYP lê SHP bi xwe ye, ji ber ku axaftinên dijber ên pergala cerdevaniyê bi gelemperî yên parlementerên SHPê ne. Esas her çiqas ew hevparên koalisyonê bin jî rexneyên li ser pergala cerdevaniyê yên parlementerên SHPê dîsa dom kiriye. Bi rastî jî di danişîna 23ê adara 1992an de parlementerê SHPê Muzaffer Arıkan mafê axaftinê xwest û got

ku digel ku navên wan demdemî bin jî, cerdevanên gundan ev heft sal in bi çekan li hemberî terorê li ber xwe didin, lê ev ne karê cerdevanên gundan e" bi van gotinên xwe kêmasî endişeyên xwe yên li ser pergalê bilêvkiriye. Parlementerê ANAPê Gürhan Çelebican jî cerdevantiyê parastiye û weha gotiye:

> "... cerdevan divê bi navê "polîsên gundan" ji nû ve nav li wan bê kirin û ...çawa ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê saziyeke bi navê "şerîf" heye cerdevan jî dikarin weke wê saziyê bêne birêxistinkirin û divê ev yek pêk were ku herêm baweriyê pê bînê ku pergal ne demdemî ye."

Ku em qebûl bikin ku Çelebican, bi zanîna ku li Dewletên Yekbûyî rêveberiy herêmî çawa pêk tê û şerîfên wan jî bi hilbijartinan têne ser kar, pêşniyar dike, cihê meraqê ye ku pergala ku ew pêşniyar dike ku pêdiviya wê bi veguherîneke mezin heye, çima behsa vê veguherînê nake...

Li ser pirsa kuştina komek mirovên li Midyadê ya parlementerê SHPê Mehmet Sincar di danişîna 25ê tebaxa 1992an de wezîrê Karên Navxweyî İsmet Sezgin mafê axaftinê xwest û got ku piştî lêpirsîna ku li ser angaşta ku bûyer bi destê cerdevanan pêk hatiye, destpêkirin 10 cerdevan hatine girtin û cerdevanên ku navên wan jî di bûyerê de derbas bûne ji kar hatine derxistin[6]. Dîsa li ser pirseke li ser angaşta kuştina komeke mirov ên bi destê cerdevanên li Midyadê weha bersiv da: Di encama lêkolîn û lêpirsinan hatiye fêhm kirin ku di bûyerê de destê cerdevanan tune ye û tu têkiliya wan bi bûyerê re nîne, li ser beyanên ku birîndar gotibûn "cerdevan êrîşê me kirin", piştî brîndar rakirine nexweşxanê û hin kesên niyetxerab ku hatine cem wan wêneyên wan kişandine û van gotina bi wan dane gotin. Parlementerê CHPê Hasan Basri Eller di danişîna 17ê kanûna 1992an di mafê xwe yê axaftinê de, got ku hejmara cerdevanên gundan 39 hezar e, mehane ya cerdevanekî Milyonk û 686 hezar lîra ye, û maliyeta van cerdevanan ji bo dewletê j îsalê 732 milyar lîrayê tirk e û balê kişandiye ser vê yekê ku budçeya ku ji bo pergalal cerdevaniyê hatiye veqetandin ji tevahiya budçeya Serokkomarî, Dedgeha Şewrê, Dadgeha Jimaryariyê, Dadgeha Bilind a Makezagonê, Dadgeha Bilind a Hiqûqê, Enstîtuya Statîstika a Dewletê Wezareta Hawîrdor û Ewlekariya Peravan zêdetir e.

Di axaftinn xwe ya danişîna di 28ê nîsana 1993an de parlementerê SHPê got ku, ew dixwazin bi lijneyeke biçine gundên hatine valakirin û şewitandin da ku li wir lêkolîn û lêgerînê bikin, lêbelê gava ku ew bikevine gund ew ji aliyê cerdevan û leşkeran ve hatine rawestandin û çek rakirine wan û du meh berê jî





heman pêkanîn li Mêrdînê hatiye serê parlementerê wan Mehmet Sincar û Ali Yiğit jî. Aydar bilêvkir ku ji bo van kesan tu lêpirsîn nehatiye destpêkirin û ev êrîş li dijî parlemetoyê û demokrasiya parlementerîst e. A rast êrîşên ku pêk hatine komeke parlementer ên diyarkirî û partiyên ku ew parlementer endamên wan in. Em dikarin bibêjin ku bênirxkirina wan a ber çavê gel ên partiyên ku parlementerên wan di bin banê meclîsê de li dijî pergala cerdevaniyê diaxifin, xizmeta dewleta leşkerî dike ku ev jî bi xêra cerdevanên ku dewletê dixin pişta xwe û ne tenê sûcan pêk tînin her weha dixwazin siyasetê têk bixin. Bi rastî jî parlementerê SHPê Coşkun Gökalp di danişîna 29ê hezîrana 1993an de ev hişmendiya "cerdevan alîgirên dewletê ne û ên ne cerdevan jî "xayin û dijminê dewletê" ne rexne kiriye û pirsiye:

> "Gava ku ez dibêjim 'ez cerdevantiyê naxwazim' gelo ez dibim xayinê dewletê?"

Piştî ku serokkomar Turgut Özal jiyana xwe ji dest da, Süleyman Demirel bû serokkomar û Tansu Çillera ku wê anîn serokatiya DYPê bû serokwezîr. Tansu Çiller di danişîna 30ê hezîrana 1993an de got ku: ew dixwazin pergalal rewşa awarte bi şertê dirûskkirina bo "valahiyeke otoriteyê û rayeyê dernekeve" dê ji holê rakin. Her weha ew ruxandina pergala cerdevaniyê jî "weke hîm" dixwazin lê belê divê pirsgirêkên karpêkirin û ewlekariyê ku bi rakirina cerdevaniyê ihtimal e derkevin holê, çareser bikin. Lê belê piştî du mehan di danişîna 1ê îlona 1993an de hin parlementeran pêşniyarnameya pirsê dan ku Cerdevan û leşker êrîşî heyeteke ku ji bo lêgerîn û lêkolînan çûbûn Amedê, kirine; her weha cerdevan muameleyên ne baş bi xelkê dikin; dixwazin gundiyan bi zorê bikin cerdevan û hin hem welatiyên masûm bi destê cerdevanan hatine kuştin. Li ser van pêşniyarnameyan Wezîrê Karên Navxweyî Mehmet Gazioğlu weha bersiv da: Ev angaşt dikin pergala cerdevaniya demdemî ku di hedefa rêxistina PKKê a terorê ye ji holê rakin û bi vî awayî terorîst li herêmê bi rehetî dê karibin bigerin. Ev angaşt bi niyeta pasîfîzekirina cerdevanên demdemî ên gund û hêzên ewlekariyê tên rojevê, em weha dinirxînin.

Di danişîna 24ê kanuna 1993an de parlementerê SHPê Selim Sadak li dijî vê nirxandinê tespitek weha kiriye:

> "Realiteya Kurd ku demekê bûbû beniştê devê birêz Süleyman Demirel, derbasî Serekerkantiyê bûye, û pêkutîkirina bi çekan bûye politikaya

bingehîn. Ji ber pêkutîkirina bi çekan e ku bi rêya bac û zeman pereyên ku ji gelê feqîr û hejar têne komkirin li skorskyan, kobrayan, pazeran, kariyeran, çek û alavan, cerdevanên gunda, muxbîr û sîxûran re tê xerckirin... Ên cudaxwaz ew kes in ku me ku em bi rêya dengên gel hatine hilbjiartin ji dewrê derdixînin û pirsgirêkê hewaleyî sererkcerdevan dikin in."

Ji dewrederxistina ku Sadak qal dike ew e ku di danişîna 2ê adara 1994an de, ew jî tê de ji bo destnedayîniya zagonî ya 22 parlementeran rabe bîrnameyeke hate amadekirin û 5 parlemeneter hatin girtin ku ew derveyî siyasetê bimînin. Feraseta ku dixwaze di navbera PKKê û parlementerên rexnevanê pergala cerdevaniyê têkiliyeke organîk çêbibe û "xweşdîtina" êrîşên li ser parlementeran ku bi destên cerdevanan dihate birin, roleke sereke dilîst ku hin parlementer li derveyî meclîsê bimînin û bikevine zindanê û hin serekcerdevan jî dianî meclîsê. Bi rastî jî di axaftina xwe ya danişîna 16ê mijdara 1994an de parlementerê SHPê Coşkun Gökalp got ku kesekî serekcerdevan dê di hilbijartinên 4ê kanûnê de di rêza yekemîn de ji partiya ANAPê bûye namzet û weha pirsiye kesekî ku "bi cerdevaniyê ewqas rû bi rû" ye dê çawa bê izahkirin ku ev kes di rêza yekemîn a namzetiya parlementeriyê de cih digire. Di danişîna 19ê kanuna 1994an de parlementerê DYPê Mustafa Zeydan di axaftina xwe de gotiye ku ew fêm nake bê çima li dijî cerdevanî û tîmên taybet in û weha domandiye: "Ew cerdevanê hemwelatî li cem welat û miletê xwe xizmetê dike." Ji bo bersivadayina Zeydan, parlementerê SHPê Coşkun Gökalp mafê axaftinê xwestiye û weha gotiye: "Bi gulebarandina bi şaşî ya cerdevanên demdemî 8 xebatkarên ewlekariyê şehîd ket" û "Di hilbijartinên herêmî yên 27ê adarê de xaniyê Sadık Çetinkaya ku ji SHPê weke şaredar hate hilbijartinu ji aliyê xizmên cerdevan ên M. Ali Yücebağê şaredarê berê ê ANAPî ji ber ku ew di hilbijartinê de bi serneket bi çekên otomatîk gulle lê barandin. Bi van bersivan xwest bibêje bê çima ew li dijî cerdevaniyê ye.[7]

Di danişîna 7ê adara 1995an de parlementerê SHPê Fuat Çay di pirsnameya xwe de ev rewş pirsî: "Cerdevan bi hêza ku ji dewletê werdigirin, pêdiviyên sereke bi buhayekî bir bilind difroşin û ji sûkareşkeriyê pereyan bi dest dixin. Li ser vê pirsê bersivek weha hat ku li ser vê bûyerê tu agahî nehatiye parêzgariya OHALê. Endamên iqtidarê tim û daîm li angaştên ku tê gotin ku cerdevan kiryarên derhiqûqî pêk tînin, çavên xwe digirin û dibêjin ku derheqê van bûyeran tu agahî nehatine ber destên wan, ev yek dike ku destê cerdevanan ji bo van kiryaran bihêztir be û dike ku aciziyeta dewletê nîşan bide ku berê jî ji ber bûyerên cihê ev aciziyet gellek caran eşkere bûbû. Yek ji endamê girîng ê bazara şerrê sûkareşkerî jî bi vî awayî derbasî zabitnameyên meclîsê bû û kete nav lîsta sûcên cerdevan ên ku bi hêza ku ji dewletê digirin pêk tînin.

Wezîrê Karên Navxweyî Nahit Menteşe di danişîna 18ê nîsana 1995an de di bersiva nivîskî ya li ser pirsnameyeke di derheqê cerdevanên demdemî de ya parlementerê SHPê Mehmet Emin Sever de ev tabloya li rûpelê din cih digire.

Di danişîna ji bo dirêjkirina bîrnameya Serokwezirîyê ya ku dixwaze 4 mehan a rewşa awarte ya 10 bajaran dirêjtir bike ku di 27ê hezîrana 1995an pêk hatibû de mafê axaftinê parlementerê RPê Hüsamettin Korkutata girt û weke ku têkiliya reqemên li tabloyê û rûyê sepandina pergala cerdevaniyê şîrove kir û wiha got: "Îro li herêmê rewşa awarte bi serê xwe bûye sektorek; bi cerdevan, axayên sercedevan, îtirafkar, sîxûrên li welêt, piştgirên li welêt û derveyî welêt bûye sektoreke kut ê de bi trilyonan pere çerxa wê de dizîvire û ev sektor kesên ku li hemberî wê bisekine, ya bi rêya reşkirina wan kesan ya bi çavtirsîkirinê an jî bi awayekî din berteref dikin.

Di danişîna 7ê adara 1996an de serokwezîrê hikûmeta koalisyona DYP-ANAPê got ku: Ew ê pergala cerdevaniya demdemî ji ber çavan derbas bikin û hêlên wê yên ku baş naxebitin ew ê biselihînin. Wezîrê Karên Navxweyî Ulku Guney jî di danişîna 14ê adara 1996an de axifî û got: Em jî dipejirînin ku cerdevaniya gundan biselihe û ev selihandin jî di çarçoweyeke hiqûqî de were kirin" Ulku Guney wiha lê zêde kir: "Lêbelê em ji bîra nekin ku ên ku herî pirr li dijî cerdevaniyê ye PKK bi xwe ye". Lêbelê di danişîna 18ê hezîrana 1996an de parlementerê DSPê İstemihan Talay, hat ber kursiya axaftinê û got ku kaniyên ku divê ji bona pêşxistinê bihata bikaranîn ji bo meaşên cerdevanên ku hejmara 50 hezarî derbas kiriye û ji bo veberdêrên xeyalî yên aligîrên partiyên siyasî hatiye veqetandin" û weha domand:

> "Ev rastiyek e ku beşek ji van derfetan bi awayekî ne rasterast diçe qaseya PKKê ya ku em hemberî wê têdikoşin."

Parlementerê DYPê Ünal Erkan jî bertek li tawanbariya ku cerdevan "alîkariya PKKê dikin" nîşan da:

> "...Ez dibêjim qey dîsa xeletgotineke ser cerdevanên demdemî weke "ew qaçaxçîtiyê dikin an nizanim kî çi dike"çêbû... Kesên ku di nav wan de xeletî bikin hebin hûn ê wan bineqînin lêbelê... kesên ku xeletî dikindi nav wan de hebin tu nikarî cerdevaniya gundan ji holê rakî"

**Cedwela Rewş û Meaşê Cerdevanên Demdemî Yên Gundan (CDG)**
**Di Navbera 1988 û 1995an de**

| Rewşa Awarte | 1988 | 1989 | 1990 | 1991 | 1992 | 1993 | 1994 | 1995 | Meaşe CDG TL* |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ÊLIH | - | - | 1171 | 1114 | 1947 | 2293 | 3447 | 3487 | 5.864.000 |
| ÇEWLIK | 793 | 873 | 937 | 927 | 1213 | 1430 | 2699 | 2715 | 5.864.000 |
| BEDLÎS | 650 | 644 | 784 | 1542 | 1847 | 2601 | 3613 | 3664 | 5.864.000 |
| AMED | 2105 | 2111 | 2158 | 2029 | 2020 | 2727 | 5851 | 5858 | 5.864.000 |
| COLEMÊRG | 3665 | 4567 | 6692 | 7123 | 7487 | 6719 | 7546 | 7263 | 6.164.000 |
| MÊRDÎN | 3271 | 3170 | 2488 | 2544 | 2604 | 2966 | 3657 | 3738 | 5.864.000 |
| SÊRT | 2565 | 2565 | 2091 | 3108 | 3694 | 4065 | 4799 | 4801 | 6.164.000 |
| ŞIRNEX | - | - | 3847 | 4298 | 4525 | 4630 | 7357 | 7597 | 6.164.000 |
| DÊRSIM | - | - | - | 12 | 11 | 11 | 350 | 384 | 5.864.000 |
| WAN | 847 | 779 | 6444 | 6754 | 6948 | 7084 | 8004 | 7936 | 4.464.000 |
| YEKÛN | 13896 | 14710 | 26614 | 29451 | 32296 | 34526 | 47323 | 47443 | - |
| Cîran | | | | | | | | | |
| SEMSÛR | 793 | 789 | 794 | 775 | 975 | 1173 | 1655 | 1655 | 4.464.000 |
| XARPET | - | - | 64 | 236 | 563 | 1370 | 2266 | 2320 | 4.464.000 |
| MÛŞ | 129 | 175 | 168 | 53 | 39 | 234 | 1760 | 2053 | 5.464.000 |
| YEKÛN | 922 | 964 | 1026 | 1064 | 1577 | 2777 | 5681 | 6028 | - |
| YEKÛNA NAVÎN | 14818 | 15674 | 27640 | 30515 | 33873 | 37303 | 53004 | 53471 | - |
| Hesas | | | | | | | | | |
| AGIRÎ | - | 676 | 675 | 653 | 696 | 531 | 1492 | 1969 | 4.364.000 |
| DÎLOK | - | - | 46 | 270 | 467 | 495 | 639 | 646 | 3.464.000 |
| MERAŞ | - | - | - | 687 | 1682 | 1895 | 2358 | 2350 | 3.464.000 |
| QERS | - | 474 | 430 | 560 | 361 | 447 | 689 | 691 | 4.064.000 |
| ERDEXAN | - | - | - | - | 110 | 82 | 126 | 125 | 4.364.000 |
| ÎDIR | - | - | - | - | 124 | 107 | 339 | 423 | 4.464.000 |
| MELETÎ | - | 398 | 639 | 929 | 972 | 985 | 1384 | 1402 | 3.764.000 |
| RUHA | - | 493 | 551 | 570 | 840 | 849 | 1109 | 1109 | 3.714.000 |
| YEKÛN | - | 2041 | 2341 | 3669 | 5252 | 5391 | 8136 | 8715 | - |
| YEKÛNA GIŞTÎ | 14818 | 17715 | 29981 | 34184 | 39125 | 42694 | 61140 | 62186 | - |

*Eşkere nehatibe diyarkirin jî tê fêmkirin ku reqemên stûnê yên sala 1995an e û meaşê brut ê sere cerdevanekî diyar dike.





### d. Di pergala cerdevaniyê de tedbîreke nû: "Islah/Selihandin" (1996-2002)

*"Belkî, di vê navberê de bê bîra hin kesan û bibêje 'ji xwe tu serekcerdevan î'...ez ji ber wê xizmetê serbilind im. Ji ber ku ez hemwelatiyê Dewleta Komarê me, ez bi xêra wê niha li vê derê parlementer im. Dîtina van yekîneyan [cerdevanan] weke sucarên potansiyel û xerab-kirina wan û ji her carekê: Ezbenî, çeteya cerde-vana, çeteya polîsan...' Ev zirarê dide Tirkiyeyê. Em deweleta hiqûqê ne. Ku kî ji me sûcdar be wê cezaya xwe jî bibîne."*

Mustafa Zeydan, Parlementerê Partiya Tirkiyeya Demoqarat/Demokrat Türkiye Partisi

Di axaftina xwe ya di danişîna 3ê tîrmeha 1996an de serokwezîrê hikumeta koalisyona DYP-RPê, weke serokwezîrên berî xwe got ku ew ê pergala cerdevaniyê ji ber çavan derbas bikin û hêlên wê yê ku baş naxebitin wê ew islah bikin. Mebesta peyva "islah"ê di danişîna 24ê tîrmeha 1996an de Wezîrê Karên Navxweyî Mehmet Ağar zelal kir û cihên ku Ağar destnîşan kiribû ev in:

> "... diyarkirina statûya cerdevanên me...ji bo dana "tezmînata ewlekariyê"guherînên zagonî ji bo kesên me yên ku bi rakirina rewşa awarte dê ji derfetên maddî bêpar nemînin ku ew di bin şert û mercên gellekî giran de peywira xwe bi cih anîne."

Bi rastî jî guherînên zagonên ku behsa wê hatibû kirin di demeke zû de hate rojeva meclîsê. Parlementerê ANAPê Mehmet Salih Yildirim di axaftina xwe ya di danişîna 30ê tîrmeha 1996an li ser guherînên ku di xala 8emîn a pêvek a Zagona Derbarê Çekên Agirbar, Kêr û Alavên Din ya bi hejmara 6136ê çêbûne weha axifî:

> "Hatiye diyarkirin ku demançe û guleyên ku bi destê Gerînendetiya Giştî a Ewlehiyê ve hatine peydekirin dê ji bekçîyên sûk û taxan bi berdêla mîriya zatî bê firotin. Hukm li ser hatiye danîn rêbaz, esas, şiklê firotinê, wendabûn, derqadro hiştin paş de vegerandina çekên firotib bi rêvebirnameyê tê sererastkirine. Li zagonê dêvla "curum"ê peyva fiil/kirarê hatiye bikaranîn û sînorê binî ya cezayê ya ku berê salek bû dakete şeş mehan. Bi vî awayî kesên ku bi çekên agirbar ku

sûç pêk bînin û ji ber vê ji şeş mehan zêdetir hukm li wan kesan – ji xeynî kesên ku bi texsîr sûç pêk anîne- were danîn ku ew kes hatibin efûkirin jî bi tu awayî çênabe ku destûrnameya çekan bi dest bixin. Çek û gulleyên bêdestûrname yên cerdevanên dildar û yên demdemî ên li bajarên ku ji aliyê Lijneya Wezîran ve bê tespîtkirin ku piştî 45 rojan ji ser meriyetbûna vê zagonê derbas bibe wan teslîm bikin derheqê wan kesan de lêpirsîn dê neyê kirin û cezayê ku li wan hatiye hukmkirin jî dê bê efûkirin."

Serererastkirina dewletê ya ji bona çekên ku firotiye dê çawa bi paş de bê standin, kirarên pêkanîna daxistina cezaya ku ji ber van çekan hatine kirin, efûkirina kesên ku gava çekên xwe yên bêdestûrname teslîmî dewletê bikin û lêpirsîn derheqê wan de neyê destpêkirin têrî islahkirina pergala cerdevaniyê nebûye ku li Zagona Gund a bi hejmara 442an xaleke lêh atiye zêdekirin ku guherînên bi vê peşnûmeya zagonê hatine ji aliyê Yıldırım ve weha hatiye ravekirin:

"Li ser esas û rêbazên peywirdarkirina cerdevanên demdemî yên dildar hinek sererastkirin pêk hatine. Ji bo kesên ku ji "Zagona Poşmaniyê" istifade kirine derfeta cerdevantiyê hatiye pêşkêşkirin. Hatiye diyarkirin ku ji bo cerdevanên demdemî yên gundan li gor hiyerarşî û qadên ku lê peywirdar in meaşên pêvekî bê dayin her weha li gor serkeftina cerdevanên dildar û yên demdemî dê bêne xelatkirin. Esas û rêbaza dayina heqê derman û tedawîkirina endamên malbatên cerdevanan ku divê ew ji aliyê wan ve bê xwedî kirin hatime diyarkirin. Guncan e ku heqê cenazeyê van kesan jî ji aliyê dewletê bê dayin. Ceza û rêbazên itirazên sûcên disiplînî yên ku dikarin ji aliyê cerdevanan ve pêk bên, bi eşkere hatine diyarkirin."

Taybetmendiya guherînên weke kesên ku ji zagona poşmaniyê istifade kirine karibine bibine cerdevan, meaşe zêde yê ku ji bo rewşa hiyerarşîk bê dayin, xelatkirina kesên "serkeftî" û dayina mesrefên tendurustî û dermankirina malbatên cerdevanan, dike em rexneyên li ser pergala cerdevaniyêi dike ku li parlementoya welatekî din dibihîzin.

Bi rastî jî digel van guherînan, arişeyên pergala cerdevaniyê ji holê ranebûye, berevajî wê hêlên nû lê peyda bûye û ev yek di meclîsê de hê jî bûye cihê gotinê. Di danişîna 10ê cotmeha 1996an de parlementerê ANAPê Ataullah Hamidi û 22 parlementerên din ji ber sedema,





"Ji aliyê saziyên fermî ve hate diyarkirin ku şebeyeke organîze ya ku gellek caran dizî û şelandina çekdarî pêk anîne ku endamên wê yek ji wan amirê tîman 4 polîsên Gerînedetiya Ewlekariyê ya Colemergê û 12 cerdevan û yek jî itirafkarek e"

vê, ji bo ku asta rewşa ku têkiliyên rêxistinên sûc ên derhiqûqî bi dewletê re û sûcên ku rayedarên dewletê jî tev lê bûne, were tespîtkirin pêşniyarnameyeke ji bo Lêkolîna Meclîsê dane. Digel ku pêşniyar nehatibe qebûlkirin jî di danişîna 20ê mijdara 1996an de li ser pirsa derheqê cerdevanan de bersiva nivîskî a Wezîrê Karê Navxweyî Meral Akşenerê rexneyên ku di pêşniyarnameyê de cih girtine piştrast dike: Ji sala 1985an û vir ve heta niha 23.222 heb cerdevanên demdemî ji kar hatine derxistin, sûcên ku cerdevan tev lê bûne, 225 heb kuştin, 71 heb revandina mirovan, 64 hep revandina keç û jinan, 65 heb qaçaxçitiya tiryakê, 58 heb qaçaxçitiya çek û alavên wê hatine tomarkirin. Di axaftina danişîna 12ê mijdara 1996an de parlementerê DSPê İstemihan Talay got ku di naveroka ku karesata ku li Susurlukê pêk hatibû derxistibû pêş me têkiliya mafya, siyaset erê û digel wê têkiliyên feodal jî hebûn. Talay got ku hejmara cerdevanên ku gihiştiye 60 hezarî bûne misogeriya bihêztirbûna feodalîzma herêmê ye. Buhayê vê misogeriyê dîsa di agahiyên bersiva Akşenerê ya 20ê mijdarê weha cih girtiye:

Li bajarên herêma OHALê, li bajarên cîran, hessas û ên din heta 22ê cotmeha 1996an bi giştî 62.034 cerdevanên demdemî, 14.872 cerdevanên dilsoz kar dikin. Ji bo cerdevanên demdemî tevî meaş û tezmînatan navbera 12.615.000 TL û 15.765.000 TL pere tê xerckirin.Misogeriyên civakî ên ku pêşkêşî cerdevanan hatine kirin ev in:
1. Alîkariya Cil û Berg: Ji cerdevanan re li gorî hukmên "Rêvebirnameya Alîkariya Cil û Bergan bo Karmendan" her sal alîkariya cil û bergan tê kirin.
2. Destûr û rewşa tendurustiyê: Ji bo cerdevanan ji ber sedemên wan salê herî pir 15 roj destûr tên dayin. Ji ber nexweşiyên wan, bi rapora sazîyên fermî yên tendurustiyê salê herî pir 30 roj destûra tendurustiyê tên dayin. Ji bo birînên ku ji ber karên wan der bûne û ji bo tedawiyên din dîsa li gor rapora fermî ya saziyên tendurustiyê qasî ku rapor diyar dike bidestûr têne hesibandin. Ev dem herîz êde 6 meh e. Cerdevan dema ku ji ber hêcet û tendurustiyê destûr xwestine jî dîsa meaşê xwe yê mehane werdigirin.
3. Tezmînetên wan: Ku cerdevanên demdemî yên gundan dema peywira xwe de şehîd bin an birîndar an jî seqet bin bi pêşniyara parêzgar û bi erêkirina Wezîrê Karê Navxweyî ji bo wan meaş û tezmînata li gor bingeha Zagona Tezmînata Neqdî ya bi hejmara 2330ê tên dayîn.

Cerdevanên ku şehîd bûne tezmînata ku wê bigirin 60 qatê meaşê herî payebilind ê dewletê ve tê hesibandin û meaş li zarok û jina wî cerdevanî tê girêdan. Cerdevanên ku seqetbûyî li gorî asta seqetbûna wî ji hesaba jorîn %25-75 kêm tezmînat werdigire û meaş lê tê girêdan. Cerdevanên ku birîndar bûne jî li gor asta seqetbûn û birîndarbûna w ê bêyî ku ji mêjera li jor %20 derbas bike tezmînata neqdî werdigire. Ji ber sedemên tendurustiyê û bêgaviyên îdarî ku dawî li karê cerdevan bê anîn jî ji bo her sala ku xizmet kiriye bi du qatê meaşê dawî bi lêkdanba sala xizmetê tezmînat tê hesibandin ev yek bi Biryara bi hejmara 85/9675 û bi dîroka 10ê tîrmeha 1985an a Lijneya Wezîran ve hatiye diyarkirin û sepandin jî bi vî şiklî tê meşandin.

Li ser daneyên derheqê cerdevan û sûcên ku cerdevan pêk anîne, pêdaniya ku ji bo cerdevanan hatiye veqetandin û têkiliya dewlet û rêxistinên derhiqûqî bi taybetî di hevdîtinên bûdçeyê de nîqaş çêbûne û ev hatine rexnekirin. Wek mînak di axaftina danişîna 9ê kanuna 1996an de parlamenterê DSPê Hilmi Develi rexne anî ser bûdçeya 1997an û got; budçeya Wezareta Pîşesazî û Bazirganiyê ku 14 trilyon 387 lîra ye qasî budçeya ku ji bo cerdevaniyê hatiye veqetandin e[8] Gotinên parlementerê DSPê Veli Aksoyê ku di 18ê kanuna 1996an de bilêvkiribû girîng e: Ihaleyên dewletê yên ku ji aliyê Wezaretên veberdêr li herêmê tên vekirin, gellek ji wan didine serekcerdevanan û ev yek jî bi raporên serperiştan tê zanîn û Aksoy gotinên xwe weha domand:

> "Ji ber ku pergal ji bo derve girtî ye û bêvenêrîn e serekcerdevan bi xêra têkiliên xwe yên rayedarên bilind ên herêmê ji para ku ihaleyên ku distînin gellek zêde par distînin û ji pahra ku werdigirin jî qismek girîng jê didine rêxistinên terorê."

Bûdçeya cerdevanan zêde ye û ev zêdebûn derveyî venêrînê ye ku ji xeynî wê hîmê hîmeke din dike ku mirov pê xembar dibe ew e ku berê jî hatibû behskirin di (xwe)biçekkirina cerdevanan de derdikeve pêşiya me. Wek mînak di danişîna 11ê adara 1997an de parlementerê DYPê Tevfik Diker pirsek dike û Wezîrê Karên Navxweyî Meral Akşener jî bersiveke nivîskî dide û di vê bersivê de têdîtin ku ne zelaliya senifandina weke çekên ku ji aliyê dewletê hatiye dayin, çekên ku ji aliyê dewletê ve hatiye firotin, çekên şexsî, gihiştiye asteke pirr bilind:

> "Cerdevanên demdemî yên ku li herêma OHALê dixebitin (22 779) heb çekên ku jêderkên wan nayê zanîn teslîm kirine. Ji van çekên ku hatine teslîmkirin (19 664) hebên wan ji bo ku bê bikaranîn bi derxistina destûrnameyê dîsa li cerdevanan hatine belavkirin. Lêkolîna balîstik ya hemû çekan nayên kirin tenê çekên ku ji aliyê Parêzgariyê weke gumanbar tên dîtin lêkolîna wan a balistîkî tê çêkirin. Li RuhayêLi Gerînendetiya Ewlekarî ya Navçeya Sewrêgê bajarê Ruhayê (1 033) heb çek hatine teslîmkirin... Ji van çekên hatine teslîm kirin weke jêderk çekek jî ne ê dewletê ye."

Dayina destûrnameyê ji bo çekên ku ne aidî dewletê ne ango jêderkên wan nayê zanîn ku bêyî ku li ser lêkolînek çêbe bê ev çek ji ku bi çi awayî gihiştine ber destê cerdevanan tîne bîra me ku ev paqijkirina perê reş e.Angaşta ku bikaranîna şiddetê ya dewletê dike ku, ji ber keyfiyeta nekirina lêkolîna balîstik a çekên jêderka wan nediyar vê angaştê ji holê radike, dewlet çavên xwe ji "hin kiryaran" digire û ji xeynî lawazkirin û berfirehkirina tekedestiya xwe ya meşrû ya şiddetê bi wê bi xerabî bikartîne. Di danişîna 8ê nîsana 1997an de reqemên ku Akşenerê pêşkêş dike, di derheqê asta suîîstimala ku dikare bigihê de me agahdar dike.

> "Li welatê me; li herêma OHAL, bajarên Cîran û Hessas 62 654 cerdevanê demdemî li ser kar in... Li Êlihê, 3 445, li Çewligê 2 678, li Bedlîsê 3 759, li Amedê 5 842, li Colemêrgê 7 596, li Sêrtê 4 809, li Şirnexê 7 520, li Dêrsimê 377, li Wanê 8 186, li Mêrdînê 3 565, li Mûşê 2 036, li Semsûrê 1 633, li Agirî yê 2 207, li Erdexanê 113, li Xerpetê 2 307, li Dîlokê 593, li Kîlîsê 37, li Mereşê 2 342, li Qersê 675, li Îdirê 479, li Meletiyê 1 343, li Ruhayê 1 112 heb cerdevanên demdemî hene."

Bi rastî jî rola ku cerdevanên li herêmê yên di bazirganiya çek û tiryakî de cih digiritin derbasî derveyî herêmê jî bûbû. Di danişîna 27ê Gulana 1997an de hin parlementerên RP, ANAP, CHP û DSPê, ji bo ku têkiliya rêxistinên derhiqûqî ya bi dewletê re û karesata ku li Susurlukê de pêk hatibû û têkiliyên tarî ê pişta vê karesatê zelal bibin pêşniyarname bo lêkolîna Meclîsê dan û ji bo vê jî parlementerê CHPê Fikri Sağlar weha axifî:

> "Hatiye fêmkirin ku di operasyonên rêxistinê ên li başûrêrojhilat de digel polîsên tîmên taybet cerdevan û îtirafkarên PKKê jî hatine bikaranîn....Rastiya ku qaçaxçitiya maddeyen hişber bi wesiteyên fermî ên dewletê hetta bi firokeyên leşkerî çêbûne li ber çavên me ne û ev yek li zabitnameyên alavan jî hatiye tomarkirin û ji aliyê hin kiryaran jî hatiye itirafkirin."

Parlementera DSPê Sema Pişkinsüt jî tespîtên Sağlar şênber dike:

> "Tê gotin ku kesê ku piştgirî dide rêxistinê û ji sazûmana feodalî û pergala cerdevaniyê digihê heta parlementoyê Sedat Bucak bi xwe ye. Li herêmê jî hin eşîr û cerdevan ji aliyê rêxistinê ve tên bikaranîn. Weke çeteya Yüksekovayê di parkirina ranta terorê a herêmê hin endamên yekîneyên ewlekariyê jî cih digirin."

Ji bo bersivdayinê Meral Akşener di axaftina xwe de xwest bibêje ku hikûmet li ser bûyerê kontrola xwe pêk aniye ku ji bo ku ji merivên wî pere fidye bê xwestin hemwelatiyek xwedê giravî bi destê terorîstan hatiye revandin ev kesên ku fidye dixwazin ji aliyê Fermandariya Cendirmeyan a Geverê ve li ser suc hatine girtin û ew ji bo saziyên dadî hatine şandin kesên kut tevlî vî sûcî bûne yek ji wan komîser yek polîs, yek îtirafkar û 3 heb ji wan jî cerdevanên demdemî bûne. Dîsa ji bo bersivdanê parlementerê DYPê Mehmet Ağar got ku Sedat Bucak karê ku dewletê daye wî, wî ew pêk aniye. Sê salan li herêmê cerdevantiyê kiriye û tevlî karên derhiqûqî nebûye û rexneyên ji bo pergala cerdevantiyê weha rave kiriye:

> "Nirxandineke Abdullah Öcalan heye; dibêje ku: 'Serê kontrgerîlla Mehmet Ağar e. Bi çeteyên cerdevan ku li Licê, Silopiya, Nisêbîn, Şirnexê avakiribû canê me ji me stand, nehişt em bikevin wan deran, niha em rehet in. 'Niha divê cerdevanî bê rakirin, pirsgirêka kurd heye...' Ev gotin heman gotinên PKKê ne birayê min. Pirsgirêka kurd tune ye. Pirsgirêka başûrêrojhilat heye. Sedema serkeftina me ya li wir ev e: Em bi mirovên wê derê re bûn yek. Me hemwelatiyên me yên koka wan kurd e ji PKKê tecrîd kirin. Cerdevan di operasyonên dersinorî de bi pêşengî diçin. 50, 100, 500 şehidiên wan hene mafê tu kesî tuneye ku van mirovan tune bihesibîne. Tu kes nikare berxwedana Tirkiyeyê ya ku li wê derê meşandiye tune bihesibîne."

Digel ku Akşener bi veşartî hebûna çeteya Yüksekovayê qebûl kiriye Ağar jî bi van gotinên xwe dixwaze bibêje ku "çete"yên bi vî rengî derqanûnê tevnagerin, jixwe karên ku dikin jî ji aliyê dewletê ji wan tên xwestin, rexneyên li ser cerdevaniyê di esasê xwe de gotinên PKKê ne. Ağar dixwaze şanî meclîsê bike ku yekbûna bi "hemwelatiyên kokkurd" bê çiqasî di pirsgirêka "başûrêrojhilat serkeftî bûne Parlamenterê DYPê Unal Erkan jî heman şibandinê di 2ê cotmeha 1997an de di dema hevdîtînên li ser rakirina OHALê ya li bajarên Êlih, Bedlîs, Çewligê kiribû:





> "Gava bê gotin ku dê cerdevaniya demdemî a gundan bê rakirin ditirsim ku li hêza moralê cerdevanên ku bi qehremantî xebata xwe dikin bandoreke neyînî bike.... Divê cerdevantiya demdemî bidome; lê aliyên wê yên ku muhtacî islahkirinê ye divê ew werin islahkirin. Di nava van xebatan de divê dayina mafê teqawutbûyînê û mafên tendurustiyê yên cerdevan û malbata cerdevan jî weke xebatkarên din ên dewletê neyê ji bîrkirin."

Ilsahkirina pergala cerdevaniyê ji aliyê partiyên siyasî bi awayekî ji hev cuda tê şîrovekirin."Islah", ji bo kesên ku pergala cerdevantiyê diparêzin, başkirina şert û mercên civakî yên cerdevanan, ji bo kesên ku pergalê rexne dikin ew e ku divê cerdevan ji çek û sucan bê pakkirin û ew derbasî qadeke din a karpêkirinê bibin. tê fêmkirin: Di danişîna 21ê kanuna 1997an de parlementerê Partiya Tirkiyeya Demoqrat Mustada Zeydan ji bo van têgihiştinên cuda ên parlementoyê van gotinên ronîker bilêvkirine:

> "Ez dixwazim behsa cerdevaniya ku parçeyeke Hêzên Çekdar e ango di bin fermana wê de ye bikim.. Belkî, di vê navberê de bê bîra hin kesan û bibêje 'ji xwe tu serekcerdevan î'...ez ji ber wê xizmetê serbilind im. Ji ber ku ez hemwelatiyê Dewleta Komarê me, ez bi xêra wê niha li vê derê parlementer im. Dîtina van yekîneyan [cerdevanan] weke sucarên potansiyel û xerabkirina wan û ji her carekê: Ezbenî, çeteya cerdevana, çeteya polîsan...' Ev zirarê dide Tirkiyeyê. Em deweleta hiqûqê ne. Ku kî ji me sûcdar be wê cezaya xwe jî bibîne."

Lê, xetereya tawanbarkirinên derheqê çeteyan ên ku Zeydan qîma xwe pê neaniye li holê ye û esas tê fêmkirin ku li meclîsê lihevkirinek li ser mijara dê çi zirarê bide Tirkiyeyê tuneye.Bi rastî jî di danişîna 23ê hezîrana 1998an de ji bo Wezîrê Dewletê Eyup Guven pirsnameyeke hatiye dayin ku li wê pêşniyarnameyê tê gotin ku Mahmut Yıldırımê kod nav "Yeşil" ku di derheqê wî de biryara girtinê heye û digel ku cihê ku lê ye ji aliyê Eyip Aşık ve zanîn lê wî tu agahî nedaye saziyan; Orhan Velî Yildirimê ku parlementerê CHPê ye di derheqê pêşniyarnameyê mafê axaftinê xwest û got ku: Hevalê herî girîng ê Yeşil, Ahmet Cem Erserver e û ew bi xwe endamekî girîng ê kontrgerîlla ye û Fermandarê Herêma Başûrêrojhilat ê JİTEMê ye. JİTEMîyên di bin fermandariya Ersever de ne êniyeke bi navê Tevgera Gel a Anatoliyê damezrandine û sê xetên vê eniyê hene:

"Di serê xeta ku bi Amedê ve dest pê dike weke kujtar Yeşîl weke plansaz jî Zinnar heye. Di xeta Colemêrgê Babat (cerdevan) û weke kujtar jî itirafkarek bi navê kod Havar heye. Xeta Mêrdînê jî tîmeke din bi rê ve dibe. Di hevpeyvîna ku bi sernavê Rastiya Kontrgerîlla ku li rojnameya Tercümanê ya. 8ê tebaxa 1993an weşiyabû... Ali Öncü, gava ku behsa Ersever dike wî weke fermandarê Tevgera Gel a Anatoliyê bin av dike. Dibêje ku endamên wê ji JİTEMî, îtirafkar û cerdevanan pêk tê."

Ji aliyê din angaştên bi vî rengî hatine piştguhkirin, weke ku ji kesên pergala cerdevaniyê diparêzin tê fêmkirin ku giranî li ser islahkirina pergalê mayê. Di axaftina danişîna 23ê tîrmeha 1998an de Wezîrê Karên Navxweyî Murat Başesgioğlu mafê axaftinê xwest û got ku: Xebata başkirina rewşa civakî û aborî ya cerdevanên demdemî bi dawî bûye û ji bo rojeva Lijneya Wezîran weke pêşnûmeyeke zagonê hatiye pêşkêşkirin:

"Bi zagonbûyina pêşnûmeyê nediyariya statuya hiqûqî ya cerdevanên demdemî û yên dildar, esasên peywir û karên wan, mafên wan ê xweyî û civakî wê zelal bin. Meaş û dana tezmînetan her weha heqê cil û bergan jî û mesrefên tedawîkirinê jî bi bê pêşnûmayê tê payîn.Yên ku beşdarî operasyona bûne wê tezmînatê operasyonê bitsînin û yên ku serkeftî bûne wê bi pereyan bêne xelatkirin. Mirovên berpirsiyariya wan a xwedîkirinê li ser milê Cerdevanên demdemî û yên dildar in mafê tedawîkirinên wan jî tê misogerkirin. Digel van hemî tiştan, girêdana fermanî ya cerdevanên demdemî û yên dildar, awayên peywirdarkirinên wan, perwerdehî û esasên venêrînê, sicil û destûrên wan, peywirdarkirina wan a li operasyonên derveyî sînor bi esaan ve tê girêdan û endişeyên ku di raya giştî de derdiketibûn ji holê radikir."

**e. Şîroveya nû ya "Islah"ê: "Sozdarî" (2002-2009)**

*"Ku ev pergala cerdevaniyê li welatekî din bûya û ev cerdevan heta niha 1.357 şehîd bidana, dê peykerên wan bihatana çêkirin; ji heft salî heta heftê salî, hemû kesên wî welatî dê girêdana xwe ya bo van kesan bi minnet û spasdarî tim û daîm îfade bikirana."*

Ümmet Kandoğan, Parlementerê DYPê

Piştî sê salan ku ya ku dîsa kir ku pergala cerdevantiyê bê rojevê çarçoweya mantixa ishalê bû. Di danişîna 23ê çileya 2002an de parlementerê





DSPê Mehmet Salih Yıldırım mafê axaftinê xwest û piştî ku derheqê dîrok, bergeh, fêdeyên pergala cerdevaniyê axifî weha domand:

"Ev mirovên ku di serî de li welatên xwe debara xwe bi çandinî û xwedîkirina heywanan dikirin û hilberîner bûn mixabin bi demê re cerdevaniyê weke awayê jiyana xwe dîtin û bûne çîneke berxur.... Mixabin meaşên cerdevanan nikare têrî wan bike lê ji vê jî pirr dûr e...Îro pereyên ku dikevine destê wan di navbera 139.000.000 û 152.000.000 lira[9] û vê meaşê herî kêm du an sê malbata cerdevanan di nav xwe par ve dikin.... Lêçûnên tedawiya cerdevanan tune ye. Ew û malbatên wan nayên tedawîkirin. Heke alîkariya hêzên çekdar bigihê wan şensê wan ên tedawîkirinê çêdibe. Bedelên xweyîkirinê ya cerdevanan tune ye. Bedelên wan ên çûnûhatinê tune... Niha tu mafeke din a xwezayî tune ye ku ji dewleta xwe misogeriyekê bixwazin. Hewce nake ku ew çekên xwe weke mirat li zarokên xwe re bihêlin. Divê em wan ji çîna berxuriyê derxînin û wan bi xwedî taybetmendî û bikin ku bibin mirovên hilberîner ev berpirsiyariya me ye. Bi têkildarî cerdevanan gelek arîşe pêk hatin. 20.360 cerdevan îstifa kirin. 36.104 cerdevan ji kar hatin dûrxistin lê belê ez dikarim bibêjim ku ev deh salên dawî pirsgirêkên derbarê cerdevanan de bi temamî ji holê rabû. Hejmara sûcên ku bi cerdevanan re eleqadar e 289 ev dike ji hezarî heft ku ev yek nîşaneyeke watedar e ku em dibînin arîşe û pirsgirêkên berê piranî ji holê rabûye... Niha hin hêviyên cerdevanan ji dewletê hene: Dixwazin dahatûya wan bê misogerkirin. Dixwazin weke muxtaran bibin "Bağ-Kur"î. Prîm û pêdanên heta niha divê ji aliyê dewletê ve bi yekcarî bê razandin û ên mayî jî divê ew razînin... Ev mirovên me mînakeke herî baş a sozdariyê nîşan didin ku ev hêviyeke hemû neteweya me ya ku ji dewletê tê payîn..."

Bi cih anîna xwestekên ku Yıldırım weke "mînaka herî baş a sozdariyê" bi nav kir ji 2002an heta îro derheqê pergala cerdevaniyê de bûye şîveleya bingehîn a rojeva meclîsê. Axaftina parlementerê DYPê Hayri Kozakçıoğlu yên di danişîna 19ê Hezîrana 2002an de:

"gava ku em ber bi rakirina rewşa awarte diçin, divê rewşa cerdevanên wê herêmê ji ber çavan bê derbaskirin, kesên ku mafê teqawîdbûyînê bi dest xistibe an hatibe wî temenî divê alikariya wan a teqawudbûyînê bi wan bê kirin. Ên ku nikaribin bibin teqawud divê di saziyên din ên dewletê de weke xebatkarê ewlekariyê bêne peywirdarkin."

axaftina Parlementerê ANAPê Muharrem Doğan ya danişîna 2ê kanuna 2003an

> "Ku pêdiviya hikûmetê ji ber terorê hê jî bi pergala cerdevaniyê hebe divê hikumet ewlekariya civakî û tendurustî yên cerdevanên ku bi meaşê asgarî dixebitin mîsoger bike."

Ev her dû axaftin ji bo şîveleya meclîsê mînakên guncan in. Ji aliyê rexneyên li hemberî pergala cerdevaniyê li gor dema OHALê li gor berê kêm be jî dîsa tê rojeva meclîsê. Di danişîna 16ê tîrmeha 2004an li ser "Pêşnûmeya Zagona Zirarên ku Ji Teror û Têkoşîna Dijî Terorê Derketine" hevdîtin pêk hatin, di dema hevdîtinan de parlamenterê Partiya Dadwerî û Werarê (AK Parti) Naci Aslan weha gotiye:

> "Li gorî min, ev [pergala cerdevaniyê], sûcekî mirovahiyê ye. Li welatên demokratîk saziyeke bi vî rengî tune ye. Ev jî nîşan dike ku welatê me hê derbasî demokrasiyê nebûye. Ez nabêjim em cerdevanan biavêjin wan tune bikin; em wan biparêzin lê çekên wan jî teqez ji destên wan bitsînin. Cerdevanan nahêlin hemwelatiyên me yên ku ji ber projeya vegera gundan dixwazin vegerin gundan, zordariyê li ser wan ferz dikin, keleşkofan bikartînin. Gellek caran ew dikujîn jî. Em çekên wan ji destên wan bitsînin. Em wan di bin banê wezaretên cuda peywirdar bikin. Weke ku tê zanîn. Raporta ku di 2002an de ji aliyê Meclîsa Parlementer a Ewropayê ya bi navê "Şert û Mercên Mirovî yên Kurdên Ku li Tirkiyeyê ji Cihên Xwe Hatine Derxistin de, ev pêşniyar têne kirin: Rakirina OHALê, destûrdana saziyên mirovî ên navneteweyî, bi têkilî mafên mirovan ve mijara herî girîng a ku endîşe dide ruxandina pergala cerdevaniyê, destûrdana bo paşvgerînê, dawî lê anîna îmzekirina belgeyên weke: "me ji ber ber zext û zora PKKê gundê xwe terikand."

Zêde guh li bangên ku bixwe ji aliyê parlementerên hikumetê tê kirin nayê dayîn. Berevajî wê xwesteka ku terciha hikûmetê diyar dike dîsa ji aliyê hin parlementerên AKPartiyê dihat ser ziman ku ev dîsa sererastkirinên li ser mafên civakî yên ewlekariya cerdevanan bûn. Di danişîna 20ê kanuna 2005an de Wezîrê Karên Navxweyî Abdulkadir Aksu got ku ew weke Wezareta Karên Navxweyî di derheqê cerdevanan pêşnûmayeke berfireh amade kirine û pêşkêşî hemû raya saziyan kirine lê ji ber ku pêşnûma dereng ketiye "ew jî fikirîne ku qet nebe pirsgirêkên tendurustiya cerdevanan bê çareserkirin" wan ji bo vê yekê pêşnûmeyeke bo guhertina xalekî ya Zagona Gund anîye bi vî awayî kesên ku berpirsiyariya xwedîkirina wan li ser pişta cerdevan e dê karibin ji, xizmetên tenduristiyê çawa ku kesên xwedî kerta kesk in wê îstifade bikin. Di danişîna 28ê mijdara 2005an de parlementerê AKpartiyê Mehmet Erslan axifî û got ku belê





bi vê sererastkirinê mafê xizmetê tendurustiyê hatie dayîn lê divê prîmên wan jî bên dayîn ji ber ku ev bêgaviyeke makezagonî ye. Parlementerê CHPê Hakkı Ülkü jî got ku ev pêkanîn dikare bişibe xebitandina kesên dertomarî û weha domandiye:

> "Dewlet dixwaze kerta kesk bide cerdevanan, ji bo vê yekê divê ew bi girêdayî SSKê bên xebitandin an jî misogeriya çandinî, an jî çandinî divê bikeve bin banê Bağ-Kurê."

Parlementerê CHPê Halil Ünlütepe jî got ku ku ev zagon bê qebulkirin dê hîmên dewleta hiqûqê bê binpêkirin ku ji cerdevanên ku ne girêdayî saziyeke ewlekariya civakî, ku serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê bixin teqez dê ev zagon betal bibe, divê ev zagon bi paş de bê kişandn û sererastkirinek baştir bê çêkirin. Lê di heman danişînê de li xala 74. a Zagona Gund a bi hejmara 442î ev fiqreya li jêr hatiye zêdekirin û mafê tendurustiyê hatiye sererastkirin:

> "Cerdevanên demdemî ên ku negirêdayî saziyeke ewlekariya civakî û jinên wan, û dê û bav û zarokên ku berpirsiriya wan li ser pişta wî ye, heqê tedawiya, mûayene û vepirsîna wan, bêyî ku li şertên zagona bi hejmara 3816î bê nihêrtin bi rêya. Tespîtkirina dê, bav û zarokên ku divê ew wan xwedî bike li gorî esasên Zagona Karmendên Dewletê ve tê çêkirin. Berî û piştî meriyetbûna vê fiqrayê cerdevanên ku asgarî ji ser deh salî mafê tezmînatê bidestxistine û dev ji kar berdane, tedawî, vepirsîn, û muayeneya jin, zarok dê û bavê van kesan esasên vê fiqrayê tê sepandin."

Parlementerê AKPartiyê Hüseyin Güler di danişîna 28ê gulana 2006an de li ser navê parlementerên ku bi van seresrastkirinan re ne qayil în, pirsî ku gelo cerdevan weke şehîd tê qebûl kirin an na, ku neyên qebûlkirin ma tê hizirîn ku sererastkirinan zagonî ya pêwist wê derkeve an na. Di 12ê kanuna 2006an de parlementerê ANAPê Muharrem Doğan got ku li tevahiya Tirkiyeyê 57.860 hep cerdevanên demdemî, jin û zarokên wan hene û ew xwedî kerta kesk in û ev yek jî rûmeta mirov dişkenîne. Di danişîna 27ê adara 2007an parlementerê AKPartiyê Mehmet Tatar got ku cerdevanên herêma wî ya hilbijartinê dixwazin mijara ewlekariya sosyal bigihênin Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ku ev yek pêk were dê wek şexsê wî û rûmeta dewletê dê bişikê, divê cerdevan jî weke leşkeran bikevine "asta şehîdan". Dawiyê de, zexta derheqê başkirina mafên civakî yên cerdevanan bi encam bûye û di danişîna 27ê gulana 2007an

de li ser hevdîtinên pêşniyarên zagonan hin guhertin hatine qebûlkirin[10]. Bi van guhertinan re weke ku parlementerê AKPartiyê Osman Aslan jî bi tespîtên xwe erê dike, cerdevanên gundan bi awayekî digihêjin „asta karmendiya dewletê Dîsa Parlementerê AKPartiyê“ bi guherîna nû re bi vî awayî behsa zagonê kiriye:

> “Cerdevanên me yên ev e bîst û du sal in li ser kar in, ew ên ku wê demê çil salî bûne niha bûne 62 salî. Digel ku ew şêst û du salî ne hê jî çekên wan di destên wan de ne, heke ew dest ji çekan berdan ew ê nikaribin meaşên xwe bistînin meaşên wan qut dibe. Piştî vî temenî jî dikevin rewşeke weha ku nikarin debara xwe bi xwe bikin. Va ye bi vê pêşnûmeya zagonê kesên ku 55 saliya xwe tije kirine, 15 salan xizmetê kirine dike teqawûd û ji ser 5000î bi asteke karibin debare xwe bi xwe bikin meaşeke werdigirin. Dîsa bi vê zagonê re cerdevanên ku 55 saliya xwe tije kiribin û digel ku ji 15 salan hindiktir xebitî bin û ji ber sedemên îdarê an tendurustî ku ji kar hatibin dûrxistin an ên miribin, reqema 20.000î ya şanîder dê bi qathejmara ku li meaşên karmendan tê sepandin û bi sala xizmetê re dê bê lêketin û bi vî awayî dê mêjera tezmînatê eşkere bibe. Dîsa kesên ku dema standina vî meaşê jiyana xwe ji dest dabin ji bo jinên wan qasî ji sedî 75î vî meaşî meaşek tê girêdan. Dîsa bi vê xalê re, bi vê pêşnûmayê re kesên ku 55 saliya xwe tije kirib û ji deh salî kêm xizmeta wan hebin dikarin teqawûd bin an jî tezmînata xwe wergirin û ji kar derkevin. Cerdavanên ku 55 saliya xwe tije nekiribin bêyî ku li sala xizmeta wan bê nihêrtin ku bixwazin bi dilê xwe ji kar derkevin bi lêketina reqema nîşaneyê ya 20000î dê mêjera tezmînata van kesan eşkere bibe û wê ew vê tezmînatê werbigirin. Dîsa bi vê pêşnûmayê re cerdavênên ku di dema xebatê de jiyana xwe ji dest dabin, dê li zarokên wan heke zarok nebin li dê û bavên wan ku ew jî nebin li xwişk û birayên wan bi lêketina 15000a reqema nîşaneyê ya bi meaşê karmendan re alîkariya mirinê dê bê diyarkirin û bidin van kesan. Dîsa bi vê pêşnûmayê re kesên ku di dema xebata xwe de şehîd ketibin an qasî ku nikaribin bixebitin seqet ketibin dê li gor pêşaniyê ji hevser, zarok, yek ji xwişk û bira bi şertê ku girêdayî Zagona Karmendan a Dewletê dê bi qadroya karmendî di sazîyên dewletên de bixebitin. Dîsa bi vê pêşnûmayê rêbaza peywirdakirina cerdevan û sercerdevanan, şert û mercên peywirdarkirinê, cezayên disiplînê, rewşên ji bo ji kardûrxistinê û pêkanînên din ên ku di vê zagonê de dê bên sepandin dê bi rêvebirnameyeke ku ji aliyê Wezareta Karên Navxweyî bê amadekirin û ji aliyê Lijneya Wezîran ve bê derxistin, bê sererastkirin.”

Parlementerê DYPê Ümmet Kandoğan digel ku ev guherîn pîroz kiribin jî gotiye: Ev mirovên ku ji bo mayindetiya Tirkiyeyê dixebitin ji bo wan çi bê kirin dê kêm bimîne.” û gotiye:





> “Ku ev pergala cerdevaniyê li welatekî din bûya û ev cerdevan heta niha 1.357 şehîd bidana, dê peykerên wan bihatana çêkirin; ji heft salî heta heftê salî, hemû kesên wî welatî dê girêdana xwe ya bo van kesan bi minnet û spasdarî tim û daîm îfade bikirana

Parlementerê ANAPê Muhsin Koçyiğit jî pirsiye gelo 20 hezar cerdevanên dildar jî bi vê zagonê hatine girêdan an na û pêşniyar kiriye ku jib o cerdevanên demdemî nemaze li navendên bajaran ji bo ku karibin pê cane xwe biparêzin divê destûrnameya çekên biçûk bê dayîn. Jib o bersivdayinê Wezîrê Çandinî û Kar û Barên Gundan Mehdî Eker gotiye ku zagon ji bo cerdevanên dildar e jî her whea derbar rêvebirnameya derheqê destûrnameyên çekan jî guherînek pêk hatiye. Lê Parlementerê ANAPê Muharrem Doğan bi gotinên xwe yê wekî “zagona heyî kêm e, cerdevanên gundan jî weke SSKyîyan karmendên 657î divê xwedî karneyên tendurustiyê bin û zagonê de ji bo 22 hezar cerdevanên dildar tiştek neaniye her weha 57.680 hezar cerdevanên demdemî jî bi temamî mafên xwe bi dest nexistine.” Zagon rexne kiriye. Her weha lê zêde kiriye ku nave “Cerdevanên Demdemî Yên Gundan” navekî weha ye ku rûmeta mirov pê dişikê. Heger ev pergal berdewan bike divê navên wan weke “Cerdevanên Çekdar ên Gundar” bê guherîn û herî kêm yên ku lîse qedandine ji aliyê dewletê ve divê ew bêne istihdamkirin. Dîsa parlementerê ANAPê İbrahim Özdoğan xwestiye ku cerdevanên demdemî yên ku di parastina welatê xwe de şehîd ketibin bi awayekî fermî jî navê şehadetê li ber navê wan bê kirin her weha yên birîndar bûne jî li wan kesan rûtbeya gazîtiyê bê dayin. Her çiqas partiyên ku di kêmdîtina statu û mafên sosyal ên cerdevanan de ketibine pêşbaziyekê bi giştî parlementerên DYP û ANAPê ji kiryarên hukumetê yên derbarê islahkirina pergala cerdavaniyê de kêfxweş bûne her weha ev kêfxweşî ne tenê bi parlementeran sînır bûye her weha qonaxa ku AKPartî li herêmê lê ye jî bi erênî hatiye ew qonax hatiye guherîn.

Parlementerê Partiya Civaka Demokratîk (DTP) Hasip Kaplan ji bo ku balê bikşîne ser zirarên ku ji pergala cerdevantiyê derdikevin di danişîna 23ê çileya 2008an de weha got, “Li herêma berê a OHALê ji xeynî hin çekên ku li cerdevanan hatine belavkirin, biççekirineke bi destûrnameyên ku hejmara çekan hatine girtin bi awayekî din “cerdevanbûna dildarî” jî dikare bê gotin gelo bi kîjan zagonê ev pêkanîn çêbûye. Her weha di çapemeniyê de cih digire ku 10 hezar xort wê weke cerdevan bêne tomarkirin, gelo taybetmendiya destûnrmayên

çekên ku wê li van kesan bê belavkirin çi ne? Ji bo bersivdayinê Wezîrê Karên Navxweyî Beşir Atalay got ku: tu biryareke wan a derbarê cerdevankirinê û rahiştina wan a çekan tune ye. Lê belê ew li ser cerdevanan rêvebirnameyeke bi berfirehî amade dikin, ev xebat li ber destê erêkirina Lijneya Wezîran e. Ji ber derengketina rêvebirnameya navborî, parlementerê CHPê Ferit Mevlüt Aslanoğlu di axaftina danişîna 26ê sibata 2008an de bi bîr anî ku ji ser pejirandina zagona derbarê cerdevanan 8 meh derbas bûye. Di 27ê adara 2008an de parlementerê AKPartiyê Ünal Kaçır jî gotiye bi Pêşnûmeya Zagona Misogeriya Tendurustiya Giştî û Misogeriyên Civakî û cerdevanên ku bi Zagona Gund a bi hejmara 442î meaş li wan hatine girêdan, bi naveroka misogeriya tendurustî a giştî ve hatine girêdan.

### f. Di pergala cerdevaniyê de qonaxa dawî: “Komkujiya gundê Zanqirtê” û “Tîma Xençer” (2009-2012)

> *“Hêviya gelê herêmê û rayagiştî a civaka demokratîk ew e ku divê ev pergala ku di serî de jiyana civakî û mafê jiyînê tehdît dike bê rûxandin.”*
>
> Parlementerên DTPê

Piştî salekê, li ser bûyera ku di raya giştî de weke “Komkujiya Gundê Zanqirtê” tê zanîn ku hemû endişeyên ku gellek caran dubare bûyî ên li ser pergala cerdavaniyê rast derxist, mijara cerdevaniyê dîsa hate rojeva meclîsê. Di danişîna 7ê gulana 2009an de parlementerê DTPê Ahmet Türk û 20 parlementer, ji bo ku Lêkolîna Meclîsê bê destpêkirin lêkolîneke di derheqê arîşeyên ji pergala cerdevaniyê de û tedbîrên ku ji bo wan arîşeyan bên girtin, diyar bibe pêşniyarnameyeke dan meclîsê. Weke sedemên bingehîn ên pêşniyarnameyê ev hatibûn gotin:

> “Bûyera ku li gundê Zanqirtê ya navçeya Şemrexê ya Mêrdînê di 4ê gulana 2009an de qetlîameke pêk hat ku di encama wê de 44 hem welatiyê me jiyana xwe ji dest dan, ev bûyer kir ku divê em careke din li ser pergala cerdevaniyê rawestin ku li herêma Rojhilat û başûrêrojhilat tê meşandin êdî bûye rêxistineke sûcê... Digel ku di 2002an de OHAL hate ruxandin lê pergala cerdevaniyê hê jî didome. Li gor daxwiyaniya Wezareta Karên Navxweyî ya 20ê adara 2009an; li 22 bajaran bi giştî 47 hezar û 819 heb Cerdevanên Demdemî yên Gundan û li 32 bajaran 24 hezar û 88 heb Cerdevanên Dildar ên Gundan hene û bi giştî ev dike 71 hezar û 907 heb cerdevan li ser karê xwe ne... Li gor daneyên Wezareta Karên Navxweyî, di derheqê 2 hezar û 376 heb cerdevanên ku tevî nîsana 2003an tev lî sûcên cûrbecûr bûne de kiryarên yasayî hate pêk anîn. Ji Cerdevanên Dildar 264 kes tev li sûcên wekî “sûcê kuştinê ‘pêngav avêtina bu kuştinê’, dijberiya zagona 6136î, ‘li cihê şênî lê ne firotina çekan’ ve ‘qaçaxçitiya daristanan’ hatin mehkûmkirin. Li gor daneyên salên dawî ên Wezareta Karên Navxweyî jî ji ber ku tevlî sûcên cûrbecûr bûne 975 cerdevan ji kar hatine dûrxistin. Ev tablo bi tenê nîşanî me dide ku bê cerdevanî çawa bûye rêxistineke sûcê. Hin sûcên ku cerdevan tev lê bûnê û derbasî dadgehan bûne ev in: ‘Xesp, şêlandin, kuştin, revandin, birîndarkirini bikaranîna teqemenî, dizî, destnîşankirina çek û senetên bi zorê, şewata daristana, şewata mahsûlan, pêxwasî, zimmet, bertîldan, revandina zarokan, rehîngirtin, tehdît, tecawîz, bazirganiya jinan, qaçaxçitiya maddeyên hişber, çek, alavên çekî, ajalên zindî, berhemên dîrokî; sûcên hawîrdorê... Cerdevaniya ku êdî bûye “şebekeyeke sûcên adî.’ Roj bi roj ji aliyê derûnî û civakî ve dibe sedemên gellek hilweşandin û karesatan... Wisa bûye ku, gellek kes ji ber ku cerdevantiyê nepejirandine mecbûr mane welatê xwe terk bikin. Vê pergalê di navbera eşîrên cerdevantiye qebûl kiriye û ên nekiriye de cûdatiyeke afirandiye. Têgihên “eşîrên dost û dijminê dewletê” afirandine. Ev pergala cerdevaniyê ku rewabûna wê binîqaş e û li herêmê bi awayekî cidî aştiya civakî dixe nav xetereyekê, di ehlaq û wicdana civakê de cihê xwe yê dê neyê efûkirin diparêze. Bi rastî jî ji ber hebûna xwe ya tehdîtkar a pergala cerdevaniyê gellek kes derfet nabînin ku vegerin gund û erdên xwe. Cerdevanên ku dewlet li pişta wan e erd û zeviyên mirovên ku bi darê zorê hatine koçberkirin dagirkirine an kirine ku nikaribin bêne bikaranîn. Jixwe kesên ku dixwazin vegerin gundên xwe jî li wan pergala cerdevantiyê tê ferzkirin. “Hêviya gelê herêmê û rayagiştî a civaka demokratîk ew e ku divê ev pergala ku di serî de jiyana civakî û mafê jiyînê tehdît dike bê rûxandin.”

Di danişîna 24ê sibata 2010an de jî parlementerê Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) Nuri Yaman û 19 parlementer, ji bo lêkolîna meclîsê bixebite pêşniyarmayeke pêşkêş kirin û di wê pêşniyarmeyê de dixwestin ku li gor angaştan li Rojhilat û Başûrê Rojhilat komên nîvleşkerî bi navê “Tîma Xençerê” hene û divê ev were lêkolînkirin û ji bo vê yekê jî tedbîr werin girtin. Weke sedemên bingehîn ên pêşniyarnameyê ev hatibûn gotin:

> “Di salên dawî de tê angaştkirin ku li herêma Rojhilat û Başûrrojhilatê Anatoliyê komên bi navê “Tîma Xençerê/Hançer Timi” peyda bûne û tê gotin ku ev tîm dibin sedemê sûcên wekî kuştina mirovan, şewitandina

gundan, tehdîtkirina mirovan, gullebarandina ser mirovan, revandina mirovan. Tê îddiakirin ku, ev komên 8-10 kesî ku ji hin cerdevanên xort û çend itirafkarên kevin pêk tên li herêmê bi komên ji 3, 4 kesî pêk tên, digerin cil û bergên endamên rêxistinê li xwe dikin û bi taybetî jî bi êvaran dixebitin. Tê gotin ku ev koma ku bi navê Tîma Xençerê tê zanîn biroj bi tirimbêlên sivîl gund bi gund digerin plakayên tirimbêlên xwe diguherînin diçin hin malên gundiyan derheqê gundiyan agahî kom dikin û paşê vegerin tabûrên leşkerî û li wê derê dimînin... Dîsa li gor angaştekê berpirsiyariya her tîmê li ser Çawîşên Pispor ên Jendermeyê ye. Her weha tê gotin ku li herêmê mirovên çekdar ên sivîl diçin û tên. Digel ku li herêmê navendên kontrolên leşkerî û gellek qereqol hene jî ev kes pirr bi rehetî diçin û tên."

Di danişîna 16ê tîrmeha 2010an de parlementerê BDPê Osman Özçelik û 19 parlementer ji bo ku li ser pergala cerdevaniyê lêkolîneke bê destpêkirin, pêşniyarnameyeke dan meclîsê, Agahiyên ku di vê pêşniyarmeyê de cih digirin, agahiyên ku pêşniyarnameyên de jî cih digirtin piştrast dikin:

"Li gor daneyên Komeleya Mafê Mirovan, bilançoya sûcên ku cerdevan di navbera salên 1990î û îlona 2009an de tev lî bûne weha ye: Şewitandina Gundan: 38, Valakirina Gundan: 14, Tacîz û Tecawîz: 12, Revandin: 22, Êrîşa Çekdarî: 294, Birndarên bi êrîşên çekdarî: 189, Kesên ku ji ber êrîşên çekdarî jiyana xwe ji dest dane: 181+4, Bûyerê wendabûnê: 2, Înfaz: 50, Xesp: 70, Işkence-Pêkanînên Xerab: 454, Binçavkirin: 59, Sebebûyina xwekuştinê: 9, Şewitandina deverên daristanî: 17 Serokatiya Serekerkantiyê di rapora ku di sala 2004an de amadekiribû sûcên ku cerdevan tev lê bûne weha rêz dike: 'Alîkariya rêxistinê, xesp, şêlandin, kuştin, birîndarkini, pevçûna bi hêzên ewlekariyê, êrîşbirina ser hêzên ewlekariyê, êrîş ali ser xanî û wesayitan, revandina mirovan, bikaranîna teqemeniy, bi zanebûn şewitandina xanî û giyayan; diziya ji xanî, banqe, kargeh, tirimbêl, pêxwasî, êrişbirina ser xetên boriyan, bi zorê destnişankirina çek û senetan, tehsîlkirina wan; li avahî, tesîs û wesayitên dewletê derxistina şewatê, şewitandina daristanan, şewitandina, mehsûlên zeviyan û gihayan, pêxwasî, xeterexistina ewlekariyê, firotina alavên sûcdariyê, veşartin û kirîna wan, zirardana malan, sûcên înformatîk li dij derketina hêzên ewlekariyê, êrîş û lêdan, dijberiya fermanên hikûmetê, bertîl, zimmet, îrtiqap, ihtilas, pêkanînên xerab; revandina, keç zarok û jin û mêran, rehîngirtin, tehdît, pêkanînên xerab li hemberî endamên malbatê, heqaret, sixêf, tevgerên mustehcen, lîstina qûmarê û çêkirina derfeta lîstina qûmarê, êrişên cinsî, teşwîqa fihûşê, bazirganiya jinan, tecavîza meskenê, firotina çekan ya li cihên şênî lê hene, qaçaxçitiya tiryakê, qaçaxçitiya çek û alavên wê, qaçaxçitiya





gumrig û tekedestîyê, qaçaxçitiya ajalên zindî, qaçaxçitiya mirovan û sûcên hawîrdorê.' Tê zanîn ku cerdevanên ku li herêmê nezaretxane, girtîgeh û qereqolên wan hene bi wesayitên bê plaka digerin. Tê dîtin ku cerdevan bûne mekanîzmayeke sûcê."

Ji van pêşniyarnameyan yek jî ne hatiye pejirandin. Û rexneye herî derbasdar a li hemberî cerdevaniyê dîsa hatiye rojevê. Di danişîna 3ê sibata 2011an de koma Partiya Tevgera Neteweperwer (MHP) pêşniyarnameyeke ji bo lêkolîna meclîsê dane, di vê pêşniyarnameyê de tê xwestin ku: li ser pirsgirêkên cerdevanên demdemî yên gundan lêkolînek bê kirin da ku ew karên xwe baştir bikin tedbîr bêne girtin. Di vê pêşniyarê de hatiye gotin ku mafên qanûnî yên cerdevanan rastî pêkanînên kêyfî tên. Ji bo bersivdayinê parlementerê AK Partiyê Ali Öztürk weha gotiye ku hê li 22 bajaran bi çileya 2011an bi giştî 45.536 heb cerdevanên demdemî kar dikin û ji bo cerdevanên demdemî bi 1ê tîrmehê û 31ê kanûna 2010an bi berdewamiya xizmeta wan de her ay nêzî 712.047 TL pere hatiye sencandin; Li gor xala 16emîn a Zagona Gund a bi hejmara 442an cerdevanên demdemî yên ku gihane temenê xwe yê 55salî ji kar hatine dûrxistin, ên ku 55 saliya xwe tije kirine û 15 salan xizmet kirine 309,77 TL, ên ku 55 saliya xwe tije kirine û ji 15 salî zêdetir xizmet kirine 495 TL, piştî ku zagon ketiye meriyetê ji kesên ku deh sal û jê zêdetir xizmet kirine 309 TL meaş hatiye girêdan; ên ku bêyî ku demê xizmetê qedandinbin û ji kar derketibin tenê tezmînat li wan kesan hatiye sencandin; ji ber sedemên îdarî û tendurustî kesên ku ji kar hatine dûrxistin û ji kesên jiyana xwe ji dest dane ji bo her sala xizmeta wan 1.239 TL tezmînat hatiye sencandin. Cerdevanên ku tevlî operasyonan bûne ji bo wan jî tezmînat hatiye sencandin. Li gor xala 22emîn a rêvebirnameya Cerdevanên Gund ji bo cerdevana alîkariya cil û bergan tê kirin. Cerdevanên demdemî yên ku negirêdayî saziyeke ewlekariya civakî û jinên wan, û dê û bav û zarokên ku berpirsiriya wan li ser pişta wî ye, heqê tedawiya, mûayene û vepirsîna wan, bêyî ku li şertên zagona bi hejmara 3816î bê nihêrtin bi rêya. Tespîtkirina dê, bav û zarokên ku divê ew wan xwedî bike li gorî esasên Zagona Karmendên Dewletê ve tê çêkirin; Li gor xala 60emîn a Zagona Misogeriya Tendurustiya Giştî û Misogeriyên Civakî ya bi hejmara 5510ê, cerdevanên demdemî ketiye nav naveroka ên ku "bêmisogeriya giştî ya tendurustiyê ne". Ji bo jin û zarok ku ew nebin dê û bav ku ew jî nebin ji bo xwişk û birayên cerdevanên ku di nava xizmetê de jiyana xwe ji dest dane 929 tl meaş bêyî ku qutbûneke wê çêbibe hatiye sencandin; ku di nava xizmetê de birîndar bibin an seqet bin an jî jiyana

xwe ji dest bidin tli gor zagona 2330ê girêdana tezmînata neqdî û meaş ji bo wan hatiye diyarkirin; Li gor xala yekemîn a Zagona Têkoşîna Li Dijî Terorê ya bi hejmara 3713î kesên ku di dema xebata xwe de şehîd ketibin an qasî ku nikaribin bixebitin seqet ketibin dê li gor pêşaniyê ji hevser, zarok, yek ji xwişk û bira di sazîyên dewletên de dixebitin.

> "Em jî dixwazin ku cerdevanên me yên demdemî di şert û mercên pir baş de bixebitin. Lê ez vê yekê rast nabînim ku em di pêvajoya hilbijartinê de ne, û komîsyona lêkolîna ya meclîsê vê kêliyê xebatên xwe bi encam dike û mijarên ku heta îro nehatibin rojevê çênmabe ku di vê pêvajoya hilbijartinê de mijarên ew çend girîng bêne rojevê."

Di danişîna sibata 2011an de parlementerê MHPê Yılmaz Yankut ji Wezîrê Karên Navxweyî pirsek dipirse û dibêje ku cerdevanên ku hejmara wan gihiştiye dor 40.000î mehane û meaşên wan ên teqawûdbûnê têr nake ji derfetên alîkariyên tendurustiyê ew tenê bi kerta kesk istifade dikin û xwestiye ku meaşên cerdevanên li gor şert û mercên îroyî ji nû ve bê sererastkirin. Heman daxwaz di danişîna 8ê adara 2011an ji aliyê parlementerê BDPê Hasip Kaplan ve jî hatiye bilêvkirin. Kaplan hejmara cerdevan weke 82 hezar û meaşê wan jî weke 595 lîra diyar kiriye û gazinc kiriye ku cerdevan ji mafên misogeriyê yên sosyal nikarin isitfade bikin. Her çiqas rayedarên hikûmetê li ser hejmara cerdavanan agahiyeke zelal nedin jî derheqê mafên sosyal ên cerdevanan guherînan pêk anîne. Bi pejirandina pêşnûmeya Zagona Sendoqa Teqawûdiyê ya di danişîna 22ê kanûna 2011an de, parlementerê AKPartiyê Ekrem Çelebi got ku diyarkirina şêwaz û rêbaza ji bo ku cerdevanên gundan ji alîkariyên tendurustiyê istifade bikin wan karbidestî daye SGKê. Di danişîna 27ê adara 2012an de parlementera AKPartiyê Fatoş Gürkan mizgînî daye ku bi ji niha û pê de cerdevan jî dê karibin bêfaiz ji krediya xaniyan isitfade bikin her weha ji ber peydakirina alav û navgînên tendurustiyê dê pahra têkariyê nedin ku ev guhertin bi tevkariya Serokatiya Xizmên Şehîd û Gaziyan ku girêdayî Wezareta Polîtikayên Malbat û Civakî ye çêbûye ku bi vê tevkariyê xalên derbarê mafên şehidan li Zagona Têkoşîna Dijî Terorê hatiye zêdekirin. Ev mizgînî di danişîna 3ê tîrmeha 2012an hatiye sererastkirin û bi vê sererastkirinê hevser, zarok, an du xwişk û birayên cerdevanên şehîdbûyî dikarin di sazîyên dewletên de dixebitin.

Di danişîna 7ê mijdara 2012an de parlementerê MHPê Enver Erdem mafê axaftinê xwest û got ku Zagona Şaredariya Bajarê Mezin dê destê Tirkiyeyê





lawaz bike ku îro pirsgirêkeke weke terorê heye ji ber ku bajarên ku li herêmê dê bidine bajarêmezin jandarma dê nikaribe li wan bajaran bixebitin û niyeta li dorê ya hikûmetê rûxandina pergalal cerdevaniyê bi xwe ye. Her weha gava ku karbidestiya avakirina saziya zabitayan ya bajarên mezin hebin wê ev yek weke istihdamkirina "terorîstên ku ji çiya dê dakevin" bibînin û bi vî awayî wê hêzên xweparastinê ava bikin. Erdem bi gotinên xwe yên "pêvajoya Osloyê ya ku ji we rakirina pergala cerdevaniyê xwest" hikûmet rexne kir. Di 8ê mijdara 2012an de jî parlementerê MHPê mafê axaftinê xwest û vesazkirina rêveberiyên herêmî bi vî awayî nirxandiye:

> "Dema ku şaredariyên Herêma Rojhilat û Başûrêrojhilat ên Anatoliyê bikevine bin kontrola partiyên ku bingeha siyaseta wan etnîkî ye, dê gundên cerdevanan ji xizmetên herî bingehîn ên dewletê jî nikaribin istifade bikin."

Di axaftina xwe ya danişîna 11ê mijdara 2012an de parlementerê MHPê Sadir Durmaz jî behsa heman endişeyên xwe kir:

> "... bi vê zagonê gund, eşîr, esnaf, û cerdevanên alîgirên dewletê dê li ber bextê şaredarên ku siyasete etnîkî dikin, bimînin? Hûn ê vana çawa biparêzin?"

Dîsa parlementerê MHPê Hasan Hüseyin Türkoğlu got ku ev zagon wê bike ku xizmet neçe gundên cerdevanan, riyên wan ên girtî venebin dê zextên terorîstan li ser wan çêbin. Ev gotin dike ku di navbera cerdevan û MHPê terorîst û BDP têkiliyekê nehênî biafirîne, ne bi awayekî rasterast dipejirîne ku heta niha cerdevanên li "herêmê" bi imtiyaz bûne û ji bo gundên ku nebûne cerdevan di xizmetbirina wan de dilsarî çêbûye.

### g. Nirxandin

Pergala cerdevaniyê ji sala 1985an vir ve ku sih sal bi ser derbas bûye ku ji aliyên hêzên çekdar û hikûmetan ve bi hevparî bi israr hatiye xebitandin weke navgîneke "têkoşîna li dijî terorê" û weke çareseriya pirsgirêka bêkariyê a herêmê hatiye binavkirin. Partiyên ku dema muxalefet bûn digotin divê ev pergal ji holê rabe dîtin ku piştî ew bûne iqtidar encax ew dikarin bi islahkirina pergalê ve mijûl bibin. Ev cudahî ji ber vê yekê pêk tê ku, rêxistina ku li hemberî wê şereke

kompleks tê meşandin li gorê artêşa leşkerî bi awantajtir e ku xwe bi awayê gerillayî vesazkiriye û ji ber ku partiyên siyasî nikarin zû biz û dev ji têkiliyên xwe yên bi eşîr û cerdevanan re danîne bedrin, her weha xwe nikarin derveyî daxwazên artêşê derkevin. Axir, cerdevanî gelek caran li herêmê bûye desteka herî girîng a avayîya leşkerî, îdarî heta ya aborîyê. Piştî damezrandin pergalê rakirina pergala cerdevaniyê ji ber van sedema hat rojevê: Gundî di cerdevaniyê de ne bi dil bûn. Cerdevan hewl didan dev ji çekan berdin. Cerdevan beşdarî sûcên wekî qaçaxçitiya çek û tiryakê dibûn. Li ser gelê herêmê zext û zordarî dikirin. Ji aliyekî dibû hedefa PKKê û bi vî awayî bêbandor dima li aliyê din jî bi hinceta ku alîkariya PKKê dikin dihatin cezakirin. Ji ber van sedema rakirina wê bê rojevê wê ji ber ku têkoşîna li dijî terorê berdewam dikir û nemaze destpêka 1990an asta wê pir bilind bûbû cerdevanî tim û daîm parçeyeke siyaseta hamasî bû. Li hêla din jî ji berdêla ku cerdevanî ji holê rabe xwediyê xwestekên islahkirina wê tîne bîra mirov ku bi hêdîka û bê zerar û ziyan dixwazin ji cerdevaniyê rizgar bibin. Têgiha islahê ev tê fêmkirin: bersivdana daxwazên cerdevanan nemaze ji bo bistexistina û başkirina mafên xweyî yên cerdevanan. Demekê cerdevanên ku xwedî erd û ajalan bûn û gava ku cerdevanî ji holê rabe ew ê nikaribin vegerine karê xwe û tirsa ku ji ber sûcên ku tev lê bûne dê rastî bertekên gelê herêmê bên, ev yek rê nade xelasiya bê deng û hêdîka. Em dikarin bibêjin ku ev gav ji bo "helandina" cerdevaniyê têne avêtin: Cerdevanên êdî nikarin ji bert emenê xwe an nexweşiyên xwe an jî yên gazî karê xwe bikin bêyî ku prîm bidin dikarin bibi teqawûd. Xizmên "şehîd"an dikarin tezmînatê bistînin an jî di saziyên dewletê de dikarin bibin karmend. An jî dikarin ji xizmetên tendurustiyê bê pere istifade bikin. An jî li karên weke ewlekarî, çandiniyê an di qadên din werin istihdamkirin. Ji bo vê yekê partiyên muxalif bi istihdamkirina li qadên din bi eşkere an veşartî bi israr in. Partiyên iqtidarê jî dixwazin ji ber hejmara cerdevanan, têkiliyên wan ên tevlihev weke bi artêş û dewletê re ber çavan bigirin û bi bêdengî awayekî nazikane ji rojevê derxînin.

Em dikarin bibêjin ku ji ber nêzikatiya li cerdevaniyê li meclîsê du kom hene, dgek ku hemû endamên partiyê ne weke partiya xwe bifikirin jî. Hêleke heye ku ku ew piranî ji parlementerên rastgir û muhafazakar û gellek caran jî partiyên iqtîdarê pêk tên ku ev hêl weha difikire: Cerdevantî pergaleke dîrokî ye saziyeke texilker e, her weha kesên ku ji nav wan de karên ne li rê dikin jî ne ewqas gellek in û derheqê wan kesan de teqez lêpirsîna hiqûqî dest pê dike. Divê cerdevan jî weke karmendan xwedî maf û misogeriyan bin û asta şehîdbûnê





divê mafê cerdevanan be jî. Li gor vê hêlê rewşa feodal a herêmê ji aliyê hebûna partiyên xwe û ji bo berjewendiyên dewletê rewşeke kêrhatî ye.

Ev hêl piranî ji kesên çepgir ên partiyên muxalîf in ku li çeperê mane ku ew ji roja damezrandina pergala cerdevantiyê heta îro gellek caran rexne li vê pergalê anîne. Ev hêl jî weha difikire: Bijartina cerdevanan û avayîya eşirtî ya herêmê ku pergal dike ku aliyekî bihêz be hin alî jî di nav bera xelîl û celîl de bin. Cerdevantî di bin navê dildariyê lê bi zorê tê kirin. Divê gel neyê bi çekkirin. Biçekkirina mirovan nikare bibe rêbazeke têkoşîna li dijî terorê. Ev yek li dijî makezagonê ye ku hîmên dewletê weke hiqûqî, civakî hatiye diyarkirin ku xebitandina mirovên dertomarî tê wateya ihalekirina xizmeta ewlekariyê ye. Her weha saziyên bi vî rengî dike ku di nava dewletê de çete çêbin û têkiliyên militer û otorîter bi xwe re bînin û ev yek jî bike ku bingeha binpêkirina mafên mirovan û bûyerên antî-demokratîk zêdetir bin. Eşkere ye ku nîqaşên çarçoweya derheqê cerdevantiyê bikin ku li ser demokrasî û mafê mirovan, têkiliya devlet û mirov, têkiliyên siyaset û artêşê û li ser pirsgirêka kurd hêlên cuda cuda derdixîne ku ev nîqaş û derketina van hêlan bi hev ve girêdayî ne. Hîmeke din a evqas eşkere ew e ku tehrîbata aborî, civakî, siyasî û wendahiyên cerdevaniyê ne. Lê ya ku ne ew çend eşkere ye sedemên domandina pergala cerdevaniyê bi xwe ye.

### Pêvek 1: Sererastkirinên ku li ser hevdîtinên pêşnûmeya zagonan di danişîna 27ê Gulana 2007an de hatin pejirandin û bûn zagon

Benda 2yê ya xala 74ê ya Qanûna gundan ya li 18.03.1924ê hatî çêkirin weke li jêr hatî nivîsîn hatiye nûkirin û li xala 4ê piştî hevoka "yên ji karê xwe cida bûyîn" li wê xalê hevoka " piştî mirina Cerdevanên demkî heke meaş(mehane) ji wan re bê dayin mafê wan kesên xweyî meaş yê meîne, tetkîk û karên saxkirinê heye û ev maf berdewam e" hat zêdekirin û ev xalên li jêr hat nivîsîn.

Li bajarên ku dê ji aliyê Lijneya Wezîran ve bê tespîtkirin; ku li gund an li derdora gund nîşaneyên tevgerên tundûtujîyê û sedemên ku pêwistiya Îlankirina Rewşa Awarte derdixîne holê peyda bibe û her ji çi be bila bibe bûyerên ku dê bibin sedema tecawîza can û malê gundiyan zêde bibin, bi pêşniyara Parêzgar û bi erêkirina Wezareta Karên Navxweyî bi qasî hejmara ku pêwîstî pê bê dîtin "Cerdevanên Demdemî yên Gundan" dikarin bêne peywirdarkirin. Hejmara cerdevanên ku bi vî awayî dê bên peywirdarkirin nikare 40.000 kesî derbas bike. Lijneya Wezîran dikare vê hejmara ji sedî pêncî zêde bike. Heke

sedemên peywirdarkirinê ji hole rabe û bêgaviyên idarî derkeve hema şêwaza peywirdarkirinê dikare ji bo dawîlêanîna peywirê jî bê bikaranîn. Her meh bi berdewamiya cerdevanên demdemî yên gundan bi qasî mêjera lêketina 11.500 reqema nîşanan bi qatjimara mehaneyên karmendan re derkeve hole meaş dê bê dayîn. Ev meaş bêyî bac an qutbûnek çêbe awayekî pêşîn tên dayîn. Ji bo serekcerdevanên ku ji nav cerdevanên demdemî, bi şertê ku ji sedî deh hejmara giştî ya cerdevanên demdemî derbas neke bê hilbijartin ji bo bi zêdehî ji sedî dehê meaşê cerdevanan meaş tê dayin. Ji bilî kesên ku rêgezên disiplinê li ser wan hatiye hukmkirin, kesên ku bi dil dev ji karê xwe berdane û kesên ku jiyana xwe ji dest dana ku ev kes meaşê xwe pêşîn standibin heqê rojên mayî ji wan kesan bi şûn de nayê xwestin... Heqê xwarin û vexwarina cerdevanên ku bi hêzên ewlekariyê ve derketine operasyonê ji bûdçeya saziya ku pê re derketiye operasyonê tê veqetandin. Cerdevanên ku ji ber peywirên ku di vê zagonê de hatine diyarkirin û felaket û karesatên xwezayî û rewşên awarte peywirên xwe bi awayekî serkeftî bi cîh anibin ev kes bi pêşniyara Parêzgar bi erêkirina Wezîrê Karê Navxweyî sale carekê bi du qatê meaşên xwe dikarin bên xelatkirin. Hejmara cerdevanên xelatgirtî di saleke malî de nikarin ji sedî bîst û yekê cerdevanên wî bajarî derbas bikin. Cerdevanên ku bi hêzên ewlekariyê re derketin operasyonan bêyî ku qutbûn û bac li ser wan bê fêrzkirin bi bi qasî mêjera ku bi lêketina hejmara nîşanî ya 400î ya bi qatjimariya meaşê mehane ya karmendan bê peydekirin tezmîneta pêvekî werdigirin. Kesên ku weke cerdevanî dixebitin ji ber ku ew ji Zagona Misogeriya Tendurustiyê û Misgoriyên Civakî ya bi jimara 5510 û bi dîroka 31.05.2006 istifade dikin, ji ber şaxên misgoreriyan ji bo demek kin an dirêj misoger nayên hesibandin. Hemû lêçûnên cerdevanên demdemî yên ku ji ber vê xalê derkevin ji terxaniyeke Wezareta Karên Navxweyî derdikeve û ji aliyê parêzgarên bajara ve tên belavkirin.

Li zagona bi hejmara 442an ev xalên pêvek hatine zêdekirin.

XALA PÊVEK 16- Cerdevanên ku temenê wan gihiştibe 55î ji kar tên dûrxistin. Kesên ji kar hatine dûrxistin ên ku ji panzdeh salan zêdetir xebitîr bin, heta ku sax bin ji Saziya Ewlekariya Sosyal ve bi qasî mêjera lêketina hejmara nîşanî ya 5000 bi meaşê karmendên meaş werdigirin. Ji bo her sala ku panzdeh salî derbaskiriye ji bo jimara nîşanî ya 5000î 200 lê zêde dibe lê bi vê lêzedekirinî ev hejmara tu carî 2000î derbas nake. Di hesibandina lêzêdekirina 200î de parjimara mehan jî weke meheke tam tê hesibandin. Ji bo her meheke parjimariya salan jî qasî ji dozdeh par yek bi lêketina hejmara nîşana ya 200î bi qatjimariya meaşên karmendan li meaşê tê zêdekirin. Li gor hukmên firqreya yekemîn Kesên ku li wan meaş hatibin girêdan jiyana xwe ji dest dabin û ên ku 55 saliya xwe tije nekiribin lê ji 15 salan zêdetir cerdevantî kiribin û di dema xebatê de jiyana xwe ji dest dabin ji bo hevserê van kesan dul ji sedî 75ê meaşê ku di hesibandina vê fiqrayê de derketibû weke meaş tê girêdan. Hevserên ku ji saziyeke ewlekariyê meaş digirin nîvê hesibandina vê fiqrayê tê girêdan. Hevsera/ê bî ku bizewice meaşê wê/wî qut dibe û ji bilî mirinê bi tu awayî cardin lê nayê girêdan. Ji bo hevserên cerdevanên ku ji sûcên terorê hatine mehkumkirin bi tu awayî ji bo wan an hevserên wan meaş nayê girêdan. Berî mehkûmkirinê ku meaş hatibe girêdan ew jî qut dibe. Ji bo cerdevanên seqet bo wan an jiyana xwe ji dest dabin bo zarok û hevserên wan heke li gor hukmên Zagona Derheqê Girêdana Meaş û Tezmîneta Neqdî ya bi hejmara 2330î ya bi dîroka 3/11/1980 meaş hatibe girêdan li gor hukmên vê xalê wekî din meaş nayê girêdan ên ku ji berê meaş lê hatibin girêdan jî li go hukmên vê xalê meaşê wan qut dibe.

XALA PÊVEK 17- Cerdevanên ku temenê wan gihiştibe 55î û ji 15 salan xebitîbîn an jî yên ku negihiştibin temenê xwe yê 55î; ji bo ên ji ber tendurustî an sedemên îdarî ji kar hatibin durxistin û yên jiyana xwe ji dest dane (ji xeynî kesên ku temenên wan negihiştiye 55î û ji 15 salan zêdetir xebitîbin û di dema ku li ser kar in jiyana xwe ji dest dabin.) bi qasî mêjera lêketina sala xizmetê ya bi hejmara nîşanî ya 20000 bi meaşê karmendan tezmînat werdigirin. Cerdevanên ku 55 saliya xwe tije nekirin û bi dilê xwe dev ji kar berdane bêyî ku li sala ku xizmet kirine bê nihêrtin bi qasî mêjera lêketina sala xizmetê ya bi hejmara nîşanî ya 20000 bi meaşê karmendan tezmînat werdigirin. Di hesibandina tezmînetê dema xizmetê ji salekê kêmtir be ew jî salek tê hesibandin. Ji bo demên ku ji salekê zêdetir in; parjimariya mehan tam tê hesibandin û bi wê nisbetê tezmînat tê dayin. Cerdevanên ku mafê tezmînatê wergirtibin û jiyana xwe ji dest dabin tezmînata wan ji aliyê mîratxwirên wan tê standin. Ji bo tezmînatê bac û qutbûn pêk nayê. Li gor hukma xala pêvek a 16. Kesên ku ji ber disiplin hukm li wan hatibe pêkanîn ew kes li gor hukmên vê xalê tezmînat nagirin. Ji bo hevser û zarok ew nebin dê û bav ew nebin xwişk û birayên cerdevan bi qasî mêjera lêketina hejmara nîşanî ya 15.000î ya bi qatjimariya meaşê karmendan bêyî ku bac an qutbûnek bê pêkanîn alîkariya mirinê tê dayîn. Ji bo cerdevanên seqet bo wan an jiyana xwe ji dest dabin bo zarok û hevserên wan heke li gor hukmên Zagona Derheqê Girêdana Meaş û Tezmîneta Neqdî ya bi hejmara 2330î ya bi

dîroka 3/11/1980 meaşên seqetî, bîyî an sêwîbûnê hatibe girêdan li gor hukmên vê xalê wekî din tezmînat li wan nayê girêdan kesên ku ji berê de li gor hukmên vê xalê tezmînat wergirtibin tezmînata ku girtine li gor hukmên Zagona bi hejmara 2330î ji tezmîneta neqdî tê qutkirin. Sencandinên xala 16. a pêvekî bi destê Saziya Ewlekariya Sosyal tên kirin û piştî sencandinê du meh derbas bibe ji Hezîneyê tê tehsîlkirin.

XALA PÊVEK 18- Li ser şêwaza peywirdarkirina cerdevanên demdemî û yên serekên wan, cezayên discipline, peywirên wan, şertên destpêkirina wan, rewşa ku dive ji kar bên dûrxistin, amîrên wan ên discipline, alîkariya cil û bergan, rêbaz û şêwazên perwerdehiyê, destûr û sicîlên wan, şertên tenduristiyê ya di destpêka tendurustiyê, mafê xebitînda di karekî din û pêkanînên hîmen din ê di derbarê vê zagonê de, rêvebirnamyek bi nêrînên Wezareta Parastina Neteweweyî û Wezareta Darayî ji aliyê Wezareta Karên Navxweyî ve bê amadekirin û piştî weşandina vê xalê bi 6 meh derbas bibe dê ji aliyê Lijneya Wezîran ve bê derxistin.

Di Zagona Têkoşîna li Dijî Terorê ya bi dîroka 12/04/1991 û bi hejmara 3713 di xala pêvek 1 di fiqreya (A) di paragrafa ewil de ev guhertin pêk hatiye ku; ji dêvla "% 0,5'î" dê bibe: "% 0,7'î" û di benda (a) ya heman fiqrayê benda (a) ya fiqraya (B) yê "[Peywirdarên Dewletê yên şehîdbûyî, an qasî ku nikaribe bixebite seqet ketine] û leşker ve serleşker hebe jinên wan nebe zarokekî wan ew jî nebe ji xwişkek an birayekî wan weke, "leşker û serleşker û cerdevanên demdemî [û dildar] li gor pêşaniya cerdevanan hevser, zarok an yek ji xwişk û bira hatiye guhertin.[11]

Piştî gotina "hikmên 168ê" ya li benda (b) yê ya xala 15ê ya Qanûna Saziya Parastina Civakî hatî nivîsîn li Qanûna Gundan li xala lêzêdekirî (pêvek) ya 16 û 17ê destnîsankirina "mesrefên dayinê" hatiye zêdekirin. Li wê dema ko ev qanûn dê ji bo birêvebirinê dest bi bikarnîê bike;

a) Li gor qanûna li 18.03.1924ê hatî çêkirin ya Qanûna Gundan a 442yê û li gor guherîna lê hatî kirin ya 74ê ya ko lê hatiye eşkerekirin ko hejmara wan nayê guhertin, çênabe ko cerdevanî bê xelas kirin.

b) Cerdevanên demkî yên ko ji ber dagirtina emrê xwe yê 55 salîyê dê teqawît bibin, ji bo wan kesên ko di nêvbera 10 û 15 salan de kar kirine, li gor hejmara eşkerekirî ya 5000ê û li gor xala lêzêdekirî ya Qanûna Gundan ya 442yê mehane ji bo Cerdevanên Demkî mehane meaş tê dayin. Ew Cerdevanên Gundan yên ko 55 saliya xwe temam kirine lê belê 10 salan nexebitîne, heger ko





bixwazin dikarin 10 salên karkirina xwe temam bikin û paşê li gor qaîdeyên li jorê teqawît bibin. Ew Cerdevanên Gundan yên ko 55 saliya xwe temam kirine lê belê 10 salan nexebitîne, heger ko nexwazin zêdetir bixebitin, ji bo wan biryarên xala lêzêdekirî ya 17ê ya di Qanûna Gundan de tên pêk anîn.

c) Ew Cerdevanên Gundan yên ko 55 saliya xwe temam nekirine heger ko bixwazin dikarin heta temamkirina 55 saliyê bixebitin. Piştî wê dema ko ev kanûn ji bo birêvebirinê hat bikaranîn û pê ve, ew kesên bûne 55 salî lê belê 10 salan li karê xwe nexebitîne, heger ko bixwazin dikarin heta temam kirina 10 salên xebatê bixebitin, ji bo wan kesan jî biryarên di benda (b)yê de tê pêk anîn. Ew kesên ko li ber biryarên di bendên (b) û (c) yê dikevin û ji ber wê jî li gor biryarên xala lêzêdekirî ya 16ê ya Qanûna Gundan ya 442yê meaşan distînin li gor biryarên xala lêzêdekirî ya 17ê ya Qanûna Gundan ya 442yê tezmînatê nastînin.

Ji bo pêk anîna van biryarên li jor li wê rewşa ko êdî pêwîst nebe ko ew kesên li gor xala guhertî ya 74ê ya Qanûna Gundan ya 442yê dixebitin karê xwe dom bikin an jî ji bo hewceyîya birêvebirîyê ne asteng e ko ev kar bikare bê qedandin.

### 2. Di çapemeniyê de cihê cerdevaniyê: 1987 – 2013

Li vê pişka xebatê bi awayekê kronolojîk hinekê li medyaya serdestan û hinekê li medyaya mixalifan, li nûçeyên di rojname û heftenameyên wan de û di kovarên wan de hatine belavkirin hatiye nêrîn û her dîsa li vê pişka xebatê li ser meseleya cerdevaniyê lêkolîn hatiye kirin ka li medyayê çawa cih girtiye. Her çende carinan ji bo yekgirtina mijarê ne li gor kironolojîya wan hatibe rêzkirin jî pirsa gelo di çapemeniyê de çawa behsa cerdevaniyê hatiye kirin li ser nivîsên dîroka weşana wan nêzîkê hev hatiye kirin. Digel wê yekê ko wek-hev cih ji çapemeniya serdestan re û ji çapemeniya nemaze nêzîkê kurdan re ne hatiye cida kirin jî ji ber ko di pişka didoyê de ( di çapemeniya nêzîkê kurdan de ) zêdetir ji mijara berbehs re cih hatiye cidakirin wekhevî ji bo milê pişka yekê nekariye bê parastin û pirhejmariya nivîsan bi ser milê pişka didoyê de çûye. Li wan nivîsên hatîn lêkolandin yên di rojname û kovaran de, da ko eynî mijar nayê carîkirin, nemaze ew nivîsên mijarên eşkere ho baş beloq kirîn hatine bijartin. Ji bilî îstisnayan li ser nûçeyan şîrove nehatine kirin şîrovelêkirina giştî li dawiya pişkan hatiye nivîsîn. Bi vê yekê re hinek mijarên balkêş bi rêya ko ew li sernivîsan

bêne bicihkirin ew hatine berçavkirin û bi vî awayî jî binsernivîsin li gor demî hatine rêzkirin. Ev binsernivîsên he bi wî awayê ko kronolojîya nivîsan neguhere guhertinên mihom li gor temaya wan hatine beravkirin û hatine nivîsîn.

**a. "Bijartineka ji bo welatiyan":**
**Salên pêşiyê yên destpêka cerdevaniyê**

Di nûçeyeka li heftenameya *Yeni Gündem*ê ya rojên 15-21ê sibata sala 1987ê de, ne bi tenê agahiyên komkujîyekê heye analîzeka cerdevaniyê ya li ser talankirina civakî ya bi salan jî heye. Li wê nûçeya berbehs hatiye nivîsîn ko çekdarên PKKyê li ser du malên cerdevanan yên li Gundê Kortîyê (Gündikkörti)[12] yê Navçeya Midyadê ya Bajarê Mêrdînê girtine û deh kesên çar ji wan zarok kuştine û her li wê nûçeyê hatiye nivîsîn ko xwîndariya di navbera wan kesên PKKyî, wan kesên nebûyîn cerdevan, cerdevan û dewletê de çêbûye: ew kesên nebûyîn cerdevan û ew kesên PKKyî bûne alîyek û ew kesên bûyîn cerdevan û dewlet jî bûne alîyê dî û ev dijberîya xwîndariyê geş dibe.

Ev rewş welê ye ko cerdevanekê ko li biserdegirtinê de kesên ji malbata wî mirine dibêje ew kesê niho "PKKci" (PKKgir) berê "zelamê xwîndarên wî" bû û ho dibêje:

> "Ez dizanim ko ji ber çeka dewletê (dewleta Tirkiyeyê) ew şer li gundê min çêdibin lê ez ne jovan im. Ez ê dîsa arîkariya dewletê bikim... Serleşkerî soz daye ew ê bîst çek dî jî bide vî gundî. Her kes ê ji bo dewletê şerî bike."

Nivîsa Ümit Sezgin û Mehmet Şenolî bi vî awayî xelas dibe:

> "Gelo niho li devveyê bajaran dewletê li dijê PKKyê civak welatî dane pişta xwe? Gelo PKKyê? Gelo PKK jî bi wan kesên ji ber zordariyên dewletê xwe avêtine ber bextê wan, "bi wan kesên dilmayî" re dê berweda bike "civakî."

Heger mirov ji bo bersiva van pirsan nebêje "belê" mirov ê bi zehmetî bizane ka çima eve sih sal in sîstema cerdevaniyê dom dike.

*Hasan Cemal*î li rojnameya *Cumhuriyet*ê, li 24ê sibata 1987ê, li ser biserdegirtina PKKyê ya li Gundê *Taşdelen*ê yê navçeya *Uludere*yê ya *Hakkari*yê li hin şîrove kirine û nivîsîye ko pênç biserdegirtinên paşiyê li ser malên cerdevanan





hatine kirin û dîyar kiriye ko ev nabe nîşanê wê yekê ko sîstema cerdevaniyê di rê de ye û astengkareka rêlibergira kirinan e. Rojnameya berbehs li hejmara xwe ya piştî wê rojê cih daye rexneyên li ser sîstema cerdevaniyê yên li dijî hikûmetê yên serokê *SHPyê Erdal İnönü*yî, seroka DSPyê *Rahşan Ecevit*ê û serokê DYPyê *Hüsamettin Cindoruk*î. Heftenameya Yeni *Gündem*ê li hejmara xwe ya hejmara 1-7ê Adara 1987ê cih daye nûçeya li jêr ya bi rexneya cîndorokî dest pê dike.

> "Şerê di nêvbera dewletê û eşqiyayan de êdî bûye komkujîya hinek welatîyên me. Ev qirkirina nijadan e... Xeletiyên dewletê mirovên bêsûc dikuje."

Her li vê nûçeyê hatiye nivîsîn ko ji sala 1985ê, ji sala cerdevaniyê dest pê kirî û pê ve ev rexneyên bi vî awayî têne kirin, li nûçeyê hatiye destnîşan kirin ko parlamena pêşiyê, parlamenê bi binasê -ji ber piştî şerî gêre-vêre û heydedana dest pê kirî rê daye hinek kesên bixwazin wê rewşê ji bo mexsedên xwe bikar biînin û dewletê jî têra parastina civakê hêz nemaye ew piştgirîya civakê distîne- ev sîstem bi kar aniye tê zanîn ko ev rewş heta parlamenê li sala 1923yê yasaya "İzale-i Şekavet" derêxist dom kir lê belê li sala 1962yê parlamenê biryar da ko hem ev sîstem ne li gor Qanûna Esasî ye hem jî êdî dewlet ne mecûrê vê sîstemê ye û wê cerdevanî rakir. Tê pirsî gelo piştî 23 salan, piştî ko hêzên ji polîs û eskeran hatîn xurtkirin jî gelo çima hewce hatiye dîtin ko ev sîstem dîsa bê. Tê gotin ko li destpêkê ceredevan ji ber ko rê û rêbarên herêmê dizanine hatine bikaranîn lê paşê gilîyên welê hatin kirin ko dewlet da ko cerdevan pereyên xwe heq bikin di karên wek sîxurîyê de jî hatine bi kar anîn û ew çekên xwe ji bo mexsedên rayedarên dewletê jî bi kar tînin. Welê tê gotin ko kardayina cerdevanan ne li gor yasayan hatine kirin û ka kî û kîjan gund dê bibin cerdevan bi daxwaz û li hev hatinên di nêvbera cendirme, serokên eşîran û mixtaran de hatine kirin. Li wê nûçeyê ev gotinên Abdürrrezak *Ceylan*ê wekîlê Sêrtê yê *DYP*yê heye.

> "Di nêvbera malbata terorîstekê bi destên cerdevanekê hatî kuştin û malbata cerdevanê ew terorîst kuştî de xwîndarî çêdibe. Lê belê dema ko eskerên dewletê wan eşqiyeyan dikujin tiştek welê çênabe."

Li wê nûçeyê hatiye gotin ko PKKyê li destpêkê peyam ji gundiyan re rêkirine û bi wan peyaman gotine "nebin cerdevan" û ew tehdît kirine paşê jî

PKKyîyan rasterast bi ser gund û malên wan kesên bûyîn cerdevan de girtine û bi vê yekê jî hejmara sivîlan zêdetir bûne. Her dîsa li wê nûçeyê hizrên Wezîrê Nêvxweyî, Yıldırım Akbulutî jî heye ko ew dihizire ko ev rikberîya di nêvbera PKK û malbatên crdevanan de dest pê kirî yek ji nîşanên wê yekê ye ko cerdevanî rêlibergireka PKKyîbûnê ye. Li wê nûçeyê hatiye eşkerekirin ko piştî mirina 35 kesan bikujên wan hê jî nehatiye/nehatine girtin û ew rêlibergirtina berbehs biguman e ka ew rêbergir e an na. Ya rastî pirsa Cindorokî wek kurteyeka wê nûçeyê ye:

> "Heger ew kesên miletî xwe biparêzin ew çi hewceyî heyina dewletê ne."

Mehmet Ali Kışlalıyî li qunciknivîsa xwe ya li Rojanameya Milliyetê ya 28ê Hezîrana 1987ê, ji bo wan kesên dixwazin sîstema cerdevaniyê rabe û ji bo mixalefeta parlamenê ho gotiye " ji ber ko wan têra xwe binasê rakirina cerdevaniyê li gotinên xwe zêde nekirine mirov nikare hizrên wan baş fêm bike û li ser wan minaqeşeyan bike." Wî gotiye Rojhilata Biçûk bi salan bêsemyan hatine hêliştin û ji bo parastina sîstemê ev gotinên xwe gotine:

> "Iha nûka dewlet li gelek Gundên Rojhilata Biçûk bi xêra cerdevanan tê temsîlkirin. Ji bo wan welatiyên gundî cara pêşiyê ye ko bijartinek tê çêkirin. Gelo bila ew hêza dewletê ya bi cerdevana tê temsîlkirin bibijêrin an jî bila ew weke ji berê dîsa hêzên çeteyên cidaxwaz bigirin? ... Dewlet zorî û xurtiyê li ti gundan li ti miletiyan nake ... ew kesên miletî bi daxwaza xwe diçinê."

Ew *Kişlalı*yê ko di nêva du agiran de hêliştina gundiyan wek bijatinekê dibîne, -bi gotineka herî nerm- mirov dikare bibêje wî teqîp nekiriye ka rexneyên li ser cerdevanıyê çi ne. welê ko li wê rojnameya ew bi xwe lê dişixule, li Rojnameya *Milliyet*ê li nûçeya *Yurdakul Fincancı*yê nivîsî hatiye gotin ko cerdevanên gundan gotine ew bi zordariyê bûne cerdevan û ew kesên bûyî cerdevan yên ax û zeviyên wan nînin jî cerdevaniyê wek rêyeka pere peydakirinê dibînin. Ew nûçeya *Yurdakul Fincancı*yê bi vî awayî dom dike:

> "Nemaze ji bo wan malbatên xwîndarên hev in an jî ji hev kîndar in cerdevanî ji bo vê ji hev qetiyanê bûye agirê girtî pûşîyan. Li nêv van malbatan ew malbata ko çeka dewletê digire li ser malbata dî jê dilmayî serdet dibe. Ji bo ko ew malbata çeka dewletê nerakirî xwe li ber malbata dî ragire dibe sîxurê dildar(milîs) yê PKKyê... Welê dixwehî ko feydeya cerdevaniyê ew e ko baregehên PKKyê ne ji derveyê gundan dihêle û hew. Lê belê cerdevaniya gundan tê wê meineyê ko ew kesên gundî bê hir ve û wê ve li dijî PKKyê ne û ji ber wê yekê heger ev pêşqebûl rast be feydebûna cerdevaniyê dikare rast be."





Ev tespîta paşiyê, gotina Kışlalıyî ya temsîliyeta dewletê li gundan bi rêya cerdevanan tê kirin, welê dixwehî ko betal dike. Weke dî jî wek tê texmînkirin û ji nûçeya Kovara *Nokta*yê ya 18.10.1987ê tê zanîn ko cerdevanî ne tişteka welê ye ko "miletî bi keyfa xwe biçinê." Li nûçeya *Nokta*yê tê gotin ko li Navçeya Liceyê ya Bajarê Diyarbekirê li 56 gundan ji ber ko gundî bi zorê hatiye kirin ko ew bibin cerdevan wan gundê xwe vale kirine. Wan kesên dîtî bi xwe gotine ko Serleşkerê Qereqola Liceyê *Murat Odabaşî* gotiye "bêjin gundiyan bila ew bi delalî bibin cerdevan an jî em ê bi zorê wan bikin cerdevan" ew bi xwe çûye li meydanan gundî kom kirine û bi zorê navê wan nivîsîne û li wan kesên nebûyî cerdevan jî daye.

### b. "Destûrname" û "karkerê kargeha pere peydakirinê ya bêhilberîn": Belavkirina Cerdevaniyê

Celal Başlangıçî li Rojnameya Cumhuriyetê ya 23.08.1987ê, behsa wê yekê kiriye ko ji ber li navçeya Uludereyê ya Hakkariyê du eşîret bi çekên cerdevanan û yên "bidestûr" li hev ketine, Goyan rêya Jîrkan girtine û Jîrkan jî ava Goyan girtiye, bi vê sebebê jî ew kesên ji eşîra Jîrkan wek alîgirên dewletê û ew kesên ji eşîra Goyan jî wek alîgirên PKKyê dixwehîn, wê nivîsê bal kişandye ser wê yekê ko ev şerê bi çekên dewletê hatî kirin ji bo xeterîyên sîstema cerdevaniyê hişyarkirinek e. Wî li nivîsa xwe ya li dema 25.08.1987ê de nivîsî gotiye ko li biserdegirtina PKKyê ya li Milan û Pınarcıkê gelek cerdevanan fîşekên xwe bi kar neanîne û ti kes nekuştine jî ew hatine kuştin û li ser vê yekê dipirse gelo cima û ji ber çi ev kesên ne şarezayên bikaranîna cekan jî welê tê kir Ahmet Kahraman in ko bibin cerdevan. Her dîsa wî li nivîsa berbehs rexne li wê yekê kiriye ko ew kesên ketîn şerê bi PKKyê re û nemirîn bi tenê ji ber ko ew sax mane dewletê guman ji diristiya wan biriye û ew kirine di girtîgehan de.

Hejmara 10.01.1988ê ya Rojnameya Cumhuriyetê cih daye rexneyên parlamenterê SHPyê, Mehmet Kahramanî yên li ser "destûrname"dayina çekan. Mehmet Kahraman dibêje bi destûrdayina çekan hejmara çekên li dijî

cerdevanan zêde dibe, çekên axa û serokeşîran bidestûr dibin û bi vê yekê serdestiya wan a li ser feqîran mezintir dibe û ev yek rêya kaçaxçîtiyê jî xweş dike. Ahmet Kahraman li hejmara 10.03.1988ê ya Rojnameya Milliyetê dibêje ko yên herî zêde dixwazin bibin cerdevan "ew kesên bi sabiqe, yên xwîndar, yên eşqiya, yên axa û yên serokeşîr" in, ew li nivîsa xwe dibêje ko serokcerdevanî bi mirovên xwe yên "tewanbar" re li nêva kolaneyên bajarî bi kontoxeya ceka xwe li mirovekê ew jê aciz daye. Li gor nûçeya Mehmet Faraçî ya di 17.05.2013ê li Rojnameya Milliyetê, mixtarên pênc gundên bi ser Birecika Şanlıurfayê, ji bo Walîtiya bajarî gilîname nivîsîne û bi gilînameyan gotine ko " cerdevan hizûra di nêvbera eşîretan de xera dikin. "

Dikeve di serê mirovan de digel ko li Şanlıurfayê pêkanînên sîstema Halê Awate hebû û li gor gundiyan " ti dengên dijber derneket" jî gelo çi karê cerdevanan li wê derê hebû.

Rojnameya Cumhuriyetê ya 31.05.1988ê daxwuyaniya Waliyê Herêma Di Halê Awarte de yê Hayri Kozakçıoğlu ya ji bo birêvebir û rojnamegeran re belav kiriye, ew di daxuyaniyê de ho dibêje:

> "Êdî cerdevanî bûye sîstemaka welê ko cerdevanî bi dildarî tê kirin û êdî welê ye ko xelk xwezîya xwe bi wê tînin... Cerdevanî ne bi tenê ji bo parastina herêmê ye her dîsa ew rêyeka perepeydakirinê ye jî. Li herêmê problema kardîtinê heye. Em li vê derê mehane 125 lîreyan didin her cerdevanî/ê. Dema ko em danin ber hev em ê bibînin ko ev kar ji karkeriya di fabrîqeyekê de çêtir e. Me îro rêyeka perepeydakirinê ya parastina herêmê dike, peyda kiriye."

Gelek qedir ji bo hizra *Hayri Kozakçıoğluy*î tê dayin ko ew sîstema cerdevaniyê wek rêyeka perepeydakirinê dibîne. Gotinên wî yên ko piştî du salan wî bi rojnamegerên *İzmir*ê re kirî di Rojnameya *Milliyet*ê ya 12.06.2013ê de cih digire. *Kozakçıoğluy*î gotiye ko di halê hazir de 21 hezar û 480 cerdevanên gundan hene, ji bo wan mehane 10.5 milyar lîra tê dayin, pênc hezar kes dî jî dixwazin bibin cerdevan lê me ne nîyet e ko em hejmarê zêde bikin û ho dibêje:

> "Cerdevanek, niho ji karkerekê çapemeniyê yê bêwesif zêdetir distîne. Heger em mesrefên wan ên wek arîkariya xwarin, cilik, fîşek û bimbeyan jî li mesrefê zêde bikin dibe gelek mesref. Niho halê cerdevanan gelekê xweş e, hita ko hinekan jina xwe ya didoyê jî anine. Ev pereyê ev kes distînin aboriya herêmê geş dike. Ji me re tê gotin 'gelo li şûna hûn 150 milyar pereyan bidin wan hûn ji wan re fabrîqeyan biçêkin ne çêtir e.' Ya mihom ne 20 hezar cerdevan in. Heger ez bixwazim ez ê li şûna wan 20 hezar esker biînim, ez dikarim bi wan pereyan baştir jî eskeran xweyî bikim. Lê divê zikê miletîyên herêmê têr bibe."





Kirinên Kozakçioğluyî yên paternalîst jî eşkere dike ko mexseda bingehîn ya çekrakirina cerdevanan ne ewlehî ye.

### c. Mayindebûna "di nêva du agiran de" ya "çerxa cerdevaniyê": Mayindebûna demdemî, mecbûrîtiya dildarî

Her dîsa paşê dê bihatiya dîtin ko ew nikarin cerdevanan bisekinînin ko ew çekên xwe nedanin. Li hejmara 06.08.1989ê ya Kovara 2000'e Doğruyê di rapora Cudiyê de çîroka çekdanîna cerdevanan bi vî awayî tê gotin:

> "Cerdevanên paşiyê jî yên *Mahmuran* ên *Beytüşşebap*ê ji bo ko çekên xwe danin daxwaz dane rayedaran. Lê belê serokesker qebûl nake ko ew dest ji çekên xwe berdin, û ew dibêje ' ev welat êmanetî we ye. Heger hûn nebin kî dê van deran biparêzin.' Lê belê ew kesên gundî ji ya xwe nayên xwar, ew dibêjin: ' willehî serokeskerê min, ya rastî ev welat êmanetî we ye. Ji xwe hûn esker in. em ên reben gundiyên ji rêzê ne. Ji ber wê yekê çekên me bistînin. An na jiyana me dê biherime."

Li gor wê nûçeyê, piştî ko eşîreta navdar a Jirkiyan, bi binasê ko ewlehiya wan nîne çekên xwe danîn nîşana wê yekê ye ko gundî û dewlet ji hev dûr ketine. Hatiye destnîşankirin ko cerdevan dixwazin xwe ji çekên xwe xelas bikin û dewlet jî navegire û PKKyê jî ev yek zaniye û cil û bergên eskerî li xwe kirine û sîlehên cerdevanan kom kirine. Her dîsa li wê kovarê di hejmara 08.04.1990ê de, di nûçeya bi sernivîsa " Çavkaniya Çekên PPKyê" de, lîsteya çekan hatiye nivîsîn. Li gor wê nûçeyê PKK çekên dewletê bi zordariyê dayî cerdevanan an bi zordariyên an jî bi cil û bergên eskerî bi rihetî kom dike, dewlet jî wan cerdevanên cekên wan ji destên wan çûyîn ji ber ko wan li ber xwe nedane ceza dike, hinek cerdevan jî serokê qereqolê tehdît dikin ko dibêjin em ê jî çekên xwe bidin PKKyê.

Bülent Ecevitî ji bo Kovara Noktayê raporek li hejmara kovarê ya 15.10.1989ê li Rojhilata Biçûk hevpeyvîn kirine û çavdêriyên xwe bi vî awayî nivîsîne:

> "Her çi hatibin kirin jî sîstemeka kêrhatî û têra parastina ewlehiyê bike nehatiye danîn. Li piraniya deran li hemberê terorîstên bi salan perwerdeya gerîlatiyê standîn cerdevanên bê tecrûbe an jî peyadeyên hima çend mehekê pewerde standîn têne derêxistin. Cil û bergên wan jî têra xwe ecêb in... Ne eşkere ye ka kî esker e, kî cerdevan e, kî endamê parastinê ye û kî ji "hêza taybet" e... Her kes çûye di qalikê yê/ya dî de... Ew kesên miletî jî dema ko li serê ciyayan ciwanekê rihê wî dirêjbûyî, yê bêserûber bibîne nikare ji hev ferq bike ka ew kes ji kîjanan e."

Xuyaye Ecevitî jî ferq kiriye ko mirov bi tenê ne bi cil û bergan dost û dijminan ji hev ferq dike, ji ber wê yekê li paşiya nivîsa xwe bêçaretî û ji-halê-xwe-westiyana miletiyan bi van gotinan, dîyar dike:

> "Tişta herî xerab jî ew e ko ji ber binpêbûna rûmeta miletîyan, li paşxaneya hişê wan ew tişta li pisîkolojîyê wek 'bêrîkirina mirinê' tê binavkirin cih girtiye."

Li 22.10.1989, di beşa duyem a rêzenivîsê de, zêdetir li ser cerdevaniyê sekiniye û rexneyên xwe bi vî şeklî bi lêv kiriye:

> "Ji vir û 84 salên berê, Sultan Abdülhamit serokên eşîran anîbûn ba hev, hêzeke herêmî ya bi navê Hamidiye Alayları bi wan dabû damezirandin, û vê hêzê nikaribû herêm biparasta, bi ser de bûbûn belayê serê gel, pê re jî bingeha nîv-feodal ya herêmê bi hêztir kiribûn. Îro, di dewra komarê de "Hamidiye Alayları" li herêmê ji nû ve xwe bi cîh dike. Ez çend hefte ne, ev cerdevaniya ku desthilatdariya şexsan, koman, polan bi hêztir dike û meriv ji ber fedî dike bi gilî û gazincên xwe bi lêv dikim. Ew ji bo parastinê ye qaşo, ji bo dewletê jî ji bo gel jî talûkeke ji PKKê yan ji terorîstan mezintir e."

Ecevîtê ku dibê kesên cerdevaniyê dipejirînin dibin "xayinê welêt, şîrik" û kesên napejirînin dibin hedef, bi vê gotinê re tesbîtê xwe yê li ser gelê ku di mabeyna du aliyan de mayî dubare dike.

Celal Başlangıç, li 04.12.2012ê, li rojnameya Cumhruriyetê, di nûçeya bi sernivîsa "Notên Ji Başurrojhilatê" de, dîsa balê dikşîne ser grî-rengên di cerdevaniyê de û nêrînên ku li ser fikrên wek cerdevan bi kêfa dilê xwe çekan hildidin yan jixwe "alîgirên dewletê" ne pûç dike. Di nivîsa berbehs de, Celal Başlangıç, behsa cerdevanên Gürpınar, Bahçesaray, Çatak a Wanê û gundiyên ku serokeşîrên wan bûnî cerdevan dike, ev însanên berê bi kamyonan diçin





Wanê û paşê di wir re jî koçên xwe bar dikin diçin bajarên mezin ên rojhilat û başûrê Tirkiyeyê, li van deran boş belaş bi erzanî heywanên xwe difroşin, li ciyên ku xwe lê girtine û çûnê tî û birçî dimînin, dîsa li gundê xwe vedigerin lê gava ku vedigerin gund ji bilî cerdevaniyê ti riya debarê ji wan re namîne, ew tişta jî dîsa dibe "çerxa cerdevaniyê" . Di nivîsa xwe ya li 11.01.1990ê jî behsa gundiyên Taşdelana Uludereyê ya bi ser Hakkariyê de dike ku ew jî xwe amede dikin ku ji ber zext û zordariya PKKê ya sê salên berê, îcar jî ji ber "jiyana qedexe" û zext û zordariyan, berê xwe bidin Iraqê, ew welatê ku hemneteweyên wan sal nîvek berê bi çeken kîmyewî qetil kirine. Di vê nivîsê de Başlangıç, behsa sohbeta xwe ya bi eskerên ku ketin-derketinê gund kontrol dikin re kirî dike, ko di wê kêliyê de parlementerên SHPê Cumhur Keskin û Fuat Atalayê ku xwe wek parlementerê ANAP û DYPê nasîn dane û ev tev li hêviya destura fermandarî bûne. Li gor gotina eskerî, tevahiya gund PKKlî ne, û bi şev jî derketina sûkan qedexe ye, ji ber wê jî ku çi dilive gulebaran dikin, di şevekê de deh hezar gule diqedînin. Li gor gotina gundiyên Taşdelenê jî, gundiyên ku li dijî "jiyana qedexe" nikarin zêdetir ber xwe bidin gundê xwe terk dikin, gundiyên mane jî ji ber ku cerdevaniyê napejirînin nasnameyên wan ji dest wan hatine girtin û esker nahêlin ku ev derkevin derveyî gund. Dîsa li gor gotina gundiyan, gundî tenê ji çar paran pareka erdên gund bi kar tînin, çiku sê parên din tevde bi mayîn in. Divê gundî mehê carê bi qasî barê sê qantiran êzing bibin qereqola jandarmayê, piştî ku dinê tari dibe, gundî nikarin biçin tûwaletê jî, ji ber ku esker çi tiştê ku dilive dibîne guleyan li ser direşîne, ev tişta jî xwe rast derdixe.

Li 23.05.1991ê di nûçeyeke li rojnameya Milliyetê de, Walî Adnan Darendeliler li Çataka Wanê bi cerdevanên ku ji şexsî walî re dibên "Walî Paşam" û dibên "Em nahêlin a wa beytikek jî di vir re bêyî me derbas be. Bêyî ku me hay jê hebe, bi şev kes nikare di vir re derbas be. Ku kî derbas be em ê guleyan bi ser de bireşînin." re sohbet dike û ji cerdevanan dipirse "Ku ez jî bi şev werim vê navçeyê, hûnê guleyan bi ser min de jî bireşînin?", cerdevan dibên "Ji ber ku em ê nikaribin te di tariyê de nas bikin em ê guleyan bi ser te de jî bireşînin". Ev bersiva, nîşan dide ku cerdevanan çawa gelek kes "bi şaşitî" kuştine, ew kesên kuştî wek "terorist" bi nav kirine û ew şaşitiya wek "serfiraziyek" li deftera xwe nivîsîne.

Celal Başlangıç, di nivîsên xwe yên dî yên li rojnameya Cumhuriyetê behsa koçkirina gundiyên Eruh, Beytüşşebab, Çukurcayê yên di mabeyna di agiran de manî dike û di ser "parastvanê" ku terorîstan wek masî û gelê li herêmê jî wek

aqwaryûmekê nîşan dide re li ser qest û mabesta valakirina gundan a ku rê dibe ser tinekirina avê disekine. Dîsa, meriv dizane ku bi vê tinekirinê re wê hinek pirsgirêkên din ên nû çêbibin. Li hêjmara 23-29.06.1991, li rojnameya Yeni Ülke, nûçeyek di derheqê hinek gundên Mêrdîn, Diyarbekir û Cîzirê heye ku gundiyên van deran biryar dane ku ewê bi cerdevanan re rûnenin û tiştekî ji wan nekirin û nefroşine wan, ewên ku tiştekî xwe nafroşin cerdevanan jî ji aliyê eskeran ve hatine binçavkirin, esnafên din ên ku li dijî vê yeke nerazîbûna xwe nîşan dane jî anîne derebeyên dikanên xwe danîne. Dîsa di eynî rojnameyê de, li 22-29.09.199 û 6-12.10.1991ê, nûçeyên bi sernivîsên "Cerdevanî hildiweşe", "Cerdevanî lekeyeke reş e" hatine weşandin de li ser belayên têne serê cerdevanan û belayên ew derdixin, îstîfayên ku herku diçe zêdetir dibin û nerazîbûna dewletê ya li dijî vê yekê sekinîne. Ev gotinên cerdevanekî, kurt û kurmancî her tiştî nîşan dide:

> "Herku me miaş distand, me dizanibû ew pereya pereyê xwîna dirijê ye, em li ber diketin. Him min fedî dikir him jî ez ditirsiyam. Min li gund nedît ku yek vî îşî dike û ji halê xwe razî ye."

Li hêjmara 15-21.12.1991ê, tê gotin ku îstîfayên cerdevanan yên ku ji Adarê pê ve didomin bi hatina dawiya "dema bexişînê" re zêdetir bûne û wek nexşeyekê, gund, malbat û eşîrên Diyarbekir, Batman û Şirnexê yên ku cerdevanî terikandine û neterikandine, yên qet nepejirandine, yên nepejirandine û koç kirine yek bi yek, nav bi nav hatine nivîsîn.

Nûçeyeka mîna vê nûçeyê, piştî nêzî pênç salan dîsa li rojevê ye. Di nûçeya li serrûpera Yeni Politika ya li 9.06.1995ê de, tê ragihandin ku piştî dema çekdanînê ya ku PKKê di 25ê Sibatê de dabû dest pê kirin û bi 31ê Gulanê re bi dawî bûbû, êrîşên li ser gundên cerdevanan zêde bûne. Gava em vedigerin 1991ê, em careke din neçariya cerdevanan ya ku di mabeyna du agiran de mayî dibînin. Di nûçeyeke li rojnameya Yeni Ülkeyê, li hêjmara 15-21ê meha 12ê tê ragihadin ku piştî merasîma cenazeyê ya gerillayekî ku li Heşet, gundê Perwariyê ku bi ser Sêrtê de ye de jiyana xwe ji dest daye, 44 cerdevanên ku çûne merasîma cenazeyê têne binçavkirin, ji bilî 8ên ku ji ber kuştina eskeran têne tawanbarkirin, yên din ku serbest têne berdan çeken xwe datînin pêş qereqolê.

Li rojnameya Cumhuriyetê ya li 17.02.1992ê, Ahmet Taner Kişlaliyî bi Doğu Ergilî re hevpeyvînek kiriye. Kışlali dipirse, dibê "Li gor xwestekê hin kesan cerdevanî radibe?", Ergîl bi vî şeklî bersivê dide, "Cerdevanî, wê saziya feodalitiyê





ya ku ro bi ro ji holê radibe vedijenîne". Piştî vê bersivê, bo pirsa "Ku cerdevan ji gund vekşin wê gundî bêxwedî nemînin" jî Ergil weha dibêje:

> "Cerdevan tenê ku dema ku esker yan tîmên taybet piştgiriyê didin ber xwe didin. Lêbelê ew piştgiriya zû bi zû nayê. Bi ser de di mabeyna sîvîl û eskeran de ciyekî vala yê otorîteyê heye. Ew eskerên li wir wazîfedar in gerek bê şert û şûrt di bin hukmê otorîteya sîvîl kevin."

Ji nûçeya li kovara Noktayê ya li 23.02.1992ê bi awakî eşkere fehm dibe ku mesele ne tenê kêmasiya otoriteyekê ye. Di nûçeyê de, cerdevan wek "girseyek din ê neçar ê di mabeyna dewlet û zexta PKKê de mayî" têne nasandin û tê ragihandin ku gelek kes ji wan di dawiya dawî de çeken xwe datîninin, bi vê neçariya berbehs re bal kişadine ser awayê sosyal û psikolojîk jî:

> "Herçiqas dibên terorîst e jî, çekhildana li dijî gundiyê xwe, cîranên xwe, hemwelatiyê xwe tiştekî zor e."

Li rojnameya Cumhuriyetê ya hêjmara li 19.06.1992ê, Mustafa Balbay ê ku li Soğuksuya Wanê li ser xwestekên sigorta û sendîkayan yên cerdevanan nûçeyek nivîsiye, nivîsa xwe bi vî şeklî bi dawî dike:

> "Qaşo digotin cerdevanî pir najo wê rabe lê li Başurrojhilatê hin kes debara xwe pê dikin û bûye pîşeyek jî."

**d. "Zirarê cerdevanan, ji karê cerdevanan bêhtir e"**

Di nûçeya li rojnameya Cumhuriyetê ya 18.07.1992ê ya bi sernivîsa "Zirarê cerdevanan, ji karê cerdevanan bêhtir e" derketî de, Serokê Saziya Sanayî û Bazirganiya Diyarbekir û endamê rêvebiriya TOBBê Ferit Cemiloğlu ho dibêje:

> "1.5 trîlyonê ku di 5 salan de dane cerdevanan, li herêmê pê 150 fabrîqe ava dibin, 45 hezar însan, wê fersendek bo şixul bi dest wan keta û ewqas xwîn jî nedirijiya."

Wekî din, li gor ragihandinê tê zanîn ku di pênç salên ku cerdavaniyê dom dikiriye de 172 cerdevan bi destê mîlîtanên PKKê hatine kuştin, ji 500î zêdetir cerdevan jî, ji ber sûcên wek revandin, qaçaxçitiya çekan û bo wazîfe

xerab bikaranîn ji cerdevaniyê dûr hatine xistin. Dîsa di eynî nûçeyê de, Serokê Bajêr ê HEPê Parêzer Hüseyin Turhallı, li ser vê mijarê weha dibêje:

> "Dewletê, da ku însanên herêmê heqên xwe î sosyal û hizûra siyasal bi dest nexin, aniye xwe li cerdevaniya ku kurdan li dijî kurdan sor dike girtiye, ku bi vî şeklî jî însan tenê pê bixwin û dengê xwe nekin."

Di nûçeya li rojnameya Cumhuriyetê ya 01.02.1993ê de, cîh dane parlementerê HEPê yê Mêrdînê Ali Yiğit û Mehmet Sincar ê ku li ser pergala cerdevaniyê rexneyên xwe gotine, li gor Yiğit û Sîncar çavkaniya esil û ewil a terora li OHALê cerdevanî ye. Di hêjmara 11.03.1993ê de jî, raproa heyeta Türk-İş Başûrrojhilatê heye. Li gor rapora heyetê li herêmê "'insanên ku di eslê xwe de kurd in wek sûcdarên potansiyel tên hesibandin, însan ji hêzên dewletê ditirsin, bi pergala cerdevaniya helwesteke keyfî tê nîşandayîn"

Di nûçeyeke li rojnameya Gündemê ya li 19.10.1992ê de, cerdevan wek "ji aliyê eskeran ve têne kuştin, heqê êzingên qereqola jandarmayê ji wan tê birrîn, bacê didin sercerdevanan" têne tarîf kirin, dîsa li gor rojnameyê cerdevan di bin zext û zordariya cûde de dimînin, di hêjmarên din ên rojnameyên de yek yek nivîsên bi vî şeklî hene, lê behsa êrîş û zext û zordariya PKKê yê li ser cerdevanan nehatiye kirin. Di nûçeyeke rojnameya Gündemê ya 14.07.1992ê de jî, Mehmet Sönmez, cerdevanê gundê Begarê ya ku ji aliyê balafirên şerî yên Tirkan ve "bi şaşitî" hatibû bombekirin weha dibêje:

> "Piştî bombebaranê li ser konê me herî kêm şopa hezar gulleyan hebû... Ev bêguman dijminatî ye. Yanî ji ber ku em kurd in me dikujin... Ji bo wan ha PKKlî ha cerdevan... Me çekê wan hildaye û em bûne cerdevan. Lêbelê ti ferqa me tine."

Bêguman, bi vê nûçeyê re, komkujiya Roboskiyê ya ko 28.12.2011an pêk hatibû tê bîra meriv, ko 34 gundiyên ko ji sînor malê qaçax bar dikirin hatibûn kuştin. Lêbelê eynî wek îroj, di wan rojên berê de jî gelek kesên ku gele herêmê nabihîsîn û fehm nakin li meqamên mezin hebûn. Li rojnameya Cumhuriyetê ya li 25.06.1993ê, Halil Nebilerê ku nûçe amade kiriye, cîh daye van gotinên Waliyê Halê Awarte:

> "Ez dibêm bila cerdevanî bidome. Îro cerdevan bi riya qanûnê re parçeyek ji wan hêzên parastinê ne. Xizmeteke pir baş didin. Rê nadin rêxistinê. Ê ku dixwaze cerdevanî rabe rêxistin e. Ez dibêm bila cerdevaniya demdemî her hebe. Yan bi navê "Saziya Cerdevanan" yan jî bi navekî din, ji girtina karmendan bigre heya cil û bergên wan, ji kar-hêz û berpirsiyariya wan heya îmkanên wan ên sosyal, gerek ji nû ve her tişt bêne çêkirin. Ko PKK tine be jî, domandina vî tiştî girîng e."





Nebiler, di nûçeya we de îfade dike ko ew Erkanê ko dixwaze PKK hebe tinebe jî bila cerdevanî hebe fehm nake.

Di rojnameya Gundemê ya 31ê gulana 1993yan de di nûçeyekê de tê gotin ku li gundê Tizyana Mêrdînê 33 cerdevan li gor daxuyaniya ku Abdullah Ocalan dabû cerdevanên ku çekên xwe deynin dê bên efûkirin. Li ser vê yekê wan cerdevanan çekên xwe danîn, lêbelê piştî wî ji bo ku dev ji cerdevaniyê bernedin 15 roj di bin şkenceyê de man, piştî ku serbest hatin berdan jî ji ber ku gundên xwe terikandin û jiyana wan di xetereyê de mabû, serî li Komela Mafên Mirovan ya Diyarbekirê dabûn. Ji hêla din ve di rojnameya Cumhuriyetê ya 5ê hezîrana 1993yan de axaftinên waliyê Agiriyê Îsmet Metîn wiha dabûn:

> "Me dest pê kir û em êdî çek didin gundiyên dilxwaz yên ku dixwazin bi PKKê re şer bikin. Cara ewil e ku li herêma me tiştekî wiha çêdibe ku ev jî kêfxweşiyek e."

Ji bilî vê di nûçeyê de ev îfadeyên din jî hene:

> "Sîstema cerdevaniya bi pere heta îro li hemberî terorê têkoşîn kir lê cara yekem gundiyan bi îradeya xwe vê anîn zimên."

Tê texmînkirin ku ev gotina Metîn ji hêla serrayedarên parêzgar ve hate parvekirin. Herwiha tê zanîn ku rewşa Agiriyê ji bo bajarên wekî din yên ku li herêmê ne derbas nabe. Herwiha di nûçeya rojnameya Gundemê ya 6ê tebaxa 1993an de tê gotin ku li navçeya Qosera Mêrdînê mûxtarên yazdeh gundan ji hêla fermandariya cendirmeyê hatine bangkirin û ji wan re wiha gotine; divê yan hûn bibin alîgirên Apo yan jî yên cerdevanan. Ji bo ku gundî biryarek bide demeke kurt tê dayîn. Dema ku gundî cerdevaniyê napejirînin gundên wan tên şewitandin. Gundî ji nûçegihanan re wiha dibêjin: Em ne piştgirên Apo ne û ne jî yên cerdevan in û em gundên xwe naterikînin.

Bi navê Tûncay Ozkan di nûçeya rojnameya 11ê tebaxa 1993an de sernavê nûçeyê "rapora sosret ya başûrê rojhilat" tê danîn. Komîsyona lêkolînê

ya cînayetên ku kiryarên nediyar, lêkolînên ku li başûrê rojhilat tên kirin di raporê de cih girtiye:

> “Mînak; ji hêla DGMya Diyarbekirê ve der barê qaçaxçîtiya çekan ku hatiye tespîtkirin li gundê navçeya Erûha ku girêdayî Şirnexê ye biryara tewqîfê derketiye. Di vê pêvajoyê de girtina ku li cerdevanan hatiye birîn nehatiye sepandin. Her wiha ji dewletê pereyên xwe jî girtine.”[13]

Dewlet ji bo ku pêşî li van sosretan bigire, bi tedbîrên cil û berg û perwedehiyê, xwe derdixe holê. Her wiha di nûçeya rojnameya 11ê çiriya paşîna 1994an de li gorî agahiyên rayedarê leşkeriyê perwerde, cil û bergên cerdevanan hatine temînkirin û her wiha li ser kepên wan jî cerdevaniya wan hatiye nivîsandin û dibêje:

> “Em di sîstema cerdevaniyê de guherînên esasî çêdikin û em cerdevanan jî weke leşkeran perwerde dikin. Em encamên erênî bi dest dixin.”

Lêbelê ev encamên erênî di bin siya encamên neyinî de winda bûne. Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 25ê hezîrana 1994an de tê gotin ku li cihekî ku di navbera Wan û Agiriyê de cerdevanên ku hatine binçavkirin, êrîşî kesên ku xwe xistine dewsa gerîlayan, kirine û piştre hatiye fêmkirin ku ew heşt kesên ku hatine kuştin leşker in.

Di nûçeya rojnameya Cumhuriyeta 26ê çiriya paşîna 1993an de alîkarê sekreterê giştî yê SHPê û parlementerê Mêrdînê Mûzaffer Arikan pêşniyazên der barê ewlehiya sindoqa hilbijartinê de rexneyên xwe wiha pêşkêş kir:

> “Kesên ku di navbera cerdevanan û PKKyê de mane dibe ku ji avêtina rayan dûr bikeve. Peydakirina ewlehiya sindoqê peywira rayedarên ewlehiyê yên dewletê ne.”

Arikan ji bilî vê der barê kesên ku ji aliyê cerdevanan ve hatine kuştin, hin agahî dane û herwiha îfade kirine ku cerdevaniya kesên temenên wan li ser şêstî li dijî zagonê ne. Di heman nûçeyê de ji Serokê parlamanterên koma DSPyê Tûrhan Tayan re pirsek hatiye kirin û bersiveke wisa daye:

> “Di vê hevdîtinê de reyîsên eşîretan giliyên xwe anîn zimên û pêşniyarên çareseriyê vegotin.”





Di nûçeyeke din de pêşawayên eşîretan hevdîtinek bi Serokomar Suleyman Demîrel, Serokwezîr Tansû Çîller, Wezîrê Karên Hundirîn Nahît Menteşe û Orgeneralê fermandarê giştî yê Cendirmeyan Aydin Îlter re kirin ku mehaniya cerdevanan zêde bibe û sîgortaya wan çêbe.

### e. Rûyê cerdevaniyê yê li dewletê: Bi rêya parlamenteriyê û memûriyetê hewldana “islahkirina” cerdevanan

Sedat Yûrttaş di nûçeya rojnameya Gundema 7ê kanûna pêşîna 1993an de nivîsa xwe ya der barê “Cerdevanî û Senedî Îttifaqê” de fikr û ramanên xwe anî zimên:

> “Di mawayeke dirêj de ji hêla dewlet û medyayê ve serokên cerdevaniyan weke nûnerên kurdan yên meşrû têne pêşkêşkirin û hatina wan ya Enqereyê biryara di mehê carekê de hate dayîn. Ji hêla gelê herêmê tê gotin ku cerdevanên gundan ji bilî wezîfên xwe yên ku parastina gundan bikin jî dikin. Tevgerên ku li dijî zagonê ne, her wiha êdî ev wezîfe bi zordana dewletê tê kirin. Ji ber lêkdana ku li herêmê heye, gel ji ber tengasiya aborî ve cerdevaniyê dipejirîne û her wiha li ser cerdevanên ku bi her awayî girêdayî dewletê ne sekiniye.”

Her wiha di nûçeya rojnameya 8ê adara 1994an de Celal Başlangiç gotiye ku di hilbijartina cihekî ya 27ê adarê de teqîna namzedên cerdevaniyê derketiye holê û hin kesên ku piştgiriya cerdevanên ku çekên dewletê li ser pişta xwe kirine û yên ku Sercerdevanan yan jî yên piştgiriyê dide wan di partiya DYP, ANAP, RP û MHPyê de namzedbûna xwe eşkere kirine û dibêje ku:

> “Rexnekirin û nirxandina ewqas dem ji bo çareseriya siyasî ya pirsgirêkên Kurdî dê bi vî şiklî bibûya: Dê cerdevanên gundan bibûna serokê şaredariyê...”

Di nûçeya rojnameya Gundema 14ê adara 1994an de tê gotin civîna ku li gerînendeyê asayîşê û cihên rayedarên din de yê ku li navçeya Cizîra Şirnexê ji bo têkoşîna li hemberî PKKyê ji gel piştgirî hatiye xwestin û di gel vê jî der barê qezençkirina hilbijartina serokê cerdevaniyê namzedê serokê şaredariya RPyê Kamîl Atak de hin axaftin hatine kirin. Di nûçeya rojnameya Gundema 26ê adara 1994an de tê gotin ku ji bo gelê navçeya li Gevera Colemêrgê ku rayên xwe bidin

DYPê, ji aliyê sercerdevan Ahmet Zeydan ve pêkûtî hatiye kirin. Tê gotin ku tîma taybet xwestiye ku namzedê DYPê ji hilbijartinê vekêşe. Ji ber vê yekê cerdevan bi tîma taybet ya ku piştgiriyê dide MHPê bi hev ketin. Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 1ê çiriya paşîna 1994an de tê îfadekirin ku SHPê xwestiye ku serokê cerdevaniyê Hazim Babatê ku ji hêla DYPê ve nehat pejirandin bikin namzed. Hemû tevgerên bi dewletê re di heman demê de dewam kiriye. Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 11ê tîrmeha 1994an de tê îfadekirin ku saziyên dewletê, PTT û bingeha tenduristiya li navçeya Sasona ku girêdayî Elûhê kesên ku karker û memûr in hemû cerdevan in. Her wiha navên van kesan û xebatên wan jî diyar in. Ji bo kesên ku betal mane jî hin çareserî hatine peydakirin. Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 7ê hezîrana 1994an de tê gotin ji bo cerdevanên ku ji hêla gel ve xayin hatin dîtin, ji hêla parêzgariya Colemêrgê ji bo tenduristî û perwerdeya cerdevanan weqfek hate avakirin. Li gorî nûçeyê li weqfa piştgiriya perwerde û tenduristiya cerdevanên gund yên girêdayî Colemêrgê dê perwerdeya hişmendiya bihevrebûna welêt, bihevrebûna neteweyî û prensîbên Ataturk bên dayîn. Ev rewş hejmara weqf û komeleyên bi vî şiklî li hemberî rakirina sîstema cerdevaniyê de di sala 2000an de dê zêdetir bibe.

#### f. Hewldana hikûmkirina li ser cerdevanan

Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 17ê tîrmeha 1994an de di rojevê de li ser nepeniyên sîstema cerdevaniyê hatiye sekinandin. Tê gotin ku beriya 10 salan kesên ku ji şerên Afganistanê reviyan navçeya Ercîşa Wanê mayende bûne û karê cerdevaniye kirine. Tê gotin ku van kesana bi piştgiriya qereqolê pêkutî li wan kiriye. Di nûçeya rojnameya 24ê tîrmeha 1994an de kesên ku piştgirî dane PKKyê divê yan cerdevaniyê bikin yan jî gundên xwe terk bikin. Her wiha ji hêla dewletê ve jî bi tundiya gundan jî hatine tehdîtkirin. Lê di vê pêvajoyê de hin gundên ku hatine şewitandin hene. Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeyê de tê gotin kesên ku bi zordayînê bûne cerdevan bi tehdeyan re rûbirû mane. Li gorî rojnameyê tehdeyên cur bi cur dihat kirin mînak; qedexekirina têketin û derketina li gund, mal û zadên ku dihat şewitandin, çavên ku dihat qewartin û gundiyên ku li ser berfê dihate tazîkirin û tundiya li gundan... Kesên ku cerdevaniyê nedipejirandin ji hêla dewletê ve weke endamê PKKyê dihat hesibandin. Dîsa di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 13ê tebaxa 1994an de tê gotin ku li gundê Daricaya girêdayî navçeya Gevera Colemêrgê, ji ber hinceta alîkariya bi PKKyê





re kirine ji hêla dewletê ve çekên 47 cerdevanan hate bidestxistin, malên wan jî hate şewitandin. Heman rûpel cih daye vegotina fermandarê PKKyê Cemîl Bayik:

> "Di konferansa partiya me ya sêyemîn a neteweyî de bangewaziya efûyekê hebû. Car caran kesên ku ji çetegeriyê vegeriya bi pêş ve çû. Lê dewlet nêzî van kesan jî bû."

Kesên ku ne cerdevan in, ji hêla dewletê û kesên ku cerdevan in jî ji PKKyê weke çete tê dîtin. Cerdevanên ku dikevin bin siya PKKyê ji hêla dewletê ve tên cezakirin. Ev jî tê xuyakirin ku cerdevanên kevn û yên aniha divê ji hêla hin kesan ve bên parastin. Di nûçeya nozdehê tebaxa 1994an de li gundê Akçaya Şirnexê ji hêla dewletê bi şertê cerdevaniyê mal hatiye avakirin. Lê dewlet tu xêr ji kesên ku bi zorayî bûne cerdevan nedît û her wiha êdî cerdevanî bi awayekî hezkirinê da spartin. Lê belê ev dek û dolab jî bi encam nebûn. Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya şeşê îlona 1994an de li navçeya Pervarîya Sêrtê ji tîma taybet ya girêdayî MHPyê çarsed cerdevan êrîşî ser kurdan kirine, lê paşê dev ji êrîşê berdane. Di 7ê îlona 1994an de tê îfadekirin cerdevanên ku li sê gundê Erzîncan û Sêrtê ne guh nedan banga xwestina îstîfakirinê.

Nûçeya der barê mirina cerdevan û êrişên li ser wan, gelek caran di rojnameyê de cih girtiye. Li gorî Şemdîn Sakik gelek cerdevan ji ber ku mehaniyên xwe nestendine, cih guherandine û piştgirî dane PKKyê. Dewlet ji bo ku serweriyê li ser cerdevanan bike, rêbazên cur bi cur ava dike û yek ji van ev e. Li gorî nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 13ê kanûna pêşîna 1994an li navçeya Erganiya ku girêdayî Diyarbekirê gundên ku sîstema cerdevaniyê napejirîne, mamosteyên li wî gundî ji wê derê tê stendin û wan didin gundên ku cerdevaniyê dipejirînin.

Li gorî rojnameya 21ê kanûna pêşîna 1994an de li gundên girêdayî navçeya Vartoya Mûşê ji hêla dewletê ve nasnameya cerdevaniyê ya bi dilxwazî tê dayîn û her wiha ji hêla fermandarê cendirmeyê yê navend hate gotin ku hûn alîkariyê bidin me em jî alîkariyê bidin we. Di rojnameya Ozgur Ulkeya 26ê kanûna pêşîna 1994an de zarokê çardeh salî yê ku pê li mayinan kir û ji ber ku bavê wî ne cerdevan e ji hêla nexweşxana leşkerî ya Diyarbekirê nehat tedawîkirin. Tê gotin ku ji ber vê sedemê mêrik zarokê xwe bir nexweşxaneya lêkolînê ya Dîcleyê. Di heman rojnameya 24ê kanûna paşîna 1995an de mizgefta gund a girêdayî navçeya Bismilê ji hêla leşkeran ji ber gundiyên ku cerdevaniyê

nepejirandin hate şewitandin û her wiha alîkariya ku li gel tê kirin, bi cerdevaniyê re ye. Di nûçeya rojnameya Cûmhûriyeta ya 4ê kanûna paşîna 1994an de li gundê Hamzaliyê ku girêdayî Qulpa Diyarbekirê êrişek ji hêla PKKyê hat kirin. Ji hêla cerdevanê gund Halît Canê ku 55 salî ye, li ser cesedê gerîlayekî wiha gotiye: "Ne dînê PKKyê û ne îmana dewletê heye. Em bi zorê ji hêla fermandarê qereqola Sîvrîceyê bûne cerdevan. Ji me re gotin ku ev kesana Ermenî ne, lê ka? Ev kesana sunetkirî ne. Heke Ermenî bin jî divê ne sunetkirî bin." Di nûçeya rojnameya Ozgur Ulkeya 8ê kanûna paşînya 1995an de li navçeya Cizîra Şirnexê di navbera cerdevanan û jîtema ku wan kontrol dike pevçûnek çêbû. Piştî vê bûyerê pazdeh cerdevan hatin binçavkirin. Di manşeta 10ê kanûna paşîna 1995an de li gundên ku girêdayî navçeya Dêrika Mêrdînê sed û pêncî cerdevan û merivên cerdevanan hatin binçavkirin û piştre jî hatin berdan. Cesedên sê serokên cerdevanên ku hatin kuştin jî teslîmî malbatên wan kirin. Di nûçeyê de îfadeyên kesên ku hatin berdan cih girtine. Leşkeran her roj îşkence dikirin. Her wiha digotin we bi dewletê lîst. Divê cesedên we ji vê derê derkevin û hûn ê her dem sedaniya vê derê jî bikin. Li gorî nûçeya rojnameya piştî du rojan du caran leşkeran girtin ser wan. Çar serokên cerdevanan hatin binçavkirin lê piştî binçavkirinê der barê wan de tu agahî nehat sitendin. Di heman rûpela 12ê kanûna paşîna 1995an de heman êriş li gundê cerdevanekî ku girêdayî Bismila Diyarbekirê pêk hatiye û leşkeran ji gundiyan re wiha gotine: "Ji ber ku hevserên we alîkariya PKKê kirine cezayê xwe dikêşin. Piştî ku ji binçavkirinê derkevin dê dadgeh pêşiya wan bernede. Di nûçeyê de tê gotin ku 'Hûn jî gund zû biterikînin'."

Mûstafa Balbay di nivîsa xwe ya di rojnameya Cûmhûriyeta şazdehê Nîsana 1995an de li ser vegotina TBMMya ku rapora komîsyona lêkolîna cînayetên siyasî yên kiryarên nediyar kiriye sekiniye û wiha cih daye tespîtên li ser cerdevanan:

> "Reyîsên eşîretan yên sercerdevan di nava tevgereke bêrêzik de ne, pêkûtiyeke xedar li ser piştgirên ku ne ji wan in hatiye danîn. Yên ku ne piştgirên wan in, hemûyan bi PKKyê tawanbar dikin. Her wiha di rojeva meclisê de cerdevanên ku ji aliyê dewletê ve çek bi dest xistine û tawan kirine, hatine behs kirin mehaniyên wan didome. Lê nehatin girtin û her wiha nêviyê mehaniyên xwe jî dane sercerdevan. Di nûçeya 19ê nîsana 1995an de li ser pêşniyarên ku di rapora biencam de cih girtiye ya ku Balbay behs kiriye hatiye rawestandin."





**g. "Gundên qedexe" yên bêcerdevan; ji bo cerdevanên "gundên stratejik" û taybet**

Rojnameya Yenî Polîtîkayê di nûçeya 2yê gulana 1995an de li gundên ku girêdayî navçeyên Lîcê û Qulpa Diyarbekirê tê îfadekirin ku gemaroya zimhêrê li ser gundên bê cerdevan hatiye kirin û her wiha astengîya ku bi destxistina îlac, sotemenî û tedawîkirinê tê diyarkirin. Di nûçeyê de mexdûrîyeta gundîyan wisa tê îfadekirin ku Nexweşên gundîyan ji bo ku biçin nexweşxaneyê pêşî divê serî li qereqolê bidin, di vegera nexweşxaneyê de jî divê reçeteyê li qereqolê bide tesdîqkirin, piştre îlacên ku bi dest xistin, car din bibin qereqolê û her wiha qedexekirina xistina mazota gund ya ji deh lîtreyan zêdetir. Tê îfadekirin ku ev hemû gemaroya li ser zimhêr, îlac û mazotê tê kirin ku gundên bêcerdevan alîkariyêb bi PKKyê re nekin. Lêbelê tê îfadekirin armanca herî mezin ew e ku gund bên valakirin. Di nûçeya wekî din ya rojnameya 14ê gulana 1995an de tê îfadekirin ku gundiyên Lîcê û Qulpê yên ku mecbûrê koçkirinê bûne, leşkeran destûr nedane gundî di cejnan de goristanên gundên xwe ziyaret bikin. Di nûçeya rojnameya Yenî Polîtîkaya 3yê hezîrana 1995an de tê îfadekirin ku gundiyên li gundê Dêrsimê bi şertekî bi navê hatina navendê, pêkûtiya terorê û pejirandina cerdevaniyê alîkariya avakirina malan bê dayîn. Ji ber ewlehiya ku li herêmê tuneye mecbûrê cerdevaniyê mane, lêbelê gundiyên ku naxwazin têkevin şer, dizanin ku ev daxwaznameya îmze bikin, dê dewlet ne berpirsiyarê gundên ku hatine şewitandin be lê ev ji aliyê gundiyan ve ne tiştekî rast e.

Di nûçeya rojnameya Yenî Polîtîkaya 18ê tîrmeha 1995an de tê îfadekirin ku kurdên ku cerdevaniyê nepejirandine, ji gundên xwe hatine koçkirin da ku di bin kontrola herêma Behra Spî û Anatoliya Navend de gundên cerdevaniyê hatine avakirin. Tê îfadekirin ku li Mêrsînê û Hetayê belavkirina çekan ji aliyê kesên ku piştevanê MHPê ne tê kirin. Kesên ku çekdar in, bi şevan têketin û derketina gundiyan qontrol dikin, bi rojan jî gundî tên çavtirsandin. Di nûçeya rojnameya Demokrasiya 24ê çiriya pêşîna 1996an de piştî belavkirina bi salekê şûnde çekên ku li gundên Tirkmenan navçeya Samandaga Hetayê li gundên ereban jî cerdevanî hatiye sepandin lê ji aliyê van gundan ve nehatiye pejirandin. Ji ber vê çekdarbûyînê mûxtarê gundekî li dijî vê rewşê derketiye û gotiye: "me neguherînin Saraybosnayê". Em hemû dizanin ku ev hişmendiya mûxtaran ku di rayderên dewletê yê herî bilind de be dê hin pirsgirêk zû çareser bibin.

Di rojnameya Yenî Polîtîkaya 1ê tebaxa 1995an de tê îfadekirin ku

kesên ku li gundê cerdevanan yên girêdayî Şemzînana Colemêrgê ne, ji ber êrîşa gerîlleyan ku nehatine parastin wargeheke ku ji sed konikan pêk hatiye ji aliyê tabûrên peya û salar ve li nêzî gundekî cerdevan hatiye avakirin. Sîstema konan piştî çar salan dîsa dê bikeve rojevê. Di nûçeya rojnameya Ozgur Bakişa 16ê çiriya pêşîna 1999an de ji sala 1994an û vir de li ser gundên stratejîk tê sekinandin. Gundên cerdevanan yên girêdayî Beytuşşebaba Şirnexê, Şemzînana Colemêrgê û Çataxa Wanê hatine valakirin ku cerdevan mecbûrê gundên ku nû avabûne mane, lê tê îfadekirin ku ev gund ji aliyê zordestên dewlet û PKKyê ve bindest mane.

Di rojnameya Yenî Polîtîkaya 7ê tebaxa 1995an di gel gelek nûçeyan ve di bin nûçeya "Pêkûtiya Cerdevaniyê" de îbareyeke wiha cih girtiye: "Bi sansûr e. Nûçeya li vir ji ber ku li ser biryara Dozgeriya DGMê ya Stenbolê hatiye qedexekirin em nikarin biweşînin." Di versiyona bêsansûr a rojnameyê de jî hatiye gotin ku li navçeya Kozlukê ya Batmanê ji ber ku bi zorê milet bibe cerdevan ji hêla hin cerdevanan ve operasyon birine li ser xelkê. Di rûpelên hundurîn de dîsa hin nûçeyên ku îfadeya "Bi sansûr e." Ji bo wê derbas dibe, di versiyona bêsansûr a rojnameyê de dixuyên ku ew jî der barê zordestiya cerdevanan û zordestiyê li ser ew kesên ku dev ji cerdevaniyê berdidin.

Di rojnameya Demokrasiyê ya 1ê kanûna paşîna 1996an de di nûçeyekê de hatiye gotin ku rûdaneke ku bûye jêderka çewisandinê qewimiye. Li gor nûçeyê piştî hilbijartinên 24ê kanûna pêşîna 1995an bi egera ku cerdevanên gundê Narliya Çataka Wanê deng dane HADEPê, ew birine qereqolê û ji wan re gotine û ew îqaz kirine "Heke hûn dewletê diparêzin, wê çaxê divê hûn deng bidin partiyeke ku li dewletê xwedî derdikeve." Her wiha dest dane li ser sîlehên ku ji mala cerdevanên gundê Kiziltaşê derketine. Di heman rojnameyê de di hejmara 1ê adara 1996an de di nivîsa Seyhan Toprak de li Hekarî, Şirnex û Mêrdînê û li hin gundên li navçeyan bi egera ku deng dane HADEPê çekên wan ji destên wan standin. Lêbelê ev yeka nade nîşan ku dixwazin dawî li cerdevaniyê bînin. Ya rastî ji ber ku ev herêm herêma botanê ye û nikarin li vir bi cerdevaniyê hakimiyeta xwe bidomînin, ji ber wê dixwazin li vir tesîra cerdevanan kêm bixin lê li deverên din hê jî bi zorê cerdevan tên girtin.

Di rojnameya Cumhuriyetê ya 5ê tebaxa 1995an de di nûçeyekê de cih dabû raporeke bi navê "Pirsgirêka li rojhilat, Teşhîs û Tespît" a ku ji hêla Prof. Dr. Dogu Ergîl ve li ser navê Yekbûna Borse û Odeyên Tirkiyê ve hatiye amadekirin. Li gor raporê hin tespîtên li ser cerdevaniyê wiha ne:





> "Gelê li herêmê bi salan e berxwedaneke mezin kirine. Ji yek şaxê ku taxsîlata ku vî karî dike cerdevan in. Armanca pergala cerdevaniyê, destûr û sînorê wan hêj tam ne eşkere ne. Cerdevan ne berpirsiyar in ku civatên xwe yên asê biparêzin. Divê cerdevan di operasyonên li gundan de an jî operasyonên wekî din de wek hêzeke alternatîf neyên bikaranîn. Yên ku bûne cerdevan tê zanîn ku pêşî xwediyê hin sûcan bûn. Ji ber ku cezayê van sûcên xwe nekêşin xwe sipartine bin baskên dewletê. Hejmara van kesan kêm be jî ji ber ku li herêmê dubendiyeke hiqûqî di navbera milet de çêdike meseleyeke girîng e."

Dîsa di rojnameya Demokrasiyê ya 10ê nîsana 1996an de di nûçeyekê de parlamanterê DYPê Selim Ensarioglu dide zanîn ku pergala cerdevaniyê wek "teşebûseke îktîsadî ya kamûya bi çek e." Her wiha gotiye ku divê pergal wisa bê rakirin ku yek cerdevanek jî nemîne.

### h. Çavgerandin û alozî: "Hereqola cerdevanan", "yekîneyên nêçîrvan", "daristanparêz", "cerdevanên taybet" û "çeteya Geverê"

Di rojnameya Demokrasiyê ya 16ê kanûna paşîna 1996an de tê zanîn li devdorê Diyarbekirê ji bo ku cerdevan kontrola hatûçûya li ser rê bikin nêzê 13 qereqolên cerdevanan hatine avakirin. Bi vê yekê re fikarî zêde dibin ku cerdevan bazirganiya nelegal bixin destê xwe û zordestiya li ser gel qewîtir bikin. Çimkî di rojnameya Demokrasiyê ya 19ê adara 1996an de tê gotin ku piştî li Erûha Sêrtê jî bi heman şiklî qereqolên cerdevanan hatin avakirin, êdî lêgerîn li gor kêfa cerdevanan dihat kirin, her wiha wek amborgoyeke xwarin û şewatê jî qontrol dihatin kirin û bi xwe re jî dizî û şêlandin ketibû rewşeke meşrû.

Di nûçeyeke rojnameya Demokrasiyê ya 29ê adara 1996an de Waliyê Rihayê û Fermandarê Tûgayê daxuyaniyeke hevpar ya çapemeniyê li dar xistin û tê de gotin,

> "Di çaroveya qanûna 4654emîn de ku 'berpirsiyariya parastina welat a çekdarî li dijî dijmin' e û di sala 1944an de dest pê kiriye û di 1991an de tê de guherîn çêbûye... Di halê awarte de û di seferan de ji bo ku bi hêzên me yên çekdar re welat biparêzin 'Yekîneyên Nêçîrvan...'"

dê bê damezirandin û ji bo vê yekê jî xelkê vedixwînin vê yekîneyê. Dema ku mirov bi hûrgilî li qanûnê binêrê wek qanûneke seferberlikê hema hema her

kesê ku bikare çek bigire destê xwe çi jin û çi mêr tê vexwendin ku bikeve nav vê yekîneyê. Dema ku ev qanûn ji nû ve bê zindekirin, tê wê maneyê ku cerdevanî bi navekî cuda careke din dê dewam bibe. Ji hêla din ve nebirina serî ya vê qanûnê ew e ku yan zêde rayedarên ku xwe nedane ber vî karî çenebûn an jî jixwe halê hazir ji pergala cerdevaniyê razî bûn ku hewce nedikir tiştekî wiha bikin. Çimkî di heman rûpelê de Li Beytuşebaba Şirnexê cerdevanên ku avêtibûne li ser qereqolê û girtiyekî azad kiribûn nehatin darizandin ku ev yek jî ji hêla dozgerê DGMya Diyarbekirê erênî hat dîtin û her wekî cerdevan jî memûrê dewletê bin ku ew jî dikevin nav Qanûna Mûhekemat a Memûrtiyê. Ji bo ku cerdevan bên darizandin destûra qeymeqam û lijneya îdareya bajêr hewce ye. Ev destûr bê girtin jî dîsa di heman qanûnê de ji ber hin madeyan darizandin hema hema tu yê bibêjî jixwe ne pêkan e. Ji hêla din ve ji ber hin sûcên ku hebûna dewletê tehdît dike cerdevan jî nikarin xwe jê xalî bikin. Di kovara Noktayê ya 28 nîsan – 4 gulan 1996an de di dosyeya ku mesela cerdevaniyê bi berfirehî di bin serneva “Qey cerdevan ew çek e ku li xwediyê xwe dikeve?” de agahiyên ku Serdozgerê DGMya Diyarbekirê Bekir Selçûk daye balkêş in:

> “Vê gavê 117 cerdevanên ku li bal me tên darizandin hene. Ji van 78 kes ji ber ku alîkariya PKKê kirine, 35 kes bi komî qaçaxçîtiya çekan kirine, 3 kes qaçaxçîtiya madeya hişbirê kirine, kesek jî ji ber ku endamê PKKê ye tên darizandin.”

Di rojnameya Milliyetê ya 13ê tîrmeha 1996an de di nûçeya li ser navê Ozcan Ercan de cih dane goftûgoyeke bi cerdevanekî ji gundê Birki re. Cerdevanek ji bo ku cerdevanî rabe wiha diaxive:

> “Ne ku cerdevanî rabe, em hemû bibin cerdevan dê çêtir be. Ne PKK tenê, ew kesên ku ne cerdevanan jî besê me ne. Çawa ku çek ji destên me bên girtin dê di dilopeke avê de me bixeniqînin. Em hatine naskirin. Dijminî û hesûdî heye. Ew dê me bikujin em hay ji vê hene.”

Şîroveya Ercan jî bi vî şiklî ye:

> “Ev tirs, hesûdî û nefreta kesên ne cerdevan yên li cerdevan re cerdevanan anîne li cem hev. Wan kirine yek û zêdetir bi dewletê ve girê daye. Dewlet û komarê ji ser zimanê xwe kêm nakin. Dibêjin: ‘Ev der axa me ye, axa komarê ye, em ê bimirin jî û nedin terorê. Dijminê dewletê dijminê me ye jî’.”





Wekî din Ercan dibêje ku hingî ev gund hatiye avakirin û pê de hê jî tu kesî neavêtiye li ser gund û lazim nebûye ku cerdevan gundên xwe biparêzin. Li gund di şûna PKKê de sîleh hakim e. Zarok jî êdî bi kalaşnîkofên bavê xwe ve dilîzin. Sîleh wek ferdekî ji malbatê ye. Sîleh ewlehiya her kesî ye. Her çiqas gundiyên bêçek ji hêla rojnameger ve wek gundiyên necerdevan bê binavkirin û mîna ku tu bibêjî qey bi empatiyeke cerdevaniyê berteka gundiyên bêçek li hemberî cerdevanan binavkirineke wek “hesûdî” hebe jî lêbelê di nûçeyê de eşkere tê dîtin ku çeknedanîna cerdevanan ji welathezî û welatparêziyê zêdetir ji ber endîşeyên madî û ewlekariyê ne. Çimkî dilxwaziya Ercan bi van gotinan jî eşkere dibe:

> “Heke dewlet cerdevaniyê bide, zar û zêç ferq nake dê her kes çek bigire destê xwe.”

Heman empatî di nivîskarê vê rojnameyê Taha Akyol de jî tê xuyan. Akyol di 30yê tebaxa 1996an de di nivîsa xwe ya bi sernava “Cerdevan dibin ‘daristanparêz’” xwestiye bide nîşan ku Wezîrê Dewletê Nevzat Ercan li ser projeya ku dê “70 hezar cerdevanî dê bikin daristanparêz” dixebite û fikrên xwe yên vê der barê de jî daye nîşan:

> “Cerdevanî meseleyeke nîqaşa dûrdirêj e ku dema li muxalefetê bin, dibêjim em ê rakin lê dema ku tên îqtîdarê ew kes bi rastiyê re rû bi rû dibin û fêhm dikin bi rastî jî ev meseleyeke çiqas tevilhev e. Ew 70 hezar mirovên ku hêviyên xwe bi dewletê ve girê dane û bi PKKê re di nav şer de ne, hûn nikarin bavêjin ber derî. Heke hûn cerdevaniyê rakin hûn ê li gundê ku ew disekinin qereqol çêkin ku ew jî ji niha ve belî ye ku dê çiqas bibe mal!.. Lêbelê pirsgirêkên ku ji cerdevaniyê çêdibin jî hene. Heke wek leşker û polêsan di nav pergaleke hîyerarşîk de tu çek nedî destê însanan, êdî hûn texmîn bikin hem psîkolojiya wan hem jî yên ku ji derve bi wan re têkildar in.”

Meseleya ku Akyol balê kişande li ser di rojên pêş me de dê bibe bingeha xebatekê. Di rojnameya Demokrasiyê ya 28ê çiriya pêşîna 1996an de hatiye gotin ku li Wan û Hekariyê “Cerdevaniya taybet” dest pê kiriye. Li gor nûçeyê yên ku leşkeriya xwe kirine, ceza nexwarine û cezayekî ku nikaribe bibe memûrê dewletê nexwaribe û bi şertê ku dibistana seretayî xwendibe û di navbera 25-35 salî de be û nexweşiyên wî yên ku jê re bibe asteng tunebin ji bo ku bibin cerdevanê taybet dê bikaribin serî lê bidin û ew kesên piştî ku hatin qebûlkirin dê

li tabûra cendirmeyan ya li navçeyê perwerde bin û ezmûnên devkî û fîzîkî bibin û paşê jî ne tenê li herêma xwe heke hewce bike li operasyonên cihên din jî dê bi sîgorte bên îstîhdamkirin. Cerdevanên taybet dê wek yekîneyên profesyonel bên bikaranîn û cerdevanên din jî di kadroya suxmeyan de bên girtin.

Di nûçeyê de tê gotin ku cerdevanên taybet dê weke yekîneya leşkerên profesyonel bê bikaranîn di gel vê cerdevanên din jî dê di suxmeyê de cî bigirin. Di rojnameya Cûmhûriyeta 14ê çiriya paşîna 1996an de Mîyase Îlknûr der barê "Mêrdîna ku terorê têk bir" nivîsek weşand û got ku rewşa neasayî dike ji holê rabe û her wiha Cizîr, Silopî û Îdîla ku girêdayî Şirnexê bû, bêdengiya Mêrdînê zêdetir kir. Îlknûr der barê sedemên xelaskirina terorê bi çend kesên ku ji Mêrdînê ne sohbetek kir. Hat gotin ku; Hadî bi alîkariya operasyonên rayedarên ewlehiyê, PKKyê dûr xist.Gelo li rayederên mîlîsa ku li navçeyan çi qewimî? hate pirskirin. Bersiva "Ew bûn cerdevan" hat dayîn. Di heman nûçeyê de jî mensûbê eşîreteke mezin Abdûlkadîrê Tûtaşiyê ku serokê şaredariya DYPyê got ku rayedarên mîlîsa kevn yên ku girêdayî PKKyê, bûne cerdevan.

Di rojnameya Cûmhûriyetê ya 2yê kanûna pêşîna 1996an de ji ajansa nûçeya Reuters ve ji aliyê Jonathan Lyons ve bi bûyera Susurluk ketiye rojevê. Her wiha tespît kiriye ku dewlet bi alîkariya serokê eşîretê Sedat Bûcak re, sercerdevanî û parlementerê DYPyê, sîstema eşîretan xurt kiriye. Her wiha di nivîsê de weke xwendekarê Behlul Yavûzê ku perwerdeya dîroka eşîretan girtiye kiriye:

> "Dewlet ji ber ku nexwestiye herêma kurdan xurt be, bernameyeke bisîstem dimeşîne."

Di nûçeya rojnameya Demokrasiya 9ê adara 1997an de tê gotin ku serokên bi wesîleya cerdevaniyê xurt bûye, li gorî nûçeyê, li Geverê kesên ku qaçaxçîtiya narkotîkê û kuştinê meçhûl dikin bi navê "çeteya biforme" serokên cerdevanan hate binçavkirin. Li mala serokê şaredariya Geverê gelek çek hate girtin. Piştre eşîreta Jîrkî û Zeydan, parlementerê DYPyê ,serokê cerdevan û lîderê eşîreta Zeydan nêzî sed cerdevanên ku bi çek re li Diyarbekirê, bi parêzgarê herêma û rayedarên leşkeriyê re hevpeyvînek çêkirin. Ji aliyê din jî hate fêmkirin ku dewlet ji pêkûtiya cerdevanan aciz bûye. Li gorî manşeta rojnameya Cûmhûriyeta 25ê kanûna pêşîna 1996an de di nûçeya ku MİT: Divê cerdevanî ji holê bê rakirin. Ji hêla Necmeddîn Erbakan jî heman îfade tê gotin.





Her wiha di rojnameya Cûmhûriyeta 17ê sibata 1997an de li gorî zagona îdareya bajaran ya ku di 4ê îlona 1996an de ketiye meriyetê. Divê cerdevan di hundirê çil û pênc rojan de çekên xwe berdin. Lê piştî zagona ku kete meriyetê çekên xwe teslîm nekirin.

### i. "Licê desteser e"

Îdareya cihekî û rayedarên eskerî zagona arasteyî berdana çekên cerdevanan nepejirand. Di rojnameya Demokrasiya 22yê kanûna pêşîna 1996an de êriş li malên ku girêdayî navçeya Licê hat kirin û dused kes hate binçavkirin. Di heman rojnameya 25ê kanûna pêşîna 1996an de jî tê gotin kesên ku cerdevanî nepejirandin bi zorê bûne cerdevan. Malbatên ku serî li şaxa İHDya Diyarbekirê dan, îfadeyên wan hate girtin. Parêzer Tahsîn Ekîncîyê ku serokê Weqfa Piştgirî û Çanda Licê ye û bertekên wiha dan:

> "Gelê Licê di bin pêkûtiyeke giran de ye. Ji bo ku nebin cerdevan bi salan li ber xwe didin. Ev xweragirî dê heta kengî bidome, nizanim. Lê ev tişt tê zanîn cihê ku ewle be, dê sed kes çekan bigire çi bike? Her wiha hejmara leşkeran ku ji hejmara gel zêdetir be... Dê gule bavêjin kê!"

Di rojnameya Cûmhûriyetê ya 27 û 28ê kanûna pêşîna 1996an de tê îfadekirin ku li navçeya Licê ya Diyarbekirê, temenê wan di navbera pazdeh û heftê de, ev hefteyek li qereqola jendermeyê ji sed zilamên ku hatine girtin û bi zorê kirine cerdevan. Heyetek ku ji sendîqeyan û parêzvanan pêk tê û komîsyona TBMMyê ya mafên mirovan li Lîcê ziyaret û lêkolîn kirine. Di nûçeya rojnameya Demokrasiya 21ê sibata 1997an de li navçeya Lîcêya Diyarbekirê, zarokên ku ji hîjdeh salî biçûktir in, îstîfayên wan nehat pejirandin. Mûrat Karamanê 18 salî piştî destdanîna li ser gundê wan ji ber ku xwişk û birayên wî yên 10, 12 û 14 salî hatibûn girtin, serbest bên berdan, cerdevaniyê qebûl kiriye. Lê belê piştre ji ber ku daxwaza wî ya îstîfayê nayê pejirandin, bertek nîşan dide. Berteka gelê li Lîceyê ji wê yekê re ye ku dewlet di eslê xwe de ji bo hêzeke çekdarî bi cerdevaniyê ve ne girêdayîye. Wek hêzeke ji bo moralê pê re ye. Ew desthilatdariya ku bi çek û îdareyê nikaribû bixista destê xwe, dixwaze bi awayekî derûnî bigihêje encam û serkeftinê. Dewlet wek kurekî ku ji keçekê hez kiribe û piştî ku dev ji wê keçikê berde jî nexwaze bibe yara kesî, bi heman mantixî dixwaze ev gelê ku jê hez neke jî pê re bimîne, çek negire destê xwe jî lê divê çekên wê bigire an jî van yekan

qebûl neke jî divê nebe malê kesî û bibe malê axê. Di civakên ku serdestiya mêrê tê de ye, li ser navê namûsê parastina xurûr û xwemezindîtinê mêr û dewletê nêzî hev dike.

Di rojnameya Demokrasiyê ya 31ê adara 1997an de Fermandarê Tabûra Licê Yuzbaşî Hacî İlbaş ji bo ku Lîceyî cerdevaniyê qebûl nakin, qehra xwe aniye zimên. Di nûçeyê de axaftinên Îlbaşı yên ku dê bibin cerdevan re teklîfa wan a kredîdayînê, ew kesên ku neçûne leşkeriyê dê wek ku leşkeriyê kiribin bên hesibandin û herwiha axaftinên din wisa ne:

> "Divê em hejmara cerdevanan derxînin 200î. Heke hejmar bigihêje 200î em ê her kesê ku çek bigire destê xwe di fabrîkaya mermeran de ya ku li deşta Fîsê ji hêla Halis Toprak ve tê çêkirin, bixine kar."

Di nûçeyê de tê zanîn ku her çiqas Îlbaşı rola midûrê bankeyê, wezîrê parastinê û xwediyê fabrîkayê girtibe li ser milê xwe jî, dîsa encameke erênî ji vê yekê negirtiye. Ji hêla din ve di rojnameya Ulkede Gundemê ya 21 tebaxa 1997an de di nûçeyek de tê gotin ku li Licê di fabrîkayeke mermerê de karkerên ku ji Ocaxa kevir a Şexlatê malzemeyên fabrîkeyê dikişînin, bi zorê ji wan karkeran xwestine ku bibin cerdevan, yên ku nepejirandine û îstîfa kirine, di şûna wan de yan cerdevanên ji gundên devdorê anîne xistine şûna wan an jî ji Sînopê karker anîne xistine şûna wan. Di nûçeyeke rojnameya Demokrasiyê de ya 12ê adara 1997an de hatiye gotin kul i gundê Baggozeya Erûha li Sêrtê teklîfa cerdevaniyê çûye û wan jî nepejirandiye. Li ser vê yekê 9 cerdevan û malbatên wan anîne û li wî gundî bi cih kirine. Polîtîkaya dewletê ya ku ji Sînopê karker tîne û li Licê bi cih dike û cerdevan tîne û li gundê ku cerdevan tunene bi cih dike polîtîkayên sala 1925an a bi navê "Şark Islahati Plani" tîne bîra mirovî.

Di rojnameya Cumhuriyetê ya 27ê kanûna pêşîna 1996an de nûçeyeke balkêş heye. Di nûçeyê de di raporeke bi navê "eşîr, terîqet, şêx û seyîd" de ku ji hêla yekîneyeke bi Alîkarê Serokê Giştî yê Partiya Refahê Abdulkadir Aksu ve girêdayî ye, hatiye amadekirin kut ê de ev tespît hene:

> "Li rojhilat û başûrê rojhilat hêza eşîran li ser rayedaran li gorî 1993-96an hema hema nîvenîv kêm bûye... Di kêmbûna hêza eşîran de roleke mezin a cerdevaniyê heye. Bi cerdevanan re pere dikeve gundan û gundî çiqas ji bin otorîteya eşîretan difilitin, dikevine bin baskê cerdevanan. Eşîr piştî 1990an di hilbijartinan de helwestên xwe yên hevpar winda kirin. Êdî ji eşîrekê du kes dikarin bibin berendam û helîna rayan de ev jî roleke mezin dilîze."





Ev tespît her çiqas bê zanîn ku li dijî daneyên berê ne jî û her wiha parvekirina vê raporê bi raya giştî re tê wê maneyê ku zemîneke "her ku tesîra eşîran li ser rayedaran kêm bibe, dê dengên RPyê û HADEPê zêde bibin" bi vî şiklî biafirînin. Heke ji bo sedemên din nebin û her wiha ji bo berevajîkirina rastiyan nebe, meseleyeke cuda mirov bîne bi cerdevaniyê ve girê bide ev tê wê maneyê ku yan dixwazin hiş tevilhev bin an jî analîzeke bêqîmet e.

### j. "Qey cerdevanî tê tasfîyekirin?"

Mûstafa Balbay di quncika xwe ya rojnameya Cumhuriyetê de di 12ê tebaxa 1997an de li ser pirsgirêka cerdevaniyê rawestaye:

> "Li ser neyîniyên pergala cerdevaniyê gelek caran tê sekinandin. Herî dawî di rojeva 55emîn ya hukûmetê de Alîkarê Serokwezîr Bulent Ecevît got ku divê ev pergal bikeve duzenekê. Lê belê cerdevan ji duzenê mixabin bêduzeniyê fêhm dikin. Di her fersendê de li rêya ku zêde ji derfetên dewletê sûd werbigirin, digerin."

Ji hêla buroya Diyarbekirê ya rojnameya Cumhuriyetê mînakên sûcên ku di meha dawî de ji hêla cerdevanan ve hatiye kirin, hat dayîn. Ev tablo daye nîşan ku li herêmê pergala cerdevaniyê bingeheke rêxistineke sûcbar jî bi xwe re ava kiriye. Ji hêla din ve tê zanîn ku dewlet jî hay ji vê tevgera cerdevanan çêbûye û dixwaze li hember vê tevgerê tevdîrên nû bigire. Di rojnameya Ulkede Gundemê ya 30yê tebaxa 1997an de bi navê "Qey cerdevanî tê tasfîyekirin?" nivîseke Cemîl Gundogan balê dikişande li ser biryareke Lijneya Ewlekariya Neteweyî ku tê de li ser rakirina halê awarte û rakirina cerdevaniyê nîqaş hatin kirin lê belê nîqaşên vê carê ji yên din cuda bûn. Li gor Gundogan dahata ji benzîna ku ji deriyê sînor yê Habûrê derbasî Tirkiyê dibû di civîna MGKê de dihat nîqaşkirin ku ew jî di daxuyaniya encama civînê de dihat gotin ku "ev dahat dê li gor berjewendiyeke neteweyî û edaleteke civakî bê parvekirin." Ev biryar jî dihat wê maneyê ku ranta vî karî ya ku herî zêde kêrî sercerdevanan dihat ku dê bihata guherandin.

Oral Çalışlar di nivîsa xwe ya rojnameya Cumhuriyetê ya 20ê çiriya paşîna 1997an de di lêkolînên xwe yên li herêma Şirnexê de gotiye ku hin cerdevan dixwazin ku divê cerdevaniya berwext ya gundan bibe herdemî û her wiha çend gotinên sercerdevanekî ji eşîra Goyanê Hazim Babatî wiha nivîsiye:

"Pirsgirêka kurdan tuneye. Ev lêanîneke ermenî ye. Dizî, bêrêtî û teror heye. Em hemû Tirk in."

Li gor nûçeya ku di rojnameya Ulkede Gundem a 30yê kanûna paşîn a 1998an de Abbas Babatê ku merivê Hamza Babat tê zanîn ku ev 10 sal in sercerdevanî dike bi 8 tivingên kalaşnîkof, sîleheke bi markeya Stern û 35 hezar guleyî ve hat girtin û got ku van muhîmatan ji PKKyî û leşkerên mirî civandiye û aniye firotiye cerdevanan. Ev nûçe gotina Hazim Babat a der barê dizî, bêrêtî û terorê de piştrast dike. Çimkî dîsa di rojnameya Ulkede Gundem a 17ê kanûna paşîna 1998an de di nûçeyekê de daye zanîn ew îhaleyên ku ji bo şewata qereqolên Şemdînlî, Yuksekova, Çukurca û Hekariyê û îhaleya ji bo xwarina Fermandariya Tugayê hatine kirin bi salan e dane "çeteya Yuksekovayê" ku mensûbên wê sercerdevan in. Ji ber fiyetên bilind ên di van îhaleyan de ji hêla mufetişan ve lêpirsîn hat kirin. Di nûçeyeke rojnameya Cumhuriyetê ya 4ê adara 1998an de Baroya Diyarbekirê di rapora ku pêşkêşê Serokê TBMMê Hîkmet Çetîn kirin de di ber meseleyên din de meseleya cerdevaniyê ku ev li herêmê bûye xetereyeke potansiyel a çekdariyê û her wiha her karê qirêj yê ku tê kirin di pişt nasnameya cerdevaniyê de tê kirin ku ev jî çînên rantiyeyê derdixîne holê ku divê teqez hay ji vê meselê hebin. Ji bilî perwerdeya leşkerî, ûnîformayeke yekrengî, operasyonên hevkar ku ji demeke zû de ye Sererkanî bi cerdevanan re di nav têkiliyê de ye, lêbelê hê jî bersiva ku çima naxwaze îstihdam bike, dibe ku ev be; Çimkî bi salan e ev qirêjiyên ku ji hêla cerdevanan ve tên kirin, aşîkar bi çavên xwe dibînin. Bi vê yekê re di rojnameya Milliyetê ya 23yê sibata 1998an de nûçeya li ser navê Tolga Şardan hat weşandin de nîqaş li ser rakirina pergala cerdevaniyê û her wiha piştî ku hat rakirin ka gel cerdevan bi çi şiklî bên îstîhdamkirin an wek xebatkerekî kamûyê bê wezîfedarkirin. Lê belê Sererkanî li fikra ku cerdevan di bin banê TSKê de bê wezîfedarkirin germ nebû.

Di rojnameya Ulkede Gundem a 7ê nîsana 1998an de di manşeta xwe ya bi navê "Bexşîneriya cejnê bo Cerdevanan" de dabû zanîn ku ji birêvebirên mezin yê PKKê Cemîl Bayik gotibû ku di nav sê mehan de kîjan cerdevan çek dayne dê bê efûkirin. Bayik banga xwe bi vî şiklî kiribû:

> "Di vê rewşa ku em tê de ne hûn jî ne kêfxweş in... Dema ku karên qirêj, kujerî pêk tên û welatparêzên kurd tên kuştin polîtîkavanên li Ankarayê dibêjin 'Artêşa me paqij e, vî karê qirêj cerdevan dikin' Hûn bi çi şiklî tevdigerin û bigerin, hûn di dilê vê dewletê de şirîn nabin...





> Hûn çiqas bi me re şer dikin bikin, me ji bo ayendeya zarokên xwe vê têkoşîna azadiyê domand... Hûn jî êdî dev ji vê cerdevaniyê berdin. Dev ji xencerkirina li pişt ve ya birayên xwe berdin."

Ya rastî banga Bayik bi awayekî eşkere ji bo bêhizûriya di nav malbatên cerdevanan de bû. Berî vî bangî 4 sal ewil di rojnameya Gundemê ya 4ê nîsana 1994an de di nûçeyekê de hatibû gotin ku ciwanekî ji ber ku bavê wî bûbû cerdevan li ber xwe neda û gund terk kir û her wiha aciziya gelek kesî bi vî şiklî heye. Yek ji ciwanan li ser pirsa heke bavê te di şerê bi gerîlayan de bimire, tu yê çi hîs bikî gelo wiha bersivandiye:

> "Ez ê ji vê yekê dewletê berpirs bikim. Çimkî bavê min bi zorê kete vî karî... Heke bavê min rabe biçe pevçûnê ez ê vêya bikim stûyê dewletê. Û bi tu awayî ez ê li dijî têkoşîna azadiya gelê kurd dernekevim."

Di rojnameya Cûmhuriyetê ya 1ê tîrmeha 1998an de di nûçeyekê de pergala cerdevaniyê di civîna dawî ya MGKê de careke din hate nîqaşkirin û hat xwestin ku ev pergal di demeke dirêj de bê tasfîyekirin:

> "Di MGKê de hat gotin ku heke tasfîyekirina cerdevanên berwext ên gundan çêbe û piştî wî jî heke qala tazmînatê bê kirin, bi daxwaza teqwîdbûyînê dibe ku were zêdekirin. Ji bo ku cerdevan teşwîqê teqawîdiyê bibin, dê temenê teqawîdbûyînê bê daxistin. Cerdevanên ku şertên wan ên fîzîkî musaît bin dê tevilkirina hêzên parastinê re bên îstîhdamkirin. Ji hin cerdevanan re jî dibe ku li şaredariyan kar bê dîtin û li wan deran bi awayekî peywirdarê ewlekariyê sûd bê wergirtin."

Di nûçeya rojnameya 17ê tîrmeha 1998an de piştî ku PKKyê êrîşî cerdevanan kir, piştre vegotina PKKyê ya ku der barê efûkirina cerdevanên ku çekan bedrin de hat kirin. Di meha adarê de piştî dused cerdevanên ku îstîfa kirin, dewlet li hemberî van îstîfayan hin tedbîr stend. Mînak; li ser pêşnûmaya zagonekê tê sekinandin ji bo mafên cerdevanên ku tê başkirin, temînkirina xerckirina tenduristiyê, ji hêlekê rexneyek der barê zerarên cerdevaniyê, ji hêlekê jî gurdaneke (tabûreke) ji îtîrafkar û cerdevanan pêk tê, tê avakirin... Lê ev jî rewşeke tevlihev derdixe holê. Lewre di nûçeya rojnameya Millîyeta 15ê çiriya pêşîna 1998an de tê gotin ku li navçeya Çataka Wanê tabûra cerdevanên bi perwerdeya taybet ya ku bi navê "Şîmşekler" tê naskirin, ji hêla PKKyê ve

ketin nav kemînekê. Di nûçeyê de ji bilî vê tê gotin ku tabûra Şîmşekê beriya du salan pêk hatiye. Tabûra ku ji du sed cerdevanan pêk hatibû piştre ji bo ku heşt sed cerdevan zêde bibe, çar tabûrên din pêk hat. Serokê Şîmşeka ku ji hêla mensûbên eşîreta Özbek, Alan û îtîrafkarên PKKyê pêk tê, bi navê serokê cerdevaniyê Şban Kahraman tê naskirin.

Piştî salek bi şûnde di rojevê de aciziya Şîmşekan cih girtiye. Di nûçeya rojnameya Ozgur Bakışa 3yê Kanûna paşîna 2000an de tê gotin ku mensûbê cerdevanên taybet yên ku bi navê Şîmşekan tê naskirin û her wiha serokên cerdevanan ên ku li bajarê Wanê tê naskirin, xwestina rakirina sîstema cerdevaniyê anîn zimên. Di gel vê jî daxwaziya îstîhdamkirina cuda jî anîn zimên. Lê ev daxwaziyana nehatin cih. Di rojnameya 17ê kanûna paşîna 2003an de tê gotin ku amadehiya cenga ku ABDyê li Iraqê bike, di Tîma Cerdevanan a Taybet a bi navê Şîmşekan sêsed kesên ku cerdevan in, li hemberî cenga Iraqê perwerde girtine. Her wiha tê gotin ku heman rewş li navçeya Şemzînana ku girêdayî Colemêrgê dest pê kiriye. Li gorî hevpeyvîna Pinar Seleka ku di rojnameya 25ê nîsana 2005an de kiriye li gundê Xrabedarê girêdayî navçeya Gurpinara Wanê, Şîmşekên ku êrîşî ser gundan kirine di rojevê de ne. Di hevpeyvînê de ji bilî vê behsa kesên ku ji gundên xwe koç kirine û kesên ku dîsa vegeriyane gundên xwe û ji bo ku nebin cerdevan çawa li ber xwe dane dike. Di berdewamiyê de behsa kesên ku çawa û ji bo çi cerdevanî qebûl kirine û operasyonên ku dema cerdevan bûn jî dike.

Rojnameya Cumhuriyetê ya 11ê sibata 1999an di rûpela xwe ya ewil de dest nîşan kiriye ku "kurapê parlamanterê Rihayê yê DYPê Sedat Bucak yê bi navê Ali İhsan Bucakê 73 salî ji bo ku berteka xwe nîşanî çeteyan bide dîsa ji Rihayê bû namzetê partiya DSPê. "Ev nûçe, bi nûçeya ku di 27ê kanûna pêşîna 1996an de hat weşandin ya ku di rapora RPê de cih digirt ya bi sernavê "eşîr dibin du perçe" wek hev in. Lê belê, sedema vê perçebûnê weke ku di raporê de derbas dibe gelo cerdevaniyê ew bi guman e. Ji aliyê din ve Ali İhsan Bucakê ku xwe weke cerdevan û Atatirkçî nîşan dida digot; "Bucakî nebûne du perçe. Tenê ji aliyê siyasî ve em ji hev qetiyane." Û di berdewamiya axaftina xwe de digot eşîr destekê dide min. Ji bilî vê gotinên Bucak yên "Bi ya min divê cerdevanî ranebe. Lêbelê, divê her kes sînorê xwe biparêze. Ma em ne dewlet in." di rojnameyê de cih girtiye.

Rojnameya Ozgur Bakişa 25ê nîsana 1999an nivîsiye ku, tevî ku HADEPê piraniya dengê gelê herêmê stendiye jî benda hilbijartinê ya ji sedî deh derbas





nekiriye û di encama vê de cerdevan weke parlamenter ketine meclisê. Li gor vê nûçeyê, Hakkı Tore ji Colemêrgê, Mehmet Sait Deger ji Şirnexê, Sedat Edip Bucak ji Rihayê bûne parlamenterên DYPê; Ji Mêrdîn Süleyman Çelebi bûye parlamenterê ANAPê. Li Şirnex, Beytuşşebap, Silopî, Qileban, Basa, Îdîl, bajaroka Mezra, Uzungeçit, Şenoba û Kumçatıyê DYP, ANAP û DSP ku cerdevan weke namzet nîşan dabûn hilbijartin qezenc kirine. Ji aliyê din ve, parlamenterê DYPê yê ji Hekariyê Mustafa Zeydan dest nîşan kiriye ku hin cerdevanên ku ji Mêrdîn û Şirnexê bûne namzet rayên hewce nestendine.

Rojnameya Ozgur Bakiş di hejmara xwe ya 2yê çiriya paşîna 1999an de li ser "destdirêjiya cerdevanan" ku berê jî tim dihat rojevê, lêbelê bê ceza dima, disekine. Li gor vê nûçeyê, li navçeya Diyarbekirê Qulpê, keçeke 14 salî piştî ku bavê wê dimire, diçe li cem merivên xwe yên cerdevan. Li mala wan dimîne. Paşê ji aliyê kurê malê ku ew jî cerdevan e rastî destdirêjiyê tê. Piştî ku merivên wê yên cerdevaniyê nakin pê dihesin keçik ducanî ye, gilîdar dibin. Cerdavanê ku qereqol bangî wî dikin piştî îfadeyê, wî serbest berdidin. Di heman rojnameya 11ê çiriya paşîna 1999an de jî tê destnîşankirin keçika ku rastî destdirêjiyê hat li nexwşxaneyê zarokek mirî ya heft mehî aniye û ew kesê ku bi destdirêjiyê dihat sucdarkirin jî tu agahî jê nestendine. Di hejmara rojnameyê ya 16ê çiriya paşîna 1999an de jî ev nûçe derbas dibe; keça ku destdirêjî li wê kirin bi biryara malbata xwe ve hatiye kuştin û di navbera merivên wê yên cerdevan û necerdevan de pevçûn derketiye.

Di hejmara 11ê sibata 2000î ya rojnameya Ozgur Bakişê de jî nûçeyeke wiha derbas dibe; Li Hekarî, Wan, Şirnex, Bitlîs û Mûşê ji cerdevanan dîplomaya dibistana seretayî tê xwestin, kesên ku dîplomaya wan tunebe dê çekên wan ji wan bên stendin. Ji xwe gelek cerdevan bê dîploma bûn. Ev jî nîşan dide ku ev sepandin ji bo ku cerdevanî bê tasfiyekirin gavek e. Di nûçeya rojnameya Ozgur Bakişê ya 17ê sibata 2000î de jî tê destnîşankirin ku; ji aliyê fermandariya alayê ya Mêrdînê ve nivîsek ji qeymeqamtiyan û fermandariya tabûrê re tê şandin û lîsteya mal û milkê cerdevanan û beriya cerdevaniyê çi kar dikirin tê xwestin. Ji banqe û mudîriyeta tapûyê der heqê mal û milkê cerdevanan de agahî tê komkirin. Ji bilî vê li navçeyan hejmara karkerên ku tesîsên dewletê de dixebitin û pêdivî tê tespîtkirin. Hin nûçeyan jî fikir dida rayedarên ku dixwestin ji bo pergala cerdevaniyê verastkirinên nû bînin. Mînak, di nûçeya 19ê çiriya pêşîna 2001ê de dihat destnîşankirin ku 17 "cerdevanên xiyalî" ku Sasona Batmanê terikandibûn û koçî bajarên din kiribûn bi salan ji dewletê mehanî stendine û

ji ber ku navê wan dişibiyan hevdu, li ser navê merivên xwe yên mirî mehanî distendin. Nûçeyeke kurt ku di rojnameya Milliyetê ya 12ê adara 2000î de derbas dibe jî wiha ye:

> "Wezîrê karên hundir û parlamenterê wê heyamê Nahit Menteşeyê DYP yê Aydınê li ser pirsên der heqê çekên winda yên li Batmanê ku gotibû 'Nayê bîra min' hişê wî hat serê wî. Menteşe piştî hevdîtina ku bi Çillerê re kir ji rojnameya Milliyetê re got, ew çekên ku ji aliyê Walîtiya Batmanê ve hatibûn îtxalkirin, dema ku li cerdevanan hatin belavkirin dibe ku bê ûsûlî çêbûbe. Menteşe dest nîşan kir ku di dema gera Batmanê de tîmên bi kincên taybet dîtine û axaftina xwe wiha dewam kir: 'Min got qey çek li cerdevanên gundan û cerdevanên dildar hatine belavkirin. Di vê derê de dibe ku bêûsûliyek hatibe kirin.'"

Ew kesên ku ji serî de wek Menteşe nedifikirîn û li dijî cerdevaniyê bûn, piştî van gotinên Menteşe wisa xuya dike ku xwe mafdar dibînin.

**k. "Saziyên civakî yên sîvîl yên Piştgiriya dewletê distînin": Komeleyên Cerdevanan**

Di nûçeya rojnameya Gundemê ya 2yê çiriya pêşîna 2001ê de derbas dibe ku li berê li Kercosa Batmanê komeleya cerdevanan hatibû avakirin, niha jî li Diyarbekirê komeleyeke mîna vê bi navê "Komeleya Piştevanî û Arîkarî Ya Cerdevanên Sasonê" hatiye avakirin. Tê gotin ku serokatiya vê komeleyê jî Fewzî Yalçınê ku navê wî di gelek kuştinan de derbas bûye kiriye. Armanca rêznameya komeleya ku hezar û çarsed endamên wê hene wiha ye:

> "Nêrîn û tamîra amûrên wesayîtên cerdevanan û heke hewce bike yên nû bên kirîn. Di wezîfeyên derveyî bajêr de heqê xwarin û sotemeniya wesayîtên cerdevanan dê bê dayîn. Di mirin, birîndarî û nexweşiya jin û merivên cerdevanan de dê arîkarî bê kirin. Dê bi malbatên cerdevanên şehît û gazî arîkarî bê kirin." Komele ji bo ku van armancên xwe yên jorîn bîne cih têkîldarî nirxên me yên Exlaqê Giştî û Çanda Giştî ya Neteweyî pêşbazî, konferans, şahî, pişkavêtin, pîrozbahî û rojên bibîranînê li dar dixist."

Şîroveya vê nûçeyê jî wiha ye, "cerdevanên ku tê xwestin ku bê rakirin, ji bo ku bêkar nemînin rêxistinî dibin. "Ev rêxistinî di salên pêş de jî bi awayekî lezgîn zêde bûye û êdî cerdevan rayeya wan zêdetir bûye. Lewra, di nûçeya





kovara Noktayê ya 1-7ê Adara 2007an de ya bi ser navê "STKya Cerdevanan ya Bi Piştgiriya Dewletê" de wiha dihat destnîşankirin: "Komeleya Piştevanî û Arîkarî ya Cerdevanên Gund yên Bihurbar ya Şemzînanê hatiye avakirin û vekirina wê ji aliyê qeymeqam û fermandarê garnîzonê hatiye kirin. Komeleyê her meh ji endaman mehanî distend û armanca wê ew bû arîkariyê bi cerdevan û malbatên wan yên ku rewşa wan nebaş bû bike. Û dihat gotin ku têkiliya komeleyê bi tu awayî bi sîyasetê ve tuneye. Ji aliyê din ve, nivîskara pirtûka bi navê *Terörün Bekçileri/Hamidiye Alaylarından Günümüze Koruculuk* (2007) Bêrîvan Tapan di kitêba xwe de li ser armanca avakirina komeleyên cerdevanan, neheqiya li ser wan disekine û dibêje armanca wan tenê ne piştevanî ye. Armanca wan ew e ku bi komeleyê weke esker û cendirmeyan bêtir bi rêxistinî hereket bikin.[14] Li gor her sê nûçeyan, hejmara endamên komeleyên cerdevanan ku weke saziyên sîvîl in 3 hezar û 801 e, hejmara cerdevanan jî nêzî 81 hezar e.

Di rojnameya Cumhuriyetê ya 2yê hezîrana 2002yan de hatiye gotin ku rakirina OHALê li Tûncelî û Hekariyê û cara dawî li Diyarbekir û Şirnexê dirêjkirina wextê OHALê xelkê li wir kêfxweş kiriye. Di nûçeyê de hin gotinên Serokê Şaxa Diyarbekirê yê Komela Hevkarî û Alîkariya Koçberan (GOÇ-DER) Parêzer Serdar Talay wiha bûn:

> "OHAL rabû lêbelê divê cerdevanî jî rabe. Rehabîlîtasyona van mirovan jî gelek girîng e."

Her wiha di rojnameya Milliyetê ya 29ê îlona 2002yan de Gokçer Tahincioglu di nûçeya xwe "Korucular 'O' halde kaldi" de cerdevanên ku piştî leşker û polêsan hêza çekdar ya herî mezin ya Tirkiyê ne ku hejmara wan gihiştiye 70 hezar kesî ji sala 1985an vir ve jî 23 hezar kesên ji wan ji ber bûyerên cuda hatine dûrxistin her wiha der barê vê sê mehê dawî de ku çi kirine û ew kesên ku di paş de vegeriyane gundan çawa kuştine tê gotin. Di rojnameya Cumhuriyetê ya 3yê çiriya pêşîna 2002yan de Serokê Şaxa Diyarbekirê yê İHDê Selahatin Demîrtaş gotiye ku ev meseleya ku li gundê Ugraka Bismilê qewimiye û bi mirinê qediyaye her wiha di paş de vegerînên li gundan de ji ber ku berjewendiyên cerdevanan xisar dibînin, meseleyên bi vî şiklî di bin serê cerdevanan de derdikevin. Di rojnameya Milliyetê ya 20ê tîrmeha 2002yan de malbatekê ku ji ber tirsa PKKê teklîfa cerdevaniyê qebûl nekiribû û di sala 1994an de ji gundê Nûrettîna Milazgirta Mûşê derketibûn û paş de vegeriyan

lêbelê piştî vê vegerînê ji hêla cerdevanan ve 3 kesên vê malbatê hatin kuştin. Piştre tê gotin ku ji cerdevanan 20 kes hatin girtin û 60 kes jî çekên di destê wan de ji wan hatin stendin.

Di rojnameya Demokrat Bakiş ya 27ê tîrmehê - 2yê tebaxa 2002yan de di dosyeya ku li ser cerdevanan hate amadekirin de wiha hatibû gotin. Ji bu ku çekên cerdevanan ji destên wan bên standin û di warên cuda de bên îstîhdamkirin li herêma pîlot a Şirnexê nêzî 80 cerdevanî di dibistanên seretayî de 21 cerdevan jî li Silopî-Xabûrê li TPICê (Turkish Petroleum International Company)wek peywirdarê ewlekariyê hatin îstîhdamkirin. Di dosyeyê de qala du raporên din jî dike ku yek ji van rapora Parlamanterê DYPê Salim Ensarioglu ku adara 2002yan de amadekiribû ye ku tê de dibêje cerdevanî gelê li herêmê dixe qirika hev, baweriya bi dewletê kêm dike û tehdîdekê li pergala unîteriyê dike. Rapora din jî ji hêla Zanîngeya Yuzuncuyilê di kanûna pêşîna 2001ê de hatibû amadekirin ku tê de dibêje cerdevan ji dewletê bêhtir bi serokên eşîran ve girêdayî ne, di kaçaxçîtiya madeya hişbir û sîlehê de cih digirin. Di rojnameya Ozgur Gundema 16ê kanûna paşîna 2003yan de hin agahiyên vê nûçeya li jorê ji nû ve hatine weşandin. Li gor nûçeyê cerdevanên ku gotine em ji bo ku bibin xidame neketine vî karî bertekên xwe nîşan dane û yan gelek kes ji wan vî karî nepejirandiye yan jî dev ji vî karî berdane. Îcar jî rapora ku Zanîngeha Wan Yuzuncuyilê amadekiribû wek ku bi Fermandariya Asayîşê ya Cendirmeyana re hevkar amade kiribe hat gotin û ji nû ve wiha hat gotin:

> "Di vê pêvajoya dawî de cerdevanên ku dev ji cerdevaniyê berdane û derbasî cotkarî û an jî karekî din bûne fikariyeke mezin peyda dike. Di cerdevanan de mantixa memûriyeta dewletê peyda bûye ku vê jî berhêneriyê di wan de kêm kiriye."

Di nûçeya Ozgur Gundemê ya 28ê îlona 2002yan de di nûçeya manşetê de qala hilbijartinên giştî yên 3yê çiriya paşîn kiriye ku li Şirnexê Hazim Babat û Kamîl Atakê ku dixwestin berendamiya xwe ya parlamanteriyê deynin lêbelê ji ber ku sabiqeyên wan hebûn ji hêla MHPê ve hat redkirin û ji hêla DYPê ve hat pejirandin lêbelê dîsa navê MHPê bi sê cerdevanên rişwetxwir derket ku li Şirnexê berendamiya xwe danîne. Di nûçeyê de tê zanîn ku Atak berê di RP û MHPê de du serdem li Cizîrê bûye şaredar. Wekî din dîsa di rojnameya Ozgur Gundema 6ê kanûna paşîna 2003yan de li Çukurcaya Hekariyê cerdevanên ku anîne Fermandariya Qereqolê ji wan re tamîma Wezareta Karên Hundir





hat xwendin ku divê din av partiyên siyasî de ji vir ha de cerdevan tunebin ku hebin jî divê îstîfa bikin. Li ser vê yekê DEHAP ne tê de bi tevahî 140 cerdevan ji endamtiya xwe ya partiyên siyasî îstîfa kirin û li ser vê yekê MHP ji ber tunebûna tu kesî kilît li deriyê xwe xist û hin partiyên din jî yan tenê serokên wan man an jî bê serok man.

Di rojnameya Ozgur Gundema 19ê çiriya paşîna 2003yan de hatibû gotin ku DEHAP ji bo cerdevaniya ku li pêşberê aştiya navcivakî wek bendavekê ye rabe di nav xebatê de ye û her wiha ji bo ku bi cerdevan û mexdûrên cerdevaniyê re hevdîtinan pêk bîne çûye herêmê. Di nûçeyê de gotinên Serokê Komîsyona Aştiya Civakî ya DEHAPê yên Orhan Mîroglu yên der barê bûyerên berê de wiha bûn:

> "...êdî divê saziyên sîvîl ên li Tirkiyê, partiyên siyasî yên aştîxwaz Komîsyona Lêkolîna Heqîqetan ava bikin û nîqaşan bidin destpêkirin. Ev komîsyonên ku li Afrîkaya başûr, Guetamala, Şîlî, Çad û Ûgandayê hatin avakirin ji b o ayendeyeke demokratîk, rehetbûna wijdana civakê, avakirina keltûreke aştiyane rolên mezin girtine li ser milên xwe."

Di nûçeyê de dihat ragihandin ku li 22 bajaran 58 hezar û 511 cerdevan hene, pêşniyazên çareseriyê yên Komîsyonê bi vî awayî hatine rêzkiri: Divê çekdanîn di demeke periyodîk de bê belavkirin, cerdevanên ku temenên wan li ser 45 salî bin bên teqawîdkirin û yên ku temenên wan di bin 45 salî de bin jî bi projeyên aborî û civakî bên destekkirin. Divê birokrasiya herêmî û merkezî jî piştgiriya vê pêvajoyê bike. Heke li ser pêşniyazên Komîsyonê baldarî tunebe ev ne tiştek e awarte û ecêb e. Lêbelê rûdanên ecêb diqewimin**.**

### I. Astengên vegera li gundan: Cerdevan

Di nûçeya rojnameya Huriyeta 27ê tebexa 2004an de cerdevanên di sala 1994an de ku li gundê Suryaniyan yê Sarıkoyê ku li ser navçeya Îdîla Şirnexê ve ye hatibûn bicihkirin û ji ser vê yekê nedixwestin ji gund derkevin, Waliyê Şirnexê Osman Guneş dibêje ku ji aliyê rayedarên wê demê ev cerdevan nehiqûqî anîne gund û "bi emrê ku ji wezaretê hatibû ber destê min, min ji bo valakirina gund emir da cendirmeyan" wekî din cî dide van gotinên Guneş:

> "Mafên cerdevanan tune li vî gundî bimînin. Ew mal yên hemwelatiyên me yên din in. Xwediyên malan dixwazin di xaniyên xwe de bi cî bibin. Tu

deynê dewletê ji cerdevanên wê derê re tunene. Heke ew cerdevaniyê dikin jî dewlet berdêla vî tiştî dide wan."

Ji aliyê din Sercerdevan Mehmet Ali Bulut dibêje dema me li gundê Yaylalarê cerdevanî dikir, ji terefê Waliyê Şirnexê û Qeymeqamê Îdilê yên wê demê bi devkî emir dan me ji bo em li vî gundî cerdevaniyê bikin û wiha dewam kir:

> "Me ev tişt heq nedikir. Li vî gundî 240 kes dijîn. Heke em li vir vala bikin cihekî ku em herinê tunene. Bila ji me re xanî bê çêkirin, em jî gund vala bikin. Çavên me di axa kesekî de tunene**.** Em gefan li kesekî naxin."

Di nûçeya rojnameya Cumhuriyeta 29ê tebaxa 2004an de jî agahî dide cerdevanên "Sarikoy"ê bi îqazên walîtiyî û hemî saziyên rayedar û di gel pêşniyazên alîkariya xanî û malzemeyan jî ji gund derneketine. Di rojnameya Gundema 8ê îlona 2004an de jî cî daye hevpeyvîna ku bi sekreterê Komeleya Federasyonên Suryaniyan a ku navenda wê li Elmanyayê ye, Johann Roumee, radigihîne ku komeleyên Suryaniyan yên li Ewropayê ji rayedarên Komara Tirkiyê re name şandin û ji rayedaran daxwaza rakirina cerdevaniyê û vegera li gundan kirin. Di nûçeya rojnameya 15ê çiriya pêşîna 2004an de jî agahî dide ku bi rêya Eren Keskîn parêzerê êzidiyên ji gundê Kivexê ya li ser Hezexa Şirnexê ku bixwe xwediyê li wir bûn, têkoşîneke hiqûqî hatibû dayîn û hatibû xwestin ku gund ji cerdevanan bê valakirin. Piştî encameke erênî ji hêla Qeymeqamtiya Hezexê ve biryar hatiye girtin ku bi merasimekê gund bê valakirin û teslîmê xwediyê wî yê berê bê kirin.

Di nûçeya Rojnameya Gundema 4ê çiriya pêşîna 2004an de hatibû gotin ku hikûmet şûna sîstema rakirina cerdevaniyê, li ser van awayan xebatan dike: kêmkirina rêjeya sucên ku cerdevan dikin, li ser wan kontroleke baştir, perwerdeya cerdevanan, baweriya wan ya bi dewletê bê zêdekirin û ên ku êdî nikaribin cerdevaniyê bikin di hin karên din de bên îstîhdamkirin. Dîtinên di nivîsa Dr. Veli Fatih Guven ya di hejmara dawî ya kovara "Stratejik Analiz" ya ku Navenda Vekolînên Stratejîk ên Awrasyayê diweşînin hatiye veguhestin. Di nivîsa ku nivîskar li ser sûda domandina sîstema cerdevaniyê disekine û îqaz dike heke cerdevantî bê rakirin "hem têkoşîna li hember PKKê dê têkeve tengasiyê hem jî ev yek ê têkeve bandora propagandaya rêxistinê." Hatiye veguhestin ku di





"zêdebûna rêjeya sûcên cerdevan dikin tehrîkên PKKê bandor kirine." Cî dide pêşniyazên nivîskar jî ku dibêje cerdevan di demek şûn de "Ên nifşeke ji ber xwe ku li derveyê sîstemê maye ava bikin" û "divê tevî her tiştî jî dewlet ji cerdevanan re muemeleyê bi dilsozî dewam bike."

> "Dewlet… divê ji bo bihêzkirina hişmendiya; yekîtî, tevahî û têkoşîna li dijî terorê ku bi cerdevanan re heye giraniyê bide perwerdeyan û divê vê hişmendiyê ji bo ku bigihîne nifşên ayende xebatan bike."

Tiştê ku xuya dike, sîstema cerdevaniyê kiryarek e, bi qasî ku ji aliyê dewletê ve tê pejirandin û parastin heta zêdetir ji aliyê dewletperestan jî tê pejirandin û parastin. Bi rastî maliyeta cerdevantiyê li dewletê çiqas diçe zêde dibe, cerdevan ne tenê ji aliyê civakî û siyasî ji aliyê aborî jî li ser pişta dewletê dibe barek.

Nexasim di nûçeya rojnameya Gundema 1ê gulana 2005an de, ji ber di sala 1994an de bi destê cerdevanan şewitandina gundê Nurettîn yê li ser navçeya Milazgirta Muşê ku gundiyan li dijî Tirkiyê dozê li Dadgeha Ewropayê ya Mafên Mirovan vekiribûn û qezenc kirin. Dewlet 15 hezar Sterlînên îngilizî tazmînat dabû gundiyan, dewlet ji bo ku dîsa wî pereyê ji paş de bistîne doza rûcûyê li berpirsiyarên bûyerê, cerdevanan vedike, lê tê diyarkirin ku di bûyerên mîna vê de li hember polês an cendermeyan tu doza rûcûyê nehatiye vekirin. Di nûçeya rojnameya Gundema 11ê çiriya paşîna 2005an de jî hatibû gotin, doza di 1997an de li dijî deh cerdevanên ku di sala 1993an de li navçeya Midyata Mêrdînê 8 kes kuştibûn hatibû vekirin, di sala 2000î de li gel bereata hin cerdevanan jî li ser biryara Dadgeha Ewropayê ya Mafên Mirovan ku xwediyên gundiyan serî lê dabûn dîsa hatiye dîtin û vê carê ji cerdevavan re 25 sal cezaya hepsê tê dayîn.

Ji hêla din ve di rojnameya Gundemê ya 23yê hezîrana 2006an de hatiye gotin ku Sererkanî li ser cerdevanên ku ev çend mehên dawîn in kêmasiya maaş û ewlekeriya xwe wek sebeb didin pêş û naçin operasyonan û çekên xwe ji dest danîne bi Wezareta Darayî re pêşnûmayeke ku "bêyî prîm teqawîd bin" tê amadekirin. Di rojnameya Gundemê ya 18ê tebaxa 2007an de nûçeyeke bi vî şiklî derbas dibe ku di vê serdema dawî de li herêmê piştî ku pevçûn dîsa gur bûn, Sererkan Yaşar Buyukanit cerdevan qebûl kirin û bi hev re çûn serdana Anitkabîrê. Dewlet hem dixwaze ji cerdevanan xelas bibe hem jî naxwaze ku cerdevan bi xwe re pirsgirêkeke nû derxînin holê. Ji ber wê yekê dixwaze

dîmeneke wisa bide nîşanê milet ku hem dê ji cerdevanan ji xwe nexeyidînin hem jî dê bi awayekî medenî ji wan xelas bibin. Lêbelê ev ne tiştekî ew qas asan e, çimkî têkiliya di navbera cerdevan û dewletê de gelek têkilhev e. Her wiha rojnameya Alternatîfê ya 1ê tebaxa 2008an di nûçeyeke xwe de li ser têkiliyên cerdevan, îtirafkar, kontrgerîlla û JİTEMê yên ku di îdianameya Ergenekonê de derbas dibûn sekinî. Li gor agahiyên ku di îdianameyê de debas dibin kesekî bi navê Abdulmuttalîp Tonçer pêşî dibe milîtanê PKKê piştre teslîmê DGMê dibe û tê darizandin lêbelê ji ber ku dibe îtîrafkar ceza naxwe û paşê jî li Mûşê di pexşa îstîxbaratê ya cendirmeyan de leşkeriya xwe dike û piştî ku terhîs dibe jî dibe cerdevan û di vê serdemê de bi JİTEMÊ re jî xebitiye.

#### m. "Qetliyama li gundê Bîlgeyê"

Meseleya ku raya giştî wek qetliyama gundê Bilgeyê dizane ku li Mêrdînê doza xwînê ya di navbera du malbatan de bi mirina 44 kesî qediya di rojnaeya Cumhuriyetê ya 6ê gulana 2009an de di rûpela nehemîn de cihekî berfireh girt. Di nûçeyê de cih dabûn hin gotinên Serokê Odeya Qesaban Saît Şanlı ku li Diyarbekirê bi sedan dozên xwînê bi aştiyê bi encam kiribû:

> "Min jî dizanibû ku di navbera malbatên Ari û Çelebî de dijmintî heye. Cara ewil di sala 1992yan de bi hev çûne. Ji ber ku ji canê xwe ewle bin û bi rehetî çek bigirin destê xwe bûne cerdevan."

Di nivîsa ku di heman rûpelê de cih digirt ku Mehmet Faraç nivîsîbû dihat gotin ku "Bi Kalaşnîkofên ku dewlet ji ber cerdevaniyê dida komkujî pêk tên." Di peyamên şermezarkirinê de yên ku rayedarên mezin yên dewletê weşandine de tê dîtin ku piçik neketine nav meseleya cerdevaniyê. Dîsa di rojnaeya Gundemê ya 6ê gulanê de bi awayekî berfireh qala vê bûyerê hatiye kirin ku rayedarên dewletê jê re digotin "kujeriya toreyê" temsîlkarên rêxistinê û partiyên mûxalif jî digotin "kujeriya cerdevaniyê". Yuksel Genç di nivîsa xwe ya ku di heman rûpelê de cih digire de dibêje ku li gelek deveran bûyer û kujeriyên bi vî rengî li ser kurdan wek tore lansekirin tenê nêrîna "desthilatdar, nijadperest, oryantalîst" dide nîşan û wiha axiviye:

> "Li bal vê bûyerê, ji dêvila balkişandina li ser mekanîzma "cerdevaniyê", mehkûmkirina rewşê bi toreyê û paqijkirina berpirsiyariya dewletê, nayê qebûlkirin."





Hejmara rojnameyê ya 7ê gulanê cih daye fikrên Prof. Dr. Tulîn İçli ya endamê beşa civaknasiyê ya Zanîngeha Hacettepe ku bi xebatên xwe yê li ser qetla toreyê û namûsê tê nasîn . Tulîn, divê ev êrîş bi tu awayî weke qefleke toreyî neyê pejirandin, ev bûyereke sosyolojîk e ku hîn mahîyeta wê nehatiye fêmkirin.

Hîkmet Çetînkaya di qunciknivîsa xwe ya rojnameya Cumhuriyetê de ya 7ê gulana 2009an de tespîtê dike ku "dewleta civakeke eşîrî ya bi çek alisandiye" gundê Bilge teslîmî qetilvanan kiriye û Mezopotamya û İyonya newarê iptidaiyê bûye, bîlakîs warê dîrok û çandê bûye. Di nûçeyek de di heman rûpelê de tê gotin ku "cerdevan" dest daniye ser malbatên ku ji gund barkirine û malbatên ku dixwazin vegerin gund û merivên wan ji hêla "cerdevaniyê" ve gef li wan hatiye xwarin. Dîsa di heman rûpelê de, bi îmza Mehmet Faraç, her çiqas wesfên paşverû û barbarî di tore û saziya feodal di xwe de dihewîne jî dîsa qeyîdeyên exlaqî û mirovan digihîne aşitiyê dihundirîne. Faraç dibêje ev tore û saziya feodal kuştine zarok û pîrekên ducanî û kesên li ser nimêjê napejirîne:

> "Ev kesên li Mêrdînê bê xof 44 mirov qetil kirin, ji ber ku li hember xwe tu eşîr nedîtine ev xwîn rijandine."

Faraç dibêje ev bûyera wahşî û hov, ne ji adetên kurdan dizûhîne. Faraç îfade dike ev bûyera ku di çapemeniyê de wek bûyereke hov û wehşiyane tê nîşandayîn ne ji kevneşopa gelê kurd e û dixwaze ew nêrîna ku eşîran wek sindoqa dengan dibîne biguhere û pergala cerdevaniyê rabe. Eşkere ye ku ev yeka hêzeke çekdarî û siyasî dide eşîran û ev jî wan teşwîqê zordariya li ser xelkê dike ku tu carî nikaribin her du alî bên li cem hev. Dewlet di şûna pergala eşîriyê ya kevneşop de bêyî ku rewşeke modern a ku ji hêla rewşa civakî, aborî û rêxistinî ve durust be, saz bike, her diçe civakê davêje hembêza tundî û xizaniyê.

Di rojnameya Cumhuriyetê ya 8ê gulana 2009an de di nûçeyeke din de tê îdiakirin egera qetliyama ku çêbû bi pirsgirêkên "evîna qedexe" an jî "hevpariya ranta esrarê" ve tê girêdan. Hatiye ragihandin ku her du malbat ji berê ve ye di eraziyan de esrarê diçînin û ranta wê li hev parî dikin, lêbelê piştî ku kadastro kete nav erd û erazî wekhev nehat parvekirin vê dijminatiyê dest pê kir. Di heman rûpelê de di nûçeyeke din de gotinên Alîkarê Serokwezîr Cemîl Çîçek wiha ne:

> "Divê mesele tenê bi aliyekî ve neyê dîtin û ji gelek hêlan ve bê nirxandin… Heke hewcedariya islahkirinê hebe mirov dikare islah bike na jî hewce be ku rabe dê bê rakirin. Ev meseleyeke cuda ye."

Qey nexistine bîrê ku ev sih sal in li Meclisê ev mesele bi her awayî hatiye nirxandin, nepakiyên wê hatin gotin û dîsa der barê islahkirin û rakirina wê de gelek caran axaftinên meclisê çêbûne û ji hêla komîsyonan ve rapor hatine amadekirin. Di rojanameya Gunlukê ya heman rojî de dîsa hat zanîn ku li Wanê 26 cerdevanan çekên xwe danîn û gotin ku me ji vê yekê şerm kiriye. Di hejmara 9ê gulanê ya rojnameyê de axaftinên Serokê Daîreya Ragihandinê ya Sererkaniyê Metin Gurak yên der barê meseleya Mêrdîne de wiha dabûn: "em ew kesên ku vê meseleyê bi pergala cerdevaniyê re girê didin durust nabînin û van gotinan wek pêşdarezekê dibînin." Tişta ku Gurak tênegihiştiye ew e ku ev mesele ne pirsgirêkeke cerdevanan e ev pirsgirêk ya pergala cerdevaniyê ye.

Di rojnamaye Gunlukê ya 11ê gulana 2009an de di hevpeyvîna ku ji hêla Yuksel Genç ve bi Hîndekara Beşa Sosyolojiyê ya Zanîngeha Bogaziçiyê Alk. Doç. Dr. Nazan Ustundag hevpeyvînek hat kirin. Di hevpeyvînê de Ustundag gotiye ku "tegeheke mîna cerdevaniyê" tuneye, tişta ku jê re dibêjin cerdevanî "hêza paramîlîter" e û wiha dewam kiriye:

> "Li Tirkiyê ji vê pergala paralimiter re gotin "cerdevan" û di bin vî navî de bingeheke paralîmîter hat sazkirin û meşrûkirin. Lê di lîteratura cîhanê de dema ku dewletê çek da destê sîvîlan ev dibe paramîlîtarîzm. Ev tişt li dijî hemû qanûnên cîhanê ne."

Ustundag gotiye mesela Mêrdînê ne mesleyeke toreyî û perwerdeyê ye û wiha pê de çûye:

> "Her kes dizane ku ev ne tore ye. exlaqek û qanûneke toreyê bixwe heye. Di toreyê de mekanîzmayên pirsgirêkan û çareseriyan jî hene… Ez dikarim mîna vê meseleyê gelek bûyerên din yên ku bi egera toreyê qeyd bûne bibêjim. Yek ji van jî ne kujeriya toreyê ye. Ev hemû septomên ku ji salên hezar û nehsedî pê ve ye li devera kurdan tên kirin in… Dema ku kuştin jî dest pê kir erê qaşo yên ku perwerde dîtine baştir dizanin. Tayyîp Erdogan jî gotibû, 'hûn baş dizanin zarokan bikujin'. Kesên ku li Îsraîlê qetliyam kirin perwerde nedîtibûn qey?"

Di nivîseke rojnameya Cumhuriyetê ya 3yê tebaxa 2009an de encamên





rapora ku ji hêla 22 zanyar û Komela Perwerde û Geşedana Jiyaneke Hergavî hatibû amadekirin wiha bû:

> "Eleqa bûyerê bi kevneşopan re tuneye. Li gor piraniya kesên ku meselê kolane, tê de egerên berjewendiyên aborî û danexwarina hêzê û pirsgirêkên ji sîstemê hene ku bûye sedema rûdanê… Dema ku di dest mirovî de amûrên tundiyê hebin, qewimînên tundiyê rehetir dibin. Di vê bûyerê de mêrên çalak hemû cerdevan in û çekên wan hene. Rûdanên ku li vî gundî qewimîne, ji hêla herêmê ve nîşandayîneke axirtewr e."

Rayedarên dewletê yên ku berê jî guh nedabûn raporên bi vî şiklî dîsa bi nûçeya 2yê hezîrana 2009an rûyê xwe yê esil dane nîşan. Li gor nûçeyê li Dêrsimê bi tevahî 20 li navçeya Pulumurê 3 jê jin 27 cerdevan bi merasimekê bûn xwedî nasnameya cerdevaniyê.

**n. "Dîroka" Cerdevaniyê: Failên meçhûl, destdirêjî, sûc; tirs, wijdan, aştî**

Di rojnameya Gunlukê ya 6ê adara 2010ê de nûçeyeke bi vî awayî ku di salên 1993-1995an de li navçeya Cizîra Şirnexê bi mebesta ku ji 52 failên meçhûl berpirs in hin kes hatin darezandin. 7 mehkûmên ku di nav de fermandarê komî yê JÎTEMê Albay Cemal Temîzoz jî heye di danişîna Dadgeha Cezayê Giran ya 6emîn ya Diyarbekirê de ji mehkûman Sercerdevan Kamil Atak şahidên bûyeran û xizmên malbatên ku der barê wî de îfade dane tehdît kiriye, hatiye nivîsandin:

> "Navê kurê min Tarîh e. Tarîh dê tarîxekê binivîse, bila kes wiha bi rehetî îfade nede."

Tê zanîn ku hin rayedarên mezin yên dewletê jî bi heman terzî diaxivin. Di rojnameya Gunlukê ya 16ê adara 2010an de jî hatiye gotin ku Sererkan Îlker Başbûg di Sempozyûma Terorîzma Gerdûnî û Hevkariya Navneteweyî de axiviye û gotiye bi mebesta ku cerdevanî xizmetguzariya rêxistinê dike ji ber wê divê bê rakirin, fikreke şaş e û her wiha gotiye ku ev sîstem ji hêla DYAyê ve li Îraqê ji sala 2007an ve tê tetbîqkirin û dê heman pergal li Afganistanê jî were tetbîqkirin. Wek mînakên ku Başbûg jî daye li Tirkiye di demeke nêz de hat dîtin ku ev pergal çiqas bi serkeftî bû. Her wiha bi gotina ku Başbûg dibêje ji ber şaşiyên du-sê kesî ne hewce ye ev pergal were xerabkirin jî di rojnameya Gunlukê ya 27ê sibata

2010an de bi îtîrafên cerdavanekî şaşiyên ku Başbûg jê re digotin du-sê hebin jî hatibûn nivîsandin. Di nûçeya li ser vê yekê de di navbera salên 1990-1998an de li Nisêbînê Ethem Seyhanê ku cerdevanî kiriye, gotiye ku fermandarê qerekola herêmê yê wê çaxê û sercerdevan bi hev re ji 20î zêdetir gund şewitandine, ji ber ku gundî cerdevaniyê qebûl bikin, tûşê tundiya wan hatine û her wiha gelek welatiyên sîvîl kuştine û van yekan jî avêtine li ser PKKê.

Di nûçeyeke rojnameya Gunlukê ya 12ê hezîrana 2010an de hatiye îdîakirin ku li navçeya Dêrîkê ya li ser Mêrdînê eraziyên gundê Derînsûyê ji hêla cerdevanan ve hat şewitandin û li ser van eraziyan ji nû ve mal hatine çêkirin. Gundiyên xwediyê van îdiayan radigihînin ku par jî bi heman egerê cerdevan gilî kirine, piştî ku li qereqolê lêpirsîna wan qediya serbest hatine berdan û ji bo ku terka eraziyên xwe yên tapîkirî bikin, hatine tirsandin. Di hejmara 14ê hezîrana 2010an ya rojnameyê de jî tê ragihandin ku piştî destdirêjî û destavêtinên peywirdarên kamûyê, leşker û cerdevanan bi heman şiklî hin bûyer li Mêrdîn, Sêrt, Wan, Hekarî, Agirî, Qers û Dêrsimê jî rû dane. Li gor nûçeyê keça cerdavanekî nameyek nivîsiye ku tê de qala destdirêjiya ku ji hêla 6 cerdevan û personelekî nexweşxaneyê ve 3 sal li ser hev lê hatiye kirin û her wiha ji hêla fermandarê qereqolê jî dest avêtiyê ku 5 meh in jî ducanî maye. Bavê keçikê jî daye zanîn ku keça wî tirsiyaye ku gilî li dozgeriyê bike û di şûna wî de ew bixwe çûye dozgeriyê û bavê keçikê di axaftina xwe de wiha dewam kiriye:

> "Derekî ku ji hêla dewletê ve destê xwe bavêjimê nemaye. Ez ê ji vir ha de cerdevanî nekim... Yên ku dest avêtin keça min, min jî tehdît dikin. Min vê rewşê ji berpirsiyaran re vegot. Wan jî çek amin ji ber ewlekariyê ji destê min girtin. Lê belê dest nedane çekên kesên ku ez tehdît kirim."

Di rojanmeya 18ê hezîrana 2010an ya Gunlukê de di nûçeyek de hatiye gotin ku 103 cerdevanên ku ji bo operasyonê şandine derveyî herêma wan û bi zorê nobedariya li ser sînor bi wan dane girtin û li ser vê yekê îstifa kirine û hin ji wan jî bi şertê ku li gund bimînin îstîfayên xwe paş ve girtine. Di rojnameya 21ê hezîrana 2010an de jî di nûçeyek de hatiye gotin ku di demeke nêz de komek cerdevan ji ber ku wezîfeya ku leşkeran daye wan nekirine ji hêla leşkeran ve gule li wan hatine reşandin, li ser vê meselê cerdevanên li gundê Kirikdaga Hekariyê ne, bi tirsa ku dê di wextê peywirê de ji hêla leşkeran ve bên gulebaranê peywira xwe nekirine. Di rojnameya 10ê tîrmeha 2010an de jî nûçeyekê qala 60 cerdevanên li gundê Narliya navçeya Çatakê ya Wanê kiriye ku wan bi mebesta





gerîlayekî ji gundê wan di pevçûna li Beytuşebaba Şirnexê de canê xwe ji dest daye, dev ji çekên xwe berdane. Di nûçeyê de cerdevanek wiha axiviye:

> "Heya îro ji gundê me 15 ciwan çûne nav refên PKKê. 4 kesî di pevçûnan de canê xwe ji dest dane. Di gundî û cerdevanan de ev narehetiyeke wijdanî pêk tîne. Li gund kesê ku derdikeve serê çiyê jî û kesê ku dibe cerdevan jî xizmên hevdu ne."

Her wiha tê zanîn ku cerdevan naxwazin biçin operasyonan û ji ber ku hêzeke wan a ku li hember êrîşan bikaribin tevgerin, tunene. Îcar tûşê gulereşandina leşkeran tên û di encama vê yekê de jî dizanin ku ev gulereşandina serberedayî dixin stûyê PKKê. Di nûçeyeke rojnameya Gunlukê ya 8ê hezîrana 2010an de hat ragihandin ku cerdevanên li herêmê dê bi gelemperî çekên ji dest bên danîn û her wiha piştî daxuyaniya ku cerdevanên eşîra Jîrkî ya li herêma Hekariyê gotin êdî em bi PKKê re şer nakin, tê îdîakirin ku li ser vê yekê hukûmet polîtîkayeke nû ya cerdevaniyê daye destpêkirin. Li gor îfadeyên şahidan ew kesên ku di ezmûna mamostetiya wekîl de bi ser neketine, bi şertê ku cerdevaniyê qebûl bikin, memûrtî teklîfê wan kirine.

Ji rojnameya Gunlukê ya 8ê sibata 2011an jî tê zanîn ku peywireke nû dane cerdevanan. Seroka Berê ya Saziya Tiba Adlî û Seroka TİHVê Prof.Şebnem Korur Fincancı di nûçeyê da daye nîşan ku bi kepçeyê kolandina gorên komî "şermeke mezin" e û ji bo vê yekê di kolandinê de divê teqez pisporên tiba adlî, huqûqvan, antropolog û arkeolog jî hebin. Her wiha di heman rûpelê de bi îmzeya Zeynep Kuray nûçeyeke din jî tê dîtin. Di nûçeyê de tê gotin ku temsîlkarên İHDê yên Bilîsê îdîa kirine ku Dozger di kolandina gorên komî ya li Mûtkiyê de gotiye ku heya em li vir bin kes ji we nikare dest bide van goran û her wiha kolandina wan goran jî bi cerdevanan daye kirin. Di hejmara 10ê adara 2011an de jî tê gotin qerarnameya ku di bin madeya 13065an de ya lijneya Wezîran de ye, di 2007an de hatiye qebûlkirin û bi tamîmeke ku ji walîtiyan re hat şandin, hat xwestin ku 10 hezar cerdavanên din jî bistînin. Li ser serîlêdanên kêm ên ne li gor dilê dewletê, hat zanîn ku di bin navên saziyên cuda de mesela li Bismila Diyarbekirê ji bo ewlekarî û notirvaniya xeta BOTAŞê li elemanan digeriyan. Wextê ku serîlêdanên vî karî çêbûn, hat ferqkirin ku ji bo cerdevan bistînin wisa kirine û li ser vê yekê yên ku serî lê dabûn, di paş de vekişiyan.

Nûçeya herî nû ya der barê cerdevanan jî nûçeya ku qala piştgiriya cerdevanan a ji bo pêla çareseriyê ku jê re dibêjin pêvajoya Îmraliyê ye.

Koordînatorê Giştî yê Cerdevanên Berwext yên Gundan û Federasyona Malbatên Şehîdan Ata Altın jî vê yekê gotibû:

> "Em li ser navê cerdevan û malbatên wan piştgiriyê didin her tevgera ku dê li herêmê dengê çekan bitefîne, xwîna ku diherike rawestîne û pêşî li mirinan bigire. Lê belê dema ku rewşa hesas ya li herêmê bê dîtin dê bê zanîn ku hin teşebusên ku bê bingeh tên kirin ji karê zêdetir zirarê didin herêmê û her wiha ji xwestekên rêxistina teror re jî derfetan saz dikin. Ji ber vê yekê pêlên guftûgoyê yên bi vî şiklî ji hêla me ve hem bi xweşhalî hem jî bi fikarî tê şopandin. Em bi fikar in, lewra tecrubeyên me yên berê vê didin nîşanê me. Em jê xweşhal in, çimkî em êdî dizanin wextê dahatûyeke hevpar a biraderane ya li Tirkiyê ye."[15]

Bi heman şiklî di 12ê kanûna paşîna 2013an de di televîzyona CNN Tirkê de di nûçeyekê de li Wanê Fermandarê Tabûra Şimşeklera ku di 1996an de hat avakirin û Serokê Komela Cerdevanên Berwext ên Gundan û Malbatên Şehîdan Ayhan Kahraman jî daxuyaniyeke mîna ya li jor jî me nivîsiye anî ziman. Dema ku mirov li vê yekê dinêre, mirov dibîne ku êdî cerdevan jî ne bi çekan bi siyasetê, ne bi şer di nav aştiyê de dixwazin bibin aktivîstên vê pêlê.[16] Her wiha di rojnameya Tirkiyê ya 27ê adara 2013an de Sercerdevanê ji gundê Bayraktepeya Sêrtê û Serokê Federasyona Şehîd û Gazî ya Sêrtê Kenan Şehitoglu di goftûgoyekê xwe de dide nîşan ku cerdevan jî dixwazin piştgiriyê bidin pêla çareseriyê ku ew axaftin wiha bû:

> "Ew kesên ku bi nêteke baş li vê pêla çareseriyê nanirxînin, wijdan û baweriya wan kêm e. Ji mirovahiyê jî para xwe negirtine. Kî naxwaze ku aştî çêbe? Kesê ku bixwaze pevçûn û şer berdewam be jî bi rastî jî xayîn e. Bi gotina hin kesan 'ez neteweperwer im, welatparêz im' ev kar çênabin. Di dawiya dawîn de divê hin pêngav bên avêtin. Welatparêzî, Alahezî û neteweperwerî bi gotinê naçe serî."

Ji hêla din ve di rojnameya Hurriyeta 8ê nîsana 2013an de cerdevanên ku bûne 48 hezar heta bi yên dildar ve ku gihiştine 70 hezar kesî ku ev jî qasî artêşek mezin e. Hem piştgiriyê didin pêla çareseriyê hem jî fikariyên xwe yên der barê dozên xwînê de hem jî bi van gotinan "Dewlet û PKK li hev tên, îcar axiriya me dê çi be. Heya PKK çekên xwe daneyne, em nikarin deynin." Carekî din fikariyên xwe tînin zimanî. Sercerdevanê Gundê Tepealtiya li ser Nisêbîna Mêrdînê Adnan Durak gotinên bi vî şiklî anîbûn zimên:





"Ez nikarim yek bi yek bigerim û biçim ji xizmên miriyan bexişandinê bixwazim. Divê dewlet vê yekê bifikire. Kurê camêrekî dimire û dizane ku em jî ew roj li operasyonê ne. Ji ber wê vî tiştî ji me dizane. Temam eva me got aştî çêbû. PKK û dewlet li hev hatin. Wê çaxê bila me jî bi kesên ku em bi wan re dijîn re li hev bînin. Gelo axiriya me dê çi bibe?"

Fikariyên cerdevanan tenê lihevhatina miletan bi hev re nîne, her wiha aştî û lihevhatina nav miletekî bixwe ye jî ku ev yeka dê bibe parçeyek ji adaleta vê pêvajoyê.

**o.Nirxandin**

Pêkan e ku mirov nûçeyên der barê cerdevaniyê de bi çend kategoriyan dabeş bike: yek ji wan ev e; cerdevanên ku di şerê xwe û PKKyê de ji bo ku bikevin çavên dewletê û ji bo ku miletê din jî bikin cerdevan, zordestiya ku li xelkê dikirin; sûcên ku ji hêla cerdevanan ve dihatin kirin wek qaçaxcîtî, tecawuz, kujerî; cerdevanên ku di navbera PKK û dewletê de mabûn û zehmetiyên ku wan dikêşand; kesên ku nedixwestin bibin cerdevan û koçberiya wan a ku bi dîsa bi destê cerdevanan dihat kirin; daxuyaniyên ku daxwaza rakirina cerdeaniyê dikirin û yên ku zirarên cerdevaniyê didan nîşan; goftûgoyên der barê xweşkirina rewşa cerdevanan de; agahiyên der barê têkiliyên cerdevan, dewlet û çeteyan. Di çapemenî û rojnameyên berbiçav de meseleya cerdevaniyê, heke ji hêla dewletê durustkirinek li ser cerdevanan bihata kirin, heke bûyereke ku cerdevan tevil bûbûn û ev jî ne qasî ku were veşartin biçû be an jî heke di navbera cerdevanan û PKKê de û cerdevan û dewletê de tiştekî girîng çêbûbe, nedihate xefkirin û dihat nivîsandin û belavkirin. Qunciknûsên van rojnameyan jî ji bilî çend kesên awarte kesên ku serê xwe pê diêşiandin û bi awayekî rexnegirî li ser radiwestan, tunebûn. Di rojname û kovarên li herêmê yên ku nêzî gelê kurd bûn û li ser rehên kurdan xwe îdare dikirin, bi taybetî piştî salên 90î û vir ve hema hema her roj piranî neyinî li ser cerdevanan nûçe dihatin çêkirin. Wekî din bi analîz û dosyeyên berfireh yên ku li ser van nûçeyan dihatin kirin derfeta gihiştina hûrgiliyên van bûyeran ji xwîneran re diafirand.

Li ser hin gotinên sercerdevanên ku reyîsên eşîran bûn, cerdevan piraniya caran wek cinawiran dihat nîşandayîn. Piştî nûçeyên der barê gundiyên

ku di nav du agirî de mabûn, bi cerdevanan re goftûgo dihat kirin û ev portreya nexweş dihat berterefkirin. Heta pêkan e ku mirov bibêje carinan dema ku cerdevan sûcekê bikirana, dewletê ev vedişart û carinan jî li gor kêfa xwe bi cerdevanan re muamele dihat kirin û vê yekê jî her wekî agir berdida petrolî. Jixwe yên ku bi zorê bûne cerdevan, bi awayekî durust “bikarneanîna çekan” û teslîmkirina çekên wan bixwe jî ji wan re dibû sûceke mezin. Yên ku bi awayekî pispor çek bi kar dianîn jî yan dibûn hedefa PKKê yan jî di operasyonan de ew derdixistine pêş şerî û wekî din jî carinan li wan xwedî dernediketin û ew dikirine nav karên qirêj. Serokên eşîran û cerdevanên ku ji hêla siyasetmedaran ve jî dihatin bikaranîn, ketibûne nav xefikekê wisa ku êdî bixwestana jî nikaribûn jê xelas bûna. Cerdevanên ku ji hêla PKKê hedef dihatin girtin û piştre dihatin bexişandin jî di heman geremolê de bûn. Dîsa jî li gor nûçeya rojnameya *Günlük*ê ya 10.07.2010ê, piştî ko milîtanekê PKKyê yê ji gundê 60 cerdevanên lê heyî, gundê *Narlı*yê yê Navçeya *Çataklı*yê ya bajarê *Van*ê, li şerekê li navçeya Beytüşşebapê, ya Şirnexê hat kuştin ji bo ew helwesta xwe ya neyînî diyar bikin wan xwestine çekên xwe danin û ev yek jî rastiyeka berçav zelal dike, ew kesên bi dildarî bûyîn cerdevan li gor wan kesên ji bo nebin cerdevan li ber xwe dayîn di rêyeka têkelîtir de ne. Her li wê nûçeyê gotinên cerdevanekê li şûna gelek tiştên bên nivîsîn digire.

> “Li gundê me heta niho 15 ciwan gihane PKKyê. 4 kes li şeran mirin. Ev yek bi wijdanî gundiyan û cerdevanan aciz dike. Li gundî ew kesên çûyîn ser çiyayan jî û yên cerdevan jî mirovên hev in.”





## Têbînî

[1]Di Mijdara sala 1985an de bi Partiya Demokrasiya Civakî/Sosyal Demokrasi Partisi bû yek û nave wê bû Partiya Sosyal Demoqrat a Gelparêz/Sosyal Demokrat Halkçı Parti.

[2]Rewşa Awarte ku berê li Stembol, Xarpet, Çewlig, Dêrsim û Wanê hatibû îlankirin, di 20ê Gulana 1987an de, hate pejirandin ku li Amed, Colemêrg, Mêrdîn, Sêrt ê jî bikeve meriyetê.

[3]Cumhur Keskin, li 20.01.2000ê de li Vanê bi êrîşeka çekdarî hat kuştin. Digel ko bikuj bi xwe jî dibêje wî ew kuştin ji bo tolhildana di navbera eşîretan de kiriye jî, parêzer îdia dikin ko li paşxana vê kuştinê hitirafkar û çete hene. Ji bo berfieh lê nêrînê: http://www.milliyet.com.tr/2001/08/06/guncel/agun.html [9 Ocak 2013].

[4]Ev fikrên ko bi serokatiya sekreterê Giştî Deniz Baykalî, Fuat Atalay, Hikmet Çetin, Eşref Erdem û Cumhur Keskinî amade kirine û li Civîna Partiyê de bi yekdengî hatiye pejirandin, rojnamevanê Nevzat Çetîn bi taybetî li ser disekine. “Komara Tirkiyeyê ne komareka nijadekê ye an jî serjêker e, ew komareka hişmendiya sîyasî ye. Kurd rastiyeka vê komarê ne, parçeyeka wê ne... Divê kurd li her derên jiyanê bikarin xwe bi azadîîfade bikin. Qedexeya li ser zimanê zikmakî polîtîkayeka paşverû ye, divê bê rakirin, li dema yekpartitîyê jî Divê pergala cerdevaniyê bû halê awarte (OHAL) bê rakirin” dvê planên bi pêşdebirinê bêne danîn, binêrin: http://nevzatcicek.blogcu.com/ kurt-raporlari-1/5970882 [9 Ocak 2013].

[5]Li 23.05.1990ê de li dema ko li ser îlankirina Halê Awarte li bajarên Şırnak û Batmanê dihat axiftin, Aksuyî dora axiftinê stand û got heta hingê 28206 kadroyên cerdevaniyê hene û yên amade 21480 in. Welê dixweyî ko ew halê cazîbeya di nava du agirên berbehs de mayinê dikare eşkere bike ka çima li sê mehan de 3746 kes dî jî dibûn cerdevan.

[6]Mehmet Sincar,li 4.09.1993yê de dema ko ji bo lê kolandina kuştiyên bikuj nedîyar çûyî Batmanê bi êrîşeka çekdarî hat kuştin.Ji bo hûn bibînin ka idiayên li ser kuştinê çi ne û hûn bibînin ka lê kolandina li ser kuştinê bi kîjan pêvajoyê dom kir, binêrin:http://www.milliyet.com. tr/1999/01/25/siyaset/siy04.html [19 Adar 2013].

[7]Li 20.06.1995ê Mustafa Başê parlamenterê RPyê bi dora axiftinê diyar kir ko li herêmê hinek cerdevan ‘’bi hinek binasên belasebep têne desteserkirin” û ji wan rê tê gotin ko ‘’heger ew dengên xwe bidin Doğru Yolê ew ê bêne serbestkirin” û diyar kiriye hatiye gotin weke dî heger ew bi ser nekevin ew ê bikaranîna komiran bidin sekinandin û ew ê çekên cerdevanan ji wan bistînin.

[8]Parlamenterê SHPyê Muzaffer Arıkanî li 16.12.1993yê diyar kir ko pereyên ji bo xizmeta cerdevanan tê fikirîn divê bê dayin 2 tirilyon û 760 milyar Lîreyên Tirkan in, ev qas jî dibe ji sedî 41,28ê hemî pereyên Wezareya Navxweyî ko pereyên wezaretê 6 tirilyon û 685 milyar û 800 milyon in.

[9]Li sala 2002yê miaşê kêmmiaşan 222.000.000 TL in.

[10]Ew yasayên hatî pejirandin li pêveka 1ê hene.

[11]Ji bo van guhertinan sebebên ko têne diyarkirin ev in: “Bi vê pêşniyarnameyê armanc ew e ko ew kesên li ber berxwedana li hemberê terorê şehîd bûne, an jî yên ko ew qasê ketine ko nikarin bixebitin, divê karê dewletê an jî karekê li cihên taybet heger hebe ji bo zarokekê, nebe bira-û-xuşkekê bê dayin.”

[12]Navê cihan li gor van çavkaniyên lêkolîn li ser wan hatîn kirin hatine nivîsîn. Her dîsa navê eşîretan û malabatan jî bi wî awayî hatine nivîsîn.

[13]Di nûçeyê de raporê balê kişandiye li ser xaleke girîng a din jî: “Di raporê de xetereyeke mezin jî îtîrafkarên li welêt yên ku dewlet ji wan sûd werdigire hat dîtin. Ew kesên ku îtîrafkar in, mayina wan a di lojmanên polêsan de jî wek pirsgirêkeke din hatiye ziman û ev rexne hatine kirin: ‘Divê dewlet van kesan ji bo xwe bi kar bianiya, lêbelê ew dewletê

ji bo xwe bi kar tînin û li herêmê şêlandin, dizî û tiştên wek van dikin."

[14]Di hejmara 82. ya kovara Yeni Aktuel ya 1-8ê Sibata 2007 an de di hevpeyvîna ku hat weşandin de Tapan wiha dibêje: "Taybetmendiya herî girîng ya Hamîdiye û cerdevaniyê ev e ku her du jî ji eşîran pêk tên. Alaya Hamîdiye bêtir ji eşîrên bipirsgirêk û timûtim serî hildidan hat avakirin. Îro jî cerdevan ji nav wan kesên ku sûc kirine hatine hilbijartin... Amûrên wan yên suc jî êdî ew çekên ku dewletê li dijî terorê li wan belavkirine ye. Mîna alayên Hamîdiyeyê cerdevan jî zêdetir bi sûcên ku tên kirin dikevin rojevê bi taybetî di heyama ku şer radiweste de teqîneke mezin di sûcên cerdevanan de çêdibe. Li gor daneyên Wezareta Karên Hundir ji 1985an heya 2005an vir ve 4973 cerdevan sûcdar bûne. Di dawiya sala 2006an de 900 cerdevanên ku ji teror û bazirganiya madeya hişbir û çekan di girtîgehan de ne, hene. Sûcê herî zêde yê ku cerdevan tevil dibin jî 'alîkariya rêxistina terorê ye'... Sûcê duyem jî çekên ku dewlet li wan belav dike ew jî didin PKKyê. Sûcên cerdevanan tenê ne ev in. Sûcên ku kirine ne pêkan e ku mirov dabeşê kategoriyan bike; teror, qaçaxçîtiya madeya hişbir û çek, tecawuz, kuştin, xapandin..."

[15]Binêrin:http://www.marksist.org/haberler/9428-imrali-surecine-korucular-da-destek-verdi. [28 Ocak 2013]

[16]Binêrin:http://tvarsivi.com/vanli-korucular-da-terorle-mucadeleye-destek-verdiler-ayhan-kahraman-artik-bu-kan-akmasin-diye-acikl-12-01-2013-izle-i_20130103666982.html. [28 Çile 2013]





## IV. NÊRÎNEK JI HÛNDIR: SERPÊHATÎ Û DAXWAZÊN CERDEVANAN, HEVSERÊN WAN Û ZAROKÊN WAN / Şemsa Özar

Lêkolîna qadê, ji hevdîtinan pêk tê ko li gel cerdevanên ko hê jî li ser kar in û malbatên wan, (hevser û zarokên wan) yên ko bi xwe dev ji cerdevaniyê berdane, yên ko bi zorê hiştine ew dev ji kar berdin yan jî teqawît bûne.

Lêkolîn, li gel koordînatorekî û du sosyologan, yek jin û yek mêr, hatiye pêkanîn. Hevdîtinan di 12.08.2011an de dest pê kirine û di dawiya cotmeha 2011an de qediyane. Li gund û navçeyên Diyarbekir, Colemêrg, Mêrdîn, Riha, Şerenex û Wanê, bi temamî 68 hevdîtin hatine pêkanîn. Ji van hevdîtinan 33 heb, li gel cerdevan û sercerdevanan; 15 heb li gel hevserên wan, 11 heb li gel zarokên cerdevanan, 3 heb li gel cerdevanên teqawîtbûyî, 4 heb li gel rêvebirên Saziyên Alîkarî û Piştgiriyê yên Cerdevanan û 2 heb jî li gel cerdevanên dilxwaz hatine pêkanîn.

Di serî de hatiye xwestin ko li hemû navçeyên hatî diyarkirin, li gel cerdevanan hevdîtin bên pêkanîn, lê piştî ko lêkolînê dest pê kiriye ji ber hessasiyeta meselê û ji ber ko hêj li wan deran pevçûn û operasyonan berdewam dikir, ji bo saxî û silametiya lêkolînê û ji bo ko di wextê xwe de biqede, serê pêşî deverên ko têkilî bi wan re çêbûye, hatine hilbijartin. Ji bo van deveran pêşî kesên ko dikarin bibin referans hatine peydakirin û bi alîkariya wan referansan randevû hatine standin û hevdîtin hatine pêkanîn. Ji bo standina randevûyan, kesên referans ji nav endamên DÎSAyê hatine hilbijartin, yan jî bi alîkariyâ têkiliyên koordînatorê qadê yê lêkolînê hevdîtin pêk hatine.

Hevdîtin li cihên ko cerdevanan bi xwe tesbît kirine, pirranî li gundên wan, yeko yeko û roj bi roj hatin pêkanîn. Herwiha, hevdîtinên ko li gel du an jî zêdetir kesan re hatine pêkanîn jî hene. Tevî ko hatiye xwestin bi hemû malbatên cerdevanan re hevdîtin bêne pêkanîn jî, ji wan qismekî wan hevdîtinan pêk hatine. Hevdîtinên li gel jinan, ji aliyê lêkolînera jin ve hatine pêk anîn. Herwiha hevîtin, li gor daxwaza cerdevanan bi tirkî an jî kurmancî bûne û bi destûra wan pirraniya hevdîtinan bi cîhaza dengan hatine qeydkirin. Ji bo yên ko qeydiya dengî nexwestine jî bi alîkariya notan hevdîtin hatine nivîsandin.

Ji bo ko hin tişt neyên jibîrkirin, di serê de pirsên ko hatibûn amadekirin hatin pirsîn lê dîsa jî hatiye xwestin ko ev hevdîtin wek suhbetekê pêk bên. Berî hevdîtinê li ser armanc û berfirehiya lêkolînê agahdarî hatiye kirin, tevî ko hin kes piçek tirsiyane û bi rehetî neaxivîne jî, pirraniya wan bê tirs û bi rehetî fikrên

xwe gotine. Herwiha em dizanin ko li ser hin meseleyên 'nazik' agahî nedane me. Di vê beşê de îqtîbasên ji hevdîtinên li gel cerdevanan û malbatên wan cih digrin û çend kes bên hejmara wan nivîsî ye. Bajarên ko lê dijîn, heke mezin bin navçeyên wan jî hatine nivîsandin lê ji bo ko navên wan deşîfre nebin, gundên wan nehatine nivîsandin.

Gava ev xebat tê xwendin divê ev yek neyê jibîrkirin: Bersivên ko di hevdîtinan de hatine dayîn, li gor navê kesên referans diguhere. Bo mînak, heke referans yekî/a bi dewlet/hikumetê re têkildar be, zêdetir pirsgirêkên ji ber dewletê û daxwazên ji dewletê hatine gotin, heke referans sîvîl be an jî kesên ko me bi têkiliyên xwe ew dîtine, zêdetir, pirgirêkên civakî/herêmî/etnîk ko ji ber sîtemê ne, beşdarvanan anîne ziman. Bêguman di destpêka projeyê de ev dihat texmînkirin. Lewma jî bi helwdaneke mezin, hatiye xwestin ko hevdîtin ne yekalî bin lê dîsa jî di nav xebatê de nîşaneyên vê yekalîbûnê xuya dikin.

Beşên piştî vê, behsa cerdevaniyê dike ka çawa dest pê kiriye û bi axaftin û îqtibasan dest pê dike. Hewldana me ew bû ko em nîşan bidin ka cerdewanî çawa tê qebûlkirin/didin qebûlkirin û ev yek îmkanekê dide me ko em helwesta dewletê a li ser pêkanîna sîstema cerdevaniyê û birêvebirina vê wek saziyekê, bikarin deşîfre bikin. Herwiha ev îqtibas nîşan didin ko cerdevan bi vê sîstema cerdevaniyê re çawa têkildar in û çi jê dixwazin/hêvî dikin.

Piştî vê destpêkê, di beşa duyemîn de, tê nîşandayîn ko cerdevan û malbatên wan li ser cerdevaniyê çi difikirin. Me ji beşa *Di Çapemeniyê de Cerdevanî* fêm kiribû ko dewlet, vê sîstema cerdevaniyê ne tenê wek çareseriyeke ekonomîk, herwiha derfetekê jî dibîne ko bikare gundiyên kurd bike alîgirê xwe. Gava mirov vê 'alîgiriya cerdevaniyê' binirxîne, ji bo mirov dibe tercuman ko têdigehije ka cerdevan karê xwe, têkiliyên xwe û rayedarên dewletê, bi taybetî jî bi eskeran re, çawa dibînin û di vê hiyerarşiyê de xwe çawa bi cih dikin.

Di beşa sêyemîn de, behsa bandora cerdevaniyê tê kirin ko têkiliyên mirovan û jiyanê çawa diguherîne. Têkiliyên civakî yên ko diguherin û vediguherin, ne tenê bandora xwe li ser cerdevan, esker û rayedarên dewletê nîşan dide, herwiha ev bandor li ser malbat û xizmên cerdevanan jî çêdibe. Ji ber vê jî di vê beşê de, bi taybetî çavdêrî û serpêhatiyên hevser û zarokên cerdevanan hatine nivîsandin.

Herwiha cerdevanî, wekî pergaleke muhîm a ekonomîk derdikeve pêşiya me. Lewma jî di beşa çaremîn de, ekonomiya cerdevaniyê bi gelek aliyên cuda hatiye nirxandin. Di vê beşê de, guherîna jiyana gundiyên ko cerdevanî





qebûl kirine û dev ji rêncberiyê berdane û fikrên wan ên li ser mehaneyên wan û mafên wan ên xebatê hatine pêşkêşkirin.

Ji nûçeyên di beşa *Di Çapemeniyê de Cerevanî* a vê kitêbê de û ji beşa *Niqaşên li Ser Cerdevaniyê yên li Meclîsa Tirkiyê*, ji pirsyarnameyên li meclîsê hatine dayîn û bersivên wan, em têdigehijin ko karên qirêj yên cerdevan tekilî wan bûne û sûcên wan, pirr kêm hatine eşkerekirin lê qenebe em pê dihesin ko ev lîsteya sûcan pirr dirêj e. Di beşa şeşemîn de, vê carê em dibînin ko ev mesele çawa bandorê li ser şahidiya cerdevanan dike. Bêguman em li bendê nebûn ko ji bo sûcên ji aliyê cerdevanan ve hatine kirin an jî sûcên wan ên ko di dadgehan de jî hatine cezakirin, cerdevan li xwe mikur bên. Dîsa jî em ê bibînin ko ji gotinên wan ên di vê beşê de, carna gotinên wan ên li ser cerdevanên din, jixwe lîsteyeke dirêj a sûcan pêk tîne.

Helbet di vê *pêvajoya çareseriyê* de, her kes meraq dike ko gelo cerdevanî dê bê rakirin an na. Herî dawî me jî di vê lêkolîna qadê de ji cerdevanan fikrên wan ên li ser vê meselê pirsî.

### 1. Cerdevaniyê çawa dest pê kir?

#### a. Hilgirtina pêşîn ya çekan

> *Yek ji serekên vê eşîrê kujerê eskeran bû. Lê di şertûmercên wê demê de, diviya li şûna ko me dijminahiya eşîran bikin, em piştgiriya wan bistînin. Me hinek xeletiyên wan paşguh kirin. Di tekoşîneke wiha de divê mirov li kar û zirara xwe bifikire. Li başûr-rojavayê Anatolyayê me wisa kir.*
>
> Korkut Eken, Rojnameya Star'ê, 26.01.2002

Sala 1985an dewletê sîstema cerdevaniyê hat pêkanîn û dewletê bi gelek rê û rêbazan cerdevan peyda kirin. Yek ji wan rêbazan, hevdîtina li gel serekeşîran bû ko temamê eşîrê cerdevanî qebûl dikir. Ji bo vê, sûd ji rewşa eşîrên kurdan hatiye wergirtin ko ji serdema Osmaniyan ve hinekên wan "alîgirê dewletê", hinekên wan jî "dijberê dewletê" bûn. Herwiha, wekî ko "Alayên Hemîdiyê" hatibûn pêkanîn, eşîrên gelek caran têkilî sûcan bûbûn, hatin tercîhkirin.[1]

Eskerên xwedî payeyên generaliyê yan jî walî û qaymeqanan, miqabilê berjewandiyan, bi serekeşîran re li hev kirin û temamê eşîrê kirin "eşîra

cerdevan". Vê yek, cara pêşî bi Eşîra Jîrkiyan dest pê kir. Di gulana sala 1985an de, hind rayedarên dewletê û serekeşîrên Jîrkiyan, li mala muxtarê gundekî li Bêşebabê civiyan û roja piştî wê serekeşîr Tahir Adıyaman û li gel wî jî Hacı Öter, Abubekir Aydemir û Kökel Özdemir, bi helîkopterê çûn Fermandariya Artêşa 7emîn a Diyarbekirê, li vê derê bi fermandarê artêşê Korgeneral Kaya Yazgan[2] re hevdîtinekê pêk tînin û cerdevaniyê qebûl dikin. Ev hevdîtin dişibe ayînekê û Korgeneral Yazgan, li ser Quranê sond li wan serekeşîran dide xwarin ko ew ê dilsozê dewletê bin û ew jî sonda xwe li ser "sêberan"[3] dixwin.[4] Bi vî hawî, li Colemêrga ko PKKê yekemîn çalakiya xwe li dar xistibû, cerdevanên ewil jî dest bi karê xwe kirin.

Endamên Eşîra Jîrkiyan, ji qaçaxçîtiya çekan heta revandina keçan û destdanîna ser erdê gel, ji ber gelek sûcan divê biçin dadgehan lê xalek li Zagona Rêbazên Dadgehên Cezayê tê zêdekirin û bêyî ko biçin teslîm bibin, ji lêpirsînê xelas dibin.[5]

Rêyeke dî bo peydakirina cerdevanan jî ew bû ko ji ber dijîtî û berberiya PKKê an jî hin kesên dî, gelek gundiyan xwest ko sûdê ji hêza dewletê wergirin û bûn cerdevanên dilxwaz. Rêyeke dî jî ew bû ko ji ber zextên cendirmeyan û gefxwarina valakirin û şewitandina gundan, gelek gundî neçar mane ko bibin cerdevan. Ev yek bi nêrîna cerdevanan a li vê sîstema cerdevaniyê re eleqedar e ko, divê mirov têbigehe gelo wan bi çi awayî çek hilgirtine, bi zorê yan bi dilxwazî bûne cerdevan û têkiliya wan bi cerdevaniyê çawa pêk hatiye. Yên ko bi dilxwazî bûne cerdevan, vê sîstemê dipejirînin û piştgiriya dewletê dikin, yên ko ji ber zext û zordariyan bûne cerdevan jî gelek caran şaşî û xeletiyên sîstema cerdevaniyê tînin ziman.

Ji hêla kronolojîk em binêrin, xuya dike ko di salên pêşî de zêdetir, cerdevan hatine xelatkirin. Ev xelatkirin, ji bo serekeşîran paqijkirina sicîla sûcên wan ên berê ye û ji bo gundiyan jî mehaneyek e. Eskeran û rayedarên herêmî, ji gundiyan re dane zanîn ko cerdevanî wek bekçîtiya guınd e û ew ê tenê gundên xwe biparêzin, miqabilê vê jî dê dewlet mehaneyekê bide wan û hewl dane ko hejmara cerdevanan zêde bikin. Di destpêka salên 90î de jî, zext û zordariya komarê dest pê kiriye û yên ko cerdevanî qebûl nekirine gundên wan hatine şewitandin û valakirin, gundî bi lêdan, êşkence û qetlîaman re rû bi rû mane. Yên ko bi tu awayî cerdevanî qebûl nekirine jî neçar mane ko ji gundê xwe bar bikin.





**b. Zordariya cendirmeyan û derneketina ji gund**

*Ji bo ko em heywanên xwe û zeviyên xwe nehêlin*
*û neçin, me cerdevanî qebûl kir.*
Cerdevan 7, Wan

Cendirmeyan, gundiyên ko cerdevanî qebûl nekirine, bi gelek awayan tirsandine û zordarî li wan kirine, ji wan xwestine ko yan bibin alîgirê wan yan jî gundên xwe vala bikin. Tenê du rê li ber gundiyan hatiye hiştin; "yan hûn ê çekan hilgirin yan jî hûn ê ji biçin".

> Min di sala 88an de dest bi cerdevaniyê kir lê li gundê me sal 94an dest pê kir. Sîstema cerdevaniyê wiha pêk hat: Rojekê gotin qaymeqam tê gundê me. Em ji xutbê derketin, eskeran her der girtibû. Li wê derê, wiha ji me re gotin; yan hûn ê bibin cerdevan yan jî hûn ê ji vir biçin, hûn nikarin tiştekî jî bibin. *Cerdevan 1, Qulp*

Di vê pêvajoya qebûlkirin/redkirina cerdevaniyê de gotara dewletê dibe wekî "yên ko ne alîgirên me ne, dijmin in" û kesên ko cerdevanî qebûl nekirin wek PKKyî hatin qebûlkirin.

> Di serî de em ji ber zext û zordariya dewletê bûn cerdevan. Roja eydê hatin û gotin hûn ê bibin cerdevan, hetta em wek terorîst bi nav kirin. Destûr dane eskeran ko guleyan berdin me. Gotin yan hûn ê bibin yan jî ji vir herin, me jî gazî erebeyekê kir, ji bo barkirinê mala xwe. Vê carê hatin gotin "nekin, ji vir neçin, çekan hilgirin" filan. Mamê min jî got baş e, em ê çekan hilgirin lê hûn ê bidin her kesî. Heke hûn nedin me hemûyan em qebûl nakin. *Cerdevan 2, Wan*

Şewitandin û valakarina gundan ko di destpêka salên 90î de pêk hatin, serê pêşî ji ber qebûlnekirina cerdevaniyê bû.[6] Ji bo yên ko nedixwestin bibin aligirê dewletê û çekê li hemberî însanên xwe hilgire, dewletê ji koçkirinê pê ve rêyek nehiştibû.

> Pirraniya xizmên me ji ber bûyerên salên 90î, ji vê derê bar kirin. Çûn bajarên wek Edene û Amedê, eşîra me belav bû. Yên ko neçûn jî li vir bûn cerdevan. *Cerdevan 3, Lîcê*

Gelek gundiyên kurd, di salên 80yî û 90î de di navbera zordariya dewletê û xizaniyê de man û ji aliyekî ve ketin derdê bebarê, ji aliyekî ve jî tirsa canê xwe. Hevsera sercerdevanekî wan zordariyan û wê neçariyê wiha tîne ziman:

> Jixwe deh sal pêşiya wê tiştên xirabtir hatin serê me. Gotin yên ko nebin cerdevan nikarin li gund bimîne. Her tiştê me li gund bû, ma em ê bi ko derê ve biçûna, tiştekî me jî tune bû. Ji ber ko wê demê ji me re gotin heke hûn nebin cerdevan, em nahêlin hûn tiştekî xwe ji vir bibin. Û em ji neçarî bûn cerdevan. Tu faydeya cerdevaniyê tune. *Jina Cerdevanekî 2, Qulp*

Li gel ko gelek kesan gundê xwe hiştin çûn, gelek gundiyên xizan jî ji ber zordariya eskeriyê cerdevanî qebûl kir û bi zar û zêçan ve perîşaniya rêya xurbetiyê nedan ber çavê xwe.

> Ali Öz wê demê serbaz bû, di sala 1997an de li gundê me wezîfe dikir. Niha ji doza Eregenekonê girtî ye. Wê demê hate gundê me, gundiyan nexwest bibin cerdevan. Ali Öz zordarî li me kir, go hûn ê bibin cerdevan. Ma wê çi bikirana gundiyên neçar û xizan. Li her malê 10 zarok hebûn, nexwendibûn, cahil bûn. Derfeta barkirinê jî tune bû. Ji ber wê em bûn cerdevan, lê dilê me nedixwest. *Cerdevan 4, Wan*

Cerdevan bi van gotinan wê neçariya çekhilgirtinê ya pêşîn her dubare dikin. Wan salan mêrên gund ji gund derdiketin, pirranî jî ber bi bajarên mezin ve diçûn bo xebatê. Ji bo qebûlkirina cerdevaniyê gava zordariyê det pê kir, ji ber ko malbat qerebalix bûn û derfet nebû ko mala xwe bar bikin, mêr ji neçarî vegeriyane cem malbatên xwe û cerdevanî qebûl kirine.

> Ne meseleya debarê bû, ji neçariyê em bûn cerdevan. Ma ez ê biçûma ko derê? 12 piçûkên min hebûn, min ê çi bikira, min ê bar bikira ko derê? Bi tena serê xwe min ê çi bikira, ez neçar bûm. Em jî vegeriyan gund. Gava em gehiştin gund, fermandariya cendirmeyan hatin pêşiya me. Çawişê wan du saetan ji me re got çekan hilgirin. Ne li gorî min bû, ez sosyal-demokrat bûm, ne tenê ji bo kurdan, min piştgiriya hemû bindestan dikir. *Cerdevan 4, Wan*

Hin caran jî gundiyan pêşî serî li ber zordariya cendirmeyan netewandiye, nebûne cerdevan û ji ber vê jî ev pêvajo dirêj dom kiriye. Yên ko bi qasi têra barkirina mala xwe peyda nekirine jî ji ber zêdebûna zext û zordariya cendirmeyan, tenê rêyek li ber wan maye, ew jî qebûlkirina cerdevaniyê *ye.*

> Di sala 90î de gelek zordarî kirin, wê demê em bi zorê kirin cerdevan. Gotin yan hûn ê bibin cerdevan yan jî hûn ê ji vî gundî biçin. Wê demê rewşa me ya aborî pirr xirab bû, gelê me perîşan bû, yanê me nekarî em biçin. Sala 1987an, ez li Mêrsînê bûm, di sala 1990î de ez vegeriyam. 11 zarokên min hebûn lê qurîşek perê min tunebû. Salekê ez xebitîm. Paşê eskeran gelek zor an ser me, gotin hûn ê bibin cerdevan yan jî ji vir herin, ji neçarî em bûn cerdevan. *Cerdevan 4, Wan*





**c. Agahdariya xelet - bekçîtî**

> *Di meha pêşî ya sala 93yan de min dest pê kir. Berê ez li Stenbolê îşportecî bûm. Em feqîr bûn, ji ber wê em bûn cerdevan. Ji me re gotin li gundÊ xwe bimînini me'aşê xwe jî bistînin, wekî bekçîtiyê ye, em jî hatin bûn cerdevan.*
> Cerdevan5,Mêrdîn

Di hevpeyvînên cerdevanan de tiştekî balkêş jî xuya dike. Di detpêka cerdevaniyê de, nizanin ko çi ji wan tê xwestin; difikirin ko ew ê tenê çekan hilgirin gundê xwe biparêzin, yan jî li ber xeteke BOTAŞê bekçîtiyê bikin.

> Dema min dest pê kir, ez 45 salî bûm, niha teqawît bûme, 70 salî me û min 20 salan cerdevanî kir. Me wiha dest bi cerdevaniyê kir; ya rastî pêşî ji bo parastina bîrên neftê yên BOTAŞê[1] em bûn cerdevan. Mixtarê me got fermandar ji wî çend cerdevanan dixwaze. Ew kurxalê min e, hinekan got temam û bûn cerdevan. Lê 15 roj piştî wê dîsa hate ba min û got fermandar 15 kesên dî dixwaze, min jê re got tu dixwazî em nekevin nav vî karî, qulopuloyek di vê meselê de heye. Wî jî got, ez ê bikim û ez ê navên xizmên xwe jî binivîsim û ji malbata xwe 20 kes kir cerdevan. Me got heminî ew bûni em jî bibin cerdevan. *Cerdevan 6, Mêrdîn*

Jin û zarokên cerdevanan jî dibêjin ko di wê pêvajoyê de wekî mêrên xwe û babên xwe ew jî hatine xapandin. Xuya ye ko ew jî di nav xwe de niqaşa vê dikin û gelekên wan ji ber vê agahdarkirina xelet cerdevanî qebûl kirine. Bi taybetî jî, yên ko dilê wan naxwaza cerdevaniyê bike yan jî nikarin fikra cerdevaniyê biparêzin, behsa vê yekê dikin. Jina cerdevanekî, wiha tîne ziman ko mêrê wê ne li hemberî PKKê lê ji bo bekçîtiyê çek hildaye:

> Mêrê min 25 sal e cerdevan e. Pêşî gotin ji bo bekçîtiyê ye, ne ji bo tiştekî dî, ne ji bo yên derve. *Jina Cerdevanekî 1, Mêrdîn*

Bi heman awayî kurê cerdevanekî jî dibêje ko bavê wî ji ber zext û zordariya malbetê û agahdariya xelet ya derbarê cerdevaniyê de, qebûl kiriye ko çekê hilde:

> Ez li ser cerdevaniyê tiştekî ji babê xwe re nabêjim... Niha dev jê berde jî nabe, em ê birçî bimînin. Karekî wî jî tune. Tenê karekî wî heye; cerdevanî. Babê min berê li Stenbolê di şaredariyê de dişixulî, dê teqawît bûya, bapîrê min gazî wî kir. Hatiye, pêşî li vir xeta BOTAŞê hebû, bapîrê min dibêje mirov li ber wan dibin bekçî, li ber derî ye jî, nêzîk e, dê gelek peran bidin. Lê dîsa jî babê min nedihat. Bapîrê min zor daye wî, gotiye ez heqê xwe li te helal nakim filan, ew jî hatiye. Pêşî wek bekçî dest pê kiriye, gelek pere dane wî. Piştî 4-5 salan jî ew kirine cerdevan. *Kurê Cerdevanekî 1, Mêrdîn*

**d. Xizanî û pêwendiyên malbatî**

> *Ya rastî em dudilî mane, zarokên me jî dibêjin hûn çima bûn cerdevan lê pêşî em ji ber xizaniyê bûn cerdevan û me nedizanî ev kar dê wisa be.*
> Cerdevan 5, Mêrdîn

> *Gava ez vegerim gund, heke ez karekî peyda nekim, bi ser de jî bizewicim, dibe ko ez jî bibim cerdevan. Ne ko ez vê dixwazim, ji ber ko ez ê mecbûr bimînim.*
> Kurê Cerdevanekî 2, Mêrdîn

> *Cerdevanî niha wek rêya debarê tê dîtin. Qenebe însan bi meaşê wê debara xwe dikin.*
> Keça Cerdevanekî 3, Lîce

Xizanî û zehmetiya debarê, gelek caran sebebê pêşîn yê cerdevaniyê tê gotin. Jixwe tê zanîn ko li Kurdistanê xizanî di çi astê de ye û çiqas berbelav e. Kûrahiya vê xizaniyê hem ji ber polîtîkayên hikumetan ên ko rêncberan xizantir dikin hem jî ji ber polîtîkaya sewalvaniyê û konsepta ewlekariyê ye. Ji bo rêlibergirtina alîkariya PKKê bi salan zozanên gel hatin qedexekirin û ambargoya erzaqê danîn ser gundan, lewma jî gundiyan gelek caran pêdiviyên zumhêra xwe peyda nedikirin.[8]

> Heke îro bûya, dîsa derdê debarê hebûya, ez ê dîsa bûbûma cerdevan. Lê heke piçek perê min hebûya, ez tu carî nedibûm. *Cerdevan 9, Mêrdîn.*





Herwiha mirov dikare bifikire ko ne ji gotinên cerdevan û malbatên wan ên derbarê cerdevaniyê de xuya ye, difikirin ko ne tiştekî rast e mirov li hemberî gelê xwe çekê hilgire û ev kirin nayê parastin. Kurikekî ji gundê cerdevanê xwedî gotinên li jor, sebebê cerdevaniya babê xwe wiha tîne ziman:

> Berî ko babê min bibe cerdevan desttengiya me zêdetir bû, lewma jî em bûn cerdevan. Lê nayê bîra min kengî babê min bû cerdevan. Ez di sala 93yan de hatime dinyayê, bavê min di sala 92yan de bûye cerdevan. Ya rastî temamê vî gundî ji neçarî bûye cerdevan, nexwe kes nedibû. *Kurê Cerdevanekî 4, Mêrdîn*

Têkiliya temamê malbatê, vê carê me ji gotinên keça cerdevanekî guhdarî dikin. Tîne ziman ka çawa cerdevanî û xizanî têkildarî hev in û cerdevanî çawa dibe karê hemû mêrên malbatê:

> Ez di qursa berrikan de dişixulim. Hêj ez nehatî dinyayê babê min bûbû cerdevan. Tişta ko herî zêde tesîr li min kiriye, tê bîra min ko babê min diçû operasyonê û ez xemgîn dibûm, min digo belkî venegere. Babê min ji ber nexweşiyê mir. Paşê mamê min wan debara mala me kir lê wan jî ancak dikarî debara zarokên xwe bikin, ji ber ko meaşê cerdevanan kêm e. Ji ber wê xwestin diya min bibe cerdevan, ji bo debara me bike. Û ji bo me'aşê wê diya min jî kirin cerdevan. Diya min 36 salî ye û nexwendiye. Yanê wan diya min ji ber xizaniyê û ji bo debara me kirin cerdevan. Li malê çeka wê jî heye lê naçe operasyonan. Ji bo ko diya min cerdevan e ez keyfxweş im. Ji ber ko halê me xweş bû. Heke cerdevanî bê rakirin wê baş nebe, ji ber ko me'aşê wan heye, qenebe debara xwe dikin. *Keça Cerdevanekê 5, Lîce* (Hem diya wê hem babê wê cerdevan e; babê wê miriye)

Cerdevanî, pergaleke ji bo mêran e lêbele li gorî agahdariyên ji saziyên cerdevanan hatine standin, li gelek deveran, bi qasî 35-40 cerdevanên jin hene. Heke mêrê wan li ser wezîfê bê kuştin, çekan didin jinan û wan dikin cerdevan. Lê karê wan cerdevanên dî pêk tînin û ew bi xwe ne nobetê digrin ne jî diçin operasyonan. Bi agahdariya rayedarên navçeyê yên sivîl û esker, ji bo ko li şûna mêrê xwe me'aş bistînin, ev çareserî hatiye peydakirin.

**e. Çekhilanîna li hemberî PKKê**

> *Babê min, mamê min û birayê min ji aliyê PKKê ve hatin kuştin, lewma jî ez bûm cerdevan.*
> Cerdevan 10, Qoser

Di salên pêşî yên serhildana PKKê de, ji ber ko di navbera PKKê û hin eşîran de pevçûnên giran pêk hatin, helwesta PKKê a li hemberî van eşîrên “alîgirê dewletê” bû sebeb ko piştî demekê eşîr bi temamî bibe “eşîra cerdevanan”. Pergala cerdevaniyê rê li ber vedikir ko hem sûcên endamên eşîran bên veşartin hem jî alîgirên dewletê bi awayekî qanûnî bibin xwedî çek. Cerdevanên eşîran bi taybetî tînin ziman ko ew ne wekî gundiyên belengaz ji bo debara xwe bûne cerdevan, ji bo ko xwe li hemberî êrîşên PKKê biparêzin.

> Rewşa me ya aborî xweş bû. Em ne muhtacê me‘aşê cerdevaniyê bûn, em ji bo vê nebûn cerdevan. Malbata me dikare 500 kesan xwedî bike.12 hezar donim erdê me heye. Apociyan[9] wisa kir, gotin em serekeşîran bikujin, bila temamê eşîrê teslîmî bibe. Ji ber wê axa kuştin. Piştî wê çareya me nema. Heke me bi xwe çek hilgirta, ceza wê hebû. Heke me nehilgirta jî em neçar diman. Zehemt bû ko em gundê xwe jî bihêlin û ji vir biçin. Ma evqas milkê me heye, em ê çawa bihêlin biçin. Lewma jî ji neçarî em bûn cerdevan. Yanê tiştekî xirabtir hat serê me. Em axa bûn, dewlemend bûn, ji ber ko mal û milkê me hebû. Lê em bûn xulamê ber destê serbazan. Me nezanî em ê çi bikin. *Cerdevan 11, Qoser*

Eşîrên ko nexoşiyek di navbera wan û PKKê de qewimiye û ji bo ko xwe li hemberî PKKê biparêzin xwestine çekan hilgirin, dizanîn ko heke nebin cerdevan û çekan hilgirin wê ji bo dewletê bibe sebebê gelek pirsgirêkan, lewma jî bûne cerdevan.

> Ez ji eşîra … me. Eşîra …, wê pêlê li dijî PKKê şer kir. Kurê serekeşîrê me kuştin. Sê kes ji wan qetilkirin. Ne bi çekan, bi benik an jî xencerê. Di meha temûzê de, cenazê wan heftiyekê li serê çiyê ma. Paşê Tûxgeneralê Cendirme Yusuf Sayhoş, waliyê Wanê Adnan Berendereli û waliyê OHALê Halit Paymancıoğlu, qanûnek ji bo eşîran derxistin, gotin çekan hilgirin herin gundê xwe biparêzin. Wê demê wisa çek dane min jî. *Cerdevan 12, Wan, Serokê Tabûra Cerdevanan*

Gundiyên bêeşîr jî dibêjin ko, ji bo gundê xwe ji PKKê biparêzin, herwiha nehêlin ko zarokên wan ji aliyê PKKê ve bên revandin, bûne cerdevan. Jina cerdevanekî çîroka cerdevanbûna mêrê xwe wiha dibêje ji me re:

> Mêrê min ji ber rewşa xwe ya aborî nebû cerdevan, wisa bizanin û jê bawer bikin, sebebê wê ev nebû. Rewşa aborî ya her kesî baş bû. Ji ber zordariyê bû cerdevan. Ya pêşî zordariya PKKê bû. Bila wiha bê zanîn û bi rastî jî wisa bû. Berî ko em bibin cervdevan, terorîst her roj dihatin lê êrîş nedikirin, gelek tişt dixwestin. Her roj yek bi xwe re dibirin, careke dî jî nedihatin. Ji gund çend kes wisa çûn û êdî nehatin. Me dît ko wisa be ew ê qirra me bînin. Me dît ko her roj dora yek ji me ye, me jî got li şûna ko wisa be em çekan hildin, ko em bimirim jî em şer bikin û bimirin, we wisa çek hildan. Piştî ko me çek hildan, em bûn hedefa terorîstan û rewş xirabtir bû lê em êdî bêhêz nebûn, me dikarî em xwe biparêzin. Ji sala 2000î ve em piçekî dî rehet in. Ji ber ko qerara PKKê bi xwe wisa ye. Piştî wê salê li gundê me pevçûn çênebû lê berî wê gelek caran çêdibû. Heke gelek kesan zor nedaya ser me, me cerdevanî qebûl nedikir, jixwe cerdevanî helbet ne tiştekî baş e. Kes naxwaze bike. *Jina Cerdevanekî 3, Lîce*

Dîsa jina cerdevanekî tîne ziman ko cerdevaniya gundê wan ne ji ber xizaniyê bû, ji bo parastina xwe li hemberî PKKê bû:

> Mêrê min û gundiyên me teqez ne ji ber peran bûne cerdevan, ji ber ko têra xwe dewlemend in û gelek erdê wan heye, axa ne, eşîr in. Mêrê min û gundiyên me ji ber Apociyan bûn cerdevan. Ji ber ko Apocî hatin gundê me û li ber çavê me hemûyan birayên wan û xwarziyên wan kuştin. Gund xira bû, jiyana me serobino bû û yên me jî bûn cerdevan. *Jina Cerdevanekî 4, Qoser*

Bi taybetî gundiyên derdora Mêrdînê dibêjin ko ew ji ber êrîşên PKKê bûne cerdevan.

> Min di sala 1986an de dest bi cerdevaniyê kir. Ev 24 sal e ez cerdevan im. Me li gund dest pê kir. Terorîst dihatin gundê me. Digotin xwarinê bidin me, çekan bidin me, zilaman bidin me, cih bidin me û zor û zehmetî didan ber gundiyan. Ji ber wê em bûn cerdevan û me gundê xwe parast. Em bi dilxwazî bûn, kesî zor neda me. Rewşa me ya aborî jî baş bû lê min xwe li ber zordariya terorîstan ranegirt, ez bûm cerdevan… Ji bo parastina gundê xwe, namûsa xwe, ewlehiya xwe em bûn cerdevan. Ne ji bo kuştinê ne jî ji bo peran bû. *Cerdevan 13, Midyad*

Ji gundekî ereban, cerdevan wiha tînin ziman ka wan çawa çek hildaye:

> Em ji Bexdayê hatine. Eşîra me … ye. Di salên 1400î de me koç kiriye, em hatine vê derê û me ev nav li vî gundî kir. Di sala 1988an de em bûn cerdevan. Wisa berdewam kir û niha li gel yên teqawîtbûyî 85 cerdevan hene. Yên dilxwaz 35 kes in (me‘aşekî nastînin ) bi temamî em bûne

125 cerdevan. Me çima dest bi cerdevaniyê kir, ji ber ko teror derket meydanê. Teror tê nan dixwaze, alîkariyê dixwaze, gulleyan dixwaze, xortan dixwaze. Me fêm kir ko wisa çênabe, em bûn alîgirê dewleta xwe, me çekên xwe hildan û gundê xwe parast. Ji kalan heta xortan wisa berdewam kir. Em tirsiyan ko cortên me bibin çiuê û me piştgiriya dewleta xwe kir. Ji ber ko em ereb in, pirsgirêk di navbera me yên din de derdikevin. *Cerdevan 14, Lîce*

Gelek cerdevan dibêjin ji bo ko di navbera PKKê û dewletê de nemînin ew bûne cerdevan. Lê ji aliyê dî ve, cerdevaniya wan jî wan ji vê "navber"ê xelas nake. Alîgirê dike ko têkiliyên bi aliyên dî re xira bibin û malbat belav bibe.

PKKê zulm kiribû, pere xwestibû, çek xwestibû, gava me qebûl nekir, navê me bû dijmin. Êrîşî gund dikirin. Me jî, ji bo ko em di navberê de nemînin, çek hilda lê ne ji bo peran bû, jixwe min boyaxcîtî bikira debara wê çêtir bû. Em ne li dijî kurdan in, jixwe em jî kurd in. Em li dijî PKKê ne. Em ji dewleta xwe razî ne, dewlet baş e. Ya rastî em di navbera dewletê û PKKê de mane, pismamên me gêrîla ne. *Cerdevan 15, Wan Serokê Tabûrê*

Herwiha têkiliyên malbatî bandorê li destpêkirina cerdevaniyê dike.

Ez di sala 1993yan de, di bendava Kral Kızı'yê de dixebitîm. Sîgorteya min hebû. Îkramiyên min hebûn, karê min, jiyana min pirr xweş bû. Babê min wê demê cerdevan bû, gava ew hat kuştin ez neçar mam ko karê xwe bihêlim û vegerim gundê xwe. Yanzdeh xwîşk û birayên min hebûn, du birayên min jî esker bûn. Malbata min muhtacê min bû, ji ber wê ez vegeriyam gund. Hem ji bo ewlehiya malbata xwe, hem jî ji bo derbara wan ez hatim. Min karê xwe hiş û ez vegeriyam lê li gundê me jî karek tune bû, ez ji neçariya xwe bûm cerdevan. *Cerdevan 16, Farqîn, Sercerdevan*

**f. Şer û dijminahiya di navbera malbatan de**

Ji ber xwînîtî, şer û dijminahiyên kevn yên di navbera malbatan de, hemû aliyan jî xwestine ko xwe biparêzin yan jî ji "dijminên xwe" hêzdartir bin û lewma jî çek hildane.

Li gundê me ji ber nelihevkirineke li ser 'erdan, cerdevaniyê dest pê kir. Ji boewlekariya xwe,ji bo çekhildanê her kes bû cerdevanê dilxwaz.





Mêrê min berî wê nedixebitî. Pêşî babê wî bû cerdevan,paşê mêrê min jî bû, jixwe karê wî tune bû, ji ber wê bû cerdevan. *Jina Cerdevanekî 5, Lîce*

**g. Berjewendî - cerdevanî wek karekî malbatî tê dîtin**

Hinek ji wan cerdevaniyê hema bêje wekî memûriyetê dibînin. Bi hişmendiyeke faîdexwaz, hisaba pere û sigorteya cerdevaniyê dikin.

Min lîse xwendiye, ez 35 salî me, li vê derê hatime dinyayê lê li Edenê mezin bûme. 6 kulfetên min hene. Ev du sal û nîv e ez cerdevan im. Min wiha dest pê kir: Ez li Edenê bûm, gotin bekçîtî filan. Min go belkî wek memûriyetê be lê wisa nebû, min îstîfa kir. Paşê gotin dê guhertin çêbin, îstîfaya xwe paş de bikêşin. Me jî kêşa. Jixwe pismamê min serokê şaredariyê bû , wî gazî me kir, xwest ko em bibin cerdevan. Dema min fêm kir ko sîgorteya wê tune ye, min îstîfa kir. Min 2-3 caran dev jê berda lê her car gotin ew ê hin tiştan biguherînin û em xapandin. Hêj keyfa min jê re nehatiye, ez difikirim ko çeka xwe danim. Ez li Edenê dimam, min li wê derê karê temîrkirina pêlavan dikir. Ne ji dewletê ne jî ji rêxistinê zordarî li min nehat kirin, ez bi dilê xwe bûm cerdevan. *Cerdevan 17, Midyad*

Cerdevanî her wekî karê malbatê jî tê dîtin. Jixwe di nav malbatê te tenê cerdevanek jî hebe, ev bes e ko ew malbat wek "malbata cerdevanan" bê zanîn û li gorî wê dost û dijmin helwesta xwe diyar bikin. Ev helwest tesîreke mezin li ser pêşeroja malbatê, bi taybetî jî li ser ya zarokan dike.

Hemû xizm û eqrebayên me, mamê min, birayên min, her kes cerdevan e. Li nav malbata me cerdevanî bûye 'edetek êdî. Ji sala 1985an ve her kes cerdevan e. Babê min wek cerdevanekî şehîd bû, ez di bin tesîra wî de mam. Ji sala 1995an ve ez cerdevan im. Ji ber ko bûye 'edetê malbata me ez jî bûm cerdevan. Ez sercerevan im û me'aşê min 820 lêre ye. Ne ji mihtaciya peran, ez dilxwaz im ji ber ko babê min şehîd bû, hemû xim û eqrebeyên min bûn cerdevan, min jî çek hilda û ez hêj cerdevan im. Erebeya min a 60 milyarî heye. *Cerdevan 18, Wan, Serokê Saziya Cerdevanan*

Ez 29 salî me, heta lîseyê pola yekem min xwendiye. Çar kulfetên min hene, li navçeya Gelêya Diyarbekirê hatime dinyayê. Di sala 2010an de min dest pe kir. Ji ber ko pismamên min, du birayên min û babê min

cerdevan bûn û ji bo dilsoziya min a bo dewletê û ji bo ewlehiya xwe min dest pê kir û ez cerdevanekî dilxwazim im. Lê heke kadroyek bê, ez dixwazim bibim xwedî kadro. *Cerdevan 19, Gelê, Cerdevanê dilxwaz*

**2. Cerdevan û malbatên wan behsa cerdevaniyê dikin û wê dinirxînin**

*Kurê min gava bapîrê xwe dibîne dibêje "bapîr esker", ez jê re dibêjim "bapîrê te ne esker e", ji min re dibêje "na dadê, bapîrê min esker e". Dibîne ko unîforma, çek filan heye, ji bo wî esker e.*

Keça Cerdevanekî 6, Mêrdîn

*Wezîfeya cerdevanan ew e ko gundê xwe, herêma xwe biparêzin, ne ko di hemû operasyonan de bikevin pêşiya eskeran. Eskeriyê jî karên şaş bi cerdevan dan kirin. Wan karê xwe nedikir, bi me didan kirin.*

Cerdevan 20, Qulp

Cerdevanî, li gorî karên ko dikin ne cureyek e, gelek cureyên cerdevaniyê hene. Hinek cerdevan tevlî operasyonan, pevçûnan dibin, hinekên wan jî ji ber ko herêma wan ne cihê şer û pevçûnan e, bêyî ko tevlî operasyonan bibin û bêyî ko karekî giran bikin, cerdevaniya xwe pêk tînin.

Li gel dewletê an jî gêrîlayan pirsgirêkeke me çênebû. Li gund û mezrayên me derdekî wisa tune. Yek hevalê me jî bi dilxwazî nebûye cerdevan. Navê me cerdevan e lê em ji her kesî demokrattir û xwedî hişmendiyekê ne. Ji bo kurdayetiyê, ji bo gelê xwe em hişyar û xwedî helwest in. *Cerdevan 4, Wan*

Lêbelê rewşa hemû cerdevanan ne wisa ye. Fesla heştemîn a bi navê "Karên ko dê Cerdevan Pêk Bînin" di Qanûna Gundan[10] de ko cerdevanî li ser wê ava bûye, wiha nivîsî ye: "Di nav sînorên gund de, ji bo parastina namûs û mal û milkê her kesî cerdevan tên wezîfedarkirin. Lêbelê ji destpêka cerdevaniyê heta niha, cerdevan bi cendirmeyan re li dijî PKKê derdikevin operasyonan, hetta di wan operasyonan de ji bo parastina cendirmeyan li pêşiya wan cih digrin.

Em bûne cerdevan heta niha, cihê me her li pêşiya cendirmeyan e. Pirranî wek koma pêşeng em dihatin şandin. Di sala 1997an de, şev bû û gotin li cihekî terorîst hene. Em 7 cerdevan bûn. Wê demê tumen bû çi bû nizanim, fermandarê wê em li pêşiyê rêz kirin û esker jî li pişt me. Li gorî fikra me ev tiştekî xelet e. Şev e û esker jî gulleyan berdidin dengê keleşan û di destê me de jî keleş hene, di destê terorîstan de jî. Jixwe terorîst jî gulleyan berdidin me. Esker jî ber bi vî dengî ve gulleyan berdidin û şev e. Me jî got ev xeletî ye. Ji me re gotin eskerên me tiştekî li we nakin, gulleyan bernadin we, yanê ew xetaya fermandariyê bû. Tiştek jî (êlek û mertalên pola) tune bû ko em li xwe bikin, ji ber ko me dizanî ew wisa difikirin heke em bimirin jî ne xema wan e. *Cerdevan 3, Lîce*

Tevî ko hinek ji wan bi dilxwazî, hinek jî ji neçarî bûne cerdevan, ji gotinên wan tê fêmkirin ko yek ji wan jî ne dilxweş e ji cerdevaniyê. Ev yek pirranî ji ber helwesta eskeran e ko bi cerdevan bi wan re diçin operasyonê. Cerdevan tînin ziman ko esker wan wekî "qurbanên pêşî" dibînin û karên ko ne karên wan in bi wan didin kirin û gelek xeletiyên pergala cerdevaniyê dihejmêrin.

Ji bo ko em xwe bi çekên dewletê biparêzin me dest bi cerdevaniyê kir. Cerdevanî ne ew e ko mirov li derveyî gund, li pêşiya eskeran biçe operasyonan. Cerdevan herêma xwe diparêze. Pergal xelet bû, pêkanîna wê xelet bû û her tişt tevlihev bû. Cerdevan divê tenê gundê xwe, herêma xwe biparêze. Ne ko divê li pêşiya eskeran biçe operasyonan. Eskeriyê jî karên xelet li cerdevanan dan kirin. *Cerdevan 11, Qoser*

Xuya ye ko cerdevan vê pergalê, karê xwe û xwe bi xwe jî dinirxînin. Lêbelê piştî vê nirxandinê nagehin encamekê. Çekdanina wan jî wekî destpêkirina cerdevaniyê zehmet xuya dike. Herwiha ji ber ko ev sîstem nîv-qanûnî ye û cendirme jî cerdevanan wekî sîxurên îstîxbaratê dixebitînin, cerdevan ji kesî bawer nakin û di nav wan de yekîtî jê çênabe.

Di operasyonan de gava esker nediman, me bi hevalên xwe yên cerdevan re digot çi îşê me heye li vê derê. Lê dîsa xayînek derdiket û giliya me ji fermander re dikir. Û hindik mabû ji ber vê çeka hevalekî me jê bistînin hetta cezayê jî bidinê. Yanê mirvo pê bawer nabe. Em çûn me rica ji fermandarê xwe kir, me go bêbextî li wî hevalî hatiye kirin. *Cerdevan 20, Qulp*

Hinek ji wan difikirin, cerdevaniya wan bi kêra tiştekî tê ji ber ko dikarin êdî zarokên xwe biparêzin ji bo ko PKK wan nerevîne:

Xêra cerdevaniyê ji bo me ev bû; heke ev cerdevanî nebûya, ew ê bihatana gundan û zarokên me birevandana. *Cerdevan 21, Midyad*

### a. Esker me dixapînin

*Lê niha me fêm kir ko dewlet me dixapîne, ji ber wê em wek berê bi daxwaz û kelecan naçin.*
Cerdevan 10, Qoser

Cerdevan gelek caran tînin ziman ko êdî cerdevanî ne tenê parastina gundê xwe ye, 'esas bûye wezîfeya kirina karên eskeran û ji xwe karên ew dikin jî karên eskeran in. Di nav cervedanan de fikra ko herî zêde berbelav ev e; esker me dixapînin û karê xwe bi me didin kirin. Dibêjin ko ew pêşî bi vê nehesiyane lê hêdî hêdî fêm kirine.

Wê demê em çalak bûn û bi keyf û şahî dixebitîn. Em bi daxwaza dil diçûn operasyonan, hem ji ber bûyeran, hem jî ji ber nas û eqrebayên hatî kuştin. Lê niha me fêm kir ko dewlet me dixapîne, ji ber wê em wek berê bi daxwaz û kelecan naçin. *Cerdevan 10, Qoser*

Dewlet jî cerdevaniyê dişelîne, heke neşelandê, dê ji holê rakira. Ji be ko cerdevan dewletê re dibe rêbet. Çand, teb'et, cografya her tiştî cerdevan dizanin û dewlet jî ji wan îstifade dike. Heke haya cerdevanan ji van tiştan çêbe ew ê jî ji vî karî dilsar bibin. *Cerdevan 4, Wan*

Cerdevan dibêjin ko esker wan di karên curbecur de dixebitînin û ew kar ne di nav çarçoveya karên wan de ne, hetta ew ne karên dewletê ne jî.

Car caran em 24 saetan nobetê digrin û ev sê rojan carekê dubare dbe. Em diçin operasyonan jî. Rayedarê qereqolê çi bixwaze, çawa bixwaze wisa dibe. Niha jî li der û deverên nehewce nobetê bi me didin girtin. Mesela em diçin li ber Xeta Botaşê nobetê digrin. 'Esas ew der hatiye firotin, ne malê dewletê ye. Lê ji bo nobetê me li wê derê wezîfedar dikin. Esker jî karê xwe bi me didin kirin. *Cerdevan 22, Midyad*

### b. Derketina operasyonê

*Hema bêje em bûne robot, em tevlî çalakiyeke sosyal banin, ji xeynî pêkanîna fermanan em tu tiştî nakin, em hemû fermanan tînin cih.*
Cerdevan 23, Qoser





Cerdevan tînin ziman ko çi fermanê bidin wan ji neçarî tînin cih û gelek caran wan dibin operasyonan.

Em diçin operasyonan, em ji bo nobetê diçin. Heta sala 2000î jî em gelek caran diçûn operasyonan. Niha em zêde naçin. Em dixwazin aştî û aramî pêk bê, dinya piçekî serrehat bibe. Gava em diçûn operasyonan 3 an jî 4 rojan em li wir diman. *Cerdevan 7, Wan*

Aliyê îronîk yê vê meselê ew e ko, jixwe eşkere hatiye nivîsandin, cerdevan divê li derveyî gundê xwe jî biçe operasyonn, lêbelê ev qanûn di 1ê tîrmeha sala 2000î derket, di Rojnameya Fermî de hat weşandin û armanca wê wek “pêkanîna esas û usulên kar û xebatên cerdevanan, cihê ko dê lê bixebitin, wezîfe û berpirsyariyên wan, heqên wan ên karkeriyê, perwerdehiya wan û kardextina wan”[11] hatiye terîfkirinû ev yek bi navê Destûrnameya Cerdevanan hatiye derxistin. Di wê qanûnê de du xalên ko behsa derketina operasyonê dikin li dijî hev in. Xala 68an, wiha ye; “Di nav sînorên gund de, ji bo parastina namûs û mal û milkê her kesî cerdevan tên wezîfedarkirin.” Û bi vî hawî herêma ko dê cerdevan lê bixebitin wek “sînorên gund”, teng dike. Lê xala ko di sala 2007an de li qanûnê hat zêdekirin, b awayekî zelal tê gotin ko cerdevan divê derkevin operasyonan jî. (Fesla pêvek: 27/5/2007- hejmar 5673 – xala 1.) “Heqê cerdevanên ko li gel wezîfaderên ewlehiyê derdikevin operasyonan, ji aliyê wan yekîneyan ve û ji butçeya giştî ya wê yekîneyê tê dayîn.” Ev dubendî, dide zanîn ko cerdevanî ji serî de wek pergaleke paramîlîter hatiye avakirin û bi kirinên keyfî tê rêvebirin û li gorî hewcedariyên demdemî tê guhertin. Dîsa wek hemû komikên paramîlîter, di cerdevaniyê de jî “ewlehiya dewletê” bi nepeniyê ve tê girêdan û ev yek bi saya nûçeyekê di sala 2005an de derket holê. Parlamenterê CHPê Mesut Değer bi pirsyarnameyekê ji Wezîrê 'Edaletê Cemil Çiçek pirsî ko “hikumetê destûrnameyeke veşartî derxistiye yan na.” Cemil Çiçek wiha bersiv dabû wî: “Li ser têkoşîna li dijî terorê, ji bo danîna rê û rêbazên xebata personelên ko dê bên wezîfedarkirin, mecrayên ko dê lê bixebitin, wezîfeyên wan, berpirsyariyên wan, perwerdehî û jikarderxistina wan, Destûrnameya Cerdevanan hatiye derxistin lê ev destûrname di Rojnameya Fermî de nehatiye weşandin û ji bo ewlehiyê karên dewletê ne lazim e ko bê weşandin jî. Cemil Çiçek qanûna ko dibêje “destûrnameyên ko ji bo ewlehiya netewî xeternak in, bi awayekî eşkere nayên weşandin.”[12] Herwiha di kanûna sala 2008an de ev destûrname hatiye guhertin lê dîsa bi hinceta “taybet e bo karekî” ev guhertin veşartî maye.[13]

Carna jî operasyon dirêj bûne û cerdevan bi mehan ji mala xwe dûn mane.

> Yan Mûş, yan Bîngol yan jî Şîrvan, ko derê bixwazin em ji bo operasyonê diçûn wê derê. Mesele ev e. Bi şev û rojan, carna bi mehan em li derve diman. *Cerdevan 20, Qulp*

Jina cerdevanekî, çi ko mêrê wê bo demên dirêj diçû operasyonan, wiha diaxive:

> Saeta karê wî ne diyar e. Mêrê min sercerdevan e. Nikare alîkariya min bike, saeta hatin û çûyina wî diyar nabe. Kes nizane dê kîjan saetê gazî bikin. Ji ber ko ez tenê bi zarokan re mijûl dibim, qeweta min têrê nake. Dixwazim mêrê min jî bi wan re mijûl bibe. *Jina cerdevan 6, Jina sercerdevanekî, Gêlê*

Ji bo operasyonan, nerazîbûneke din a cerdevanan jî ew e ko, heta demeke nêzîk jî mesrefa çûn û hatinê û ya xwarinê ji kîsê xwe didan. Di sala 2007an de xalek li Qanûna Gundan tê zêdekirin û ev mexdûriyet diguhere: "Mesrefa cerdevanên ko li gel hêzên ewlekariyê derdiekevin operasyonan, ji aliyê yekîneyên wan ve û ji butçeya vê yekîneyê tê dayîn."[14]

> Lê heta sala 1999an em her bi erebeya xwe diçûn rêyên dirêj, em bi peyatî jî diçûn, erebeyên me jî deşîfre dibûn. Me şertên zor zehemt dîtin, nayên gotin, encax mirov di nav de fêm dike. Me konek li ser ramorka trextorê vedida û hemû rojên Xwedê, di herrî û baranê de jî em diçûn operasyonan. Heta salên 2000î jiyana me wisa derbas bû. *Cerdevan 3, Lîce*

Cerdevan ne tenê di nav hidûdên Tirkiyê de, li Iraqê jî tevlî operasyonan dibûn.

> Esas em jî wek memûrên normal, statuyekê dixwazin, çawa serbazek xwedî mafên xwe ye, bila wan mafan bidin me jî. Em cerdevanên gundan in lê em diçin herêmên dî jî, li navçeyên dî jî em diçin operasyonan. *Cerdevan 24, Farqîn*

Me ji nûçeyên çapemeniyê û niqaşên li ser cerdevanan gelek mînakên wê pêşkêş kir ko cerdevan, ji xeynî derketina operasyonan tevlî "tîm" û "çete"yan dibin û di kuştinên kiryarên nediryar de cih digrin, zilaman direvînin, cilên gêrîlayan li xwe dikin û bi ser gundan de digrin, qaçaxçîtiyê dikin û li ser navê JİTEMê tevlî gelek sûcên dî dibin.[15]





**c. Tabûrên cerdevanan**

Di hiyerarşiya cerdevaniyê de sercerdevan, serokê tîmê û cerdevan hene. Sercerdevan pirranî ji mixtaran tên hilbijartin, li gorî hejmara cerdevanên gund, hejmara sercerdevanan jî diguhere. Ji xeynî vê; li Şerenexê komikên wek "tîmê xencerê" tevlî operasyonên muhîm dibin, li Wanê jî tabûreke ji 5000 cerdevanan pêk hatî, bi navê "Tabûra Birûskan" hatiye avakirin. Di van tabûrên cerdevanan de, li gel fermandarê tabûrê, serokê yekîneya cerdevanan jî hebû.

Bi saya gotinên fermandarê tabûrê û çend cerdevanan, guherîna salên dawî yên van tabûran zelal dibe. Dewletê di salên 90î de tabûrên 800 kesî pêk dianîn lê roja îro êdî cerdevanan naşîne operasyonan.

> Tabûra ...'yê di sala 96an de hat damezrandin. Em nêzîkî 800 kesan bûn. Hinek ji wan teqawît bûn, hinek jî şehîd bûn. Niha yên mayî naçin operasyonan. Piştî vê hikumetê ev cerdevan naçin operasyonan, karên normal dikin. *Cerdevan 12, Fermandarê tabûrê, Wan*

Vê carê, cerdevanekî serokê saziyê diaxive û gava behsa endamên saziyê dike, wekî ko ew eskerên wî bi xwe ne:

> 5580 cerdevanên me hene. Li Şaxê 1500 cerdevanên me hene. Li gunên Şaxê jî 350 cerdevan hene. 180 şehîdên me, 35 jî gaziyên me hene. 40 cerdevanên me yên dilxwaz hene ko me'aş nastînin û deh cerdevanên me jî jin in. Cerdevan 18, Wan, Serokê Saziya Cerdevanan

Ev rêxistin nîşan dide ko cerdevanî wekî hêzeke paramîlîter pêk hatiye û ji ber vê jî tasfiyekirina wê pirr zehmet e.

**d. Piştgiriya cerdevanan, saziyên wan**

Di salên 2000î de, ji bo parastina mafên cerdevanan û alîkarî û piştgiriya cerdevanên hatî kuştin, ji aliyê cerdevanan ve sazî hatin avakirin. Hê jî li bajar û navçeyên xwedî cerdevan, saziyên cerdevanan hene. Di sala 2006an

de li ser facebookê rûpela Saziya Alîkarî û Piştgiriya Cerdevanan hatiye vekirin û di wê rûpelê de wiha hatiye nivîsandin: "Armanca saziya me, bi her awayî alîkarî û piştgiriya cerdevanan e, parastina mafên wan e û ev sazî di têkoşîna li dijî terorîzmê de bi her alîkarî piştevaniya wan dike."[16] Serokekî saziyeke cerdevanan armanca xwe ji me re wiha rave dike:

> Me di sala 2007an de ev sazî ava kir. Armanca me alîkariya zarokên malbatên şehîdan e. Bi qasî ji destê me bê, me bûrs dida zarokên wan. Her meh, cerdevan bi dilxwazî 5 lêreyan didin me. Herwiha gava qeziyek hat serê yekî, çiqas ji destê me bê em alîkariya wî dikin. Sîgorteya me tune, mafê me yê tazmînatê tune. Ez niha teqawî bûme lê hê jî min Karta Kesk a tenduristiyê heye. *Cerdevan 25, Midyad, Serokê Saziya Cerdevanan*

Li gorî qanûnan, qedexe ye ko cerdevanek bibe endamê partiyekê. Cerdevan, encax piştî teqawît bûn dikarin bibin endamê partiyeke siyasî. Serokekî saziyeke cerdevanan dilxweşiya xwe ji cerdevaniyê tîne ziman ko endamê MHPê ye, niha teqawît bûye û wekî wî kêm kesan gotiye ko wî bi keyfxweşî cerdevanî kiriye.

> Berî ko ez bibim cerdevan, ez fermandarê tîmekê bûm, bi hilbijartinê ez bûm serokê saziyê. Kes bi daxwaz dilê xwe nebû cerdevan, her kes ji neçariyê bû. Yan dê tevlî PKKê bûbûna yan jî dê bûbûna cerdevan. Hema bêje 500 endamên me hene. Ez bi xwe ji rêxistina MHPê me, piştî teqawîtbûnê ez ji bo wan xebitîm. Di operasyonan de esker û cerdevan wekî birayên hev bûn, têkiliya wan xweş e. Gelek kes cerdevanan wekî xayîn dibîne, lê em ji bo hizûra gelê xwe bûn cerdevan, ne ji bo peran. Ji kirinên me ez bi xwe dilxweş im. Erêi min gelek zehmetî kêşa, ez gelek westiyam lê min ji bo welatê xwe kir, ji ber wê ez dilxweş im. Ez teqawît bûme lê min dîsa serî lêda, ez ê vê carê bibim cerdevanê dilxwaz, bi keyfxweşî. Ev ne tevgera kurdan e, ev tevgera cavnebarên welatê me ye. Ma kurdek kurdekî/ê dikuje? *Cerdevan 25, Midyad, Serokê Saziya Cerdevanan*

### e. Cerdevan têkiliyên xwe û eskeran çawa dibînin

> *Qereqol baweriya xwe bi me nayne. Tu carî ji me re nabêjn ka diçin ko derê. Ne ew baweriya xwe bi me tînin ne jî em bi wan.*
>
> Cerdevan 4, Wan





> *Rêya rêxistinê diyar e. Ji xwe re rêyek çêkiriye û dimeşe. Lê rêya dewletê û miletê me ne diyar e.*
>
> Cerdevan 20, Qulp

> *Eskeriya, carna ji me re baş e, carna zorê dide me, carna heqaretê li me dike. Misqalek faydeya cerdevaniyê negehiştiye me lê gelek tişt ji me kêm kirine. Ev pergal xirabe ye.*
>
> Cerdevan 26, Midyad

Encax di sala 2000î de li ser destpêkirina kar, jikarderxistin, cihên wezîfedarkirinê û mafên din ên karkeriyê hin rê û rêbaz bi destûrnameyekê hatine diyarkirin.[17] Li gorî destûrnameyê cerdevan ji aliyê îdarî ve girêdayî mixtarên gundan, ji aliyê kar ve jî girêdayî fermandariya cendirmeyan ya li herêma wan in.

> Gava pirsgirêkeke me çêdibû, berpirsyar eskeriya bû. Têkiliya me bi qaymeqamtiyê tune bû. Qaymeqam jixwe li me xwedî dernakeve. Wezîfeya me girêdayî cendirmeyan e. *Cerdevan 24, Farqîn*

Ji ber ko di pergala cerdevaniyê de hiyerarşî nehatiye zelalkirin, roja îro jî tam ne diyar e ka cerdevanî girêdayî kîjan rêveberiyê ye.

> Ya rastî em nizanin em girêdayî kîjan sazî û dezgehê fermî ne lê em li vê derê girêdayî fermandariya cendirmeyan û qaymeqamtiyê ne, ew gazî me dikin em jî diçin. Carna em dizanin ka em diçin ko derê jî. *Cerdevan 1, Qulp*

Herwiha cihê operasyonê an jî wezîfeyê, navê fermandarê operasyonê jî, ji cerdevanan re nayê gotin. Wekî di van hevdîtinan de cerdevanan gelek caran anî ziman, ji ber wê ye ko esker baweriyê bî cerdevanan naynin.

> Em dixwazin bila cihê wezîfeya me diyar be, divê em bizanin ka em ê çi bikin û çi nekin, berpirsyariyên me çi ne. Em ê jî wê demê wezîfeya xwe bikin, em ji ber wezîfeyê xwe nadin alî. Jixwe em bi dixwazî vî karî dikin. Fermandarê navçeya me carna em dişandin derekê û em heftiyekê yan jî deh rojan li wê diman. Ji bo operasyonan em diçûn gelek deveran. Lê pirsgirêkek heye, me dibin her derê lê em jî dixwazin bizanin ka em diçin ko derê. Heqê kê heye fermanan bide me, heqê kê tune, em dixwazin van bizanin ko em bikarin xwe biparêzin, mafên xwe biparêzin. Jixwe ev mafê meye jî. *Cerdevan 2, Lîce*

Nebawerî û dijîtiya di têkiliya dewlet û cerdevanan de nîşan dide ko dewletê dixwest bi avakirina pergala cerdevaniyê, girseyeke "alîgirê dewletê" biafirîne lê bi ser neket.

> Qereqol baweriya xwe bi me nayne. Tu carî ji me re nabêjn ka diçin ko derê. Ne ew baweriya xwe bi me tînin ne jî em bi wan. Gava em bi herin herin wezîfeyê jî em li ruyê hev nanêrin. Ne mecbûrî be gazî me nakin, ne ew tên ne jî em diçin. Cerdevanî li hemberî PKKê hatiye avakirin, ji ber ko cerdevan siyasetê dizanin, her kesî nas dikin, herêmê dizanin, ji bo ko ji agahiyên wan sûdê wergirin avakirin. Li ser min ez bawer im 50 rûpel nivîsîne, tiştek xirab derxistin. Lê axirî tiştek neqewimî, nexwe wan dê ez bikuştama. Gelek caran çavên wan li min bû, ji bo min bikujin. Cerdevan nebûna dewletê nedikarî gavekê biavêje, her tim cerdevanan rê nîşan da, îxbar kir, lewma wisa bû. Dewletê cerdevan xapandin û karê xwe bi wan da kirin. *Cerdevan 4, Wan*

> Mesela ez ji bajêr derkevim, biçim Colemêrgê, Mêrdînê, Amedê filan, esker ji serî heta bînî erebeya min digerin, ji ber ko ez cerdevan im. *Cerdevan 11, Qoser, Cerdevanê teqawîtbûyî*

Mafên karkirinê yên cerdevanan li gorî destûrnameyekê nehatine diyarkirin. Şertên xebata wan li pirranî li gorî keyfa cendirmeyan e ko di bin emrê wan de dixebitin.

> Ji ber ko neheqiyê li me dikin, em ji vî karî poşman dibin. Pirsgirêka pergalê bi xwe ye. Bila berpirsyarekî me hebe, saziyek fermî hebe, gava derdekî me çêbû em jê re bêjin. Em ê biçin ba kê, şikayetên xwe em ê ji kê re bêjin, berpirsyariya me çi ye, em dixwazin van bizanin. Mesela wê rojê eskerekî xwedî rutbe hat pirsî, hûn nobetê digrin, min jî go erê em digrin, go heqê nobetgirtina we ya li vê derê hatiye rakirin, çima ji we re negotine, min jî go heta niha tiştekî wisa ji me re nehatiye gotin, go baş e tiştek nabe. Go hûn îdare bikin. Yanê em ji ber nobetê narevin lê divê tiştekî wisa nebe. Heke di wextê nobeta me de tiştek biqewime bila berpirsyarî nekeve ser milê me. Tu xebera te ye. Û êdî me li wê derê nobet negirt. Yanê ez dixwazim vê bêjim; divê berpirsyariyên me bên kifşkirin. *Cerdevan 14, Lîce*

Ji ber ko rêbazên nivîskî nîn in, yên heyî jî kes guh nade wan, dibin sedem ko rayedarên herêmî bi keyfa xwe dilê tevbigerin.

Esker, karên beredayî bi cerdevanan didin kirin. Gava operasyone tune be cerdevan çi dikin, wan jî got bila bên li qereqolê hemaliyê bikin. Ma ev cerdevan dê çawa dilsozê dewletê be! *Cerdevan 11, Qoser, Cerdevanê teqawîtbûyî*

> Hem gel hem jî dewlet me dixapîne. Du sal ceza dan min. Sedem jî ew bû ko gava em diçûn operasyonan hin çek zêde diman yan jî dihatin standin, digotin bila ji we re bimînin, dema me ev çek bi xwe birin jî ceza dan me. Tiştek ko ew bi xwe destûrê didinê, çawa bixwazin wisa li dijî me bi kar tînin. *Cerdevan 10, Qoser*

Gelek cerdevan tînin ziman ko di têkiliyên cerdevanan û eskeran de keyfiyet û neheqiyên derqanûnî hene. Li şûna destûrname û qanûnan, di têkiliyên esker û cerdevanan de keyfiyet û berjewendî heye. Esker, cerdevanên ko ji bo ewlehiya gundan hatine wezîfedarkirin wekî xwe nabîne û baweriyê jî bi wan nayne. Ji ber vê hem biçûkxistin û heqaret gelek li wan tê kirin, hem jî ji ber kêmasiya qanûnî, qereqol carna ji nişkê ve li gorî keyfa dilê xwe, cerdevanan ji kar derdixin.

> Pêşeroka me ne diyar e ji ber ko dewlet kengî bixwaze dikare me ji kar derxe. Karê me demdemî ye. Qereqol du raporan binivîse bes e. Heke navbera te û cendirmeyên naveçyê baş nebe, rapor tên erêkirin û te ji kar derdixin. Dema tiştekî biçûk qewimî, heke torpîla te li alayê tune be, yekser te ji kar derdixin. *Cerdevan 10, Qoser*

> Birayekî min heye, ew jî hema bêje 20 sal bû cerdevan bû, lê nexweş ket, çû nexweşxanê. Doktoran jê re raporek nivîsandin ko çavê wî baş nabîne, nikare çekê bi kar bîne, li qereqolê çeka wî jê standin. Tu heqê wî nema, tenê 20 milyar pere dane wî. Gelek kes wisa mexdûr bûye. *Cerdevan 27, Midyad*

Herwiha, yên ko bi zorê bûne cerdevan yan jî dixwazin ji cerdevaniyê xilas bibin, rastî gelek zext û zordariyan tên.

> Min ji fermandarê xwe re got, bila kes kesî nexapîne. Ez li vir bim gulleyan bernadim kurê xwe, kurê min jî li serê çiyê be ew jî gulleyan bernade min. Ev derew e. Yê ko rast û durist biaxive di nav civaka bêwijdan de cihê wî tıne. Tişta ko ev welat wêran kiriye pergala cerdevaniyê ye. Pêşî ez nebûm cerdevan. 5-6 salan zordariyeke ecêb li min kirin. Wê demê kê tiştekî wisa li qereqolê bigota, dihat kuştin. Piştî ko min dev ji cerdevaniyê berda, dilê min rihet bû. *Cerdevan 20, Qulp*

Ev axaftina jêr nîşan dide ko li hemberî heqaret û kirinên nexoş yên eskeran, cerdevan jî qet ji eskeran hez nakin.

> Ez ji ber xetayên wan pirr aciz dibûm. Lê min her di dilê xwe de hişt. Ji ber ko min nedikarî serî hildim. Min bi xwe gelek heqaret dîtin lê gava mirov bersivê bide jî tu m'aneya wê tune. Yan ew ê ji te re bêjin "teror" yan jî wê li te bixin. Malbata min hebû, lewma min pişguh kir. Lê tiştên ko hatine serê min ez tu carî ji bîr nakim. *Cerdevan 20, Qulp*

> Qet keyfa min ji cerdevaniyê re nayê. Em di bin emrê çawişekî pispor de bûn, zora me diçû. Ji ber ko em giregirên vî welatî ne, em ne zilamên vê rewşa xirab in. Heke cerdevanî bê rakirin dê gelek baş be. Ev pergal navê welatê me dilewitîne. Cerdevanan ewqas şer kir, lê dewletê ew paşguh kirin. Ew qas eskeran xweyî dikin lê em li vir çend hezar kes in, bi salan me li hemberî PKKê şer kir, bi gelek zehmetiyan me şer kir lê dewletê derdên me, serpêhatiyên me û têkoşîna me paşguh kir. Qîmetekê nadin me. Qet nabêjin ev însan bûne xayînê gelê xwe, vê rewşê nabînin. Yanê divê qedr û qîmetek bidana me cerdevanan. Eskerên ecemî jî qet rêz û hurmet nîşanî me nedidan. Yanê li vê herêmê heke tu cerdevan bî, şerefa te, şexsiyeta te, li erdê ye û bê qîmet e. *Cerdevan 11, Qoser, Cerdevanê teqawîtbûyî*

### 3. Guherîna têkiliyên civakî û gundan

> *Berê gundê me xweştir bû, şên bû, wekî bajarekî bû. Lê piştî pevçûnan gelek kesan bar kir, nexwestin bibin cerdevan û gund bêdeng ma. Derfet kêm bûn, li gundê me tahma tu tiştî wek xwe nema.*
>
> Cerdevan 7, Wan

> *Yanê li vê herêmê heke tu cerdevan bî, şerefa te, şexsiyeta te, li erdê ye û bê qîmet e.*
>
> Cerdevan 11, Qoser

> *Berê em diçûn dihatin lê niha na, kes ji me hez nake.*
>
> Cerdevan 28, Gêlê

#### a. Nêrîna li cerdevanan

Li gundan, têkiliyên cerdevan û gundiyan li her derê ne wek hev e, li hin





deveran gelek cuda ye. Li hin cihan cerdevan wekî mirovên xirab nayên dîtin, li hin cihan jî cerdevan rastî helwestên tund tên û hin kes bi temamî ji wan û malbata wan dûr dikevin û direvin. Ev helwest li gorî destpêka cerdevanbûna wan û şiklê pêkanîna wezîfeya cerdevaniyê jî diguhere. Bi kesên ko bi zorê bûne cerdevan û ji bo gundiyên xwe mirovên qenc in, têkiliyên normal datînin. Lêbelê li hin gundan tê zanîn ko cerdevan çûne operasyonan û di wan pevçûnan de gêrîlayên PKKê hatine kuştin û ew cerdevan tevlî gelek sûcan bûne. Bi cerdevanên wisa re, pirrî caran xizm û eqrebayên wan bi xwe jî têkiliya xwe, silav û suhbeta xwe dibirrin.

Tê zanîn ko di salên 90î de ewqas kuştinên kiryar nediyar çêdibûn û êrîş dihatin kirin, li gel eskeran, cerdevanan jî di nav van sûcan de cih girtine. Ji ber vê, wan salan têkiliya cerdevanan û gundiyan pirr xirab bûye.

> Piştî ko em bûn cerdevan pirsgirêkan dest pê kir. Bi taybetî jî di salên 90î de kesî silav li me nedikir. Û tevî ko babê min, mamê min û birayê min ji aliyê PKKê ve hat kuştin jî, miletê me ev rewşa me fêm nekir. Ji ber ko ew difikirîn, heke yek ji aliyê PKKê ve hatibe kuştin, xayîn e, sîxur e, heq kiriye. *Cerdevan 10, Qoser*

> Beriya sala 1997an, gelek pevçûn çêbûn, gelek nasên me hatin kuştin. Hema bêje her şev pevçûn hebû. Li nav baxçeyên gund, li ser û binê gund, li cihên nobeta me her û her mayin hebûn. Me nedikarî em derkevin derveyî gund, li çiyan, geliyan û nav rezên me mayin hebûn. Kesî nedikarî bi rihetî li mala xwe rûne, her kes li derve bû. Em her tim nedifikirîn ka malbata me çi dike, çi dixwe çi vedixwe. Ji ber operasyonên li derdora gundê me, di navbera salên 90 û 97an de li gundê me 16-17 kes hatin kuştin. *Cerdevan 14, Lîce*

Piştî salên 2000î, operasyon ji nav gundan derketin û ber bi cihên gêrîlayên PKKê ve çûn, bi saya vê jî tê dîtin ko têkiliyên cerdevanan û gundiyan piçekî rihettir dibe.

> Ji ber ko li gundê me her kes xizmê hev e, kes bi çavekî xirab li cerdevanan nanêre lê gundên cîran me wek xayîn dibînin. Hetta digotin ev cerdevan in, silavê li wan nekin, tiştekî ji wan nekirrin, nefiroşin wan. Yanê ev jî aligirên terorîstan in. Digotin van li erebeyên xwe siwar nekin. Lê piştî salên 2000î em rihettir bûn, piçek aramî çêbû. *Cerdevan 13, Midyad*

Jina cerdevanekî dibêje ko di serî de mêrê wê hat xapandin û ew kirin cerdevan, niha jî dewlet qedr û qiymetê nade wan, mirovên din jî ew ji nav xwe dûr kirine:

> Wan got were bibe bekçî. Me nedizanî ew dê bibe cerdevan. Gotin were bibe bekçî, negotin em ê wan bikin cerdevan. Ma cerdevan xema wan in, yek ji wan jî însan nahesibînin. Dewletê ew kirin cerdevan, destê xwe jê kêşa. Mirovên din jî ew ji xwe dûr kirin. Em di navbera herdu aliyande man û mala me xira bû. *Jina Cerdevanekî 7, Mêrdîn*

Cerdevanî, pergalek e ko xizman li hev dike dijmin. Bi taybetî yên ko alîgirê dewletê ne, xizmên wan jî naxwazin bi wan re biaxivin an jî têkiliyekê danin.

> Xizmên me hene ko nebûne cerdevan lê ji ber ko em cerdevan in, ew jî ketine pêy fikrên xelet. PKKê dipaêrzin, ji me re dibêjin we rêya xwe şaş kiriye, werin çekên xwe berdin, em biaxivin, wê demê em xizm û eqrebayên hev in wisa nebe em ne tiştekî hev in. *Cerdevan 29, Lîce*

> Min heta lîseyê xwendiye. Ji sala 98an ve ez cerdevan im, sercerdevaniyê dikim. Li vir 8 dilxwaz, 15 jî xwedî kadro, 23 cerdevan hene. Di sala 95an de cerdevaniyê li vir dest pê kir. Bi temamî 184 cerdevan hene lê tevî yên dilxwaz zêdetir in. Ez kontrolê nobetê dikim êvaran. Ji berê ve têkiliya me û kurdan ne baş e, em alîgirê dewletê ne, babê min jî cerdevanê dilxwaz e. 'Esas eqrebayên me yên alîgirên rêxistinê jî hene lê fikrên me pirr cuda ne. Berê em diçûn mala hev lê niha kes ji me hez nake. *Cerdevan 28, Gêlê, Sercerdevan*

Ne tenê cerdevan, ji aliyê kesên din ve tên paşguhkirin. Herwiha silavê li malbata cerdevanan jî nakin.

> Jinxala min heye li Amedê. Ji min re dibêje "tu jina cerdevanekî yî, hûn bê dîn û bê îman in". Ma ev li me tê, yanê tiştên wisa dibêjin me. Ma ev zora mirvo naçe, gelek tiştên wisa tên serê me. *Jina Cerdevanekî 7, Mêrdîn*

Cerdevanên ko ji ber van helwestan aciz dibin, tînin ziman ko tiştekî cerdevaniyê nîn e ko wê biparêzin, lê dîsa jî li gorî xwe sedem û mecbûriyetan rêz dikin û dibêjin ko kesên li derdorê neheqiyê li wan dikin.





> Gel bi çavekî xirab li me dinêre, em ji vê aciz dibin. Ma qey mafên kurdan hebûn û me ew ji wan standin, me rê li ber wa ngirt. Kar tune bû, rêxistinê zor dida ser me, lewma jî em bûn cerdevan. Hem ji bo debarê hem ji bo ewlehiyê û namûsa xwe, em bûn cerdevan. Jiyana me reş û tarî ye. *Cerdevan 16, Farqîn*

> Xizmên me hene ko nebûne cerdevan lê têkiliya me pirr baş e, pirsgirêkek di navbera me de nîn e. Jixwe em ne wekî cerdevanên dî ne, em baş in. Ez ji cerdevaniyê memnûn im, ji ber ko gundême nehat xirakirin. Heke em nebûna cerdevan dê xira bûbûya. Ji xeynî cerdevaniyê ez karên baxçeyan dikim û spîndaran mezin dikim. Wekî cerdevanekî û wekî welatiyekî sivîl, em ji tiştekî aciz nabim. Gundê me pirr xweş e, em modern in. *Cerdevan 30, Mêrdîn*

Cerdevanbûna babê wan ji bo zarokan û malbatê, ji aliyê civakî ve tengasiyan derdixe, wan ji civakê îzole dike. Ev îzolebûn, ne tenê li nav gund û derdora wî ye. Zarokên cerdevanan, biçine ko derê jî ji wê nasnava "zarokên cerdevanan" nikarin xwe xilas bikin. Ji ber vê, gelek zarokên cerdevanan li mektebê an jî li kargehê nabêjin ko ew zarokên cerdevanan in. Berteka herî dijwar a li hemberî cerdevaniyê li cihên ko cerdevanî lê tune, tê nîşandayîn; li bajaran. Civaka polîtîk a bajaran alîgiriya dewletê efû nake.

> Gava em diçin bajêr, em rastî gelek tengasiyan tên, xeberan dibêjin me. Em jî gelek caran dengê xwe nakin. Ji ber ko em cerdevan in, zarokên me ditirsiyan, wextê pevçûnan zarokên me digiriyan. Li gundê me kes nehat kuştin. Bawer bike piştî ko em bûn cerdevan êdî bi şevan mêhvan jî nayên mala me, kes li mala me ranazê. Carekê kurê min ji bo xebatê çûbû Stenbolê, li wir ji ber cerdevaniyê rastî tengasiyan hat. Vegeriya. Em ji bo kesî pirsgirêkan dernaxin, heke ew ji me re dernexin... Bawer bike, li jor zeviyên me hene, em nikarin biçînin, pê re mijûl bin. Tu faydeya cerdevaniyê ji bo me nîn e. 400 kes li vî gundî dijîn. 80 xwendekarên me hene. Di navbera zarokên me û yên gundên din de jî pirsgirêk derket, me bi çekan şer kir. Paşê esker ketin navberê, tiştek nebû. Keçikên me jî dixwînin, diçin lîseyê jî, yan diçin Lîcê yan jî diçin Bîngolê lê li wê derê nabêjin em zarokên cerdevanan in. *Cerdevan 8, Lîce*

Dîsa kurê cerdevanekî, têkiliyên xwe û nas û dostên xwe wiha tîne ziman:

> Ez 17 salî me, min dibistana seretayî qedandiye. Ji ber rewşa aborî min dev jê berda. Babê min cerdevan e, rewşa me ya aborî xirab e, em

> nikarin cihêkî xweş bi cih bibin. Em li malê 6 kes in, 4 xwîşk û birayên min jî hene, wan jî heta dibistana seretayî xwendine. Babê min ji sala 87an ve cerdevan e. Mamê min şehîd bûye. Carekê babê min li Bîngolê çûbû operasyonê, xeberek hat gotin mayin teqiyaye, em gelek tirsiyan me got babê min e lê ew di nav de nebû. Xizmên me hene ko nebûne cerdevan, ji ber wê têkiliya me xweş nebû, xalê min ew jî piştî ko em bûn cerdevan ji me hez nakin, nayên mala me. Carna em bi zarokên din re şer dikin, yên ko babê wan ne cerdevan e. Ji me re dibêjin r'eya xwe bidinn BDPê, em jî dibêjin na, em ê bidin AKPê, ji ber wê pirsgirêk derdikevin. *Kurê Cerdevanekî 8, Farqîn*

Cerdevan jî ji ber vê rewşa zarokên xwe ya li mektebê û cihê xebatê, ketine nav fikaran û ditirsin.

> Min birayekî xwe bir Amedê ko di fabrîqeya kerpîçan de bixebite, paşê dest bi karê xwe kir. Lê dema kesên li wê derê fêm kirin ko ew birayê cerdevanekî ye, helwesta wan ji bo wî guherî, bi çavekî xirab lê dinêriyan û heftiyek piştî wê neçar ma ko vegere gundê xwe. Ji ber pêşeroja zarokên xwe jî ez ditirsim. *Cerdevan 3, Lîce*

Hin ciwan hene ko dibêjin cerdevanên li gundê wan tevlî karekî xirab nebûne û dixwazin bi vî awayî xwe ji bertek û rexneyên derdorê xilas bikin.

> Min li Mêrdînê lîse xwend. Bi rastî jî çavê min li wê derê li jiyanê vebûn. Hevalên min cuda ne. Pirr ji min hez dikin. Pêşî min ji wan veşart ko ez keça cerdevanekî me. Gava zanîn henekên xwe bi min kirin. Min jî got em gundê xwe diparêzin û heqê nanê xwe qezenc dikin. Piştî ko min mesele ji wan re got, êdî ji bo min baş bûn. *Keça Cerdevanekî 1, Mêrdîn*

Keça cerdevanekî, ji ber karê babê xwe zext û zordariyê ji derdorê dibîne û li ser kurdayetiyê, nerazîbûna xwe nîşan dide.

> Babê min cerdevan be çi ye nebe çi ye. Ez jî kurd im, babê min jî kurd e. Ma ne babê min nabêje ez tirk im. Bila her kes wiha bizane. Em hemû jî kurdin. Ji ber ko em cerdevan in em nabin tirk. Gava em ji bo mîtîngan diçin bajêr bila nebêjin tu keça cerdevanekî yî filan û mêvan. *Keça Cedevanekî 9, Mêrdîn*





**b. Tirs**

> *Em her hişyar in, nikarin razin.*
> Kurê Cerdevanekî 7, Farqîn

> *Mêrê min miriye jî lê em hê jî ditirsin, ji ber ko em êdî xayîn in*
> Jina cerdevanekî 6, Farqîn, Mêrê wê 15 sal berê niha di operasyonekê de hatiye kuştin

Cerdevan, miqabilî çekhilanîna li hemberî gelê xwe, li gundê xwe, li mala xwe bi tirsetirs dijîn. Jina cerdevanekî vê tirsa ko wan di hundirê malê de girtî dihêle û ji nav gund îzole dike, wiha tîne ziman:

> Em zarokên xwe naşînin çiyê. Bi tena serê xwe em nikarin biçin nav rezan. Ez bi xwe jî naçim, mirov ditirse. Ji ber ko em cerdevan in, çi dibe çi nabe, em ditirsin. Heke kes bi me re neyê em qet naçin. Mêr jî tu carî naçin, jin zêdetir diçin. *Jina Cerdevanekî 5, Lîce*

Cerdevanek, tîne ziman ko ev tirs çawa bandorê li malbatan û gundiyan dike:

> Berê, serê me rihettir bû. Piştî cerdevaniyê li gundê me psîkolojiya kesî normal nema, li vir psîkolojiya her kesî xira bûye. Wisa ji nişkê ve xuya nebû lê piştî wê mirovên me yên ko şahidiya wan bûyerên xirab kirine, bi taybetî jî jinên me, zarokên me, psîkolojiya hemûyan xira bûbû. Ji ber tirsê û wan bûyeran wisa bû. Zarokên me, jinên me nikarin ji gund dûr bikevin, nizanin li pişt wî çiyayê gundê me çi heye û jixwe naçin wî alî jî. Ji ber ko ditirsin. Û tenê dikarin biçin gundê hember, ji ber ko ew jî cerdevan in. *Cerdevan 2, Lîce*

Jiyana cerdevan û malbatên wan bi "tirs"ê hatiye dorpêçkirin.

> Di malbata me de du cerdevan hene; ez û birayê xwe. Ez nikarim bi malbata xwe re biçim gerûgeştê. Em ditirsin ko bi malbatên xwe re 2 km ji gundê xwe dûr biçin. *Cerdevan 16, Farqîn*

Jina cerdevanekî wiha tirsa zarokên xwe wiha tîne ziman:

> Êrîşî gundê me kirin, heftiyekê ez lal bûm, min nekarî ji tirsan avê jî vexwim. Mêrê min û xezûrê min, herdu jî cerdevan bûn, herdu jî

di pevçûnê de bûn, ji tirsan her derê min reşûşînî bû. Çi pirs li min bikirana jî min nedikarî bersivê bidim. Gava babê wan ji mal derketa zarokan jê re digot "Babo neçe tê bêyî kuştin." Zarokan jî dizanî êdî babê wan diçe operasyonê. Ma çi heqê wan heye ko van tiştan tînin serê zarokên me! *Jina cerdevanekî 7, Mêrdîn*

Şikayeta cerdevanan nîşan didin ko têkiliyên wan û malbat, xizm, û cîranên wan xira dibin, gundên wan tên dabeşkirin û bi civakê re têkiliyên wan wisa diguherin ko belkî careke dî nebe wek berê.

**c. Fikr û raman û hest û daxwazên jinên cerdevanan**

*Ya herî dijwar operasyon yan jî serdagirtin e. Gava dengê çekan tê ziravê me diteqe. Em dibêjin qey gulle berdan me.*
Jina Cerdevanekî 5, Lîce

Jina cerdevanekî jiyana xwe ya ko ji ber cerdevaniyê tarûmar bûye ji me re dibêje û bi van gotinan daxwaza jiyaneke normal dike:

Gava mêrên me biçin operasyonê em pirr ditirsin. Ka sax in an hatin kuştin, em li benda cewabekê dimînin, bêhna me teng dibe. Em jî dixwazin wek her kesî normal bijîn lê em her tim ditirsin. Em nikarin biçin gerûgeştekê ji ber ko mêrên me jî wek me pirr ditirsin. Zarokên me jî mexdûr in. Em hizûrê dixwazin. Bi şev ranazên, encax bi roj dikevin xew. Şev û rojên wan tevlihev bûne. Mêrên me her tim diçin nobetê. *Jina Cerdevanekî 8, Farqîn*

Jin nerazîbûna xwe li hemberî cerdevaniyê tînin ziman ko jiyana wan bi tirsê dorpêç kiriye ji ber ko mêrên wan cerdevan in.

Her cara ko mêrê min diçe operasyonê em bi tirsetirs li bendê dimînin. Vî derdî em kuştin. Ji ber vê, jê pê ve karek nemîne jî ez naxwazim mêrê min cerdevaniyê bike. *Jina Cerdevanekî 9, Farqîn*

Operasyon bêhna me teng dikin, mêrê me diçin operasyonan lê em zêdetir diqehirin, em dibêjin ha îro ha sibe wê mêrê me bên kuştin û em gelek li ber wan dikevin. (Gava ev got hêstir ketin çavê wê û bi dengekî nizim axivî.) Cerdevanî ne tiştekî baş e, ma kî dixwaze mêrê wê cerdevan be, kes naxwaze, wellehî mêrên me jî naxwazin. Kar tune, ma ew ê çibikin, ketine nav vî karî êdî. *Jina Cerdevanekî 10, Farqîn*





Wextekî li gund operasyonek çêbû. Mêrê min jî çû wê operasyonê. Wê salê zarokekî min jî çêbûbû, min şîr dida wî. Gava mêrê min li operasyonê bû, ez ewqas qehirîm, piştî wê ji bo kurê min şîr di pêsîra min de nema. *Jina Cerdevanekî 11, Mêrdîn*

**d. Zarokên Cerdevanan**

*Û ji ber ko babê min cerdevan e em ê li vê derê bimînin. Belkî ez ê rastî tengasiyên mezintir bêm. Belkî jî ez zanîngehê nexwînim kes karekî nade min û ez ê ji neçarî vegerim gundê xwe. Gava ez vegerim gundê xwe jî heke ez karekî peyda nekim û bi ser de jî ez bizewicim, belkî ez jî ji neçarî bibim cerdevan. Ne ko ez dixwazim, ji ber ko ez ê neçar bimînim.*
Kurê Cerdevanekî 2, Mêrdîn

*Ew li mektebê rastî pirsgirêkekê nehatin jixwe, nabêjin em zarokên cerdevanan in, dibêjin babê me mixtar e.*
Cerdevan 30, Mêrdîn

*Jixwe em wê vedişêrin. Mesela ez niha li ba endazerekî dixebitim, di karê projeyan de. Ew nizanin ko ez kurê cerdevanekî me.*
Kurê Cerdevanekî 4, Mêrdîn

Zarok, ji ber qerareke ko wan nedaye, her tim bi tirsa mirina babê xwe dijîn, ji nav civakê tên îzolekirin û li mektebên xwe rastî nerazîbûn û tengasiyan tên. Ji bo xwe ji van tengasiyan biparêzin jî, cerdevaniya babê xwe vedişêrin yan jî ji gundê xwe dernakevin.

Babê min çû operasyonekê. Ez zarok bûm. Min xwe avêt ber lingê babê xwe û jê re got neçe. Çi heqê wan heye van tînin serê me. Ji ser serê me gulle difiriyan, her roj bi ser gundê me de digirtin, ne tenê gundê me, li gelek gundên din jî pevçûn çêdibûn. Û heta îro jî min ji bîr nekiriye. *Keça Cerdevanekî 8, Mêrdîn*

Ez di qursa berrikan de dixebitîm. Ez û du xwîşkên xwe em li wir dixebitîn, ji ber ko em mecbûr bûn bixebitin. Ez biçûk bûm, babê min şehîd ket. Ev çardeh sale babê min miriye. Babê min di nobetê de şehîd ket. Ji ber ko ez keça cerdevanekî me, ez rastî tengasiyekê nehatime,

> jixwe em ji gundê xwe dernakevin, lewma pirsgirêkeke wisa tune. Xwezî babê min nemiribûya û xwezî cerdevan jî nebûya, belkî niha hê jî sax bû. Babê min sax bûya belkî wî ez bidama xwendin, min dixwest biçim mektebê û wê demê her tişt dê cuda bûya. *Keça Cerdevanekî 9, Mêrdîn*

Jina cerdevanekî, nerazîbûna kurê xwe li hemberî cerdevaniya babê xwe tîne ziman û wiha behsa tirsa pêşeroja wî dike:

> Kurê min diçe mektebê. Kurê min jî ji cerdevaniya babê xwe ne razî ye. Min sed carî jê re mesele got lê dibêje bila babê min cerdevan nebe, em birçî bimînin jî xem nake. Ez dixwazim kurê xwe bidim xwendin, bila cahil nemîne. Lê ez ditirsim, dê kurê min lîseryê bixwîne, zanîngehê bixwîne, dê mirov wî ji xwe dûr bikin. Mixabin gelê me vê rewşê fêm nakin. *Jina Cerdevanekî 8, Mêrdîn*

Keçika ko babê wê cerdevan e, helwesta xwe û birayê xwe wiha tîne ziman:

> Gava em diçin cihekî, em nikarin bêjin babê me cerdevan e, pirsgirêk derdikevin. Birayê min zanîngehê dixwîne û ev jî vedişere ko babê me cerdevan e. *Keça Cerdevanekî 10, Lîce*

Cerdevaniya babê wan û malbata wan, bi taybetî jî li Kurdistanê, ji bo zarokan dibe asteng ko karekî fermî bibînin û bibin xwedî meʻaşekî. Zarokên cerdevanan difikirin ko cerdevanî temamê pêşeroja wan dixe ber xetereyê. Ji ber vê bêçaretiyê, psîkolojiya zarokan di bin vî barê giran de xira dibe.

> Hem ji aliyê aborî ve, hem ji aliyê sîgorteyê ve, hem jî ji aliyê psîkolojîk ve tengasiyên me hene. Ji ber ko em mecbûr in li gund bijîn, bêhna min teng dibe, em ji her tiştî mehrûm dimînin. Û ji ber ko babê min cerdevan e em ê li vê derê bimînin. Belkî ez ê rastî tengasiyên mezintir bêm. Belkî jî ez zanîngehê nexwînim kes karekî nade min û ez ê ji neçarî vegerim gundê xwe. Gava ez vegerim gundê xwe jî heke ez karekî peyda nekim û bi ser de jî ez bizewicim, belkî ez jî ji neçarî bibim cerdevan. Ne ko ez dixwazim, ji ber ko ez ê neçar bimînim. *Kurê Cerdevanekî 2, Mêrdîn*

> Jixwe em wê vedişêrin. Mesela ez niha li ba endazerekî dixebitim, di karê projeyan de. Ew nizanin ko ez kurê cerdevanekî me. Gava em di karekî taybet de bixebitin, em vê vedişerin… Di têkiliyên me û zarokên din de jî hesûdî û dijîtî çêdibe. Gava tiştên wisa tên serê me, ez ji babê xwe hêrs nabim, tiştekî xirab jê re nabêjim, jixwe ez dizanim ew ji ber xizaniyê bûye cerdevan… Ez tu carî nafikirim ko bibim cerdevan ji ber ko ez dibînim ka rastî çi tengasiyan tên. Jixwe ez çeka cerdevanan wekî amûra debarkirinê dibînim. Ew ne hêz û quwetek e, tu nikarî bi wê çekê mêraniyê bikî. Daxwaza mi ntenê ew e ko meʻaşê wan bê zêdekirin. *Kurê Cerdevanekî 4, Mêrdîn*





Hin zarokên ko ji ber van têkiliyan rastî tengasiyan hatine, dibêjin ko ew ê tu carî nebin cerdevan.

> Min lîse li navenda Mêrdînê xwend û li wir ez rastî tengasiyan hatim. Û min li wir fêm kir ko cerdevanî karekî pirr zehmet e. Min nedixwest ji kesî re bêjim ez kurê cerdevanekî me ji ber ko gava min bigota, şer derdiket. Heqaret li min dikirin û digotin hûn xayîn in. Paşê min hewl da ko cerdevaniya babê xwe veşêrim. Cerdevanî tiştekî pûç û vala ye. Ez tu carî naxwazim bibim cerdevan. Tê bîra min ko babê min diçû operasyonan. Ez gelek di bin bandora wê de mabûm. *Kurê Cerdevanekî 2, Mêrdîn*

Jina cerdevanekî, meseleya tirk û kurdan, herwiha cerdevaniyê wiha tîne ziman û dibêje ka ev yek dê çawa bandorê li pêşeroja kurê wî bike:

> Ez ditirsim ko dema kurê min biçe zanîngehê û biguhere. Ji ber ko yan wê bibe 'kurdçî' yan wê lêdanê ji 'tirkçiyan' bixwe yan jî wê kurd xeberan jê re bêjin, çi ye ko kurê cerdevanekî ye. Kurê cerdevanekî nasê me çû zanîngehê û bû 'kurdçî'. Ji ber ko gelek ji dê û babê xwe aciz e, wan fêm nake. Ez ditirsim kurê min jî wisa bifikire. Ez naxwazim kurê min wisa bifikire. Ez dixwazim ew bixwîne, her tiştî fêm bike û wisa kurdbûna xwe biparêze. Ewqas zulm û zordarî çêbû, êdî bila aştî çêbe, em jiyaneke xweş û aram dixwazin. *Jina Cerdevanekî 12, Mêrdîn, Demekê di nav PKKê de maye*

### 4. Ekonomiya cerdevaniyê

*Tenê çeka me di destê me de ma û çend çêlekên me jî.*

Cerdevan 24, Farqîn

*Vê dewletê jiyana me asteng kir.*

Cerdevan 4, Wan

> *Carna komir û erzaq filan tê gundê me. Ji me re dibêjin hûn cerdevan in, em nadin we. Cerdevan nikarin bistînin, heqê wan nîn e. Ji aliyê dewletê ve tê şandin lê nadin cerdevanan.*
> Keça Cerdevanekî 9, Mêrdîn

Di beşa bi navê "Cerdevaniyê Çawa Dest pê Kir" de gelek cerdevanan ji me re gotibû wan ji ber xizaniyê çek hildane. Em ê di vê beşê de jî cih bidin fikrên wan ên li ser ekonomiya cerdevaniyê, faydeya cerdevaniyê ji bo wan, bandora wê li ser rewşa wan a aborî û daxwazên wan ên li ser mafên xebatê.

**a. Qezenca cedevaniyê, tezmînat, teqawîtbûn û sîgorte**

Me'aşê cerdevanan, tezmînata ko piştî karberdanê ew ê bistînin û alîkariya cilûbergan ji aliyê her sê wezaretên Karên Hundir, Malîye û Gumrikê ve tên diyarkirin.

> Kurekî min cerdevan e û 17 kulfetên malbata me bi me'aşê wî debara xwe dikin. *Diya Cerdevanekî 1, Lîce*

> 11 sal e cerdevan e. Ji ber ko karûbarekî wî tune bû, ew bû cerdevan. Me'aşê mêrê min pirr kêm e lê qenebe debar pê dibe... Jê pê ve qezenceke me nîn e. Em niakrin zarokên xwe bidin xwendin, tiştên ko em dixwazin bixwin yan jî li xwe bikin em nikarin bikirrin. Pirî caran mêrê min me nabe dikanên sûkê, ji ber ko em tiştekî dixwazin lê ew nikare bikirre. *Jina Cerdevanekî 9, Farqîn*

**b. Dûrketina ji rêncberiyê; wek karekî her-demî, cerdevanî**

> *Berî ko em bibin cerdevan, em bi baxçe û zeviyên xwe mijûl dibûn, me dewar xweyî dikirin, gencên me li derve dixebitîn, hosteyên qalibê ne. Lê piştî ko em bûn cerdevan me nekarî em biçin cihekî. Rewşa me ya aborî her xirabtir bû, em feqîr bûn, yanê faydeya wê ji me re tune, zirara wê heye.*
> Cerdevan 29, Lîce

> *Piştî ko em bûn cerdevan hem îznê bêhnvedanê nedan me, hem wextê me çênebû, hem jî em ditirsiyan ko zeviyên xwe biçînin. Şeş salan me nekarî em tiştekî bikin.*
> Cerdevan 7, Wan





Pirraniya cerdevanên ko bi fikra qezencekê û xilasbûna ji feqîriyê dest bi vî karî kirine, dibêjin ko cerdevaniyê faydeyek li aboriya wan û malbata wan nekiriye.[18] Yên ko berî cerdevaniyê li gundê xwe rêncberî û sewalvanî dikirin jî, piştî cerdevaniyê ji vî karê hilberandina çandinî û sewalvaniyê dûr ketine. Ev yek, ji aliyekî ve aboriya herêmê têk dibe, ji aliyekî ve jî tesfîyekirina pergala cerdevaniyê zehmettir dike ko gundî nikarin dev ji çekên xwe berdin û vegerin ser karê xwe yê berê; rêncberî û sewalvaniyê.

> Beriya cerdevaniyê debarkirin tiştekî cuda bû. Bereket hebû, me rêncberî û sewalvanî dikir. Piştî ko em bûn cerdevan me dev ji her tiştî berda, ji ber ko bi şev û roj em li derve bûn. *Cerdevan 20, Qulp*

Cerdevanî li gelek deveran karekî 24 saetî ye. Li ser vê rewşê em guh bidin kurê cerdevanekî ko babê wî nikare destûrê bistîne û biçe nexweşxanê, serdana wî:

> Piştî ko babê min bû cerdevan, di jiyana me de kêm tişt guherîn, lê di jiyana wî de gelek tişt guherîn, hema bêje her tim li vê derê ma. Nexweşiyek di qelbê min de heye, babê min nedikarî bê nexweşxanê, serdana min. *Kurê Cerdevanekî 1, Mêrdîn*

Li gorî Qanûna Gundan, "karekî ji xeynî cerdevaniyê; mesela rêvebirina dikan, çayxane an jî xanekê û şirîkatiya wan; ji bo karê gundiyekî an jî ji bo karekî xwe bê destûr terkkirina cihê wezîfê; çêrandina heywanên xwe û şivaniya gund ji bo cerdevanan" karên qedexe ne.[19] Tevî ko di qanûnê de xaleke wiha heye, cerdevanên ko wan nabin operasyonan yan jî yên ko li herêmên bê pêvçûn dijîn, dikarin karê xwe yê rêncberî û sewalvaniyê berdewam bikin. Cerdevanên ko rêncberiya xwe jî dikin, rewşa wan a aborî xweştir e.

> Berî ko em bibin cerdevan me sewalvanî dikir, karên baxçeyan, çandina tûtinê filan me dikir. Piştî ko em bûn cerdevan jî me ev karên xwe berdewam kirin. Piştî cerdevaniyê di jiyana me de titşek neguherî, zeviyên me ji dest me neçûn, em li gundêxwe man. Em dibînin ko gelek kes perîşan bûne. *Cerdevan 31, Qulp*

Di salên 90î de, ji gelek gundên Kurdistanê, wekî roja îro, gelek gundiyên ko nedikarîn debara xwe bikin, dibûn karkerên demsalî û diçûn bajarên din.

Xortên malbatê jî pirranî diçûn bajarên mezin karên înşaatan dikirin û debara mala xwe dikirin. Piştî destpêkirina cerdevaniyê, çawa ko ji bo mêran deriyê abirê û hilberandinê hatinye girtin, deriyê çûyina bajarên mezin jî hatiye girtin. Ji ber vê yekê, cerdevanî, yek ji sedemên berbelavbûna xizaniyê ye.

> Berî ko ez bibim cerdevan, min taşeronî dikir, em li Stenbolê jî dixebitin, me parkek çêkiribû. Berî cerdevaniyê em diçûn zozanan, me pez xweyî dikirin, paşê me ew firotin û me nekarî em çbiçin zozanan jî. Niha me çend çêlek kirrîne, li nav baxçeyan jî em îsotan filan diçînin. *Cerdevan 8, Lîce*

> Beriya cerdevaniyê em diçûn xurbetê dixebitin û vedigeriyan. Êdî em nikarin vê jî bikin. *Cerdevan 14, Lîce*

> Kamyona min hebû. Piştî ko ez bûm cerdevan, min kamyona xwe firot ji ber ko kesî nedixwest bibe şofêr. Ditirsiyan ko heke bibin şofêrê cerdevanekî, ew ê bên kuştin. *Cerdevan 13, Midyad*

Cerdevaniya mêran, bandorê li ser dabeşkirina karên malbatê jî dike; barê jin û zarokan girantir dike. Jina cerdevanekî bi vî awayî qal dike ko piştî guherîna karê mêrê wê, çawa ew û zarokên wê mecbûr hiştine ko ew li nav zeviyên kesên din paletiyê bikin.

> Mêrê min 18 sal e cerdevan e. Beriya cerdevaniyê diçû karê înşaatan dikir. Rewşa me wê demê baştir bû. Lê dema bû cerdevan, karê mêrê min qediya û rewşa me ya aborî hêdî hêdî xirabû. Û niha ez û zarokên xwe diçin paletiyê ji bo debara mala xwe. *Jina Cerdevanekî 13, Qulp*

> Jiyana hemû kulfetên malbatê bi awayekî têkildarî cerdevaniyê ye.

> Carna, serê mehan pirsgirêk di navbera me û babê me de derdikeve. Jixwe piştî ko bû cerdevan gelek guherî, bû mirovekî hêrsok. Gava birayê min serê mehê peran dixwaze, babê min aciz dibe, dibêje perê min nînin. Jixwe em nikarin karekî din jî bikin, encax nas û dostek gazî me bike em dikarin karê wî bikin. *Kurê Cerdevanekî 8, Farqîn*

Herwiha tirsa êrîşkirina PKKê jî nahêle ko cerdevan karekî din bikin û rêncberiya xwe bidomînin.





> Rezên me, hingivînê me, her tiştê me hebû ko em debara xwe bikin, tengasiyeke me tunebû. Piştî cerdevaniyê me nekarî em bi rezên xwe, dewarên xwe filan mijûl bibin. Hem wextê me nedima, hem jî mayin di navzeviyên me de bi cih dikirin, dewarên me dikuştin. Li ser rêyên me mayin bi cih dikirin, ji ber wê jî tenê bi me'aşê cerdevaniyê em debara xwe dikin. *Cerdevan 13, Midyad*

> Difikirin ko dewlet ji aliyê ekonomîk ve neheqiyê li wan dike.

> Behsa eskerên profesyonel dikin û ew ê 2-3 milyon lêre me'aş bistînin. Piştî 7-8 salan bixebitin jî ew ê 70 hezar lêreyan bistînin. Ma çi ferqa me û wan heye, em eynî karî dikin. Çima neheqiyê li me dikin? *Cerdevan 22, Midyad*

**c. Mafên xebatê**

> *Em vê jî dibêjin; heminî em di nav vî karî de ne, bila dewlet me xwedî bike.*
>
> Cerdevan 19, Gêlê

> *Mirovekî ewqas piştgiriya dewletê dike, divê dewletê jî alîkariya wî bikira. Lê dewletê em paşguh kirine.*
>
> Cerdevan 14, Lîce

Cara yekemîn ko di sala 1985an de cerdevanî dest pê dike tenê me'aşê wan tê dayîn lê piştî salên 2000î cerdevanan hin mafên din jî bi dest xistin. Zehmet e ko mirov hemû sedemên dayîna van mafan bizane lê pêkan e ko mirov çendekan bijmêre. Parlementerên ji eşîrên cerdevanan dikin ko ev mesele li meclîsa tirkan bê niqaşkirin. Li gel vê, cerdevan jî saziyên alîkarî û piştgiriyê ava dikin. Bi saya van saziyan, bi awayekî fermî diçin serdana meclîsê û fermandariyê, daxwazên xwe radigehînin wan. Herwiha di salên 2000î de dewlet mecbûr dibe ko mafên xebatê, keda cerdevanên ko 15 sal e dixebitin, yên ko nexweş ketine, teqawîtbûna wan û nexweşiyên wan bi awayekî niqaş bike. Beriya sala 2005an cerdevan nabin xwedî mafê sîgorteya tenduristiyê lê piştî wê salê dewlet "karta kesk" dide cerdevanan û kulfetên wan.[20] Di sala 2004an de, zêdahiyek li Qanûna Gundan hat kirin û bi saya wê me'aş û tezmînata cerdevanan piçekî zêde bû. Bi saya guhertina sala 2012an jî sîgorteya

tenduristiyê ya giştî bi cerdevanan tê dayîn.[21] Temûza sala 2013an de jî me'aşê cerdevanên ji 55 saliyê mezintir û teqawîtbûyî hatiye zêdekirin. Meaşê herî kêm yê cerdevanên teqawîtbûyî, 383,96 lêre ye û dibe 652,72 lêre; me'aşê herî zêde yê cerdevanên teqawîtbûyî jî 614,33 lêre ye û dibe 883,10 lêre.[22] Zehmet e ko mirov bizane gelo hikumetê piştî salên 2000î ev guhertin ji bo deyndariya piştgirî û ked û xebata cerdevanan pêk aniye yan ji bo dîsa piştgiriya vê hêza paramîlîter ko her tim xurttir dibe, bistîne.

Lê mafên wan ên xebatê cerdevanan dilxweş nake:

> Sîgorteya me ya tenduristiyê tune. Em faydeya "karta kesk"[23] dibînin lê zelal û eşkere ye ko em xapandin û hê jî dixapînin. Her sal dibêjin ha îro ha sibe ew ê bê çêkirin lê nayê çêkirin, bi tu awayî sîgorteya me çênekirin. Ev qas sal e me ked daye lê sîgorteya me jî çênekirin. 'Esas ev sûc e, bi awayekî qaçax me didin xebitandin. Me çend caran got lê rayedarên qereqolê dibêjein tiştek ji destê me nayê, dibêjin me ji rayedarên dewletê re gotiye. Li rojava, karekî biçûçik jî be karker bê sîgorte naxebitin, dewlet me bê sîgorte dixebitîne, ew jî di karekî wiha xeternak de. Ez bêjim faydeya cerdevaniyê gehiştiye me, derew e. Zêdetir xirabiya wê gehiştiye me. Piştî ko em bûn cerdevan her tişt xirab meşiya, ewlehiya me nema, hizûra me jî nehişt. *Cerdevan 1, Qulp*

Bi salan xebitîne lê gelek mafên memûran ên xebatê bi wan nehatine dayîn.

> Ez zelal û eşkere diaxivim, dewletê em xafandin. Êdî ez bêjim dewletê yan rayedarên vê derê em xapandin, berpirsyar kî be êdî, mafên me ji me hatin standin û niha nadin me. Berê qenebe hizûra me hebû. Heke berê perê me nebûya jî, em li zeviyên xelkê dixebitîn, niha hizûra me nemaye. Dewletê çima wisa kir, çima em xapandin, ji ber nezaniya me. Gava em bûn cerdevan wextê me tune bû, me hizra pêşeroja xwe nekir ji ber ko wextê me tune bû em li vê bifikirin û me cerdevanî qebûl kir. *Cerdevan 1, Qulp*

Li gel daxwazên ekonomîk, cerdevan daxwaza rûhsata çekan jî ji dewletê dikin. Yek ji serokê tabûrên cerdevanan ko em ji nûçeyan navê wê dizanin ko gelek zulm li gundiyan û gêrîlayan kiriye, daxwazên xwe wiha tîne ziman:

> Daxwaza me ew e ko mafên xebatê yên qanûnî bidin cerdevanan, sîgorteya wan bê çêkirin, prîmên sîgorteyê bên razandin, tezmînata qidemê ya teqawîtbûnê bê dayîn. Û em dixwazin rûhsata çekan jî bidin, ji bo em xwe biparêzin. Tabûra me heye. Bi navê … tabûra me heye. *Cerdevan 18, Wan, Serokê saziya cerdevanan*





Li hêrêmê gelek malbat alîkariya erzaq, şewat û perwerdehiyê distîne lê ji ber ko xwedî me'aş in cerdevan ji van alîkariyên Miduriyeta Giştî ya Piştgirî û Alîkariya Sosyal bê par dimînin. Ev jî yek ji şikayetên cerdevanan e.

> Sîgorteya me tune, em li ser "karta kesk" diçin doktor. Dewlet tu alîkariyê nade me, heqê perwerdehiya zarokan filan nade. Hemû jî hatine birrîn, dibêjin me'aşê we heye, komirê jî nadin me. Beriya cerdevaniyê me rêncberî dikir, dewar xweyî dikirin û bi awayekî me debara xwe dikir. Wê demê rewşa me ya aborî baştir bû, tengasiya me çênedibû. Berê çend mêhvan bihatana malê jî xem nebû. Lê niha em nikarin mêhvanekî/ê jî bi'ezimînin. Jixwe karekî jî nadin cerdevanan. *Cerdevan 15, Wan, Fermandarê tabûrê*

Li hêrêmê alîkariya perwerdehiyê didin xwendekarên malbatên feqîr lê nadin zarokên cerdevanan.

> Zarokên me nikarin bixwînin ji ber ko masrafa wan zêde ye. Alîkariyê dişînin mektebê lê dibêjine zarên me babê we cerdevan e û nadin wan. Ne erdê me heye, ne baxçei ne dewarek. Jixwe hebe jî dê kî xweyî bike, em nikarin dewarên xwe biçêrînin, ji ber ko em ditirsin. *Jina Cerdevanekî 10, Farqîn*

> Ji ber ko babê min cerdevan e, ez rastî tengasiyan hatim. Mesela li mektebê alîkariya perwerdehiyê nadin me, dibêjin me'aşê babê we heye. Em dixwazin bixwînin lê ji ber tengasiyên aborî em nikarin bixwînin. Car caran ez dibêjim xwezî babê min cerdevan nebûya, belkî min jî bixwenda. *Kurê Cerdevanekî 8, Farqîn*

### 5. Karên der-qanûnî ko cerdevan tevlî bûne

> *Rûhsata çekan nedan min. Ji ber ko cezayê min hebû. Lê dema ez cerdevan bûm min dikarî ez çekan bistînim, cezayê min wê demê xem nebû.*
> Cerdevan 11, Qoser

> *Li ser pêşeroja zarokên xwe ez tiştekî nafikirim, encax ez dikarim li xwe bifirikim. Ji ber ko ez*

*ditirsim; ka dê kengî derkevin pêşiya min û min bikujin. Li ser gêrîlayan jî ez wiha difikirim; ew dijmin in, em rastî hev bên em ê hev bikujin.*
Cerdevan 29, Lîce

*Ê heke min zulm kiribe, min neheqî kiribe, bi baweriya wê çekê ye. Lê heke çeka min ji min bistînin ew ê vê zilmê ji min re nehêlin. Baş e ko ez tevlî zilmeke wisa nebûme, şikir ji Xwedê re.*
Cerdevan 29, Lîce

Piştî salan, dewletê cerdevanî kiriye mekanîzmayeke hebandina sûcdaran. Me behsê kiribû ko gelek cerdevanên berî ko bi daxwaza dilê xwe dest bi vî karî kirine jixwe tevlî gelek sûcan bûne û armanca wan ew bûye ko xwe ji cezayê van sûcan, bi saya cerdevaniyê xilas bikin. Herwiha, tê zanîn ko ji ber şerên di navbera malbatan de, gelek kesan xwestine bibin xwedî çek û hêzekê bi dest bixin. Bi ser de jî, bi saya qanûna ko derbarê cerdevanan de ye di sala 1996an de hatiye guhertin û rê li ber hatiye vekirin ko yên dixwazin ji qanûna poşmaniyê sûdê wergirin, dikarin bibin cerdevan. Dewlet texsîr nake ko gundiyên tevlî sûcan bûne li ser navê “ewlehiyê” bike karker û çekan bide wan.

Em ji gotinên cerdevanekî fêm dikin ko dewlet bi rêyên der-qanûnî çekan dide cerdevanan:

> Ez 57 salî me. Rûhsata çekan nedan min. Ji ber ko cezayê min hebû. Lê dema ez cerdevan bûm min dikarî ez çekan bistînim, cezayê min wê demê xem nebû. Dema mirov cerdevan be, divê xizm û eqrebayên nêzîk ji ber sûcên siyasî nehatibin girtin. Lê ez 7 caran hatim girtin, dîsa jî ev ji bo standina rûhsatê xem nebû. Ez bûm cerdevan jî, çek jî dane min. *Cerdevan 11, Qoser*

Hin daneyên li ser sûcên cerdevanan di rapora TBMMyê a li ser kuştinên siyasî yên kiryarê wan nediyar nîşan didin ko cerdevan ji qaçaxçîtiyê heta firotina çekan û tilyakê, tevlî gelek sûcan bûne. Cerdevanên sûcdar, tevî ko ji aliyê dadgehan ve qerara lêgerînê li ser navê wan heye, me’aşên xwe distînin lê ecêb e ko nayên girtin. Bi taybetî jî cerdevanên eşîran, bi fermana serekeşîran kar kirine; yên ko ne alîgirên wan in, wekî PKKyî bi nav kirine û zext û zordarî li wan kirine. Li gorî rapora navborî, di karê cerdevaniyê de ko sala 1985an dest pê kiriye, heta sala 1997an, 23 hezar 817 cerdevan ji kar hatine dûrxistin. Hatiye





daxuyandin ko ji wan 20 hezar û 319 cerdevan, bi paşguhkirina wezîfê hatine tawanbarkirin. Li gorî hejmarên Wezareta Karên Hundir, ji destpêka cerdevaniyê heta sala 2006an 2 hezar û 402 cerdevan tevlî sûcên terorê bûne, derheqê 936 cerdevanan de ji ber tawanbariya sûcê li hemberî zirardayîna mal û milkan, derheqê 1234 cerdevanan de jî ji ber tawanbariya sûcê li hemberî şexsan doz hatine vekirin.

Lêbelê cerdevanên ko me hevdîtin bi wan re kiriye, li ser navê cerdevanên din behsa van sûcan dikin:

> Hin kes ji vî karî ‘dixwin’, ev li her derê heye, ji herdu aliyan jî ‘dixwin’. *Cerdevan 25, Midyad*

> Mesela rojekê em çûn operasyonê, hin cerdevanan talan û zulm dikir, kesên sivîl dikuştin. Car caran ji ber vê em ji wan hêrs dibûn. We kirina cerdevanên gundê Zanqirtê bihîstiye, ew jî wisa bûn. Jixwe PKKê jî zor dida ser cerdevanên ko zulm dikirin, bi ser gundê wan de digirt. *Cerdevan 30, Mêrdîn*

Di lêkolîna cerdevan û sûcên wan de xuya dike ko, ne tenê cerdevan, herwiha esker jî tevlî van sûcan bûne.

> N.Z berpirsyarê asayîşa heremê bû. Wî karê narkotîkê jî kir, mirov jî kuştin û ji ber karê narkotîkê ket hepsê jî. *Cerdevan 4, Wan*

Bi qasî ko em ji nûçeyên çapemeniyê dizanin, Tabûra ..., tevlî gelek karên der-qanûnî bûye û li herêmê tabûrek e ko bi zalimiya xwe tê naskirin. Serokê tabûrê wiha behsa kirinên tabûrê dike:

> Cihekî herdemî yê Tabûra ...’yê tune bû, navê wê hebû, li mala min diciviya. Serokê wê ez bûm. Hetta rojekê avêtin ser mala min jî. Ez jî êdî westiyabûm, min dev jê berda. Paşê ez ji ber vê sîstemê canbêzarî bûm, min go ne karê mirovekî rast û durist e. Ji ber ko gava min ev çek hilda, min ji bo têkoşîna li dijî terorê hilda. Yanê hinek guherîn çêbûn, ez jî jê dûr ketim. Niha ez li mala xwe rûdinim, karê xwe dikim. *Cerdevan 12, Wan, Serokê Tabûra Cerdevanan*

Navê cerdevanan li gel JÎTEMê, tevlî kuştinên kiryar nediyar jî dibe. Di hevdîtinan de tînin ziman ko ev kirin ne yên wan bûn, yên cerdevanên din bûn.

20 sal berê me ji gundê xwe koç kiribû, bi zorê eskeran. Ji me re gotibûn heke hûn neçin em ê gundê we bişewitînin, hûn alîkariya PKKê dikin. Ez wek welatiyekî vê dipirsim: Ez feqîr im, li malê 15 kulfet û 3 çêlekên min hene, ez ê çawa debara xwe bikim?.. Lê beriya cerdevaniyê halê me xweş bû, zarên me diçûn xebatê. Heke cerdevanî bê rakirin, ez ê jî ji van deran bar bikim biçim. Ê heke min zulm kiribe, min neheqî kiribe, bi baweriya wê çekê ye. Lê heke çeka min ji min bistînin ew ê vê zilmê ji min re nehêlin. Baş e ko ez tevlî zilmeke wisa nebûme, şikir ji Xwedê re. Li ser pêşeroja zarokên xwe ez tiştekî nafikirim, encax ez dikarim li xwe bifirikim. Ji ber ko ez ditirsim; ka dê kengî derkevin pêşiya min û min bikujin. Li ser gêrîlayan jî ez wiha difikirim; ew dijmin in, em rastî hev bên em ê hev bikujin. Wellehî gêrîla jî esker jî li ser rêya kufrê ne, herdu jî xayîn in. Ew bûyera vê pêlê li Farqînê pêk hat, ma ew PKKê kir? Ew teqez eskeriyayê kiriye. Jixwe ew jî dibêjin xeletiyek çêbû. *Cerdevan 29, Lîce*

Cerdevanên ko hay jê hene sûcên wan ew qasî zêde ne û êdî nayên veşartin, bi taybetî ji me re dibêjin em tevlî sûcekî nebûne û naxwazin bi giştî hemû cerdevan ji ber van tiştan bên sûcdarkirin.

Em aciz dibin ko hemû cerdevan tên sûcdarkirin. Yên xirab jî hene, keçan direvînin û hwd… Lê em ne cerdevanên wisa ne. *Cerdevan 10, Qoser*

### 6. Fikr û ramanên li ser rakirina cerdevaniyê

*Di peuçûnan de em tenê hizra mirinê dikin, lê ne tenê mirina xwe, ya kesê ko em ê bikujin jî. Ji ber ko ev şer beredayî ye û ne lazim e. Em nizanin ka em çima dimrin û dikujin. Bila ev mesele biqede ez ê di cih de çeka xwe danim.*
Cerdevan 32, Mêrdîn

*Heke rakin jî bila rakin lê me serberedayî bihêlin dê tiştên ne xweş biqewimin, dibe ko tiştên xirab pêk bên.*
Cerdevan 10, Wan, Serokê Tabûrê

*Bi ya min ev mesele dê çareser bibe lê nahêlin, dewlet jî naxwaze, ew jî naxwazin. Menfî'eta gelekan jî tê de heye. Ji ber wê ew naxwazin çareser bibe.*
Cerdevan 31, Qulp





Fikrên cerdevanan ên li ser rakirina cerdevaniyê ji hev cuda ne. Yên ko bi zorê bûne cerdevan, tevlî şer nebûne, li gundê xwe û derdora wî zulm nekirine, dixwazin ko di demeke nêz de cerdevanî bê rakirin. Hinekên dî piştî rakirina cerdevaniyê ewlehiya xwe û mafên xebat û teqawîtbûnê dixwazin. Lêbelê koma sêyemîn naxwaze cerdevanî bê rakirin. Ev kom naxwaze hêz û bandora ko bi saya çekê û cerdevaniyê bi dest xistine, ji wan bê standin.

Yên ko dixwazin cerdevanî bilez bê rakirin, herî zêde behsa jiyan cereke têrhizûr û bêtirs dikin û wê dixwazin. Poşmaniya xwe ya ji ber cerdevaniyê tînin ziman û yekser dixwazin ji çekê û navê cerdevaniyê xwe xilas bikin.

Li aliyê me tiştek neqewimî û jixwe me nehişt tiştek biqewime jî. Di navbera esker û gêrîlayan de pirsgirêkek derneket. Em tevlihev nekir, tiştên xirab neqewimîn. Ew jî rihet bûn em jî… Li gundê me bi eskeran, gundiyan yan jî gêrîlayan pirsgirêkeke me çênebû. Me nexwest em li hemberî kesî şer bikin, em ne alîgirê sîstemê ne, ya me ji neçariyê bû. *Cerdevan 4, Wan*

Heke cerdevanî bê rakirin, ez ê vegerim Edenê, jixwe hunereke min heye, ez hostayê pêlavan im. Xwezî rabûya em jî vegeriyana. Herî dawî ev vê dibêjim; bila aştî pêk bê, her kes çawa dixwaze bila wisa bijî, bla hizûra me hebe. *Cerdevan 17, Midyad*

Cerdevanî rabe ji bo me jî baş e, ji ber ko ne karekî durist e. Em nikarin bêjin em cerdevan in. Em poşman in, her tim em niqaşa vê dikin nav xwe de. Em dibêjin xwezî em nebûna cerdevan. Saziya me jî heye li Mêrdînê lê em êdî naçinê. Her meh 5 lêreyan ji me distînin, dîsa jî em naçin. Em dixwazin ev bûyer êdî biqedin, mesele çareser bibe, wê demê em ê jî çekê xwe danin. Em bêtirs bigerin ji xwe re, bê şer û pevçûn, em bi hev re bijîn. *Cerdevan 33, Mêrdîn*

Heke rojekê vê meselê çareser bikin, ewil em ê çekên xwe danin. Me tu carî cerdevanî qebûl nekir. Jixwe derdora me tev bi zorê bûn cerdevan. *Cerdevan 4, Wan*

Yên ko ji ber tengasiya aborî bûne cerdevan jî, difikirin ko ji bo debarê berê xwe bidin derveyî welat.

Rakirina cerdevaniyê dê ji bo me zehmetî be. Heke bê rakirin em ê biçin derveyî welat. Berê em diçûn Stenbolê, ji bo xebatê. Lê êdî li Tirkiyê jiyan zor buha ye, ji ber wê ez difikirim ko biçim derveyî welat. Ez berê

li Lubnanê dimam. Paşê ez vegeriyam gund, karek tune bû, ji neçarî ez bûme cerdevan. Jina min nedixwest ez bibim cerdevan. Me'aşê wê kêm bû lê ji ber neçariya xwe min qebûl kir. *Cerdevan 22, Midyad*

**a. Mafên xwe dixwazin**

Di hevdîtinan de dîsa gelekên wan tînin ziman ko ew ji aliyê dewletê ve hatine xapandin û dixwazin çekên xwe danin. Di pêvajoya tasfîyekirina cerdevaniyê de naxwazin dev ji mafên xwe yên ked û xebat û xizmeta bi salan berdin.

Ji ber pakiya dilê me me dixapînin. Ji bo çareseriya vê meselê bila mafên me bidin me. Em hizûr û aramiyê dixwazin, bila mafê her kesî bê dayîn… Ji xeynî van, ez ê ve jî bêjim; însan însan e, bila kes kesî nekuje. Em hemû li gel hev ji çekan re bêjin êdî bes e. Kî be bila ew be, bila mafê jiyanê ji kesî neyê standin. *Cerdevan 1, Qulp*

Ez hêvîdar im, înşalleh dê her tişt baş bibe, em ê bi aştî û biratî bijîn, wê demê em ê çekên xwe danin. Ez ê hema roja ewil çeka xwe danim, bes bila cerdevanî bê rakirin, bila li hev bikin. Ji ber çekan gelek kesan zulm dît jixwe. Hin cerdevanan jî xwe spartin vê çekê û gelek zulm û zordarî kirin. *Cerdevan 30, Mêrdîn*

Heke tê rakirin jî bila bê rakirin, jixwe ez jî wê dixwazim. Bes bila aramî çêbe, ez ê yekser çeka xwe danim. Ji bo pêşeroja zarokên xwe ez tiştên baş difikirim. Ez zarokên xwe didim xwendin, wan dişînim dersxanê. Niha diçin lîseyê, hetta keça min beşa mamostetiyê qezenc kiriye. *Cerdevan 30, Mêrdîn*

**b. Karekî, rêya debarekê dixwazin**

Yên ko bi me'aşê cerdevaniyê debara xwe dikin, ji dewletê dixwazin ko karekî bide wan. Dibêjin ko heke karek hebe ew ê bi dilxwazî yekser dev ji cerdevaniyê berdin.

Heke cerdevanî rabe, divê dewlet ji me re çareyekê bibîne. Jixwe piştî vê temenê xwe ma ez ê çi bikim! Li ser pêşeroja zarokên xwe ez çi bêjim… Tengasiyên me yên aborî hene, em feqîr in. *Cerdevan 8, Lîce*





Heke qanûnek filan bê derxistin em vê dixwazin: 'Esas dewlet min bişîne ko derê jî ez ê biçim, ez ê her karî bikim. Ez dixwazim bixebitim. Li mektebekê, yan jî li şaredariyekê… *Cerdevan 21, Midyad*

Jin û zarên cerdevanan jî li ser vê meselê wek wan difikirin. Heke karekî dî bê dayîn, dixwazin yekser ji cerdevaniyê xilas bibin.

Cerdevanî ne tiştekî baş e. Ji ber ko ne ji aliyê ekonomîk ve, ne ji aliyê derûnî ve hizûra me heye. Em dixwazin dewlet cerdevaniyê rake û karekî dî bide me. *Jina Cerdevanekî 11, Mêrdîn*

Keça cerdevanekî, hem dixwaze babê wê ji cerdevaniyê xilas bibe, hem jî dixwaze ji bo debara malê çareyek bê dîtin. Bi awayekî eşkere behsê dike ko roja îro halê wan çiqas xirab e û piştî temeneke mezin peydakirina karekî çiqas zor e.

Karek tune. Ez bizanim ko karek dê hebe û her tişt biguhere, ez ê babê xwe qaneh bikim. Ne diya min ne kesekî din hewce nake, ez ê bi xwe wî qaneh bikim ji bo dev ji cerdevaniyê berde. Lê piştî wê dê çi bike? Piştî vê temenê xwe nikare hemaliyê, dergevaniyê filan bike. Ev camêr 50 salî ye, ma dê çi bike? Ne tenê babê min, gelek hevalên wî hene wisa, ew ê çi bikin? Ez xweş dizanim yek ji wan jî naxwaze bibe cerdevan. Lê kar tune, ma dê çi bikin? *Keça Cerdevanekî 9, Mêrdîn*

Yên ko ji bo çekberdanê dibêjin peydakrina karekî şert e, bi awayî eşkere gefan dixwin ko heke ev şertê wan neyê cih, cerdevanî dê bibe pirgirêkeke mezin.

Bila ev bûyerên xirab neqewimin, bila hizûra me hebe, em ê çekan danin. Heke rakin jî bila rakin lê me serberedayî bihêlin, dibe ko tiştên xirab pêk bên. Êdî dema dewletê cerdevanî rakir, karekî ji me re peyda bike dê baş be. *Cerdevan 32, Mêrdîn*

**c. Tirsa ji PKKê**

Yên ko difikirin heta PKK ji holê ranebe dê ewlehiya wan çênebe û îddia dikin ko ji bo qedandina "teror"ê dewlet muhtacê wan e û ji ber vê jî heta meseleya "teror"ê neqede divê cerdevanî jî neyê rakirin.

> Heta tu PKKê xilas nekî, tu çeka wî jê bistînî, ev camêr dê çawa xwe biparêze? Jixwe te cerdevan perîşan kiriye. Cerdevan diçin saziyeke dewletê, mirov bi çavên xirab li wan dinêrin. Ez nikarim bêjim ko ez cerdevan im, li saziyeke fermî jî ji ber tirsa xwe em nikarin bêjin em cerdevan in. *Cerdevan 12, Wan, Serokê Tabûrê*

> Heta teror neqede nikarin ji kar derxin. Lê ji bo vê jî em nabêjin bila "teror" berdewam bike. Yek cerdevan jî wisa nafikire. *Cerdevan 13, Midyad*

Ji aliyekî ve dibêjin heta ko şerê PKKê re bidome dewlet muhtacê wan e û ne pêkan e cerdevanî bê rakirin, ji aliyekî jî tê dîtin ko têkiliya wan û dewletê ne baş e. Gelek caran behsa aciziya xwe ya ji ber heqaretên esker û rayedarên dewletê dikin.

> Sebra me nema, êdî em dixwazin biqêrin. Heke em biteqin, wê ji PKKê xirabtir be. 'Esas BDP jî carna li meclîsê mafên me diparêze lê AKP qet me naparêze. Jixwe parlementerê Mêrdînê Muammer Güler, li gelek cihan bi gefxwarinê ji cerdevanan dixwest ko r'eya xwe bidin wî. *Cerdevan 23, Qoser*

Bi taybetî jî cerdevanên ko bi parazvanên xwe digerin, pirranî ji eşîrên cerdevanan in yan jî serokên tabûran in, heke cerdevanî bê rakirin ji dewletê dixwazin ko soza parastin û ewlehiyê dibin wan. Hetta li ser vê meselê bi rayedarên dewletê re axivîne û dest bi amadekariyê jî kirine:

> Ji bo vê ez çûm Wezareta Karên hundir. Min go hûn ê min çawa biparêzin? Ne ji ber qurretiyê dibêjim. Di belgeyan de jî dinivîse, avêtine ser mala min, ez rastî êrîşê hatime, niha jî tahlûkeya êrîşê heye. Em niha jî bi parazvanan digerin. Tê min çawa biparêzî? Tu dewlet î, wezîfa te ye ko tu min biparêzî. *Cerdevan 12, Wan, Serokê Tabûra Cerdevanan*

> Em wek welatiyên sivîl ditirsin ji ber ko yên zarokên wan li çiyê mirine, dê têkiliya me xweş nebe. Jixwe me wek xayîn dibînin. Ji destê wan bê, ew ê di cih de me bikujin. Cerdevanî bê rakirin em ê bimrin, ji ber ko ewlehiya me ketiye tahlûkê. *Cerdevan 30, Mêrdîn*

Hinek cerdevan piştî çekdanînê ji kuştinê ditirsin. Ji ber vê heke cerdevanî bê rakirin, yên ko difikirin ji gundê xwe dûr bikevin, daxwaza karekî ji dewletê dikin.





> Heke cerdevanî bê rakirin bila me di saziyên din de bidin xebitandin. Jixwe em li gundê xwe, li mala xwe nikarin bê tirs bimînin. Ez ne bawer im ko pêşeroja me geş û ronî be. *Cerdevan 24, Farqîn*

Cerdevanên ko wextekê zulm kirine, dizanin ko ew ê rastî bertekên gundiyan û PKKê bên, lewma jî naxwazin çekên xwe danin. Ev kom jî bi awayekî eşkere dibêje ko heta daxwazên wan pêk neyên û cerdevanî bê tasfiyekirin, ew ê serî hildin.

> Heke dewlet cerdevaniyê rake û ji bo me çareyekê peyda neke, ev mirina me ye. Acizî ji ber me heye, gelek jî heye û carna bertekên wan di cih de ne jî. Cerdevanan li vê derê jî gelek caran zulm û zordarî kirine... Dewlet nikare ji me re bêje ev kar qediya, haydê çekên xwe bidin. Heke tiştekî wisa bike dê acizî çêbe, em ê jî serî hildin. *Cerdevan 28, Gêlê, Sercerdevan*

> Ji ber ko me bi dilxwazî ev kar kir, gelek dijminên me çêbûn. Her tim dibêjin şerm e, çawa kurdek cerdevaniya dewletê dike. Lê em ji dewleta xwe ji Tirkiyeya xwe hez dikin. Em dikarin bi keyfxweşî ruh û canê xwe ji bo wê bidin. Jixwe heta "teror" nesekine em jî nasekinin. Dewlet bisekine jî em nasekinin. *Cerdevan 18, Wan, Serokê Saziya Cerdevanan*

Mirov dikare ji gotinên li jêr şîrove bike ko cerdevanî piştî ew qas salan bûye mekanîzmayeke çawa. Tam ne eşkere ye ko ev cerdevan ji ber tirsa kuştinê, piştî çekdanînê, yan jî ji ber dijminiya PKKê wisa diaxive. Lê ev gotinên wî nîşanî me didin ko hin cerdevan bûne komikeke wisa ko guh nadin hêza dewletê jî.

> Rojekê cerdevanî bê rakirin, dewlet çekên me ji me bistîne jî aştî di navbera me û PKKê de çênabe. Em nikarin bibin alîgirê PKKê, em dûrî hev in. Temamê eskeriyayê bixwaze jî em nikarin bi PKKê re li hev bikin. Em cerdevanên vê herêmê ji ber xayîntiya li van însanan yan jî xayîntiya li doza gel, nebûne cerdevan. Em doza gelê kurd diparêzin, em dostên wan in. Em dostên 'kurdçî'yan in jî. Yanê çi ye ko me çek ji dewletê standiye, em nebûne dijminê gelê xwe û fikrên xwe. Em li dijî PKKê ne, ji ber kirinên wan, em tenê xwe ji wan diparêzin. *Cerdevan 11, Qoser*

Ji alîyekî ve behsa tasfîyekirina cerdevaniyê tê kirin lê ji aliyê dî ve jî dewlet kadroyên nû dide cerdevanan. Ev yek jî nakokiya polîtîkayên dewletê nîşan dide.

Vê pêlê 400 kadro hatin dayîn. Li Midyadê û hin cihên dî 64 kadro hatin vekirin. Cihên ko pêdivî pê heye. Vê sala dawî ev kadro hatin dayîn. *Cerdevan 25, Midyad, Serokê Saziya Cerdevanan*

Beriya hilbijartinê, bi qasî ko ez zanim dîsa 200 kadroyên cerdevanan ji Amedê re hatin şandin. Cerdevan wisa bi rehetî dev ji çekên xwe bernadin. Ji ber ko şehîd ketin. *Cerdevan 8, Lîce*"





**Têbînî**

[1]Bnr. Berivan Tapan (2007), Terörün Bekçileri, Hamidiye Alaylarından Günümüze Koruculuk. İstanbul: Weşanên Güncelê; rp. 20.

[2]Ji eşîra Jîrkiyan hê jî 700 cerdevan hene ko li sala 1985ê ew eşîra cara pêşiyê bûyîn cerdevan ew e.

http://www.radikal.com.tr/turkiye/jirki_asireti_pkk_ile_kucaklasiriz-1131323 dema weşayî: 13.08.2013

[3]Li gor kevneşopiyên herêmê ew kesên li ser sê berikan sond xwarîn heger li ser gotina xwe nesekinin ji dîn derdikevin û jina wan ji wan tê berdan. Wek yekê bêrûmet tê dîyarkirin.

[4]Bnr. Berivan Tapan (2007) Terörün Bekçileri, Hamidiye Alaylarından Günümüze Koruculuk. İstanbul: Weşanên Güncelê, rp. 106-107.

[5]Bnr. a.g.e. s. 107.

[6]Bnr. Kalkınma Merkezi, Zorunlu göç ve Diyarbakır, Diyarbakır, 2010.

http://www.kalkinmamerkezi.org/upload/kitaplar/zg_vd/zgVD_kalk%C4%B1nma_trk.pdf7

[7]Bnr. Kalkınma Merkezi, Zorunlu göç ve Diyarbakır, Diyarbakır, 2010.

http://www.kalkinmamerkezi.org/upload/kitaplar/zg_vd/zgVD_kalk%C4%B1nma_trk.pdf

[8]http://www.mevzuat.gov.tr/Metin.Aspx?MevzuatKod=1.3.442&sourceXmlSearch=&MevzuatIliski=0

[9]Bnr. Köy Koruculuğu Yönetmeliği Madde 9. 01.07.2000 tarihli ve 24096 sayılı Resmi Gazete:

http://www.seo.mavi1.org/mevzuat/20524.html

[10]GÖÇ-DER (2013), Türkiye'de Koruculuk Sistemi: Zorunlu Göç ve Geri Dönüşler, İstanbul, rp. 2.

http://panel.stgm.org.tr/vera/app/var/files/t/u/turkiye%E2%80%99de-koruculuk-sistemi-zorunlu-goc-ve-geri-donusler.pdf

[11]Adnan Keskin, Yönetmeliği Bile Gizli, Taraf, 08.05.2009. http://www.taraf.com.tr/haber/yonetmeligi-bile-gizli.htm

[12]Benda pêvek: 02/06/2007 – Xala 5673 S.K/1.

http://www.mevzuat.gov.tr/Metin.Aspx?Mevzu atKod=1.3.442&sourceXmlSearch=&MevzuatIliski=0

[13]Bedran Akdağ (2012), Dağın Ardındaki Gerçekler. PKK, Korucular, JİTEM, İtirafçılar ve "Diğerleri", İstanbul: Weşanên Ozanê.

[14]Bkz.https://www.facebook.com/pages/DO%C4%9EU-VE-G%C3%9CNEYDO%C4%9EU-G%C3%96N%C3%9CLL%C3%9C-VE-GE%C3%87%C4%B0C%C4%B0-K%C3%96Y-KORUCULARI/262112873842918?id=262112873842918&sk=info

[15]Rêznameya Wezareta navxweyî li gor qanûna 422yê ya Cerdevaniya Gundanamadekirî û li Rojnameya Fermî ya 01.07.2000 bi hejmara çap bûyî.

[16]Ji bo cerdevanên gundan li meha 5ê ya 2012ê 761 lîre mehane, ji bo her operasyonê 24 lîre û 76 lîre zêdeyî tê dayin"Türkiye'de Korucu Sayısı ve Aldıkları Maaş" TRT Haber, 6.09.2012 http://www.trthaber.com/haber/turkiye/turkiyedeki-korucu-sayisi-ve-aldiklari-maas-54735.html

Wezîrê Navxweyî, Muamer Gülerî bersiva pirsa nivîskî ya parlamenterê Malatyayê Veli Ağbabayî ya li ser " mafên mirovane yên cerevanan" li 04.09.2013ê da. Wî diyar kir li Tirkiyeyê 46 hezar û 195 cerdevanên gundan yên demkî hene. Muammer Gülerî diyar kir

ko cerdevanekê Gundan li gor meha yekê ya 2013ê 849 LT distîne. Muammer Gülerî da zanîn ko li gor zêdekirina miaşên memûran miaşên cerdevanan jî tê zêdekirin. Wî got ji 01.01.2013ê û pê ve hemî cerdevan bûne xwedanê sîgorteya giştî.

[17]http://www.egitimmevzuat.com/index.php/20091118251/Kanun/koey-kanunu-442.html

[18]Bnr. Qanûna Gundan xala 74ê (benda pêvek: 28/12/2005 - 5443/1 md.)

Ew cerdevanhen demkî yên gundan yên ko ti sîgorteyên wan nînin, hevserên wan, dê û bav û ew kesên xudankirina wan bi stoyê wan ve ye, dê Qerta Kesk ji wan re bê dayin bêyî ko li qanûna 3816 ê bê nêrîn ko ew dibêje ew kesên nekarin ji bo saxlemiyê pereyan bidin dewlet dê bi Qerta Kesk li şûna wan bide. Ji bo tespîta wan kesên ew xudan dikin, li gor esasên li qanûna 657ê ya Memûrên Dewletê tê diyarkirin.

Ew cerdevanên ji pêşiya ev bend bê diyarkirin an jî piştî wê ew kesên ya kêm 10 salan xebitîn û bi tezmînatê ji karî derketîn, meîne û mesrefên li ser saxlemiya wan kesên ew xwidan dike dê, bav û zarok li gor vê qanûnê daxwazên wan têne bicihanîn.

http://www.kastamonu.gov.tr/ContentDownload/442%20Say%C4%B1l%C4%B1%20K%C3%B6y%20Kanunu.pdf

[19]Bnr. Saziya Sîgorteya Civakî rêberek amade kir: "Ew kesên cerdevanên gundan in û yên li gor wê qanûnê miaşî distînin dê xweyî sîgorte bin.Ew kesên cerdevan in bêyî ko lê bê nêrîn ka çi qas hatîyên maddî yên wan hene û ew kesên ji cerdevaniyê teqawît bûne heta mehaneyên wan didome ew ê xweyî sîgorte bin" http://www. sgkbagkur.net/sgk-gss-icin-rehber-hazirladi/

[20]"Muhtar ve Korucuların Maaşına Zam" Aktif Haber, 12 Temmuz 2013. http://www.aktif-haber.com/muhtar-ve-korucularinin-maasina-zam-820663h.htm

[21]Dema ko lêkolînên di nav civakê de dihat kirin ji ber ko pergala Qerta Kesk hebû axiftin li ser wê berdewam dibe.

[22]Bnr. Fedai Erdoğ (2005), TBMM Faili Meçhul Siyasi Cinayetler Araştırma Komisyonu Raporu. Ankara: Gizlisaklı Kitap.

[23]Bnr. "21 Yılda 5 Bin Köy Korucusu Suça Karışmış", Radikal (rojname), 27 Temmuz 2006.





## V. EZMÛNÊN WELATAN YÊN BI BI RÊXISTINÊN NÎVLEŞKERÎ RE TÊKILDAR / Osman AYTAR

### 1. Destpêk

Pergala ko wek Notirvaniya Gund tê binavkirin, tenê ne ji aliyê Tirkiyê ve tê bikaranîn. Bi nav û şêweyên cuda be jî, li gelek dewletan nimûneyên vê pergalê hene ko bi meaş û ciyêwaziyên tên dayîn beş û pişkeka civakê li dijî muxalefetê tê çekdardikin. Eger em rêxistinên bi vî rengî ko dewlet bi awayeke beloq û berbiçav piştigrî neke jî di bin re bin re disitirîne û diparêze, çavê xwe jê re digire, hetta hevkariyê pê re dike jî li lîstê zêde bikin ebatên pirsgirêkê wê berfirehtir bibe.

Armanca vê nivîsê, li ber ezmûnên çend dewletan li ser rêxistinên paramîlîter[1] yên ko ji aliyê hikûmetan ve hatine çekdarkirin vekolînan bike û ji bo duh, îro û siberoja pergala Notirvaniya Gund ya ko di sala 1985an de ji aliyê Tirkiyê ve li Kurdistanê hatiye danîn zemîneke ko ji perspektîveke navneteweyî rayêxe û berpêş bike. Welatên ko ji bo vê nivîsê hatine hilbijartin: Fîlîpîn, Guatemala, Afrîqaya Başûr û İraq. Ji her welatekî li ser mimûne û mestereyekî bi berfirehî hatiye rawestan.

Nivîs di çarçeveya vekolîna ezmûn û serpêhatiyên dewletan de li bersiva sê pirsên vekolînê digere: qonaxên derketin û belavbûna rêxistinên paramîlîter çi ne? Encamên civakî û pratîkên sereke yên rêxistinên paramîlîter çi ne? Rewşa dawîn ya rêxistinên paramîlîter çawa ye?

Di vê nivîsê de ji paramîlîtarîzmê qesd û armanc, ji bo parastina sazûmaneke serdest li dijî muxalefetê bikaranîna welatiyên sivîl e (Kowalewski, 1992). Dema mirov mijara rêxistinên paramîlîter yên ko ji aliyê dewletan ve tên piştgirîkirin digire ber dest, xalek ji xalên ko divê pêşîkê bê destnîşankirin, tevî ko ev birêxistinkirin bêtir li welatên ko di rojeva wan de têkoşîna rizgariya civakî û neteweyî di rewacê de ye derbikeve pêş jî tenê ne pirsgirêka welatên bi vî rengî ye. Wekê ko tê zanîn welatên ko şoreşa xwe ya rizgariya civakî û neteweyî pêk anîne û di vî warî de veguherînên xwe didomînin wek parçeyeka armanca parastina destkeftiyan pirsgirêka"mîlîsên gel" ketiye di rojevê de. Ji ber ko mijara vê lêkolînê, hêzên ko li dijî berxwedana rizgariya civakî û neteweyî ko ji aliyê dewletê ve têne rêxistin e, mijara "mîlîsên gel" û mijarên pê re têkildar wê nekevin di ber çarçeveya vê nivîsê de.

Li ser rêxistinên paramîlîter, di hilbijartina Fîlîpîn, Guatemala, Afrîkaya Başûr û Iraqê de, tevî daxwaz û pêşniyarên Enstîtûya Lêgerînên Siyasî û Civakî ya Diyarbekir (DÎSA)'yê ya ko ev nivîs jî parçeyek jê ye çend pîvanên din jî hatine bikaranîn. Ji van pîvanan ya yekê me xwest ko em dabeşiyeke parzemînî pêk bînin. Ya duyê diviya ezmûnên welatên hatîn hilbijartin xwediyê pêvajoya pêşveçûneka dîrokî bûyîna. Ya sisêyê jî, diviya hem nimûneyên ko piştî peyman û guherînên siyasî û civakî ji holê hatine rakirin, û hem nimûneyên ko hîn jî hebûna xwe didomînin hatibûna dayîn.

Pîvana rêxistinên paramîlîter ko li gorî tayebtiyên welatên xwe hatine hilbijartin, ji her welatekî rêxistina demdirêjtirîn û berbelavtirîn hatiye hilbijartin. Di vê çarçeveyê de ji Fîlîpînê Yekîneyên Erdnîgarî ya Hêzên Welatiyê Çekdar (Citizens' Armed Forces Geographical Units, CAFGUs)[2], ji Guatemalayê Komîteyên Dilxwazan ya Parastina Sivîl (Voluntary Civilian Defense Committees, CVDCs), ji Afrîkaya Başûr Yekîneyên Welatiyan (Vigilantes) û ji İraqê jî Siwariyên Selahaddîn (Fursan Salah al-Din, Saladin Knights) hatine hilbijartin.

Tevî çavkaniyên ko min di xebata xwe ya berî vê xebatê (Aytar, 1992) de bikar anîne, metoda ko min ji bo berhevkirina dane û agahiyên derheqê welat û rêxistinên hatîn hilbijartin de bikar aniye, mirov dikare wek berhevkirina sîstematîk (Polît & Beck, 2010) û analîzên li ser van berhevkirinan binav bike. Di lêgerîn û vedozîna çavkaniyan de hem berî ko welat û rêxistinên têkildar werin destnîşankirin û hem piştî ko welat û rêxistinên têkildar hatin destnîşankirin, pêşîka pêşîn min sûd û kelk ji databankên navneteweyî yên pirtûkxaneya zanîngeha Stockholm û pirtûkxaneya zanîngeha Malardalenê ya li Swêdê wergirt. Ev çavkanî ji lêgerîn û vedozînên min ên ji serdema Kewçêra 2011an ta Nîsana 2012an pêk hatine pêk tê. Wekê din min bi çend saziyên sivîl yên li Swêdê li ser Afrîka, Başûrê Kurdistanê, Fîlîpîn, û Amerîkaya Latîn dixebitin re têkilî danî. Google jî di lêgerîna çavkaniyan de hate bikaranîn. Di krîterên têkilkirin û vederkirina nivîsan ya ji nav çavkaniyên bi dest me ketîn yên derheqê welatên hatîn hilbijartin de, tevî pirsên lêgerînê ko me li jor destnîşan kiribûn, krîterên ko me di hilbijartina welatan de bikar anîbûn jî ji bo me bû wek mestere û nimûne.

**2. Perspektîvên Teorîk**

Ji bo kom û rêxistinên paramîlîter mirov dikare perspektîvên zanistî yên





cihêreng bikar bîne. Mirov dikare bi gelek perspektîvên teorîk û nêzikayîtêdanên derbarê babetên wek mafê mirovan, kontrola civakî, tundûtûjiya kollektîv, dadmendiya civakî, demokrasî, rêxistinên nesivîl û berjewendiyên sinif û komelan de bêtir û baştir serwextî kom û rêxistinên paramîlîter bibe. (ji bo nimûne ji bo çend perspektîvan binêrin: Senechal de la Roche, 1996; Payne, 2000; Mazzei, 2009). Di vê nivîsê de li gorî çend lêkolînên zanistî yên li ser rêxistinên paramîlîter, du perspektîvên ko cara pêşîn di sala 1992an de ji aliyê David Kowalewskî ve hatine bikaranîn, *Perspektîva erênî* (The benevolent perspective)[3] û *Perspektîva rexnegirî* (The critical perspective), wê wek çarçeveya şirove û guftûgoyan were bikaranîn. Mirov dikare van herdu perspektîvan wek du perspektîvên nakok yên ko bi hev re berberiyê dikin jî şirove bike. Kowalewskî (1992), cudatiyên di navbera perspektîvan de, ji bergeh û pencereya çar buûdên pêvajoya paramîlîter ya ko li jor bi berfirehî hatiye behskirin dinirxîne: *Çalakbûnî* (mobilization), *meşrutiyet* (constitutionalism), *pêkanîna nîzamê* (order-maintenance) û *helwesta rexnegirî ya raya giştî* (reactive public behavior).[4]

Li gorî Perspektîva erênî (Kowalewski, 1992) çalakkirina (mobilization) tevgerên paramîlîter şêweyeka dilxwaziya demokratîk e. Li gorî vê perspektîvê, paramîlîtarîzm, yek ji mekanîzmayên demokratîk e ko dema pêdivî pê çêdibe ji bo parastina sazî û pêvajoyên cihê xwe xweş kirîn tê bikaranîn. Rêxistinên paramîlîter yên ko wek yek ji pratîkên serdemên normal yên demokarsiyê ko tê de welatî têne çekdarkirin, ji bo parastinê çek tên bikaranîn, û girtin û derdestkirin tên kirin nayê hesibandin, li gorî vê perspektîvê paramîlîtarîzm xwediyê wezîfeyeke erênî ne. Li gorî vê perspektîvê temînatên qanûnî tu carî ne mutleq in (constitutionalism) û di serdemên ko qonaxên qanûnî yên edetî naçin serî de ji bo paramîlîtarîzmê sempatiya xelkê zêde dibe. Kesayet û komel dema derdikevin derî nîzama qanûnî, şertên têkilî mafên kasayetî de girîngiya xwe ji dest didin û li dijî kesayetên wihareng reng e ko komên paramîlîter werin bikaranîn, ev yek jî yek ji pêkhateyên girîng yên vê perspekîva ko ji bergeh û pencereyeke erênî li paramîlîtarîzmê dinêre ye.

Tevî ko azadî xudan girînigiyeke mezin e, li gorî vê perspektîva ko îdîa dike bes di çarçeveya misogerkirina vîna xelkê de azadî dikare were pratîzekirin, welatî misogerkirina nîzamê (order-maintenance) didin pêş mafên xwe yên kolektîv û eger pêdiviya rejîmê ji bo cîbicîkirina nîzamê pê çêbe wê piştgiriyê bidin hêzên paramîlîter jî. Li gorî vê perspektîva ko dibêje hêzên paramîlîter navgîneka serwerî û desthilata xelkê ye ji ber vê yekê jî xelk wê bertekên erênî

(reactive public behavior) ji bo hêzên paramîlîter nîşan bide, hêzên paramîlîter ji bo têkariyên rêkûpêkiya nîzama dewletê wê ji aliyê xelkê ve werin pesinîn û çepikkirin û eger ji bo parastina ewlekariya dewletê zorî û kotekî li çend kes û kûsan were kirin jî xelk wê dengê xwe neke.

Li gorî *Perspektîva rexnegiriyê* (Kowalewski, 1992) ko ji bergeh û pencereyek berovajî li *Perspektîva erênî* dinêre, yekîneyên paramîlîter, hêzên ko ji daxwazên civakê dûr, ji çalakiyên xwe zêde ne "berpirsiyar" û ji aliyê ekaliyetek biçûk ya elît ve têne manipûlekirin in (mobilization). Li gorî vê perspektîva rexnegiriyê, çînên serdest ji bo berjewendiyên xwe biparêzin rêxistinên paramîlîter bikar dihînin., kes û komelên ko berjewendiyên wan ji aliyê muxalîfan ve têne tehdîdkirin armancên xwe yên nedemokratîk bi riya paramîlîtarîzmê dinixumînin û hêzên paramîlîter çendî ko bêjin û îdîa bikin ko ji bo pirraniya civakê têdikoşin jî lê di rastiya xwe de xizmeta ekaliyetek biçûk dikin. Ji ber ko xizmetê ji ekaliyetek biçûk ya serdest re dikin, tevî hêzên muxalîf yên rêxistinbûyî, yekîneyên paramîlîter bi pirranî êrîş dibin ser pişkên feqîr yên civakê jî. Li gorî vê nêrîna rexnegirî, pêkhateya rêxistinên paramîlîter li ser şik û gumanê ava bûye, ev rêxistin zirarê didin nîzama qanûnî (constitutionalism), û tevil gelek karên ko li dijî prensîbên eşkeretî û berpirsiyariyê ne dibin. Serberedayîtî yanî bi serê xwe tevgerîn, xwe di şûna qanûnan de dîtin û hetta gelek caran bi serê xwe çêkirina qanûnên ji xwe re jî yek ji taybetmendiyên van hêzan e. Li gorî vê perspektîvê, bikarnanîna hêzên wekê komên paramîlîter ji bo nîzama dewletê (order-maintenance) bizerar e. Ev hêzen han şûna rêzgirtinê ji bo qanûnan, muxalefeta li dijî qanûnan xurt dike û hem bi hêzên ewlekariyê re û hem xwe bi xwe re rûbirû dimîne. Yek ji tezên din yên vê perspektîvê jî, tundûtûjiya paramîlîtarîzmê rê li ber tundûtûjiyeke miqabil vedike. Berovajî Perspektîva Erênî li gorî Perspektîva rexnegirî, berteka pirraniya xelkê ji bo hêz û rêxistinên paramîlîter neyênî ye. û li gorî vê perspektîvê ev hêzên paramîlîter ji bo demeke kurt eger çend kelk û havil ji bo rejîmê hebin jî di dem û wadeyeke dirêj de bizerar in.

## 3. Ezmûnên welatên cihêreng

Danasîna rêxistinên hatîn hilbijartîn yên li ser ezmûn û serpêhatiyên welatên muxtelîf, wê li gorî xweseriya her welatekî wek bersivandina her sê pirsên vekolînê ko di serê nivîsê de hatibûne destnîşankirin were kirin. Di vê çarçeveyê de, di her beşekî de li gorî xweseriya welatan wê behsa derketin û





berniyas û berbelavbûna rêxistinên paramîlîter, pratîk û bandorên wan yên li ser civakê û qonaxa ko gihaştinê û pêvajoya wan ya jinavçûnê wê were kirin

### a. Fîlîpîn: Yekîneyên Erdnîgarî ya Hêzên Welatiyên Çekdarî

Li ser ezmûn û serpêhatiyên welatên cihêreng rêxistina ko ji Fîlîpînê hatiye hilbijartin, Yekîneyên Erdnîgarî ya Hêzên Welatiyên Çekdarî (Citizens' Armed Forces Geographical Units, CAFGUs) ye ko "reorganizasyon" an piştî demokarasiyê tesfiyekirina wan heta vê gava ko ev nivîs tê amadekirin jî di rojevê de ye lê hê jî hebûna xwe diparêze, CAFGU di sala 1987an de ji aliyê serokdewletê Fîlipînê Ferdînand Marcos yê ko bi zilma xwe navdar bûye ve di şûna Yekîneyên Sivîl yên Parastina Welêt (Civilian Home Defense Force, CHDF) ya ko di sala 1972an de avabûye de hatiye damezrandin. CHFD çendî di sala 1987an de hatibe feşkilandin jî lê heta sala 1989an jî bi egera "dewra derbasbûnê" hebûna xwe parastiye.

CHFD, li dijî bi dehhezaran hêzên Artêşa Nû ya Gel (New People's Army, NPA) ya ko par û pişka leşkerî ya Partiya Komûnîst ya Fîlîpînê (Communist Party of the Philippines, CPP) bûne di sala 1972an de li ser qanûneka ko di sala 1935an de hatiye derxistin ji aliyê Marcus ve hatine damezrandi, ji aliyê dewletê ve hatine birêkxistin û li gundan hatine belavkirin. Ev hêzên han serberedayî û qels û zeîf bûne. Piştî hilbijartinên ko 7ê Sibata sala 1986an de hatiye çêkirin Marcos bi dek û dolaban xwe wek aliyê serkeftî îlan dike û li ser vê yekê jî xelk derdikeve xwepêşandaran û Marcos jî neçar dimîne ko welatê xwe bicih bihêle û bireve. Piştî ko Corazon Aquîno di 25ê Sibatê de têye ser wezîfê hêviya aşitî û çareseriyê gurtir dibe. Agirbesta ko di Berfanbara sala 1986an de hatibûye îlankirin û hevdîtinên ji bo aşitiyê û bernameya derxistina efûyeka giştî ev hêviyên han gurtir û geştir dikirin. Lê hê meheka hevdîtinan temam nebûyî hevdîtin têkçûn û şer dîsa destpê kir û pevçûn ji berê jî gurtir bûn. Di qonaxek wiha nazik de bi sernavê Rêxistinên Sivîl yên Xwe Parastinê (Civilian Self Defense Organizations, CVOs) di destpêka sala 1987an de "komên parastina semt û taxan" hatibûn damezrandin, ev rêxistin bi komên din ên paramîlîter yên wekê Alsa Masa ko bêtir li bajaran çalak bû û wek tevgereke antîkomûnîst dihate nasîn ji aliyê dewletê ve li dijî tevgera milîtanî bi şêweyeke çalak dihate bikaranîn. (Amnesty İnternational, 1992; Kowalewski, 1992)

Çend raportên Rêxistina Navneteweyî ya Efûyê (Amnesty International)

yên li ser salên 1980î û 1990î (Amnesty International, 1981, 1988, 1991a, 1991b) derheqê rêxistinên paramîlîter yên wekê *Rock Christ* û *Lost Command* ko di serdema Marcosî de çalak bûn û derheqê rêxistinên wek *Alsa Masa, Tadtad, Nakasaka* û *Walang Patawad* yên ko di serdema Aquino de çalak bûn agahiyên berfireh dihundirînin. Di raportan de têkiliyên van rêxistinên paramîlîter yên bi artêş û hikûmetê re, kuştinên bi destê van rêxsitinan çêbûyîn û komkujiyên kirîn cihek girîng digire. Heta ko di Sermaweza sala 1988an de ji nû ve werin revîzekirin rêxistinên paramîlîter yên wekê Alsa Masa, Nakasaka, Tadtad li dijî alîgirên NPA'yê û li dijî kesên ko di dêr û sendîkayan de çalak bûn polîtîkayeke sîstematîk ya tunekirinê meşand. Di sala 1987an de Aquino, bi ûşt û egerên wek "Berteka gel ya li dijî Komûnîzmê" û "Xweparastin"ê piştgirî da komên paramîlîter. Ev rêxistinên han ji aliyê leşkeran ve dihatin perwerdekirin û çekdarkirin, û bi hevkariya otorîteyên herêmî şer dikirin.

Li ser rexneyên di nav welêt û ji derûdorên navneteweyî yên derheqê sûnc û tawanên ko hêzên paramîlîter tevil dibûn de, hate gotin ko CAFGU'ya ko ji aliyê serokdewletê wî çaxî Corazon Aquino ve hatiye damezrandin wê di bin perwerde û kontrola artêşê de be, û li ser mijarên bingehîn yên mafên mirovan herî kêm mehekî wê werin perwerdekirin. Bi vê yekê dihate xwestin ko 'îmaj'eke nû ji bo van hêzên paramîlîter were danîn. Lê hêj zêde wext ser re nebihorî van hêzan rûyên xwe yên reş pêşan kirin û wekê komên berê yên paramîlîter dest bi çalakiyan kirin. Gelek kes û kesayetên ko bi xirabiyên xwe yên di nav CHDF'ê de nav dabûn di CAFGU'yê de jî hatin wezîfedarkirin. Ji bo kadroyên CAFGO'yê tevî faktorên wek pere, ji bo kes an koman derfet û îmtîyaza li herêma xwe serdestî û kontrolê, gef û şantaj û zor û kotekî jî hatin bikaranîn; yên ko tevil van rêxistinên paramîlîter nedibûn bi piştgiriya tevgera gerîlayan dihate tohmetbarkirin, û dibûn hedefa êrîşan. Hejmara endamên CAFGU'yan yên ko li dijî tevgera milîtanan bi polîs û leşkeran re derdiketin operasyonan heta Berfanbara sala 1990an nêzî 70-80 hezar kesî bû. Ji bo Fîlîpînê ko di sala 1990an de nûfusa wê 60 milyon bû ev hejmar ne hejmarek kêm û hindik bû. Piştî ko hate damezrandin û çend sal şûnde CAFGU bi tevger û helwestên xwe yên serberedayî û binpêkirina mafên mirovan nav da dîsan. Rêxistinên han yên paramîlîter li dijî tevgerên etnîkî yên ko li Luzon û Mîndanao'yê rûdabûn jî hatin bikaranîn. (Palme, 1989; Amnesty International, 1991a, 1991b, 1992; Kowalewski, 1992).

Endamên CAFGU'yê yên ko ji bo roja îroyîn rewşeke perçekirî berpêş





dikin. Li gorî agahiyên Komîsyona Mafên Mirovan ya Fîlîpînê, endamên CAFGU'yê wekê endamên CHFD'ya berî xwe têra xwe tevil bûyerên wek girtinên keyfî, zilm û êşkence û kuştinê bûne (Amnesty International, 2011). Çendî ko di dest de çend parametreyên berbiçav hebin jî lê zehmet e ko mirov bûyerên ko reng e ko di siberojê de biqewimin ji îro de texmîn bike. Lê çend bûyerên li jêr bi kurtî hatîn rêzkirin, nîşan dide ko selihandina van kom û rêxistinan di çarçeveya çareseriyên derî çek û tundûtûjiyê de qet ne hêsan e û wê qet ne hêsan be jî.

Di 30ê Hezîrana sala 2010an de serokdewletê nû yê Fîlîpînê Benigno Aquino III ko kurê Corazon Aquino yê piştî serdema Marcusî serokdewletî kiriye piştî ko gerîlayên Artêşa nû ya Gel (NPA) li herêma Surigao del Norte ya bi ser Bakurê Mîndalanao'yê ve ye bi ser kana madenê ya ko ji aliyê şîrketên taybet ve tê şixulandin de girt û sê pasdarên ewlekariyê kuştin, li ser vê bûyerê di 12ê Kewçêra sala 2011an peşniyareka artêşê pesend kir. Li gorî vê biryarê birrek kes ji CAFGU'yan bi ser navê Yekîneyên Alîkar yên Çalak yên CAFGU'yê yên Taybet (Special CAFGU Active Auxiliary Units, SCAA) wê di kanên madenan yên ko ji aliyê şîrketên taybet ve dihêne şixulandin de werin bicihkirin. Li gorî agahiyên artêşê dayî, 41 yekîneyên SSCA'yê ko her yek ji 100 kesan pêk tê ji aliyê leşkeran ve hatiye perwerdekirin. Arastin û pişkinana SSCA'yan wê li ser milê artêşê be, lê wê mişeyên xwe ji şîrketên taybet werbigirin. Li gorî agahiyên bi dest ketîn 200 endamên SSCA'yê wê di demeke kin de di du şîrketan de wê dest bi kar bikin û yên mayîn jî wê li gorî pêwistiya şîrketan werin îstîhdamkirin. Rêxistina Navneteweyî ya Efûyê (Amnesty International), di daxwuyaniyeka xwe ya çapemeniyê ya ko di 14ê Kewçêra sala 2011an de weşandî de bi kurtî behsa bûyer û qewimînên li jor kir û ev biryara ko ji aliyê Aquino III ve hatiye girtin hate rexnekirin. Raya giştî ya cîhanê hişyar kir ko artêş wê nekaribe nîzam û dîsîplîna rêxistina paramîlîter ya berbehs temîn bike û ev yek jî wê rê li ber zemîna tundûtûjiyê û binpêkirina mafên mirovan veke. Li gorî dane û agahiyên Rêxistina Navneteweyî ya Efûya tevî SSCA'yê birrek ji CFGU'yan jî wê di nav teşkîlata leşker û polîsan de werin îstîhdamkirin. (Amnesty International, 2011).

Wek ko tê dîtin, piştî ko Marcus neçar ma dev ji desthilatdariyê berde û welatê xwe bicih bihêle di serdema Corazon Aquiro ko bi sozên demokrasiyê hatibû ser hukm û serdemên din ên birêvebiriyê de jî polîtikayên dudil û pejirandina şerê navxweyî mirov dikare bêje ko hey berdewam kir. Tevî îstîhdam û guherînên di şêweya birêvebiriyê de, mirov dikare bêje ko heta hêzên ko tevil sûnc û tawanan bûne di nav sîstemê de bin, pirsgirêk wê her berdewam bin.

### b. Guatemala: Komîteyên Parastinê yên Sivîl yen Dilxwaz

Koma paramîlîter ya mijara vê beşê ya ji Guatemalayê, rêxistina ko di dewra general Riot Montt de (1982-1983), bi navê Yekîneyên Sivîl yên Xweparastinê (Civilian Self-defense Patrols) hatiye damezrandin û paşê di sala 1986an de di dewra hikûmeteka sivîl de bi destê artêşê bi navê Komîteyên Parastinê yên Sivîl yen Dilxwaz (Voluntary Civilian Defense Committees, CVDCs) ve hatiye guhertin e. CVDC wek parçeyeka hevdîtinên ko di sala 1994an di navbera hikûmeta Guatemalayê û tevgera milîtanan de dest pê kiriye û bi lihevhatin aşitiyê bidawî bûye hatiye feşkilandin (Ball, Kobrak & Spirer, 1999).

Pêvajoya damezrandina CVDC'yan, wekê li gelek welatan, bi têkoşîna muxalefeta çekdarî ya li Guatemalayê rûdaye re eleqedar e. Tevgerên milîytanan yên çepgir û komûnîst ji sala 1962an û vir ve çalakiyên xwe xurttir kirin û şoreşa Nîkaraguayê ya sala 1979an wekê li gelek welatên Latîn Amerîkayê li Guatemalayê jî hêviya şoreşê xurttir kir. Di dawiya salên 1970î û di destpêka salên 1980î de Artêşa Milîtanan ya Feqîran (EGP - Ejercito Guerrillero de los Pobres, Guerrilla Army of the Poor), ya ko di sala 1972an de hatiye damezrandin xurttirîn tevgera siyasî-leşkerî bû herî zêde dewlet ji vê tevgerê ditirsiya. Tevî EGP'yê hêzên wekê Hêzên Çekdar yên Berxwedêr (FAR – Fuerzas Armadas Rebeldes, Rebel Armed Forces) ya ko di sala 1962an de hatiye damezrandin û Rêxistina Çekdar ya Gel (ORPA – Organizacion del Pueblo en Armas, Organization of the People in Arms) ko di sala 1978an de hatiye damezrandin, li dijî rejîmê şer dikirin. Di sala 1982an de piştî ko EGP, FAR, ORPA û partiya komûnîst ya vî welatî Partiya Karkeran ya Guatemalayê (PGT - Partido Guatemalteco del Trabajo, Guatemalan Labor Party), di bin navê Yekîtiya Şoreşger ya Neteweyî ya Guatemalayê (URNG – Unitad Revolucionaria Nacional Guatemalteca, Guetemalan National Revolutionary Union) de yekîtiya xwe îlan kirin tirsa rejîma zordest zêdetir û xurttir bû. Bandor û piştgiriya ji bo tevgera milîtanan ya di nav xelkê de jî roj bi roj zêdetir bû (Figueroa Ibarra & Marti i Puig, 2007).

Di sala 1981an de hikûmeta Guatemalayê teşekûlek bi navê Yekîneyên Herêmî yên Nebirêkûpêk (Local Irregular Forces, FIL) damezrand ko mirov dikare vê teşekûlê wek paçeyek ji vê pêvajoyê binirxîne. Ev teşekûl di dewra serokdewletiya General Romeo Lucas García de (1981-1982), bi însiyatîfa birayê wî Benedicto Lucas García'yî hate damezrandin. Paşê di Adara sala 1982an de General Efrain Riot Montt bi kudetayekî dest datîne ser desthilatdariyê û di





dewra xwe de (1982-1983), bi navê Yekîneyên Sivîl yên xwe Parastinê (Civilian Self-defense Patrols, bêtir bi kurteya navên xwe yên Spanî PACs, Patrullas de Autodefensa Civil têne nasîn) rêxistinek ava kir ko hejmara endamên wê digihişt heta 800 hezar kesî û pirraniya endamên wê ji gundî û binecihan pêk dihat. Ev hejmar ji bo Guatemalaya ko di sala 1983an de nûfusa wê teqrîben 7 milyon û 100 hezar kes bû, li dijî tevgera milîtanan ya ko roj bi roj bêtir sempatî û piştgiriya xelkê bidest dixist, nîşana wê yekê bû, bê ka wê şer çawa were gurtirkirin û berfirehtirkirin. Di dewra Rio Montt de ko komên rastgir yên fanatîk û antî-komûnîst jî li dijî tevgera gerîlayan dihatin bikaranîn, li dijî binecihên sivîl yên ko li dijî tevgera gerîlayan piştgirî nedidan dewletê, çi jin çi zarok û çi jî pîr û kal şer hate ragihandin û stratejîya esas bi qewlê Riot Montt bi xwe "ziwakirina behra ko masiyan tê de avjenî dikirin" bû (Draining the sea that the fish swim in) (Ball, Kobrak & Spirer, 1999). Li gorî nûçeyeka rojnameya New York Times'ê ya ko di 18ê Temûza sala 1982an de derketiye, Rio Montt di axaftineka xwe ya ji bo xelkên binecih de bi qasê ko bikaribe bêje, "Eger hûn bi me re em ê we xweyî bikin, na eger hûn ne bi me re bin em ê we bikujin" (If you are with us, we'll feed you; if not, we'll kill you) ser xwe ve çûbû.

Ev mirovên ko bêyî ko mişeyeke diyarkirî bistînin, berovajî propaxandaya "dilxwaziyê" ya ko dewletê di gotinên xwe hey behs dikir, ji bilî komên rastgirên fanatîk û antîkomûnîst, hema bêje hemû bi riya kotek û tirsê hatibûn çekdarkirin, bi pirranî di navbera salên 10-20î de bûn û serê hefteyê carekî an du hefteyan carekî bi qasê 12 an 24 saetan nobet digirtin. Armanca vê nobetê li gund û mezrayên dûr yên çiyê ko di sala 1980an de teqrîben 400 gund ji nav van gundan bi destê dewletê hatin kavilkirin temînkirina kontrola hikûmetê bû. Ev hêzên paramîlîter, kontrola têketin û derketina gund û mezrayan jî tê de, ji ji bo artêşê berhevkirina êzingan bigire heta kuştina mirovên ko bi devê dewletê wek rûxîner dihatin binavkirin tevil her karê dewletê dibûn (Human Rights Watch/ Americas, 1994).

Sala 1986an di dewra hikûmeteke sivîl de artêşê navê PAC'an guherand û Komîteyên Parastinê yên Sivîl yên Dilxwaz (Voluntary Civilian Defense Committees, CVDCs) ava kir. Ji bo kesên serokatiya van komîteya dikirin jî şûna "komutan" navê serokê komîteyê hate danîn. Çendî ko dewletê bi vê yekê dixwest ko ji têkiliya ferman-berfermanê bêtir îmaja "dilxwaziyê" bide van koman jî, gelek kesên endamên van yekîneyan navê "dewriyeyên sivîl" (civil patrols) û "komutan" (commandantes) li xwe dikirin. Di sala 1988an de tevgereke sivîl

ko alîkarî dida gundiyên ko nedixwestin tevil van komên paramîlîter bibin, bû armanca êrîşên artêşê û komên paramîlîter û kesên ko dixwestin ji van koman veqetin jî liqayî kotek û sûîqestan dihatin (Ball, Kobrak & Spirer, 1999). Wek ko tê dîtin tevî çend cudatiyên xweser yên van welatan, wekê dewra Aquino yê ko li Fîlîpînê ketibû şûna Marcosî de, li Guatemalayê jî hikûmeta nû ya "sivîl" dest neda hêzên paramîlîter û parast.

Dewleta Guatemalayê bi navgîniya CVC'yan xwest ko li gundan xelkê wek alîgirê dewletê û wek "dijmin" veqetîne du pişkan. Li gorî vê yekê kesên ko çeka dewletê hilgirtîn bûn dost û yên hilnegirtîn jî bûn dijmin. Kesên ko piştgirî nedan dewletê mecbûr man ko cihûwarên xwe bicih bihêlin û koç bikin an bi zora dewletê li deverinan hatin bicihkirin (Ball, Kobrak & Spirer, 1999). Armancên sereke yên van polîtîkayên zordestî û koçkirinê ko civak bi xwe ve dikir wekê warê şer û cengê, piştgirî û alîkariya xelkê ya ji bo gerîlayan ko roj bi roj tesîra wan di nav xelkê de zêdetir dibû were kêmkirin û pê re pê re jî were tunekirin. Tê gotin ko tenê kesên ko di navbera salên 1980-1983an de mecbûr mane ko cihûwarên xwe bicih bihêlin teqrîben milyonek bû ko ev jî dike nîvê nûfusa li gundan ya Guatemalayê. Di vê serdemê de nêzî 50 hezar gundî hatin kuştin û di navbera 150 hezar û 250 hezar welatî jî derketin derveyî Guatemalayê an mecbûr man ko derkevin (Smith, 1990). Eger mirov bide ber bîra xwe ko ev pêvajo heta peymana aşitiyê ya ko di nava salên 1990î de hatiye danan mirov dikare texmîn bike ko zerar û xusara xelkê sivîl dîtî bê ka çi qas mezin e.

Komên paramîlîter, hem di dewra hikûmeta leşkerî û hem di dewra hikûmeta "sivîl" de, ji bo herisandina kesên ko mecbûr mane cihûwarên xwe bicih bihêlin û birevin, revandin û kuştin jî tê de di her warî de alîkarî dan hêzên leşkerî yên dewletê. Ji bo nimûne şêniyên bajarekî bi navê Cantel ko bi hilberandina tekstîlê û bi kevneşopiya xwe ya mêjîn ya sendîkavaniyê ve navdar e dema li dijî pêngavên paramîlîter helwesta xwe nîşan dan, liqayî gelek êrîş û zordestiyên ko pê gelek serok û rêberên herêmê jiyana xwe ji dest dan hatin. Dewletê, ji bo ko li gund û mezrayan bigihije armancên xwe cudatiyên etnîkî jî bikar anîn. Berovajî gotinên fermî, komên paramîlîter yên li gund û mezrayan tevî artêşê bi çalakî tevil operasyonan jî bûn. Ji bo ko rêberên komên paramîlîter bi xwe ve girê bidin gelek caran artêşa Guatemalayê, mal û milkên gundiyên hatîn kuştin di nav rêberên komên paramîlîter de belav dikirin, hetta dema rêberên van koman jinên bî mayîn ji bo xwe hildidan jî dengê xwe nedikirin. Di nîveka salên 1980î ko pevçûnên di navbera dewlet û gerîlayan de gihiştibû asta gurtirîn,





jin û zarok û pîr û kal jî bibûn armanca êrîşên leşker û komên paramîlîter. Bi ser de li gelek deveran jin berî ko werin kuştin ji aliyê leşker û komên paramîlîter ve rastî destaêtin û destdirêjiyê dihatin. Li deverên ko pevçûnên di navbera dewlet û gerîlayan de gur bû kesên ji van deveran yên ko hevkariya dewletê nedikirin tiştek asayî û ji rêzê bû ko rastî êrîşên leşker û komên paramîlîter were. Rêberên komên paramîlîter li gelek deveran ji gundiyên ko dixwestin vegerin ser mal û milkên xwe pere jî distandin (Ball, Kobrak & Spirer, 1999).

Kar û kirinên endamên CVDC'yê tenê ne ev bûn. Xwediyê otorîteyek ew çedn xurt bûn ko, tenê ne li dijî muxalîfan hikûmetê, li dijî muxalîfên otorîteyên herêmên xwe jî şer dikirin. Reqîb û dijminên şexsî yên rêberên komê, û beş û pişkên ko berê di navbera wan de ji ber erd an meseleyên siyasî nakokî çêbibûn jî bihêsanî ji wan re dibûn armanc (Krueger & Enge, 1985). Bi taybetî jî nîveka pêşîn yên salên 1980î di warê kuştin û revandin û serwindakirinê de ji bo komên paramîlîter çi tenê bi serê xwe û çi jî bi hevkariya hêzên artêşê bibûn salên "zêrîn" (Ball, Kobrak & Spirer, 1999).

Bi taybetî jî ji ber bertekên ko ji derûdorên navneteweyî dihatin û hevdîtinên ko bi tevgera milîtanan re dihate kirin, di destpêka sala 1994an de li deverinan CVC'yê navê xwe guhert, û bi navê Komîteyên Pêşveçûn û Aşitiyê (Peace and Development Committees) ko dilxwede tu têkiliya wê bi artêşê re tune bû, hebûn û çalakiyên xwe berdewam kir. Ev gav piştî ko serokdewletê wê demê yê Guamtemalê León Carpio di Rêbendana sala 1994an de ji bo serokdewletê wê demê yê DYA'yê Clinton nameyek şand ev guherîn wek gaveke girîng hate hesibandin. Lê Rêxistina Çavdêriyê ya Mafên Mirovan ya Amerîkayê, yanî *Human Rights Watch/Americas*'ê di Adara sala 1994an de ji bo çavdêriyê lijneyek şand serdana herêma Nebajê, li gorî çavdêriyên vê rêxistinê dibêje ko ji bilî guherîna navan tu guherîn çênebûye, û komîteyên hatine damezrandin jî hemû di ber dest û fermanên leşkeran de ne. (Human Rights Watch/Americas, 1994).

Di encama hevdîtinên ko teqrîben 9 salan dom kir de di 29ê Berfenbara sala 1996an de tevgera milîtanan URNG û hikûmeta Guatemalayê bi navbeynkariya Neteweyên Yekbûyî (United Nations, UN) li ser Lihevhatina Aşitiyeke Saxlem û Mayînde (Accord for a Firm and Lasting Peace) li hev kirin û bi vî awayî şerê navxweyî yê ko teqrîben 36 salan dom kir bidawî bû. Hevdîtinên ko carinan dialiqî an derengî pê diket piştî Rêbendana sala 1994an cardin xurt bûn û heta peyman û lihevhatina 1996an di gelek waran de li ser gelek xalan peyman hatibûn danîn (Figueroa Ibarra & Marti i Puig, 2007).

CVDC'yî wek parçeyeka vê pêvajoyê bi fermî hatin feşkilandin, lê ji ber ko muhasebe û guherînek ji binî de çênebû, van koman li gelek deveran hebûna xwe ya berê parastin. Artêşa Guatemalayê jî hêj peyman neketî di meriyetê de tevî Komîteya Aşitî û Pêşveçûnê piştgirî da rêxistinên wek Komîteyên Parastinê (Defense Committees ) û *Komîteyên Pro-Pêşvebirinê* (Pro-Improvement Committees). Ji xalên balkêş yek jê jî, birrek rêberên CVDC'yê bûn serok an endamên van komîteyan. Ev rewş bû sebeb ko teşekûlên nû çêbûyîn wekê otorîteyên ewlekariyê yên herêmî werin dîtin. Birrek ji endamên CVDC'yê jî rêxistinên nû yên tawanê damezrandin. Li ser rexneyên xelkê yên di vê barê de bersiva ko dewletê dayî, dibêje ko mensûbên berê yên CVDC'yê ne ji bo zirarê bidin sivîlan lê ji bo xizmetên xwe yên ko di serdema şerê navxweyî de dane tezmînatê bistînin bi hev re di têkiliyê de ne. *Inter-American Commission on Human Rights* dibêje ko hikûmet li ser çend xalên peymana ko di sala 1996an de hatiye girêdan nemaye û wezîfeya xwe bicih neaniye û di sala 2003an de wek pêşniyar dibêje ko, divê rê li ber birêxistinbûna endam û mensûbên berê yên CVDC û PAC'ê were girtin û divê têkiliya karmend û karbidestên hikûmetê yên bi van kom û komelan re were qedexekirin (Inter-American Commission on Human Rights, 2003).

Guftûgoyên bi vî rengî heta çend salên din jî dewam kir, lê guherînên ji binî de çênebûn. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje ko pêvajoya demokrasiyê ya ko bi peymana di sala 1996an de di navbera hikûmeta Guatemala û tevgera milîtanan de hatiye girêdan destpê kiriye, hem ji bo dewletê û hem ji bo tevgera milîtanan rê li ber stratejî û tektîkên nû vekir, ev pêvajo bi serê xwe tijî ders û îbret e ji xwe. Ji bo nimûne birrek kesên ko berê di komên paramîlîter de cih digirtin di teşekûlên nû yên ji bo têkoşîna li dijî sûncên adî de cih girtine û ev yek jî dibe egera metirsî û bêbaweriyê. Ji ber sebebên ko li jor bi kurtî hatine behskirin feşkilandin û selihandina komên paramîlîter yên berê li ruhê peymana aşitiyê ya ko di sala 1996an de hatiye îmzekirin nagunce.

**c. Afrîkaya Başûr: Yekîneyên Welatiyan**

Rêxistina paramîlîter ya mijara vê beşê ya li ser Afrîkaya Başûr, *Vigilant* (Vigilantes) in. tevî ko ji gelek kom û rêxistinan pêk were jî bi giştî wek Yekîneyên welatiyan tên binavkirin û di serdema rejîma Apartheid ya ekaliyetên spî yên nijadperest de (heta 1994an) hevkariya dewletê dikirin. Vigilante, ji bo komên kevneperest û şerûd yên birêkxistî dihate gotin û ev komên han bi piranî li deverên ko reşik lê niştecih bûn di bin koordînatoriya dewletê de çalakî li dar dixistin. Tevî ko mesned û pêgeheka wan a qanûnî tunebe jî, Vîgîlant, êrîş dibirin ser kes û komên ko li dijî rejîma Apartheîd têdikoşiyan û polîs jî di nav de bi gelek saziyên dewletê re di nav hevkarî û koordînasyonê de bûn (Haysom, 1989). Di vê nivîsê de ji dêla ko em navê çend rêxistinan bidin û lê hûr bibin, bi giştî em ê di bin banê Vîgîleatan de behsa hêzên ko çi bi eşkere û çi bi dizîka xizmeta rejîma nijadperest dikirin bikin.

Li Afrîkaya Başûr edet û kevneşopiya bikaranîna sivîlan ya ji bo berjewendiyên dewletê diçe digihe heta salên 1910î û hêzên serdest di berdêla çend bertîl û ciyawaziyan de pişkeka civakê ji bo berjewendiyên xwe tim û daîm bikar anîne. Lê Vîgîlantên ko pişta xwe bi dewletê germ kirîn, piştî payîza sala 1985an xurt û berbelav bûn û bi taybetî jî li cihên ko di serkêşî û serperiştiya Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê (African National Congress, ANC) de muxalefeta civakî çêdibû polîs û leşkeran pê nedikarîn ev rêxistina han dikete dewrê de. Vê rêxistinê wek armanceka sereke rêya bêtesîrkirina kes û komelên li dijî rejîma Apartheid danîbû ber xwe, polîsan ji xwe dengê xwe li van koman nedikir bi ser de jî gelek caran polîs bi xwe jî tevî van koman tevil êrîşan dibûn. Ev yekîneyên han yên ko di nav xelkê de wek qutikreş dihatin nasîn bi rola xwe ya li dijî ANC û komên din ên muxalîf wek artêşa herêmî û rêxistinên din ên ewlekariyê ya dewletçeyan (cureyeke eyalet) kar dikir. Dewletçeyên ko parçeyek ji polîtikayên parçe bike û birêve bibe yên hikûmeta nijadperest ya Afrîkaya Başûr bûn, di nav warekî ko nêzî 10 milyon mirov lê dijiyan de bi navê War (Homeland) û Rêveberiyên Reşik yên Herêmî (Black Local Authorities) wek du rêveberiyên bi rejîma Afrîkaya Başûr ve girêdayî hatibûn damezrandin. Kesên ko li ser van dewletçeyên ko erdê wan hindik, rêjeya betaliyê bilind bû; û serokê dewletê, parlemento, artêş û hêza wan ya polîsan hebû tenê dikarîbûn bibin welatiyên Warê xwe. Ev rêveberiyên ko rasterê xizmeta dewletê dikir wek tescîla welatiyên ji çîna duyem tevdigeriyan, rexma hemû polîtîkayên faşîst yên dewletê welatiyên van rêveberiyan nedikarîn ji derfetên qismî yên ko mafê her welatiyekê Afrîkaya Başûr e jî sûdemend bibe (Haysom, 1986; Afrikagrupperna i Sverige & ISAK, 1986; Sekhonyane & Louw, 2002).

Li deverên ko ANC û Bereya Yekbûyî ya Demokratîk (United Democratic Front, UDF) lê çalak bûn, hêzên mîlîs yên herêmî ko piştî sala 1983a de hatibûn damezrandin mirov dikare wek parçeyek ji Vîgîlantan bihesibîne û qebûl bike. Ev

mîlîsên han dema êrîşên gerîlayan an bêaramiyên polîtîk çêdibû dikarîbûn çekan hildin. Li Afrîkaya Başûr karkerên spî yên li fabrîqeyan dişixulîn jî dikarîbûn tevî polîsan tevil operasyonên pêkanîna nîzamê ya li herêmên reşik bibin. Li Afrîkaya Başûr ko karkerên mêvan jî li dijî ANC û hêzên din yên muxalîf, bi riya gefxwarin, şantaj û bertîl û ciyawaziyên madî dihatin bikaranîn û çekdarkirin, xwendekarên dibistanan jî li gorî armancên mîlîtarîst dihatin perwerdekirin (Afrikagrupperna i Sverige & ISAK, 1986).

Di dewletçeya bi navê KwaZulu'yê ya ko Inkatha yê ko bi êrîşên xwe yên li dijî ANC û beşên din yên muxalîf dihate nasîn û û îdîaya siyasetek alternatîv dikir lê çalak bû, polîsên KwaZulu wekê pişka çekdarî ya Inkathayê dişixulîn. Li KwaZuluyê di serî de li saziya polîsan ji bo li gelek kargehan de bikaribî bişixulî diviya tu endamê Inhatkayê bûyiya. Inkatha ya ko pişta xwe bi dewletê germ dikir tenê êrîş nedibir ser ANC û UDF'yê û tenê ne endam û alîgirên wan dikuştin û tenê ne mala wan dida ber êgir, êrîş dibir ser herkesê ko pişta Inkathayê nedigirt, komên Vîgîlantan yên bi navê *Amasinyora* û *Amambutho* yên li KwaZuluyê çalak bûn jî bi hevkarî û alîkariya Inkathayê êrîş dibir ser hezên muxalîf (Afrikagrupperna i Sverige & ISAK, 1986; Sekhonyane, & Louw, 2002). Inkatha îro jî wek partiyek siyasî li Afrîkaya Başûr hebûna xwe diparêze.

Li deverên din jî Vîgîlant çalak bûn. Li KwaZulu'yê tevî herdu komên bi navê *Amansiyora û Amambutho*, gelek komên din yên muxtelîf jî hebûn. Ji bo nimûne, li Mpumalanga (KwaNdebele)'yê *Mbokodo*, li Mpumalanga'yê *Black Cats*, li Gautent'yê *Toaster gang*, li Western Cape'ê *Amasolomozi*, *Witdoeke* û *Amadoda*, li Eastern Cape'ê *Kekanas, Mememsi* û *AmaAfrika*, li Free State'ê *Three million gang*, *Mabangalala* û *A-Team* (*Phakathis*) hebûn û van komên muxtelîf yên Vîgîlantan êrîş dibirin ser hêzên muxalîf yên li dijî rejîmê. Û bi vê riyê bi hezaran kes kuştin, malên wan dan ber êgir an mecbûrî koçê kirin. Di pêkanîna van komên paramîlîter de tevî cudatiyên wek herêmî, civakî, komelî û yên din ciyawaziyên madî û derfeta bikaranîna hêzê jî rolek berbiçav leyîstiye. ANC û rêxistinên alîgir jî li hemberî êrîşên Vîgîlantan bêdeng neman. Li gorî hesabekî ji sedan 90'î zêdetir kuştinên ko ji ber "bêaramiyan" çêbûne têkilî êrîşen Vîgîlantan û bersivên têkilî van êrîşan yên hêzên muxalîf de ne (Sekhonyane & Louw, 2002).

Hikûmeta nijdaperest ya Afrîkaya Başûr, wek parçeyeka armanca xwe ya"Namibyakirin"a şer li Namibya'ya ko dagîr kiribû ji nav xelkê mîlîs didan hev û van mîlîsan berî serxwebûna Namibyayê bi salan bi ser navê Afrîkaya Başûr çek hildan. Hêza Herêmî ya Başûr-rojavayê Afrîkayê (South West African Territorial





Force, SWATF), ko ji nêzî 10 hezar leşkerên reşik û spî pêk hatibû di sala 1980an de qaşo bi navê artêşek serbixwe, lê wekê beş û parçeyek ji Hêza Parastinê ya Afrîkaya Başûr (South African Defence Force, SADF) hate damezrandin. Beşek mezin ya vê artêşa Namibyayê leşkerên artêşa Afrîkaya Başûr pêk dihanîn. Artêşa Namibyayê çendî wek artêşek serbixwe bixweye jî bi hemû tiştên xwe ve bi ser artêşa Afrîkaya Başûr ve bû û piştî ko av artêş hate danîn ji bo hemû mêrên Namibyayê leşkerî bû mecbûrî. Piştî vê yekî ji Namibyayê koçên bikom destpê kir. Leşkerên diravgir jî li Namibyayê dest bi wezîfeyê kirin. Di vê wezîfedarkirinê de helwesta eşîrên Nambiyayê ya li dijî rejîma kedxwar û dagirker ya Afrîkaya Başûr jî rolek girîng leyîst, ji sedan 40'ê artêşa Namibyayê û ji sedan 25'ê artêşa Afrîkaya Başûr ji reşikan pêk dihat (Afrikagrupperna i Sverige & ISAK, 1986). Mirov dikare ji van agahiyan têderxe ko rejîma nijdaperest di polîtikayên xwe yên parçe bike û birêvebibeyê de qonaxek çawa baş û serkeftî biriye.

Piştî peyman û lihevhatina sala 1994an ya ko di navbera hikûmeta Afrîkaya Başûr û ANC'ê de hatibûye danîn piştgiriya dewletê ya ji bo Vîgîtelantan yekcarî qut bû. Piştî vê peyman û pêvajoyê demokrasiyê di serokatiya Desmond Tutu yê ko di sala 1995an de xelata Nobelê wergirtibû Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê (Truth and Reconciliation Commission), hate damezrandin û evê komîsyonê bi qasê sê salan bûyer û rûdanên ko çi Vîgîlant û çi hêzên muxalîf tevil bûne ji gelek buûd û perspektîvan ve vekola û şop gerand.Wek mijarên din di mijara Vîgîlantan de jî bi taybetî jî kesên ko liqayî zilma Vîgîlantan hatine ji vê pêvajoyê memnûn neman, lê pêvajoya lihevhatinê dest da ko gelek bûyer û rûdanên qewimîn werin ronîkirin. Li gorî perspektîva ko Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê ji xwe re kiriye çavkanî, pirsigirêk bi tenê ne meseleya efûyeka giştî bû. Bi vê perspektîvê sê komîteyên jêr yên ko hev û din temam dikin hatin damezrandin: (1) ji duwarojê heta wê rojê derxistina hemû îhlal û binpêkirinan (2) temînkirina derfetên tezmînatên pêwist û rehabîlîtasyonê û derxistina hemû rastiyên veşartî mayîn (3) divê efû bikeve di rojevê de. hem pratîkên Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê bi xwe û hem pratîkên komîteyên pê ve girêdayî, tevî hemû cudatiyên van herdu welatan, ji bo gav û pêngavên di warê çareserkirina pirsgirêka Kurd de dikare bibe modêl û nimûneyek baş. Ji ber pratîkeka xwe ya encamgir û belgeyên lêpirsîn û vekolînê yên têkilî Vîgîlantan jî di nav de ko di malpera fermî[5] ya komîsyonê de cih digirn û têne pêşankirin, ezmûn û serpêhatiyên vî welatî tenê ne ji bo vî welatî, lê ji bo hemû welatên ko qonax û pêvajoyên bi vî rengî birîne tijî dersên watedar yên bêserûber in.

Piştî sala 1994an dîsa li dijî sûncên cihêreng û tiryakfiroşiyê komên wekê *Vigilant*'ê derketin. Li gorî lêkolînên pêşî û piştî sala 1994an, mirov dikare bêje ko di navbera herdu serdeman de jî ji aliyê kar û kirinên keyfî ve zêde ferq çênebûye, bes armanca van kom û komelan hatiye guherîn (Harris, 2001, 2003; Sekhonyane & Louw, 2002). Yanî şûna armancên berê yên siyasî yên nijdaperest, sûnc û tiryakfiroşî êdî bûye cihê lihevgihanê ji bo van kombûnan. Ev kombûnên nû yên li Afrîkaya Başûr, tevî hemû cudatiyên van herdu welatan, gelekî bi ser kombûnên li Guatemalayê ve diçin. Bûyer û rûdanên vê taliyê nîşan dide ko, hewldan û daxwazên kesên ko dixwazin xwe têxin şûna qanûnan de û 'nîzam'ê temîn bikin, rexma guherînîn di warê siyasetê de, bi awa û şêweyên din her berdewam e, û reng e ko ev yek bibe egera pirsgirêkên nû yên civakî.

**d. Iraq: Siwariyên Selahadîn**

Rêxistina paramîlîter ya ji Iraqê hatî hilbijartin yekîneyên *al-Fursan* (Siwarî) ya ko bi ser navê Siwariyên Selehaddîn (Fursan Salah al-Din, Saladin Knights)[6] di sala 1963an de li Başûrê Kurdistanê ji aliyê rejîma Iraqê ve hatiye damezrandin û birêk xistin e. Şêwe û wergiriya van hêzan çendî li gorî serdemên cuda hatibin guhertin jî heta serhildana Kurdî (raperîn) ya sala 1991an van hêzan hebûna xwe diparastin. Al-Fursan a ko di sala 1963an de hatibûye danan ji du pişkan pêk dihat. Ji alayiyan ya bi navê Siwariyên Selahaddîn tenê ji Kurdan, û ya dî jî ya bi navê Siwariyên Xalid bîn Welîd (Fursan Khalid ibn al-Walid, Khalid ibn al-Walid Knights) jî ji Ereban pêk dihat. (Zeick, 1997). Di nav Kurdan de ji bo van hêzên ko bi rejîma Iraqê re hevalî û hevkarî dikirin "Cahş" yanî "çehşikên kerê" dihate gotin.

Dem û dewra ko ev hêzên paramîlîter hatine damezrandin girîng e. Li gorî peymaneka ko sala 1963an di navbera tevgera Kurd û hikûmeta Iraqê de hatibû girêdan di çarçeveya otonomiyê de mafên Kurdan yên neteweyî wê hatibûyan nasîn û dabînkirin. Kurdan digot divê bajarê Kerkûkê jî di nav sînorên Kurdistanê de were berdan lê hikûmeta Iraqê bi tu awayî pê qayîl nedibû. Piştî vê lihevnekirinê cardin pevçûnan destpê kir û hikûmeta Iraqê jî li dijî tevgera neteweyî ya Kurd ji bo hêza xwe ya têkoşînê zexmtir û qewîntir bike rêxistina paramîlîter ya bi navê al-Fursan ko nû hatibû damezrandin bikar anî. (Zeick, 1997).

Li gorî Martin van Bruinessen (1999) dibêje, serokeşîrên êl û ezbetên wek Zebarî, Bradost, Lolan, Herkî û Surçî ko bi Mele Mistefa Barzanî û kom û kesayetên bi Barzanî re di tifaqê de bûne re nelihev bûn, bûne serokên pêşîn yên tevil al-Fursanê bûyîn. Paşê çend serokeşîrên din jî tevil bûn, lê rolên wan yên di vê rêxistinê de li gorî yên berî xwe gelekî kêm bû. Serokeşîr û kesên bi serokeşîran ve girêdayîn yên ko çekên dewletê hilgirtîn ji biryarên hikûmeta Iraqê bêtir li gorî têkiliyên xwe yên li dijî Barzanî û Kurdên ko bi Barzanî re di tifaq û têkiliyê de bûne tevdigeriyan. Pêşiyê tenê serokeşîr bi milîsên xwe tevil al-Fursanê dibûn, lê paşê di serkêşî û serperiştiya çend rêberên kartêker yên ne eşîr alayiyên bi serê xwe jî hatin damezrandin. Di dawiya salên 1970î û di destpêka salên 1980î de alayiyek ko serperiştiya wê şêxeke ji terîqa Qadiriyan dikir bi mirîden xwe yên ji gundê xwe ve tevil al-Fursanê bû, tevî ko ne eşîr bû lê di pratîka xwe de wek eşîrekî tevdigeriya.

Di navbera salên 1970-1974an de di dewra peymana otonomiyê de tu çalakiyên al-Fursanê li Kurdistanê tunebûn hema bêje wekê bi awayekî "de-facto" feşkilîbin dixweyiya ev rêxistin. Serokeşîrên wê heyamê yên ko bi tevgera Kurd re nelihevbûn li bajarên di destê hikûmeta navendî de hatin bicihkirin. Di dawiya salên 1970î de piştî ko tevgera Kurd ya neteweyî ji nû ve gur bû hêzên siwarî yên Kurd yên ko hevkariya rejîmê dikin û al-Fursan ji nû ve xurt bûn.

Di havîna sala 1986an de li Başûrê Kurdistanê hejmarê kesên tevil al-Fursanê bûyîn nêzî 150 hezar kesî bû (hetta gelek kes dibêje 250 hezar kes tê hebû ev hejmar). Lê di pratîkê de yên ko di vê rexistinê de çalak bûn ji vê hejmarê kêmtir bûn. Çimkî gelek kes ji bo ko tevil şerê Iraq û Îranê yê ko di navbera salên 1980-1988an de qewimî nebe an ji ber wezîfeyên din ên mecbûrî bireve navê xwe di vê rêxistinê de dida tomarkirin. Di ber şerê Iraq û Îranê re de yekîneyên Kurd yên alîgirê rejîmê, bi rêxistineke bi navê Tabûrên Parastina Sînor (Qiyada Jahafil al Dîfaa al Watanî, National Defence Battalions) ko ji aliyê techîzat û mûhîmatên xwe ve sist û qels bû ve girêdayî bû. Milîsên ko pişta xwe bi dewletê germ kiribûn meaş û mesrefên xwe yên din ji serdarên xwe yên ko jê re Musteşar jî dihate gotin werdigirtin. Û gelek mûsteşaran bi vê riyê saman û sermiyanek têra xwe mezin bidest xistin. Evê çerxê cih û paleya mûsteşaran xurttir û bilindtir dikir. (Human Rights Watch, 1993; McDowall, 1996; Bruinessen, 1999).

Dema mirov li pratîkên Siwariyên Selahaddîn yên ko ji Kurdan pêk dihatin dinêre, mirov dibîne ko her wextî li dijî tevgera Kurd derneketine. Hetta li deverinan pêşmergeyan dizîka ji wan çek û cebilxane wergirtine. (Bruinessen,

1999) Li gorî çavkaniyeke din rejîma Seddam heta sala 1987ê li Kurdistanê hema bêje qet nemabû, û hikûmet û hêzên leşkerî hema bêje bitemamî ji herêmê vekişiyabûn. Li çend xalên pişkinîn û venêrînê hêzên al-Fursanê yên bi Musteşaran ve girêdayî hebûn, lê wan jî bi piranî dengê xwe li çalakiyên Pêşmergeyan nedikir. Lê vê rewşa aram zêde dom nekir û kampanyaya Enfalê ya ko bû sebeba kuştina bi sedhezaran kesan hate destpêkirin û di vê kampanyayê de çend Mûsteşar roleke gelekî aktîv leyîstin (Hiltermann, 2008).

Tiştên ko Mesûd Barzanî yê ko îro serokê herêma federe ya li Başûrê Kurdistanê ye di hevpeyvîneka xwe ya ko sala 1991an de pê re hatiye çêkirin de dibêje jî cudatiyên demkî yên yekîneyên Kurd yên ko bi rejîma Seddam ve girêdayîbûn nîşan dide. Barzanî di hevpeyvîna xwe de dibêje ko ji bo berî sala 1975an dikare behsa “Cahşên rastî” bike, ji ber ko wan bi dil û can piştigriya hikûmetê dikir, lê piştî sala 1983an rewş gelekî guheribûye. Barzanî dibêje ko ji ber ko wan nedikarîn di nav refên xwe de cih bidin her kesî ji ber hindê hinek ji wan kesan tevil siwariyên sivik yên bi ser rejîmê ve dibûn, û dibêje pirraniya Cahşan bi wan re di têkiliyeke veşartî de bûn (McDowall, 1996).

Pêvajoya ko bi operasyonên Enfal û Helepçeyê destpê kir, dagîrkirina Kuweytê û piştî vê dagîrkirina helwesta dewletên dinyayê yên li dijî Iraqê di nav gelek Kurdên endamê al-Fursanê bû egera şikestin û têkçûnê, çendî ko birrek ji Mûsteşaran di operasyonên Enfalê de di nav artêşa Iraqê de rolek girîng leyîstibin jî. Ji ber vê û çend egerên din di raperîna ko sala 1991an de li Kurdistanê rûda pirraniya Mûsteşaran bi heval û hevrêyên xwe ve beşdar bûn û di serhildanê de rolek girîng leyîstin. Ev dihat wateya veqetîna ji mahr û tekiliyeka ko bi dehan salan dom kiribû. Wî çaxî ji ber ko Seddam li ser hukm û desthilatê bû Bereya Kurdistanî ko ji Partiya Demokrata Kurdistanê, PDK û Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê, YNK’ê pêk dihat ji bo Mûsteşarên ko li dijî Seddam derketine û dest hilanîne efûyeke giştî derxist. Û ji bo yên ko li Kurdistanê mayîn ne hingî û ne paşê ji ber sûnc û qibhetên ko di bin kontrola rejîma Beas’ê de kirîn tu muamele nehate kirin.

Hêza ko Mûsteşaran di destê xwe de digirt, paşê ji bo rûxandina rejîma Seddam jî hate bikaranîn. Çend Mûsteşarên ko tevil serhildana sala 1991an nebûyîn û têkiliya xwe ya bi rejîma Seddam re berdewam kirîn ji aliyê Amerîkayê ve jî hatin bikaranîn. Musteşar Faris Silêvanî ko xwediyê eşîreke teqrîben ji 50 hezar kesî pêk tê ye û têkiliyeke xurt ya wî bi Seddam re hebûye, di sala 1994an de piştî ko bi wezîrê berevaniyê yê wê demê Ali Hassan Majid ko ji aliyê Kurdan





ve wek Elî Kîmyewî tê binavkirin pev çû li ser rêya Tirkiyê çû Ukraynayê, û ji wir jî pêşiyê çû Almanyayê û paşê jî çû Amerîkayê bicih bû. Bi planên ko Rêxistina Navendî ya Saloxgeriyê CIA amade kiribûye çû Sûriyê û li wir bi gelek dîplomatên kevn yên payebilind re û bi Erşad Zêbarî yê ko Kurdek e û demekî wezîrî jî kiriye re li hev rûnişt û hîn zêde wext ser re nebihûrî Zêbarî jî bi Amerîkayê re kete di nav têkiliyeke xurt de. Hem Silêvanî û hem Zêbarî di dema operasyonên Enfalê de bi awayeke çalak tevil operasyonan bûyibûn (Rosen, 2003). Zêbarî paşê li ser daxwazên Tirkiye, Sûrî û Îranê partiyek ava kir û li gorî planên van dewletan yên li ser Kurdistan û Iraqê direjî bi xizmetên xwe dan (Rizgari Online, 2007).

Tevî Siwariyên Selahaddîn çend rêxsitinên din jî li Kurdistanê hatibûn damezrandin. Hêzên Lezgîn (Quwat al-Taware, Emergency Forces) ko di bin kontrola Partiya Beasê de li bajaran ji bo îstîxbarat û li dijî derketina “terorîzm”ê kar dikir yek ji van bû. Yekîneyên Taybet (Mafarez Khaseh, Special units) ko bi Rêxistina Navendî ya îstîxbaratê Amn’ê ve girêdayî bû û ji sîxurên Kurd pêk dihat rêxistinek din ji nav van rêxistinên paramîlîter bû. Ev hemû hêzên hatîn behskirin tevî ko Kurd bûne, lê ji bo dijminatiya birayên xwe yên Kurd bikin ji aliyê rejîma Beasê ve hatibûne perwerdekirin. (Human Rights Watch, 1993). Li gorî *Human Rights Watch*’ê (1993) du buûdên polîtîkayên rejîma Iraqê ya parçe bike û birêvebibeyê hebûn. Yek ji van buûdan kûrtirkirina dudilî û nakokiyên di navbera partiyên Kurd de. Ya din jî heta jê dihat dixwest û dikir ko zêdetir Kurd tevil komên paramîlîter yên ko xwediyê teesûbeke eşîrî û alîgirê hikûmetê bûn bike û bi vê riyê berjewendiyên xwe biparêz

Li Başûrê Kurdistanê li ser serhildana sala 1991an heta îro 21 sal derbas bûne, lê hîn jî biryara ko wê heyamê Bereya Kurdistanî ji bo Mûsteşaran wergirtibû di meriyetê de ye. Di sala 1994an dema ez li Başûrê Kurdistanê bûm min bi guhê xwe bi xwe hesasiyetên derheqê helwestên li dijî Mûsteşaran de bihîst û bûm şahidê bê ka Mûsteşar pergala xwe ya berê çawa diparêzin. Pişkek mezin ji Mûsteşarên berê ji bo cihê xwe yê berê biparêzin riyên muxtelîf yên wekê nêzikatiya bi ber herdu partiyên mezin yên sereke (PDK û YNK) û hetta wekê ko serokeşîrê eşîra Surçî kiriye avakirina partiyekî diceribînin. Birrek ji Mûsteşarên berê jî xwe li kerî û laliyê danîne û li gorî rewş û rojevê cihê piyê xwe xweş dikin. Rewşa Mûsteşaran ko di dewr û dewrana Seddam de bi operasyonên wekê yên Enfalê destê xwe li xwîna gelek Kurdan gerandine û sekn û helwesta wan a li dijî tevgera Kurd ya neteweyî û bi tayebetî jî cihê wan ê aborî û civakî yê di roja îroyîn de mijarek gelek aloz û tevlihev e heta niha çend caran di

çapemenî-weşangeriyê de jî bûye cihê behsê û egera guftûgoyan û piştî îro jî wê hîn gelek caran were rojevê û wê were behskirin û gugtûgokirin.

**e. Guftûgo û çend encamp**

Armanca vê nivîsê, li gorî ezmûn û serpêhatiyên taybet yên her welatekî vekolana rêxistinên paramîlîter yên ko ji aliyê hikûmetan ve hatine çekdarkirin, û danîna perspektîva zemîneke navneteweyî ji bo duh, îro û siberoja pergala Notirvaniya Gund ya ko ji aliyê Tirkiyê ve di sala 1985an de li Kurdistanê hatiye damezrandin e. Pratîkên çend welatên ko li jor bi kurtî hatine behskirin nîşan dide ko, rêxistinên paramîlîter çendî li gorî xweseriyên welatê lê xwediyê çend cudatiyên taybet bin jî, di navbera polîtikayên şer yên ko bi salan li welatên wek Fîlîpîn, Guatemala, Afrîqaya Başûr û Iraqê hatine meşandin de şibînên mezin hene.

Ezmûn û serpêhatiyên welatan yên ko hatine behskirin bêtir bi ser perspektîva rexnegiriyê (Kowalewski, 1992) ve diçin. Yek ji van, komên paramîlîter şûna pirraniya civakê xizmeta daxwazên ekaliyetek biçûk dikin. Şane û nîşaneka din ya girîng jî, hêzên serdest û serwer ji bo parastina berjewendiyên xwe rêxistinên paramîlîter bikar anîne û ji bo bêdengkirin û binpêkirina birr û pişkên civakê yên muxalîf jî hawara xwe gihandine paramîlîtarîzmê. Paraleliyek din jî, kar û kirin û kiryarên hatîn kirîn li dijî prensîbên eşkeretî û berpirsiyariyê bûyîne, û gelek caran endamên van rêxistinan bi serê xwe tevgeriyane û carinan jî xwe xistine di şûna qanûnan de. Rejîmên zordest, ji ber ko maliyet û mesrefa rêxistinên paramîlîter kêmtir e û qabîliyeta wan ya tevgerê berfirehtir e di şûna hêzên ewlekariyê yên edetî de hêzên paramîlîter bikar anîne.

Aliyê "globalîzmê" ya polîtîkayên parçe bike û birêvebibeyê ko parçeyek ji pejirandin û pesendkirina lihevnekirin û nakokiyan e, encamek din e ko mirov dikare ji nav pratîkên van welatan têderxe. Bi ser navê xizmeta ji bo dewletê êrîş birin ser xelkê sivîl, helwestên bi serê xwe girtin, kar û wezîfeya xwe ji bo berjewendiyên xwe û berjewendiyên malbata xwe bikaranîn, tevî ko peyt û delîlek mezin e ko hikûmetên sivîl û yên leşkerî ji ezmûn û serpêhatiyên hev û din sûdemend dibin e, lê wek şibînên ko ji ber strûktûra zilmê çêbûyiye jî mirov dikare binav û pênase bike. Ji bo nimûne di navbera gotinên serokwezîrê wê demê Turgut Özal, ko di sala 1980an de dema ko PKK li herêmê gelekî xurt û çalak bû, gotibû bila bi riya koçkirinê demografiya herêmê were guhertin û





gotinên dîktatorê Guatemalayê Rio Montt ko di serê sala 1980an de gotibû ko divê "behra ko masî tê de avjeniyê dikin were miçiqandin" şibînên mezin hene. Gotinên wekê gotina ko Rio Montt di axaftineka xwe ya ji bo xelkê herêmê de bikar anîbû; "Eger hûn bi me re bin em ê we xweyî bikin; na eger hûn ne bi me re bin em ê we bikujin" li Kurdistanê dema pergala Notirvaniya gund dihate damezrandin, li bajarên wekê Sêrt, Colemêrg û Wanê bi sedan caran hatine gotin û dubarekirin (Aytar, 1992).

Di nav rêxistinên paramîlîter de îstîhdama bi kotekî, ko bi taybetî jî di ezmûn û serpêhatiya nimûneyên dewletên wek Fîlîpîn, Guatemala û Iraqê zêde tên dîtin, di serdema avabûn û berbelavbûna pergala Notirvaniya Gund de jî mirov dibîne (Aytar, 1992) Ji bo tevgerên çekdar yên ko roj bi roj bihêztir dibin bên çewisandin û serkutkirin, ji koçberiya bi kotekî bigirin heta valakirin û şewitandina der û deverên ko çûn û hatina gerîllayan lê zêde ye hema bêje her rê û rêbaz wek tiştek asayî û ji rêzê hatiye dîtin, bi taybetî jî di pratîka dewletên wek Fîlîpîn, Guatemala û Iraqê de ev rastî beloqtir û berbiçavtir e. Di mijarê de jî bi pêşketina pêvajoya pergala Notirvaniya gund gelekî dişibe nimûneyên li welatên din.

Yek ji encamên din ko mirov dikare ji ezmûn û serpêhatiyên van welatan têderxe, zû an dereng piştî ko ev komên paramîlîter, li ser peymanên siyasî yên hatîn girêdan an li ser guherrîna rejîmê werin feşkilandin û belavkirin jî, birînên ko ji ber van koman çêbûyîne zûbizû nakewin. Wek nimûne tevî ko Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê, li Afrîqaya Başûr bêyî ko cudakariyê bike bi salan guhdarî hemû aliyên beşdarî şer bûyîn ko dewlet û muxalefet jî tê de kir û li ser van guhdarîkirinan biryarên girîng jî standin, lê dîsa ji herdu aliyan jî gelek kes ji encamê memnûn neman. Li Guatemalayê ji bilî çend lêpirsînên berbiçav ji ber ko li ser bûyer û rûdanên di nav şer de qewimîn lêpirsîn û mehkeme çênebû û bes bi efûyeka giştî hate xwestin ko mesele safî bibe muhasebe û muhakemeyek tam çênebû. Ji ber van çend egeran hê jî serok û endamên çend komên paramîlîter yên berê bi nav û armancên muxtelîf teşekûlên nû dadimezrînin. Herwisa li Başûrê Kurdistanê jî carinan heman mijar dikeve di rojevê de û ji bo kesên ko berê çekên dewleta Iraqê hilgirtîn carinan bertek û aciziyên mezin çêdibin.

Şibînên mezin û girîng di navbera hêzên paramîlîter yên li Fîlîpîn û Guatemalayê ko tevî guherînên hikûmetan van hêzan heyîna xwe her parastin û Notirvaniya Gund ya li Tirkiyê ko ji sala 1985an û vir ve çendik û çend hikûmet

guherîbin jî pergalê her hebûna xwe berdewam kirriye de hene. Di navbera tiştên ko ji bo danîn û damezrandina hêzên paramîlîter yên wekê pere, serdestiya şexsî û komelî, zor û kotekî û sekn û helwestên hikûmetên sivîl de jî şibînên gelek girîng hene. Çi serdema hikûmeta cûntayê ko piştî kudetaya 12ê Îlonê ya sala 1980an hatiye ser wezîfê û çi jî serdema piştî hikûmeta cûntayê ya hikûmetên sivîl de be, tevî cudatiyên qewl û gotinên xwe, hemûyan jî pergala Notirvaniya Gund parastine û ji bo rakirin û jinavbirina vê pergalê tu tişt nekirine. Ji ber hindê mirov dikare bêje ko di mijara çareseriya kêşeya Notirvaniya Gund de, wek kêşeyên manend yên li Afrîqaya Başûr û Guatemalayê, divê li ser rê û rêzana çareseriyeke demokratîk, aşitîxwaz û dadmend ya ji bo pirsgirêka Kurd jî were rawestan.





**Têbînî**

[1]Di vê nivîse de ji bo hêzên ko me jê re navê rêxistinên paramîlîter bikar aniye li welatên din navên cihêreng têne bikaranîn, ji bilî navên resen yên xweserî welatan, di nivîsê de tenê ev binavkirin hatiye bikaranîn. Têgeha birêxistinbûnê ya di nivîsê de hatiye bikaranîn, bi şêweyeke ko hemû rêxistin, tevger, kom û teşekûlan werbigire nava xwe hatiye bikaranîn, û ji ber karaktera nivîsê, muqayesek teorîk di navbera têgeha ‘’rêxistinbûn” û ‘’rêxistinê” de nehatiye kirin.

[2]Navên rêxistinên paramîlîter yên Kurdî yên ko di vê nivîsê de derbas dibin, li ber navê wan ê Îngîlîzî hatine çêkirin. Lê ji bo xwendineka hêsantir û pêkanîna zemîneke guncantir ji bo lêgerîna çavkaniyên derbarê mijarê de di nav kevanekî de navê wan ê Îngîlîzî jî hatiye danîn.

[3]Bergîdan û miqabilê peyva “Benelovent”ê di Kurdî de peyvên wekê xêrxwaz, qencîxwaz û alîkarîxwaz e. Di vê nivîsê de ji ber ko guncantir û lihevhatîtir e me di berdêla term û têgeha The Benelovent perspective’ê de ji bo Kurdî têgeha Perspektîva erênî bikar anî.

[4]Ji bo ko di wergerandinê de rê li ber şaş têgihiştinan venebe me di nav kevanekî de navê resen yê Îngîlîzî yê term û têgehan daniye.

[5]Ji bo bêtir agahî derbarê mijarê de mirov dikare li malpera fermî ya Komîsyona Heqîqet û Lihevhatinê binêre: http://www.justice.gov.za/trc/index.html

[6]Balkêş e ko rêxistina paramîlîter ya ko sala 1963an li Iraqê hatiye danîn, navê xwe ji navê Selahaddîn Eyûbiyê Kurdî ko serdariya serkeftin û serfiraziya artêşên Îslamê ya li hemberî Xaçperestan kiriye, standiye.

**Çavkanî**


Afrikagrupperna i Sverige, & ISAK (1986). *Det totala kriget: Om militärstaten Sydafrika*. Stockholm: Afrikagrupperna i Sverige & ISAK.

Amnesty International. (1981). *Report on Amnesty International Mission to the Repuplic of the Philippines*. London: Amnesty International.

Amnesty International. (1988). *Philippines: Unlawful Killing by Military and Paramilitary Forces*. London: Amnesty International.

Amnesty International. (1991a). *Philippines: Recent Extra-Judicial Killings in Northern Samar*. London: Amnesty International.

Amnesty International. (1991b). *Philippines: Human Rights Violations and the Labour Movement*. London: Amnesty International.

Amnesty International. (1992). *Philippines: The Killing Goes On*. London: Amnesty International. Tarîxa têketinê: 1.11. 2011, http://www.amnesty.org/en/library/info/ASA35/001/1992/en

Amnesty International. (2011). *Philippines: Aquino should rescind plan to deploy militias in mining areas*. Public Statement (AI Index: ASA 35/006/2011). Tarîxa têketinê: 1. 11. 2011, http://www.amnesty.org/en/library/info/ASA35/006/2011/en

Aytar, O. (1992). *Hamidiye Alaylarından Köy Koruculuğuna*. İstanbul: Medya Güneşi Yayınları.

Ball, P., Kobrak, P., & Spirer, H. F. (1999). *State Violence in Guatemala, 1960-1996: A Quantitative Reflection*. Washington, DC: American Association for the Advancement of Science (AAAS). Erişim tarihi: 8 Aralık 2011, http://shr.aaas.org/guatemala/ciidh/qr/english/en_qr.pdf

Bruinessen, M. van (1999). *Kurds, states, and tribes*. Paper presented at the conference "Tribes and Powers in the Middle East", London, SOAS, Birkbeck College and Iraqi Cultural Forum, January 23-24, 1999. Erişim tarihi: 2 Aralık 2011,

http://www.hum.uu.nl/medewerkers/m.vanbruinessen/publications/Kurds,%20states,%20tribes.htm

Chomsky, N. (1990). *Terrorismens Kultur*. Göteborg: Epsilon Press.

Crapanzano, V. (2011). *The Harkis. The Wound That Never Heals*. Chicago: The University of Chicago Press.

Figueroa Ibarra, C., & Marti i Puig, S. (2007). Guatemala: From The Guerrilla Struggle to a Divided Left. In Deonandan, K., Close, D., & Prevost, G. (Eds.), *From Revolutionary Movements to Political Parties: Cases from Latin America and Africa* (pp. 43-65). New York: Palgrave Macmillan.

Harris, B. (2001). *As for Violent Crime that's our Daily Bread: Vigilante Violence during South Africa's Period of Transition*. Johannesburg: The Centre for the Study of Violence and Reconciliation (CSVR). Tarîxa têketinê: 24.11. 2011, http://www.csvr.org.za/docs/vigilantism/asforviolentcrime.pdf

Harris, B. (2003). Spaces of violence, places of fear: Urban conflict in post-apartheid South Africa. Paper presented on the *Conflicts and Urban Violence*







panel, Foro Social Mundial Tematico, Cartagena, Colombia, 16-20 June 2003. Tarîxa têketinê: 24.11. 2011,

http://www.csvr.org.za/docs/urbansafety/englishspaces.pdf

Haysom, N. (1986). *Apartheid's Private Army: the rise of right-wing vigilantes in South Africa*. London: Catholic Institute for International Relations.

Haysom, H. (1989). *Vigilantes: A contemporary form of repression*. Paper presented at the Centre for he Study of Violence and Reconciliation, Johannesburg, S. Africa. Tarîxa têketinê: 24.11. 2011, http://www.csvr.org.za/index.php?option=com_content&view=article&id=1442:vigilantes-a-contemporary-form-of-repression&catid=138:publications&Itemid=2

Hiltermann, J. R. (2008). *The 1988 Anfal Campaign in Iraqi Kurdistan*. Online Encyclopedia of Mass Violence. Tarîxa têketinê: 3.12. 2011, http://www.massviolence.org/spip.php?page=article_pdf&id_article=98

Human Rights Watch. (1993). *Genocide in Iraq. The Anfal Campaign Against the Kurds*. New York: Human Rights Watch, A Middle East Watch Report. Tarîxa Têketinê: 2.12. 2011,

http://old.krg.org/reference/hrw-anfal/index.asp

Human Rights Watch/Americas. (1994). *Human Rights in Guatemala during President De Leon Carpio`s First Year*. New York: Human Rights Watch. Tarîxa têketinê: 8.12. 2011,

http://www.hrw.org/sites/default/files/reports/GUATEMAL946.PDF

Inter-American Commission on Human Rights. (2003). *Justice and Social Inclusion: The Challenges of Democracy in Guatemala*. Washington: Inter-American Commission on Human Rights. Tarîxa têketinê: 8.12. 2011, http://www.cidh.org/countryrep/Guatemala2003eng/TOC.htm

Klare, Michael T., & Kornbluh, Peter (Eds.) (1988). *Low-Intensity Warfare*. New York: Pantheon Books.

Kowalewski, D. (1992). Counterinsurgent Paramilitarism: A Philippine Case Study. *Journal of Peace Research*, 29 (1), pp. 71-84. . Tarîxa têketinê: 1. 11. 2011: http://www.jstor.org/stable/423879

Krueger, C. & Enge, K. (1985). *Security and Development Conditions in the Guatemalan Highlands*. Washington: Washington Office on Latin America.

Mazzei, J. (2009). *Death Squads or Self-defense Forces? How Paramilitary Groups Emerge and Challenge Democracy in Latin America*. North Carolina: The University of North Carolina Press.

McDowall, D. (1996). *A Modern History of the Kurds. London*: I. B. Tauris.

Palme, S. (1989). *Hemliga Krigare: USA:s Militära Strategi i Tredje Världen*. Stockholm: Utbildningsförlaget Brevskolan.

Payne, L. A. (2000). *Uncivil Movements. The Armed Right Wing and Democracy in Latin America*. Baltimore: The Johns Hopkins University Press.

Polit, D. F., & Beck, C. T. (2010). *Essentials of nursing research. Appraising evidence for nursing practice*. Philadelphia: Lippincott Williams & Wilkins.

Rizgari Online. (2007). *Şengal'deki patlamada Türk ve Suriye istihbaratı*

*destekli aşiretlerin parmağı*. . Tarîxa têketinê: 2.11. 2011, http://www.rizgari.com/modules.php?name=News&file=article&sid=9483#bg

Rosen, N. (2003). Iraq: US running with the enemy. *Asia Times Online*. . Tarîxa têketinê: 2.11. 2011, http://www.atimes.com/atimes/Middle_East/EH15Ak03.html

Sekhonyane, M., & Louw, A. (2002). *Violent Justice, Vigilantism and the State's Response*. Pretoria: Institute for Security Studies. . Tarîxa têketinê: 24.11. 2011, http://www.iss.co.za/uploads/Mono72Full.pdf

Senechal de la Roche, R. (1996). Collective Violance as Social Control. *Sociological Forum*, 11 (1), pp. 97-128. . Tarîxa têketinê: 13.10. 2011, http://www.jstor.org/stable/684953

Smith, C. A. (1990). The Militarization of Civil Society in Guatemala: Economic Reorganization As a Continuation of War. *Latin American Perspectives*, 17 (4), pp. 8-41. Erişim tarihi: 8 Aralık 2011, http://www.jstor.org/stable/2633570

Zieck, M. (1997). *UNHCR and Voluntary Repatriation of Refugees: A Legal Analysis*. The Hague: Martinus Nichoff Publishers. Tarîxa têketinê: 10.10. 2011,

http://books.google.co.uk/books?id=ro1JOuwdf20C&pg=PA177&lpg=PA177&dq=%22Fursan+by+kurds%22&source=bl&ots=G_QTNnfLOK&sig=MUD3TSU1pWEsMsIMmL1cxoQJj30&hl=en#v=onepage&q&f=false





## VI. NIRXANDIN

Ji dema ev pergala cerdevaniyê li sala 1985 hatî danîn heta niho, ev pergal ji aliyê hikûmetan û hêzên leşkerî ve tê bi rê ve birin û binasê heyina vê pergalê jî bêkarî û "berxwedana li hemberê terorê" hatiye nîşandan. Ew partiyên li dema opsîyonê difikirîn ko divê pergala cerdevaniyê bê rakirin jî dema ko dibine desthilatdar ferq dikin ko bi tenê ew dikarin ji bo islih kirina vê pergalê bixebitin. Ev "ferqkirina vê rewşê" qasî ko bi heyina rêxistineka xwedanê milîtanên şarezayên herêmê û dezavantaja ji ber vê yekê, her dîsa bi daxwazên artêşa dewletê û daxwaza partiyên siyasî ye ko ew dixwazin têkiliyên xwe yên bi eşîret û cerdevanan re ji destên xwe derneêxin.

Dema ko ev pergala nîvleşkerî hatiye çêkirin, hinek nîşan diyar dikin, wek Alayên Hemîdiyeyê, dewletê hem xwestiye bi sîstema cerdevanîyê, hêzeka leşkerî çêbibe hem jî bi heyina wê rêxistinê kurdan asîmîle bike. Weke dî jî dewletê xwestiye ko civakê bike "piştgirên dewletê" û "piştgirên PKKyê" û bi vê yekê jî yekîtiya civatê xera bike ko opsîyoneka bi hêz ji nêv civakê çênebe. Yek ji armancên çêkirina pergala cerdevaniyê jî wekî ko li belgeyan hatiye dîtin bi rêya parçe bike-bi rê ve bibe, hatiye xwestin kurdan li kurdan bide şikênandin. Bi vê pergala kêrhatî dewletê hem xwestiye kurdan bîne ser rêya xwe hem jî xwestiye meydaneka bê kontrolkirin çêbike. Ew gundên gundîyên wan nexwestine bibine cerdevan hatine xerakirin û şewitandin û ev yek jî parçeyeka wê planê bûye. Bi van kirinan dewletê xwestiye rêyên agahî rêkirinê li PKKyê bigire û nehêle ciwan biçin di nêv PKKyê de, ji bo wan gundên ihtimal heye arîkariya lojîstîk bê rêkirin jî bi tenê destûra "alîgirên dewletê" daye.

Pergala cerdevaniyê gelek caran ji bo birêvebirîyê, artêşê heta ji bo ekonomiyê jî bûye cihekê xwe-spartinê. Car caran ji ber "dilnexwaziya cerdevanan" zêdebûna hejmara "sûcên ciddî" yên ew ketinê, minaqeşeya rakirina sîstema cerdevaniyê hatiye kirin. Weke dî ji ber ko ew dibûn armanca PKKyê ew kêrnehatî dibûn û bi binasên wek cerdevan arîkariya PKKyê dikin minaqeşeya rakirina cerdevaniyê hatiye kirin. Lê digel heyina van minaqeşeyan jî heta "berxwedana li hemberê terorê" dom kir û nemaze, li dema li sala 1990ê şer dijwar bû, pergala cerdevaniyê bû parçeyeka polîtîkaya giştî.

Dema ko islahkirina cerdevanan hat rojevê, vê carê em dikarin bifikirin ko dewletê fikirî "bêzerer û ziyan" ji cerdevanan xelas bibe. Ji gotina islahê herî zêde weke parastina mafên kesane yên cerdevanan û başkirina şertên wan tê

fêmkirin. Ji ber ko cihekê ew cerdevanên ko demekê cotkarî dikirin û heywan xwedan dikirin nemane ko ew lê bixebitin û tirsa ji ber sûcdariya cerdevanan xelkên necerdevan dê heyina wan qebûl nekin, ji bo ji cerdevanan bi bêdengîyê dewlet xelas bibe ti rê nehêla. Partiyên opsiyonê bi israr fikirine ko divê bi temamî cerdevanî bê rakirin û cerdevan li karên dî bêne bicihkirin lê digel vê yekê partiyên desthilatdar, pirrengiya cerdevanan, têkiliya wan a bi dewletê û artêşê re aniye ber çavên xwe û hewl daye pergala cerdevaniyê ji rojevê rake. Hê jî ev rewşa ko ji aliyekê ve behsa rakirina pergala cerdevaniyê tê kirin û digel wê yekê cerdevanên nû tê girtin nîşana wê yekê ye ko ddewlet naxwaze bi hêsanîkê dest ji vê pergalê berde.

Weke dî ew problemên ji bo tesfîyekirina alayên Hamîdiyeyê hê jî tehsîra xwe heye. Dema ko dewletê hizir kir êdî ew ne hewceyî wan eşîretên Hemîdiyeyê ne, ew eşîretên her dem behsa kehremaniya wan dikir û hemî îmkanên maddî seferber dikir hat wê rewşê ko bi destê dewletê hatin kuştin. Alayên Hemîdiyeyê yek ji mînakên ber bi çav e ko dema polîtîkayên parçe bike û bi rê ve bibe cih negire û dema hat xwestin rêxistinên wek wan bi destên hinekên dî çêbikin ka çi tê kirin.

Ew partiyên di parlamenê de qebûl dikin ko her kesên di yek partiyê de wek hev nafikirin lê belê li ser meseleya pergala cerdevaniyê hema em dikarin bibêjin du kom hene. Ji aliyekê ve komek heye ji ber dîroka heyina cerdevaniyê ya dom û dirêj heyina wê meşrû dibîne, heyina vê pergalê ji bo rê li ber girtina terorîstan wek rêyekê dibîne, îdia dikin ko hejmara yên karê xwe ji bo neqenciyan bi kar tînin neliberketî ne û li qaûnan çi lazim be ji bo wan tê kirin, difikirin ko divê cerdevan jî bikarin biçin statûya şehîtbûnê, divê ew jî bibin xwedanê mafên ji bo memûran, difikirin ko heyina eşîretan ji bo partiyan û dewletê komên bifeyde ne, ew kesên çepgir, mihafzekar û ji partiyên desthilat hene.

Ji aliyê dî jî komek heye her ji destpêkê ve li dijî heyina cerdevaniyê ne, ew nîşan didin ka mirovên çawa dibine cerdevan, heyina eşîretan tîne bîra civakê, dibêje ev yek hinek hêzên desthilatdar bihêz dike, heyina vê pergalê xelkê diêxe di nêva du agiran de, bi navê dildariyê bûye pergaleka mecbûrî. Ew parlementerên di vê komê de difikirin ko çareserkirina “terorê” çênabe bi rêya çekdarkirina miletiyan bê çareserkirin û ev yek ji bo dewletên civakparêz û hiqûqparêz rêyeka xelet e û li dijî Qanûna Esasî ye. Ev kesên van tiştan dibêjin pirtirîn ji partiyên derdorê û ji partiyên herêmê ne. Piranîya wan çepgir in. Gelekê zelal e ko ew xetên li ser pergala cerdevaniyê ne wek hev in li ser demokrasî û mafên mirovan, li ser dewlet û miletîyan jî ne wek hev in.

Ji nûçeyên di çapemeniyê de, ji serhatiyên mexdûran, ji dozên mexdûran li dagehê vekirî, ji raporên lêkolînê yên Meclîsê, heta ko ji kitêbên cerdevanan bi xwe nivîsîn tê zanîn ko cerdevanan bi hêza ko wan ji xwedaniya çekan standine wan sûcê tecawizê, qaçaxçîtiyê, vegirtina zevîyan û malên xelkê kirine. Hinek cerdevanên ji ber van binasan ji karê xwe hatîn avêtin jî hene lê gelek cerdevan hene ko digel ko ew sûcdar in jî ew ji aliyê hêzên dewletê ve hatine parastin û hê jî li ser karê xwe ne. Dewletê carinan sûcdariya cerdevanan veşartiye û carinan ne li qamê ceza dane wan û bi vî awayî em dikarin bibêjin dewletê di nêva agirekê de agirek dî jî dadaye û ew keyfanê çi bixwaze wê li cerdevanan dike. “sûcdar”kirina cerdevanan ya ji aliyê dewletê ve jî eşkere dike ka dewlet çawa li cerdevanan dinêre.

Ew kesên bi zordariyê ji aliyê dewletê ve bûyîn cerdevan dema “çekên xwe bi kêrhatî neşixulînin” sûcdar hatine dîtin, weke dî dewlet carinan mecbûr bûye ko ew kesên sûcê kuştin, talan, tecawizê kirîn dad kirine. Her dîsa gelek ji cerdevanan bi destên dewletê têne parastin û ew nikarin bêne cezakirin. Dîsa tê dîtin ko carinan dewletê êdî xwedaniya xwe li wan nekiriye û ew ketine di nêv karên ne yasayî. Sîyasetmedar jî li ber feydeyên ji cerdevan û serokên eşîretan in ko ew jî weke ketine dhfikekê nikerin jê xelas bibin. Cerdevanên pêşiyê ji aliyê PKKyê ve dihatin kuştin û paşê hatîn efûkirin jî bi dahfeka weke ya sîyasetmedaran ve ne. Yek ji en camên herî giring ên vê lêkolînê jî ew e ko ev lêkolîn eşkere dike ko ne yek texlîdê cerdevanan hene gelek texlîdên ji hev cida hene. Ew kesên bi zorê bûyîn cerdevan, yên bi dilê xwedest pê kirîn, yên bi sebebên cida lê dîsa jî bi mecbûrî dest pê kirîn, yên ji ber dewlet, PKK an jî ji ber nasnameya xwe û navê xwe yê di nêv civakê de di nêv hemiyan de ferqîtiyên mezin hene. Mirov nikare bi yek çavî li wî serokeşîrê bi artêşê re li hev kirî û hemî endamên eşîreta xwe kirî cerdevan û ew kesê gelek zarokên wî heyî û difikire ew nikare li cihekê dî zarokê xwe xwedan bike û di bin tehdîda “an ji gundê xwe here an jî bibe cerdevan” û ti rê jê re nemayî wek hev bibîne. Ev cidayên he bi taybetî ji bo tesfîyekirina cerdevanan dê meseleyê zelal bike. Ew cerdevanên sûcdar dixwazin ev pergal bidome ji ber ko ew dihizirin ji ber zilma wan kirîn heger ew bêçek bibin yên zilm lê hatîn kirin dê bêne tola xwe hildin. Weke dî ew cerdevanên bi zorê bûyîn cerdevan dîyar dikin ko ew amade ne çekan danin.

Bêguman divê mirov yek bi yek li kirinên kesane yên cerdevanan

binêre. Lê belê ev pergala berbehs ne yeka welê ye ko endamên wê bi însiyatîfa xwe ava kiribin, rêxistineka bi mebestekê hatî sazkirin e û divê mirov pêkveyî jî li pergalê binêre. Ko cerdevan qasî ko sûcdar û mexdûrê sûcan bûn ew bûne kurbanên polîtîkaya xerakirina civak û çanda kurdewarî. Yek ji şertên rêyê dide ev mirovên vê civakê bi hev re bijîn ew e ko divê bi giştî li vê meseleyê bê nêrîn û bi bernameyeka giştî bê tesfîyekirin. Gelekê zelal e ko li civakeka pergaleka nîvleşkerî bi eşkereyî an jî veşartî lê heyî mirov nikare behsa jiyaneka bêçek bike.

Tişteka dî jî ya gelekê zelal ew e ko pergala cerdevaniyê gelek tiştên li civakê, ekonomîyê û siyasetê xera kirine. Li gelek gundan ew kesên cerdevan û yên cerdevanan zilm lê kirîn li rexa hev dijîn. Başkirina têkiliyên bi vî awayî çênabe bi dayina tezmînatê, bi rêya pereyan be. Weke dî li ser mal û zeviyên wan kesên bi zorê hatîn koçkirin ew kesên cerdevan hene û divê ev binpêkirina mafî nehebe.

Hêzên dewletê yên bi zorê xelk kirîn cerdevan dema ko xelk dikirin cerdevan gelek çavkaniyên aborî yên ji berhemên xwezayî serobin kirine. Ew zeviyên bi salan beyar mayîn, an jî ew zeviyên cerdevan cûyin ser welê hatiye ko êdî tovçîn lê nayê kirin. Ev xerakirina mezin ya ekonomîkî zelal e ko bi salan nayê serastkirin. Ji bo serastkirina xeletiyan xebateka ciddî û piştgiriyeka baş pêwîst e.

Me gotibû ko her çende tirsa ji "neewlebûnê" wek sebep hatibe nîşandan jî yek ji armancên bin re-bin re ew bû ko asîmîlasyon bê kirin. Encamên lêkolînê eşkere dike ko siyaseta resmî ji bo vê yekê bi ser neketiye. Tam li dijî vê yekê karmendên dewletê û eskeran li her firsetê anine bîra cerdevanan ko kurdbûn tê wê meineyê ko mirov ji çîna didoyê ye. Di têkiliyên di nêva cerdevanan û eskeran de jî her car eskeran ew ji xwe kêmtir dîtine û ji wan piştrast nebûne û vê yekê cerdevan gelekê aciz kirine. Dewletê dema ko "yên li aliyê dewletê" ji komên dî cida kirin û li nêva xwe de jî di kiriyarê de yên li aliyê xwe ji xwe nehesibandin, bû sebep ko polîtîkaya wan li dijî xwe dom kir.

Ew cerdevanên bi zorê an jî bi dilê xwe bûyîn cerdevan hemî jî ji zincîra têkiliyên dewlet-esker-cerdevanan nerazî ne û difikirin ko ew hatine xapandin. Cerdevaniyê ne bi tenê têkiliyên cerdevanan û mexdûrên ji kirinên cerdevanan xera kirine, vê pergalê hemî civak serobino kiriye. Bi taybetî ew zarokên ko ti biryarên wan li ser cerdevanbûna babên wan çênebûye, dibine mexdûr, civaka giştî wan ji xwe qebûl nake, ew kêm têne dîtin, heta carinan êrîşî wan jî tê kirin. Her dîsa jinên cerdevanan bi salan bi tirsa ka mêrê wan dê bi sax û silamet





vegere an na, dijîn ji bo biryardayinê digel ko ti heqê wan nebû jî bedela wê yekê didin. Hinek jin jî mecbûr dibin çeka mêrê xwe yê ko ji operasyonan sax neziviriye dihilînê û barê debara mala xwe didane ser milên xwe.

Gelekê eşkere ye ko rakirina vê pergalê, bi rêya dayina mafên kesane yên cerdevanan, ji wan re kar dîtin, ya kêm dayina tezmînatê ya ji bo mexdûran (ya rastî dewlet qet behsa tezmînateka bi vî rengî nake jî) çênabe ko ev birînên bi salan bê girtin.

Em ê li jêr ji bo tesfîyekirina cerdevanan xalên giring yên divê haya dewletê ji wan hebe binivîsin. Bêguman divê ev xal bêne berfirehkirin û divê li ser zêdetir bê hizirîn.

- Divê çekên cerdevanan û imtiyazên wan ji wan bêne standin û pergala cerdevaniyê ji binî ve bê rakirin.
- Ew cerdevanên li hemberê sivîlan sûc kirine divê bi bayê bezê bêne dad kirin.
- Divê bi bernameyeka eşkerekirî cerdevan ji mal û cihên wan dagir kirîn bêne derêxistin.
- Divê mafên kesane yên cerdevanan bê dayin, ew kesên di emrê xebatê de ne divê rêyên kar kirinê ji wan re bên çêkirin.
- Divê ew kesên ko cerdevanî kirine an jî hê dikin bi ti rengî nekarin bibin parastvanên daristanan, parastvanên dibistanan, parastvanên kesan an jî saziyan. Divê teqez rêya karkirina li karekê divê çekan hilgire û imtiyazê li ser hinekan bikare bike, li ber wan bê girtin.
- Divê lijne û bernameyeka saziyên sivîl jî tê de erkdar bin bê çêkirin ko ew rêyê li ber qaçaxçîtî û kirîn-firotina ne li qamê ya çekan bigirin ko dîsa saziyên nîv-leşkerî nekarin ji nû ve çêbin.
- Divê di nêva PKK û cerdevanan an jî heger lazim be di nêva gundΔîyên necerdevan û cerdevanan ji bo tol ji hev neyê hildan peymanek bê îmzekirin.
- Divê dewlet bi yasayî hemî rêyan li ber çêbûna saziyeka nîvleşkerî bigire.

Ev lêkolîna ko di destên we de ye, bi çavê dîrokê û civakê li pergala cerdevaniyê dinêre û lêdikole ka çawa li Tirkiyeyê, dewletê çek dane hinek sivîlan û bi vê yekê komên "alîgirên dewletê" û yên "dijminê dewletê" çêkirine.

Ev xebat paşxaneya sazîya nîvleşkerî ya li demên paşiyê yên osmaniyan, Alayên Hemidîyeyê û dewama wê, pergala "nûjen" ya li sala 1985ê hatî çêkirin li ber çavan zelal dike. Nêzîkî 30 salan e ko cerdevaniya gundan hem divê bê xelaskirin hem jî ji bo hemî siyasetên dibine desthilatdar hêzeka çekdar e ko wan hemiyan xwestiye ev pergal dom bike. Em da ko bibînin sebebên/binasên heyina van herdu rewşan ka çi ne, me lêkolîna xwe li ser Belgeyên Meclisê û Çapemeniyê domand.

Ev, xebateka welê ye ko cara pêşiyê lêkolîneka bi vî rengî, bi berê fireh, di nêv civakê de hatiye kirin, ev xebata ko xwe dispêre hevdîtinên rû-bi-rû yên li gundan bi cerdevanan, jinên wan û zarokên wan re hatîn kirin, li ber çavan didane û zelal dike ko hinek kes bi dildarî, hinek bi mecbûrî, hinek kes -bi rengekê- cerdevanên dildar ew "mecbûr" kirine, hinek kes ji ber rola xwe ya di civakê de û şexsiyeta xwe ya bi dewlet, PKK an jî nasnameya xwe ya kurdî ve têkildar di nêv vê pergalê de cih girtine.

Ev lêkolîn ne bi çavên ko divê pergala cerdevaniyê bê tunekirin û islah kirin li cerdevaniyê dinêre, ev lêkolîn dîyar dike ko divê li dema destpêkirina pêvajoya bêçek û bêşer bi rêyên li-mafên-xwe-geranê û temînata civakî bê çareserkirin. Ji ber vê yekê ye ko beşek heye, eşkere dike gelo li welatên ji hev cida saziyên nîvleşkerî bi kîjan rêyên siyasî, hiqûqî û civakî bi rêlibergirtinên biserneketinê hatine tesfîye kirin.

DiSA

DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ
DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL AND SOCIAL RESEARCH

ISBN: 978-605-5458-20-1